

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîstî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

NÛKIRINA KURMANCÎ

Kurmancî zarekî gelekî dewlemend e. Di hin warên jiyana rojane de, di peywendiyên bi xwezayê (tabîetê) re, peyvên wê ji yên zimanên mezînan ên ewropayî kêmtir namînin. Mesela ji bo navên pez û dewaran, ji bo navên dengên tişt û heywanan de ew ji fransîzî û îngilîzî jî zengîntir e. Ew berî rûsî û zimanên slav ên din bûye zimanekî edebî û hê di sedsalên XIV û XV de berhemên giranbiha dane.

Mixabin, ji bo sedemên siyasî, ji ber bindestketina gelê kurd û parvekirina welatê wî, rê li ber vê pêşveçûyîna dirokî hate bestîn, an asê kirin. Kurmancî wilo bê xweyî, li jêrê erîş û gefên çandên biyanî kete sedsala XX an, ya nûjeniyê (moderniyê), ya rojname, radyo û televîzyonê. Bi awayê ku civaknas dibêjin mirovahî di heftê salên dawîn de ji heft sed salên berê bêtir veguherînen civakî (sosyal) û çandî (kultûrî) derbas kiriye. Çerxa dirokê bereberê zûtir digere, bergehên mirovan frehtir dibin, nûyîti li çar aliyên cihanê zûtir belav dibin, dinya hin bi bin "biçûktir" dibe. Di vê meşa han de qels, kulek, brîndar, naamade dikevin, û hin ji wan jî ji rûpelên dirokê wînda dibin.

Ji salên 1920î ve Kurdên Iraqê karîne bi kurmanciya xwarê ango bi "sorani" binivîsîn, pirtûk, kovar û rojnameyan derfînin. Zaroyên wan di xwendegahên despêkî û navîn de zimanê xwe yê dê dixwînin, di radyo û televîzyonan de bernamê û weşînekên "sorani" hene. Zimannasên kurd ên Iraqê bi salan li ser pirsên rastnivîsîna "sorani" xebitîne, hê jî dixebitin. Lewre rewşa van jî ya kesên ku bi kurmancî dipeyivin (Kurdên Tirkiye, Sûrye, û yên bakura Kurdistana Îran û Iraqê, tevhihev bêtiî 65% ê gelê kurd) pîrr baştir e.

Xebatên ku di salên 1930-1940î de Kamran A. Bedirxan û Celadet Bedirxan pêk anîne ji bo rastnivîsîna kurmancî gaveke hêja ne. Lê pêşvebirin û kûrkirina vî karî ferz e, pirseke jindarî ye. Heke rojekê li perçeyê Kurdistanê gelê kurd bigihê azadiya xwe, wê demê dê Akademiyeke ziman, bi riya imkan û gengaziyên dewletê (radyo-televîzyon, rojname, xwendegah) li ser pirsên zimên biryaran

bistîne û wan biryaran bide qebûl kirin. Lê ev roj dê kengî bê diyar nîne. Heye ku ta wê rojê, li jêr tesîra televîzyon û xwendegahên tirkî û erebî birrekî mezînan ê gelê kurd kurmanciya bav û kalên xwe ji bîr ke an jî tenê zimanekî jarketî, tevlihev bipeyve. Kurmancî jî bibe wekî zimanên îrlandî, welşî an brotonî, zimanekî "folklorî" ku tenê carna di govend û dilanan de tê bi karînin.

Welatparêzên xwedî berpisiyar, nemaze xwendada û ronakbîr, li ber sermavişt û qedere serî natewînin, wekî berxên sernerm li hêviya kêra qesab namînin. Parastina zimanê pêşiyên me bîngelê evîna welêt e, rehê jindarî yê welatparêzî ye. Lewra divê ku her Kurdê welatparêz li gora karîna û zanîna xwe beşdarî vî şerê parastin û nûkirina kurmancî bibe.

Ji bo nûkirin û dewlemendkirina kurmancî Enstîtu salê du caran, her carê hefteyek nivîskar, zimannas û rojnamevanên kurmancî ên ji hemû navçeyên Kurdistanê dicivîne. Ew di her civînekê de li ser peyvnasiya (terminolojiya) saxeke ziman dixebitin. Civîna bihara 1987 li ser rastnivîsîna navên rojan, mehan, hejmaran û li ser navên coxrafî xebitî. Biryarên vê civîna di rûpelên vê rojnameyê de tên belav kirin. Ewê heya payîzê Enstîtu xarîteyêke cihanê û yeka Kurdistanê bi kurmancî çap bike û bixe nav xelkê.

Di vê civîna de pisporên kurd ên ji navçeyên Agirî, Şapûr (Kurdistana Îranê), Akre û Kerkûk (Kurdistana Iraqê), Hekarî, Diyarbekir û Mêrdînê (Kurdistana Tirkiye), hebûn. Ev civîna ji 18 ta 24ê nîsanê li bajarê Barselonayê, paytexta Navçeya xweser (otonom) a Kataloniyayê li Spanyayê çêbû. Civîna payîzê jî her li wî bajarî bi arîkariya hikûmata xweser a katalanî çê dibe û ewê li ser peyvnasiya (terminolojiya) siyasî û îdarî be.

Her Kurdek dikare pirs û pêşneyarên xwe yên li ser rastnivîsîna ziman jî "Komîsyona kurmancî" ya Enstîtuyê re binivîse. Em hêvîdar in ku her Kurdê ku pê diqede dê arîkariya vê xebata bîngelî bike. Bila pîrsa ziman bibe ya heryek ji me, ya me hemûyan, pîrsek neteweyî. Tenê bi vî awayî emê bikaribin di nav salan de kurmanciya me ya şerîna jî talûke û gemaroyê rizgar bikin.

KURMANCÎ

Encamên civîna Barselonayê

Nivîskar, rojnamevan û zimannasên kurd ên ku ji 18 ta 24ê nîsanê li bajarê Barselonayê (paytexta Kataloniyayê) li ser pirsên rastnivîsîna kurmancî xebitîn gihane encamên (netîceyên) ku em di rûpelên vê rojnameya taybetî de belav dikin. Ewê Enstîtu piştî her civîneke zimanî hejmareke vê rojnameya *Kurmancî* derfîne.

RASTNIVÎSÎNA JIMARAN


0	Sifir (Nîn)	16	Şazdeh
1	Yek	17	Hevdeh
2	Du, dido	18	Hejdeh
3	Sê, sisê	19	Nozdeh
4	Çar	20	Bîst
5	Pênc	21	Bîst û yek
6	Şeş	30	Sî
7	Hef	31	Sî û yek
8	Heşt	40	Çil
9	Neh	50	Pêncî
10	Deh	60	Şêst
11	Yazdeh	70	Heftê
12	Dozdeh	80	Heştê
13	Sêzdeh	90	Nod
14	Çardeh	100	Sed
15	Panzdeh	101	Sed û yek

200 : Du sed; 1000: Hezar;
1 000 000: Milyon; 1 000 000 000: Milyar;
1 000 000 000 000 (1 000 milyar): Trilyon

JIMARÊN RÊZÊ

1.	Yeka	yekem	yekemîn
2.	Didoyan	duyem	duyemîn
3.	Sisêyan	sêyem	seyemîn
4.	Çaran	çarem	çaremîn
5.	Pêncan	pêncem	pêncemîn
6.	Şeşan	şeşem	şeşemîn
7.	Heftan	heftem	heftemîn
8.	heştan	heştêm	heştêmîn
9.	Nehan	nehem	nehemîn
10.	Dehan	dehem	dehemîn
11.	Yazdehan	yazdehem	yazdehemîn
20.	Bîstan	bîstem	bîstemîn
30.	Sîyan	siyem	siyemîn
40.	Çilan	çilem	çilemîn
50.	Pêncîyan	pênciyem	pênciyemîn
60.	Şêstan	şêstem	şêstemîn
70.	Heftêyan	heftêyem	heftêyemîn
80.	Heştêyan	heştêyem	heştêyemîn
90.	Nodan	nodem	nodemîn
100.	Sedan	sedem	sedemîn

NAVÊN COXRAFÎ




AMERİKA

Kanada	Otawa
Alaska	Xelîca Alaskayê
Dewletên Yakbûyî yên Amerikayê	Waşington (Washington)
Kuba	Havana
Haîtî	PortoPrens
San Dominîk	Santo Dominigo
PortoRîko	SanJuan
Antîlên Mezin	
Antîlên Biçûk	
Meksîka	Meksîko
Belîz	
Belmofan	
Guatemala	Guatemala
Salvador	San Salvador
Hondûras	Tegucigalpa
Nikaragua	Managua
Kosta Rîka	San Jose
Panama	Panama
Kolombiya	Bogota
Venezuela	Karakas
Brazîl	Brazîlyla
Giyana	Corc Tawn-Amazon
Sûrinam	Paramarîbo
Giyana Fransayê	Kayen
Ekwador	Kîto
Perû	Lîma
Bolîvya	La Paz
Paraguay	Assunsiyon
Arjantin	Buenos Aires
Ûrûguway	Montevideo
Şîlî	Snatiyago
Girava mezin a Agiristanê	
Tengava Macelan	
Malvînas (Falkland)	Stanley
Xelîca Sen Xorxê	
Xelîca Korkovado	
Girava Corciya Başûr	
Tengava Dêwan	
Antîlên Başûr	
Welatên Graham	


EWROPA

-Finlanda	Helsinki	-Albanya	Tirana
-Swêd	Stokholm	-Yûgoslavya	Belgrad
-Norwej	Oslo	-Otrîş	Viyen
-Danmark	Kopenhag	-Lîxtînştayn	
-Îsland	Reykjavîk	-Îtalya	Roma
-Gronland		-Malta	Valleta
-Faroarna		-Sardînya	Kyalerî
-Britanya		-Korsîka	Bastyâ
Mezin	London	-Swîs	Cenev
-Îngilîstan		-Fransa	Parîs
-Îrlanda Bakur	Belfast	-Monako	Monte Karlo
-Skotland		-Spanya	Madrid
(Scotland)	Glasgow	-Andora	
-Wêls		-Portugal	Lîsbon
-Îrland	Dublin	-Almanya	Berlîna Rojhelat
-Polonya	Warşova	-Rojhelat	
-Çekoslovakya	Prag	-Almanya Rojava	Bon
-Romanya	Bûxarest	-Luksembûrg	
-Macarîstan	Budapest	-Beljîka	Bruksel
-Bulgarîstan	Sofya	-Hollanda	Amsterdam
-Yunanîstan	Afîna		





ASYA		AFRİKA		OQYANÜSYA	
Afxanistan	Kabul	Misir	Qahîre	Cibûti	Cibûti
Pakistan	İslamabad	Lîbya	Trablûs	Somalya	Mogađiřu
Hind	Delhî	Tûnis	Tûnis	Kenya	Nayirobî
Srî Lanka	Kolombo	Cezayir	Cezayir	Ûganda	Kampala
Bengladeř	Dakka	Mexrib (Marok)	Rebat	Rwanda	Kigali
Bûrma	Rangûn	Sehra		Brundî	Bujumbura
Tayland	Bangkok	Sehraya Rojava	El Eyûn	Tanzanîka	Dar Es Selam
Kamboçya	Phnom Pen	Giravên Kanariyê		Malawi	Blantîre
Laos	Viyang řan	Moritanya	Nûaķřot	Mozambik	Mabûto
Viyetnam	Hanoy, Ho ři Min	Malî	Bamako	Madagaskar	Antana Narivo
Maleziya	Kuala Lumpur	Senegal	Dakar	Kanala Mozambikê	
Singapûr		Gambiya	Banjûl	Girava Rewinyon	
Endoneziya	Cakarta, Bandûng	Gineya Bisao	Bisao	Girava Moris	
Gineya Nû	Port Moresbî	Gine	Konakrî	Zengibar	Zengibar
Awistralya	Sîdney (Sydney)	Siyera Leon	Fritawn (Free Town)	Zimbabwe	Salsbûry
Zelanda Nû	Wellington	Lîberya	Monrovyia	Swaziland	Mbabane
Kaledonya Nû	Nûmeya (Noumea)	Kotdîvuwar	Abidcan	Lesoteo	Maserû
Giravên Silêman		Gana	Akra	Afrika Bařur	Pretorya
Fiji		Bûrkîna Faso		Botswana	Gabaron
Filîpin	Manila	Voltaya Jorîn	Wanadûgû	Namîbya	Windhûk
Taywan	Taypê	Togo	Lome	Zambiya	Lûsaka
Hong Kong	Viktoriya (Victoria)	Benen	Kotonû	Angola	Lûanda
Çin	Pekîn (Bejîng)	Nijerya	Lagos	Zaîr	Kinřasa
Nepal	Katmandû	Kamrûn	Yaûnde	Kongo	Brazil
Bûtan		Gineya Ekwatorî	Malabo	Gabon	Librvil
Moxolistan	Ûlan Batûr	Nijer	Niyamey		
Koreya Bakur	Piyongyang	Çad	Nicame`na		
Koreya Bařur	Seûl	Sûdan	Xartûm		
Japon	Tokyo	Afrika Navendi	Bangi		
Yekitiya Sovyeti	Moskov	Etyopya	Adis Abeba		
		Erître	Esmerê		



TIRKIYE

Enqere
Edene
Stembol
Qeyserî
Qonya
Antaxya
Îskenderûn

IRAQ

Bexda
Besra
Kerbela
Kûfe

SÛRIYE

Şam
Heleb
Hums
Lazkiye
Dêrezor

ÎRAN

Taran
Tewrêz

ROJHELAT

Lubnan Beyrûd
Îsrail Tel Avîv - Quds
Urûdîn Amman
Kuweyt Kuweyt
Erebistana Seûdî Riyaz
Yemena Bakûr Sen'a
Dubey Şarîqe

Mîrîtiyên Erebî yên Yekbûyî Ebû Zebî
Bahreyn Mename
Uman Mesqet
Qibris Levkosia
Yemena Başûr 'Eden
Qetar Dohe

DEMÊN SALÊ

Di salê de çar **dem** an werz (mewsim) hene:
BIHAR, HAVÎN, PAYÎZ û ZIVISTAN
Her dema salê sê meh dom dike.

Mehên biharê: Adar, Nîsan, Gulan

Mehên havînê: Hezîran, Tîrmeh, Tebax

Mehên payîzê: Îlon, Çirî, Teşrîn

Mehên zivistanê: Kanûn, Çile, Sibat

NAVÊN MEHAN

<i>kurdî</i>	<i>almanî</i>	<i>fransîzî</i>	<i>îngilîzî</i>	<i>tirkî</i>
Çile	Januari	Janvier	January	Ocak
Sibat	Februari	Février	February	Şubat
Adar	Mârz	Mars	March	Mart
Nîsan	April	Avril	April	Nisan
Gulan	Mai	Mai	May	Mayıs
Hezîran	Juni	Juin	Juni	Haziran
Tîrmeh	Juli	Juillet	July	Temmuz
Tebax	August	Août	August	Agustos
Îlon	September	Septembre	September	Eylül
Çirî	Oktober	Octobre	October	Ekim
Teşrîn	November	Novembre	November	Kasım
Kanûn	Dezember	Décembre	December	Aralık

ROJÊN HEFTÊ

Gotina **hefte** ji jimara heft tê, bi xwerû kurdî ye.

Di **hefteyekê** de heft roj hene. Va ne navên rast ên van rojan û wergerandina wan a bi zimanên biyanî:

<i>kurdî</i>	<i>almanî</i>	<i>fransîzî</i>	<i>îngilîzî</i>	<i>tirkî</i>
Yekşem	Sonntag	Dimanche	Sunday	Pazar
Duşem	Montag	Lundi	Monday	Pazartesi
Sêşem	Dienstag	Mardi	Tuesday	Salı
Çarşem	Mittwoch	Mercredi	Wednesday	Çarşamba
Pêncşem	Donnerstag	Jeudi	Thursday	Perşembe
Înî	Freitag	Vendredi	Friday	Cuma
Şemî	Samstag	Samedi	Saturday	Cumartesi

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pîrsên zaravê kurmancî

*Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan*

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

BARSELONA 2

Nivîskar, rojnamevan û zimannasên kurd ên dervayî welêt salê du caran, di bihar û payîzê de, ji bo hefteyekê dicivin, li ser pîrsên rastnivîsîn û nûkirîna kurmancî dixebitîn.

Di civîna bihara 1987 an de giraniya xebatê li ser peyvnasiya (terminolojiya) coxrafî û li ser rastnivîsîna navên rojan, mehan û hejmaran bû. Navên welatên cihanê, ên çiya, deşt, çem û bajarên sereke, bi zimanê kurmancî hatin tesbît kirin. Encamên civînê di hejmar 1a rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî *Kurmancî* de hatin belav kirin. Ji ber van encaman nexşeyê (xarîteyê) rengin a cihanê bi zaravayê kurmancî hate pêk anîn û çap kirin.

Civîna payîzê ji 7 ta 14 teşrîn 1987an de dîsa li bajarê Barselonayê (paytexta Katalonyayê), bi arîkariya dostane ya hikûmeta otonom a katalanî çê bû. Di civînê de ji rojhelat ta rojava, ji bakur ta başûrê navçeyên kurmancîxavên Kurdistanê çibigre ji her herêmê beşdar hebûn. Di rojên pêşîn ên civînê li ser navên coxrafî yên Kurdistanê hate xebitîn. Di şêst salên dawîn de dewletên ku wela-

tê me li hev par kirine navên pîraniya bajar, bajarok, deşt û çiyayên me jî guherîne, navên nû li van danîne. Guhartina navan destpêka guhartina zana-va (huwiyeta) kesekî, gelekî an welatekî ye. Lewra gava ku Konkîstador ên spanî an dagîrkerên brîtanî an îngilîz welatek zevt dikirin tafil navên nû li wan datanîn û, piştî çend nîfsan (neslan), derveyî çend zana û dîroknasan, kesî êdî navên kevn ên van welatan nedizani.

Di sedsala XX an de li me jî wilo qewimiye. Welatê me jî me re bûye biyanî (xerîb). Em Kurdên Îran û Iraqê li aliyekî bihêlin, îro çend Kurdên Tirkîyê dizanin ku navê kurdî yê *Adiyamanê* Semsûr e, ku yê *Kurtalanê* Misric e, *Bingol, Çewlik* e...

Ji bo ku ev nav neyên ji bîr kirin, nîfsên nû ew binasin, Enstîtu jî ber encamên vê civîna payîzê xarîteyê rengin a Kurdistanê da çap kirin, tê de navên kevn ên bajar, bajarok, çem, gol, deşt û çiyayên Welatê Kurdan bi awayekî zanistî bi cî kir û li bin navan, di nav kevanekan de, navên wan ên resmî jî nivîsî da ku welatîyên me çêtir tê bigihên. Weka her xebata destpêkî ev xarîta jî bê kêmasî û şaşî nîne. Ewê di çapa duwemîn de bîn rast kirin.

Di bemameya Civîna payîzê de hin pîrsên din jî hebûn: navên îdarî, navên meywe û heşina-

tiyan, reng, hwd... Bi carekê bersîvdana pîrsên wilo freh mimkin nebû. Pîrsên ku hatine safî kirin di vê hejmarê Kurmancî de tên belav kirin. Ên din ewê gav bi gav, piştî şêwr û lêgerînê bêtir, di civî- nê pêşiya me de zelal bibin. Herwekî di encamên vê Civînê de jî dixuye amanca vê xebatê çêkirina peyv û gotinên nû nîne. Heya ku ji me tê, em lê digerin ka li navçeyên cihê yên Kurdistanê ji bo tişteki çî nav bêtir tê bi kar anîn. Em wî navî û, heke ku hebin, guhartoyên (variyantên) wî yên deverî tesbît dikin û belav dikin. Gava ku di tu zaravê kurdî de ji bo tişteki an mefhumêkê navek nîn be, wê demê li ser çêkirina peyveke nû, li gora aheng û mantiqa kurmancî, diponjînin. Baş di bîra me de ye ku zimanekî çêkîro, zêde *xwerî û pefî* heye ku dilê hin ronakbîr û xwendayan xweş bike lê pîraniya xelkê tê nagihê, xelkê jî hevûdu û ji xwendayan dîr dixe. Gava ku Kurdekî ji rêzê, hinek bi xwendin û nivîsandinê dizane, bikaribe bi serbestî, bi zimanê xwe yê rojane, kovar an roma- neke kurdî bixwîne û jê zewq bistîne emê bikaribin bêjin ku kurmancî êdî bi rastî bû, an cardin bû zimanekî nivîskî yê gelêrî. Zimanê ku bi frehî hate nivîsandin û xwendin jî êdî zû bi zû wînda nabe. Amanc û merema xebata me jî her ev e.

KURMANCÎ

ENCAMÊN CIVÎNA PAYÎZÊ

Nivîskar, rojnamevan û zimannasên kurd ên ku ji 7 ta 14ê teşrîna 1987an li barjarê Barselonayê li ser pîrsên rastnivîsîna kurmancî xebitîn, gihane encamên (netîceyên) ku em di rûpelên vê rojnameya taybetî de belav dikin.

RENG

kurdi	tirkî	fransizî	ingilîzî
spî	beyaz	blanc	white
reş	kara	noir	black
sor	kırmızı	rouge	red
zer	sarı	jaune	yellow
kesk, sewz	yeşil	vert	green
şîn	mavi	bleu	blue
qehweyî	kahverengi	marron	brown
qemer	yağiz	basané	swarthy
qemerê vekirî, esmer	esmer	brun	dusky
gewr, spiyê girtî	açık gri, açık	clair, gris clair	light, light grey
qerqas, çil spî	bembeyaz	blanc éclatant	bright white

binevîşî, mor	mor	violet	purple
pembe	pembe	rose	pink
erxewanî	şarabrenge	pourpre	crimson
kej	kumral, sarışın	blond	blond, fair
bor	kızıl	roux	red-haired, redhead
boz	boz	gris-pommelé	dapple-grey
çûr	açık sarı	jaune clair	light yellow
qîçîk	saman sarısı	jaune paille	straw colour
qer	parlak siyah	noir brillant	bright black
şê (qehweyê bi sorayî ve)	al (at için)	alezan	chestnut
genimî	açık esmer	couleur de blé	wheat colour
şîrî	sütbeyaz	opalin, laiteux	opaline
xakî	haki	kaki	khaki

MEYWE

kurdi	tirkî	fransizî	ingilîzî
sêv	elma	pomme	apple
porteqal	portakal	orange	orange
hirmê	armut	poire	pear
hêjîr	incir	figue	fig
hinar	nar	grenade	pomegranate
zebeş, şûtî	karpuz	pastèque	watermelon
xox	seftali	pêche	peach

tirî	üzüm	raisin	grapes
kelek, gundor,	kavun	melon	melon
petêx, qawin, qire			
arûng, zerdele,	kaysî	abricot	apricot
qeyşî, mişmiş			
tûtfrengî	çilek	fraise	strawberry
tû	dut	mûre	blackberry
behîv	badem	amende	almond
gûz	ceviz	noix	walnut
gêlaz, qeresî	kiraz	cerise	cherry
wîşne	wîşne	griotte	morello cherry
biyok, bih	ayva	coing	quince
alûçe	yeşil erik	mirabelle	green plum
încas, hulûreş	kara erik	prune	black plum
limon	limon	citron	lemon
mûz	muz	banane	banana
mandarîn,	mandalîn	mandarine,	mandarin,
klemenîn		clémentine	clémentine
fistîq, piste	fistîk	pistache	pistachio
findîq, bindeq	findîk	noisette	hazelnut
bitim	bitim	lentisque	
kezwan, şinok	menengûç	térébinthe	
gîvîj	akdikên	aubépine	hawthorn
xurme, qesp	hurma	datte	date
hembelaz, xatûnok			
dendûreşk	bögürten	mûre sauvage	bramble
ananas	ananas	ananas	pine apple
şekok, girsik	ahlat	poire sauvage	wild pear
tihok, tawik	dağdağan	baie de sureau	elderberry
belût	palamut	gland	acorn
kestane	kestane	chataîgne	chestnut
tereçî	nektarin	nectarine	nectarin
zeytûn	zeytin	olive	olive

nok	nohut	pois-chiche	chickpea
nîsk	mercimek	lentille	lentil
maş	börülce	féerole, faséol	horse bean
baqil	bakla	fève	broad bean
tevrik, tivir	turp	radis	radish
binerdik	şalgamın bir türü	variété de navet	variety of turnip
şêlim	şalgam	navet	turnip
silk	pancar	betterave	beet
silk sor	kırmızı pancar	betterave rouge	beetroot
silkên şekir	şeker pancarı	betterave sucrière	sugar beet
kundir, kulind	kabak	courge	marrow, pumpkin
dolmik, rextik	kabak	courgette	courgette
bamiye	bamya	gambo, bamias	okra, gumbo
enginar,	enginar	artichaut	artichoke
neynokên bûkê			
xerdel	hardal	moutarde	mustard
meroje, kiling	kuş konmaz	asperge	asparagus
garis	darı	millet	millet
lazût, gilgilê	mısır	maïs	Indian corn,
Stembolê, garisê			corn
Stembolê,			
genimê Şamê,			
genimok			
rêwas, rûbês	ravent, okçul	rhubarbe	rhubarb
îşpanax, silqok,			
siyele	ispanak	épinard	spinach
karî, kuvark,			
kumik, figerojşk,			
karkulîk			
karok	mantar	champignon	mushroom
tûzik	tere	resson	watercress
tolik	ebegümeci	mauve	mallow
rihan	fesleğen	basilic	basil
pûng	yarpuz	menthe sauvage	spearmint
kereng	kenger	chardonnette	cardoon
nane, pûjan	nane	nane	mint
catirî	kekik	marjolaine	marjoram
şirik	yabani sarmısak	ciboule	scallion
şirim		ciboulette	chive

HÊŞÎNAHÎ - S E W Z Î

<i>kurdî</i>	<i>tirkî</i>	<i>fransizî</i>	<i>ingilîzî</i>
pîvaz	soğan	oignon	onion
şir	sarmısak	ail	garlic
pîvazterk	yeşil soğan	oignon	shullop
xiyar, arû	salatalık	concombre	cucumber
bejik	kitir	variété de concombre	variety of cucumber
acûr	acur	conbombre russe	russian cucumber
îsot	biber	poivron	green
kelem	lahana	chou	pepper
gulkelem	karnibahar	chou-fleur	cabbage
kelemê Brukselê	Brüksel lahanası	chou deBruxelles	cauliflower Brussels sprout
sorkelem	kızıl lahana	chou rouge	red cabbage
kartol, patat, qompîr	patates	pommes de terre	potato
sêvaxîn	yerelması	topinambour	helianthe tuberaux
xes	marul	laitue	lettuce
gizêr	havuç	carotte	carrot
pirasa	pirasa	poireau	leek
şiwît	dereotu	fenouil	fennel
bexdenûs	maydanoz	persil	parsley
firingî, şamik,	domates	tomate	tomato
bacanê sor, tomate			
balican, bacan	pathcan	aubergine	aubergine, eggplant
fasûlye, lobî, loby	fasulya	haricot	bean

PEYVEN KURDÎ DI KLASÎKÊN ME DE Mewlûda Kurmancî

Reşo ZÎLAN

Mewlûda Kurmancî ya ku em ê lê piçekî hûr binihêrin û hin peyvên kurdî yên ku tê de derbas dibin, berpêşî we bikin, ya Mela Huseynê Bateyî ye. Ji bilî mewlûdnemeya Bateyî, Mela Ebdilkerîm Mideris û Mih-emedê Reşad El-Miftî ji mewlûdnemeyên nivîsandine. Di nav van herdukan de mewlûdnemeya Bateyî bêtir nêzîkî ya Bateyî ye. Di van salên dawin de, melayek ji melayên Kurdistana bakur, mewlûdnemeya Bateyî li gor zanîna û kurdiya xwe, bê ku kêşa wê ya yazdeh kîteyî tîk bide, kiriyê kurmançiyê nû. Di van hiç

<p>yekê de tam û çêja rastîn ya mewlûdnameya BATEYÎ dîtîn ne mumkun e. Mewlûdnameya Bateyî, bê guman ji hemûyan tşkûztir, edebîtir, giranbihatir û binavûdengtir e. Ev di nav şênîyên Kurdistanê de, yê ku bi zaravayê kurmançî dipeyivin, gelekî belav bûye û nas e. Mîrov bê şik dikare bibêje, ku di nav klasîkên kurdî de ya herî bêtir çap û belav bûye, nas e û tete xwendin, Mewlûda Kurmançî ye. Dêlîndêzên xwendin û dayîna mewlûdan êdî ji roleke olî û ayînî bêtir, roleke civakî dilîzin. Ew gelek caran ji bo bîranîna miriyan, pîrozkirina di tistekî de biserketinê, bi sax û xwe, şî ji xerîbî û eskeriyê vegeerê û herweha ji bo belavkirina xêr û qenciye û hwd. tete xwendin û dayîna.</p> <p>Gelo Mala Huseynê Bateyî kî ye û çî kes e ? Çî berhem û afirandinên wî hene ? Herçendî ev pîrs ne babeta vê nivîsarê be jî, dîsan jî pêwîst e ku em gelekî bi kurtî li ser van pîrsan rabiwestin.</p> <p>Gelek kesên ku li ser BATEYÎ û mewlûdnameya wî nivîsandine; Bilîç Serko, M.Emin Zekî, 'Elaeddîn Sucadî, Herekol Azîzan, Prof. Qanatê Kurdo, Dr. Kemal Fûad, E.B. Soane, Thomas Bois, V.F. Mînosky û gelekên din, bê ku bi belge bipeyîtin, dibêjin navê wî "Mela Ehmedê Bateyî" ye. Lê heçî navê "Ehmed" e, wî hiç li cihêkî û li hîç helbestekê bi kar neaniye welê xûya dike ku çavkaniya vî navî, A. Jaba ye. Herwekî tete zanîn A. Jaba, balyozê Rûsyayê li Erziromê, hemû agehî û enformasyonên xwe yê ku li ser klasîkên kurdî û nivîsevanên wan ji Mela Mehmûdê Beyazîdî wergirtiye. Mixabin gelek ji wan jî şaş in. Wisan diyar e, ku cara pêşîn ev nav bi şaşî bi riya pirtûka A. Jaba belav bûye û yê din jî jê û ji hev wergirtine. Di çapeke Stembolê û her weha di çapa Gîw Mukriyanî ya Mewlûda Kurmançî de navê wî "Hesen" hatiye nivîsîn, ku ev jî ne rast e. Lê navê rastî yê xwedî û nivîsevanê Mewlûda Kurmançî, her wek neviyên wî bi xwe jî dibêjin û di nav mela, feqî û şênîyên Kurdistanê de belav e û di piştî mewlûdnameya wî de jî hatiye nivîsîn, Mela Huseynê Bateyî ye. Ew bi xwe ji eşîra Hertosîyan (Ertrosîyan) e û ji gundê Bateyî ye. Ev gund li herêma Hekariyan e û dikeve nêzikî geliyê Tiyarê û gundê Marûnis.</p> <p>Tete texmîn kirin, ku wî di medreseya Mîr Hesenê Welî de, li gundê Muksê xwendiyê. Ev medrese, medresa mezin û binavûdeng e. Dibêjin carina heya 300 feqeh lê dixwendin û qasî 10 mamosteyan jî tê de ders didan. Wî piştî dawîanîna xwendina xwe ya medresê, bi xwe</p>	<p>ders dane feqihan. Ew bi zanist û nivîsîna helbestan ve mijûl bûye. Herweha çûye hec û helbesta xwe ya "Hilo raba Ebû el-Qasim" li ser gora pêxember gotiye.</p> <p>Heçî zanîna dem û zemanê ku ew tê de jiyaye, yek car dijiwartir e. Gelek kesan, wek A. Jaba, B. Şerko, M.E. Zekî, 'E. Sucadî, H. Azîzan, Prof. Q. Kurdo, T. Bois, V.F. Mînosky û gelekên din gotine ku ew di navbera salên 820-900-ê koçî, ango 1417-1495-ê zayînî de jiyaye. SADIQ Behadin Amêdî, Bateyî hevçaxê Mela Mensûrê Gêrgaşî nîşan dide. Mela Mensûrê Gêrgaşî ji gundê Gêrgaşê ye. Ev gund dikeve başûra rojhelata Amêdiyê. Mela Enwerê Mayî dibêje ku "Ew di sedsala 11-an ya koçî de jiyaye, ango di sedsala 17-an ya zayînî. Lê herwekî mewlûdname ji aliyê olperestî û dîndariyê de afirandineke gelekî girîng e û cihê wê di dêlîndêzên ayînî de bi qedr û rûmet e, ji aliyê kesekî wek Ehmedê Xanî (1650-1707) de nenasbûna wê pîrseke girîng tîne pêşberî me. Heke hebûna wê ji aliyê Xanî ve bihata zanîn, ji wê çelnekirin ne mumkun bû. Xanî, pêxemberê me yê neteweyî, di sertaca edebîyata kurdî Mem û Zînê de navê Bateyî nehaniye. Wî, di van malikan de navê Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrê û Feqiyê Teyran aniyê û rûmeta berhem û afirandinên wan girtiye û gotiye ;</p> <p><i>Mîn dê 'alema kelmê mewzûn 'Alî bikira li banê gerdûn B'navê ruhê Melayê Cizîrî Pê hey bikira 'Eliyê Herîrî Keyfek we bida Feqiyê Teyran Heta bi ebed bimayî heyran Çib'kim ko qewî kesade bazar Nînin ji qumaşî re xerîdar</i></p> <p>Ne xwe, heke Bateyî berî Xanî jiyaba û mewlûdname nivîsîba, divabû Xanî jê çel bikira. Yan na, ji XANÎ re dibû kêmasîyeke mezin. Dîtina ev celeb kêmasî û li milekî din jî aliyê Xanî de nezannîn pûtepênedan û nedîtina mewlûdnamê ne mumkun e. Rastiyeke din jî heye, ku mewlûdname û toreya xwendin û dayîna mewlûdê derengtir ketiye nav civata kurdî. Ji ber vê yekê ye, ku mewlûdnameyên bi zaravayê kurdiya jêrîn û bi zaravayê kurdiya dimilî jî ne xwedî tarixeke hinde dirêj in. Ev yek jî wê baweriyê dide me, ku Mewlûda Kurmançî ne ji sedsala 15-an e. Lê heye ku ew piştî Xanî, yan jî çend sal berî mirina wî, ango ji destpêka sedsala 18-an be...</p> <p>Mewlûda Kurmançî heya niha gelek caran hatiye</p>	<p>çap kirin. Destnivîsara herî kevn ku me dîtîye, ji sala 1270-yê koçî, agno 1853-yê zayînî ye. Ew bi destê kesekî ku navê Wî Ebdulhemîd e, hatiye nivîsîn. Rojhelatnas Albert von Le Coq ew destnivîsar di sala 1901-2-an de li Şamê bi dest xistîye û piştî ew aniyê Ewropayê. Ew destnivîsar niha li kitêbxaneyê "Staatsbibliothek" Marburg/Berlinê ye.</p> <p>Cara pêşîn A. von Le Coq di sala 1903-an de Mewlûda Kurmançî li Berlinê çap dike. Ew ji ber destnivîsara Mela Mihemedê Wanî, ku ji sala 1888-an e, bi awakî fotolîtoğrafîkî hatiye çap kirin. Bi dû re Ehmed Ramîzê Liceyê di sala (1324) 1906-an de li Qahîrê çap kiriye. Mewlûda Kurmançî di sala 1906 û 1919-an de li Stembolê, di 1933-an de bi destê Celadet Bedirxan li Şamê di (1350) 1931-an de li Stembolê, di 1966-an de bi destê Gîw Mukriyanî li Hewlêrê, di 1977 (?) -an de dîsan li Hewlêrê û di 1982-an de ji aliyê S.B. Amêdî de li Bexdayê hatiye çap kirin. Lê ev çap jî ya xwerû û orjinal cihêtir e. Mewlûdnameya Bateyî heya niha gelek caran li Kurdistanê bakur foto-ofset, hatiye çap kirin. Lê bê ku tarîxa li ser bête guhartin û şaşiyên çapê bînin rastkirin. Mewlûda Kurmançî di forma mesnewî de ye, ji 564 malikan û ji 18 beşan pêk hatiye. Malikên wê gişt jî 11 kîteyan pêk tên û kêşa wê li ser 11-an e. Rojhelatnas Wetzstein dibêje, ku "Şêx BATÊ yê Kurdan mewlûda <i>İbn Hecer</i> bi helbestkî kiriye'kurdî". Lê di rastiyê de wî jê îlham wergirtiye, ne ku her yekser ew wergerandiye kurdî.</p> <p>Destpêka Mewlûda Kurmançî weha ye ;</p> <p><i>Hemdê bê hed bo Xudayê 'alemîn Ew Xudayê daye me dîne mubîn</i></p> <p>Dawiya wê jî weha ye :</p> <p><i>Bo cemî'e muslimîn û salihê Bo feqîrê Bateyî el-fatihe</i></p> <p>Di dawîya her beşekê de ev neqarat heye;</p> <p><i>Ger divêtin hûn ji narê bin necat B'îşq û şewqê hûn bibêjin es-selat</i></p> <p>Gelek nivîsevan û lêger dinivîsîn û dibêjin ku ji bilî mewlûdnamê çend tiştên din yê Bateyî hene. Wek diwaneke çîroka Zembîlfrôş, û hwd. Lê heya îro jî çend helbestên Bateyî û pê de çu tiştêk bi dest neketiye. Heçî çîroka Zembîlfrôş e, ew ne ya Bateyî ye. Lê ew ya Miradxwanê Beyazîdî ye.</p>
---	---	--

BEŞ I

Namwer (Namuwer) (f)	Xudannav, xwedînav
Mar û mûr	Mar ji bo heywanên dixuşin (rawir) û mûr jî ji bo bihukan ango rawir û bihuk.
Negotî	Eşkerenekirî, diyarnekiri, ji dev derneketî
Der (f)	Li, di... de, di nav de.
Karsaz (karisaz)	Kesê ku karekî bi rêk dixê û çêdike, çêker, xaliq
Bende	Kolê, bendî, 'ebd
Mihriban (f)	Dilovan, bi şewqet, bi muhabet, rûxoş, xûynerm
Bedîd-Pedîd (f)	Pendî, eşkere, aşikar, berçav
Ba (f)	Bi
Aferîd	Afirand, xulq kir
Ala	Di kurmanciya nûjen de ev peyv wek AL hatiye nivîsîn û bi kar anîn. A rastî ne Al e, lê herwekî di zaravayê jêrîn de têt gotin, ALA ye. Ango; perçem, beyreq
Zeman	Dem, çax, wext
Aferîn	Bijî !

BEŞ II

An (f)	Bîsk, kêlik, xêlek, lehze
Hin (e)	Bîsk, kêlik, xêlek, lehze
Darû (f)	Derman
Dîde (f)	Çav
Bînahî	Hêza dîtinê, dîtin
Destegîr	Alîkar, destgîr, kesê ku bi destan digre
Gunehkar	Kesê ku gunehê kiriyê
Penah (f)	Parêzgeh, star
Pûşt (f)	Pîşt, piştivan
Rahnî	Ronahî, ronakî
Asîman, asûman, asîman (f)	Asman, 'ezman
Rewan, revan	Tiştê ku diçe, diherike; li vir: jîn
Xakî pa (f)	Xweliya pê, axa (toz) pê
Lew	Lewma, loma, ji ber vê/wê
Goşîdar, gûşdar (f)	Guhdar
Karûbar	Kar û xebat
Xweşnewa (f)	Xeş, xweşdeng
Çerx	Daxdar
Daxîdar	Daxdar, birîndar

(f) : Ango bi farisî ye.

BEŞ III

Dergeh	Derî
Koh, Kûh	Çiya, şax, kîr
Fer	Teyîsok, îskok, birqok
Hember	Bergind, bergîdan
Bexşîn	Dayin, lê borîn
Dîger (f)	Yê/ya din
Hilbûn	Vêketin, pêketin (Çira hilbû = çira vêket, Agir hilbû = agir vêket, Agir hilkirin = agir dadan, agir vêxistin)
Hemnişîn	Pêkve rûniştî, hevrûniştî
Çavxirab	Çavneçê, çavpîs
Pur	Maneya rastî ya vê peyvê, herwek di zaravayê jêrîn de tete bi kar anîn, tijî, dagirtî ye. Bi kurdî ne pur lê pir e. Li vir bi maneya gelek de ye.
Şiyan	Karîn, şekirin
Cergebez	Govenda ku jin û mêr bi hev re digrin, reşbelek. Wekî din maneya qelebalix jî dide.
Lêk	Li yek û du, li êk û du, ji hev, jê
Huşyar bûn	Hişyar bûn; li vir: agehdar bûn, haydar bûn.

AL AN ALA ?

Hin Kurdên Tirkiyê di van salên dawîn de ji bo **perçem** (tirkî: *bayrak*, fransîzî: *drapeau*, îngilîzî: *flag*) peyva **al** bi kar ûnin. Ev peyv xwerû kurdî ye û gelekî kevn e, lê rastiya wê **ala** ye, ne **al** e. Melayê Batê di Mewlûda kurmançî de ev gotin wilo bi kar aniyê:

*Ya Reb imanê dixwazin em mudam
Jêrê alaya Muhemed wesselam.*

* * *

KEY Û KEVANÎ

Kurdên ku gotina **kevanî** yê nizanibin kê m in. Piranî ew bi mana jina malê, pîrek, xêzan an xanim bi kar tînin. Lê gelo ev gotin ji ku tê ? Ji peyva **Keybanû** , ango jina **key** (qiral, şah) tê. Mana gotinê qiraliçe, şahbanû, melîke (tirkî: *kraliçe*, fransizî: *reine*, îngilîzî: *queen*) ye. Pêşiyên me **civanmêr** (tirkî: *centlmen*, fransizî: *gentilhomme*, îngilîzî: *gentleman*) bûne, bi gotinê be jî, qedrê jin û xatûnên xwe zani-bûne.

BIJÎ AN AFERÎN

Kîjan rastir e ? Her du jî. Aferîn ji **afirandinê** (xulq kirin, jiyandan) tê û xwerû kurdî ye, di farişî û zimanên îranî de teşeyên nêzîk ên vê gotinê hene. Jê **afirandî** (mexlûq, tirkî: *yaratık*, fransizî: *créature*, îngilîzî: *creature*) çêbûye. Mana aferîn bijî ye.

NAVÊN ÎDARÎ

<i>kurdî</i>	<i>tirkî</i>	<i>fransizî</i>	<i>îngilîzî</i>
Dewlet	devlet	état	state
Hukûmet	hükümet	gouvernement	government
Serekkomar	cumhurbaşkanı	président de la république	president of republic
Serekdewlet	devletbaşkanı	chef d'état	head of state
Sermiyan	başkan	président	president
Serekwezîr	başbakan	premier ministre	prime minister
Komar	cumhuriyet	république	republic
Key, şah, qiral	kral, şah	roi	king
Şahiî, keyîî, qirali	şahlık, krallık	royaume, royauté	kingdom, kingship
Keyperest, şahperest	monarşist	royaliste, monarchiste	monarchist
Paytext	başşehir, başkent	capitale	capital
Wezaret, wezaretxane	bakanlık	ministère	ministry
Wezîr	bakan	ministre	minister, secretary
Wezaretê dadiyê	adalet bakanlığı	ministère de la justice	ministry of justice
Wezaretê karên derve	dışişleri bakanlığı	ministère des affaires étrangères	ministry of foreign affairs
Wezîrê derve	dışişleri bakanı	ministre des affaires étrangères	foreign minister
Wezaretê karên civakî	sosyal işler bakanlığı	ministère des affaires sociales	ministry of social affairs
Civakî, sosyal	toplumsal	social	social
Wezaretê karên çandiniyê	tarım işleri bakanlığı	ministère de l'agriculture	ministry of agriculture
Çandin	tarım	agriculture	agriculture
Cotkar	çiftçi	agriculteur	farmer
Wezaretê bazara kar	çalışma bakanlığı	ministère du travail	ministry of labour
Bazara kar	iş piyasası	marché du travail	labour market
Wezaretê malîyê	maliye bakanlığı	ministère des finances	ministry of finance
Sivîl	sivil	civile	civilian
Mal, xanî	ev, mesken	maison, logement	house, accomodation
Wezaretê hawîrparêziyê	çevre bakanlığı	ministère de l'environnement	ministry of environment
Wezaretê enerjîyê	enerji bakanlığı	ministère de l'énergie	ministry of energy
Hawîr, hawîr	çevre	environnement	environment
Wezaretê bazirganiya derve	dış ticaret bakanlığı	ministère du commerce extérieur	ministry of foreign trade
Bazirganiya derve	dış ticaret	commerce extérieur	foreign trade

Bazirganî	ticaret	commerce	trade
Bazirgan, təcîr	tüccar	commerçant	trader, merchant
Wezaretê aboriyê	ekonomî bakanlığı	ministère de l'économie	ministry of economy
Wezaretê tendurustiyê	sağlık bakanlığı	ministère de la santé	ministry of health
Wezaretê zanistî û teknolojiyê	bilim ve teknoloji bakanlığı	ministère des sciences et de techonologie	ministry of sciences and technology
Wezaretê budcê	bütçe bakanlığı	ministère du budget	ministry of budget
Wezaretê tûrîzmê	turizm bakanlığı	ministère du tourisme	ministry of tourisme
Wezaretê sporê	spor bakanlığı	ministère des sports	ministry of sports
Neteweyên Yekbûyî	Birleşmiş Milletler	Nations-Unies	United-Nations
Parlement	parlamento	parlement	parliament
Wezaretê karên hundir	içişleri bakanlığı	ministère de l'intérieur	ministry of domestic affairs
Wezaretê şer	savaş bakanlığı	ministère de la guerre	ministry of war
Wezaretê çandê	kültür bakanlığı	ministère de la culture	ministry of culture
Çandî	kültürel	culturel	cultural
Xwenda	okumuş	lettré, instruit	educated
Welat	ülke	pays	country
Navçe	bölge	région	area, region
Hêl, alî, rex, la	yer	côté	side
Dever, cîgeh	lokal	endroit, lieu, place	place
Cî, şûn, der	yer	lieu, place	place
Herêman	distrikt	district, secteur	district
Bajar, şehr	şehir	ville, cité	city, town
Tax	mahalle	quartier	quarter
Bajarok	küçük şehir, kasaba	bourg, bourgade	staggling village, small town
Gund, dêh	köy	village	village
Wîlayet	il	département, préfecture	department, province
Belediye, şaredarî	belediye	mairie	city hall, mayoralty
Şaredar, serekbelediye	belediye başkanı	maire	mayor
Bajaravahî	şehirçilik	urbanisme	town planing
Walî	vali	préfêt	prefect, governor

NAVĠÎNÊN NEQLİYÊ

<i>kurdi</i>	<i>tirkî</i>	<i>fransîzî</i>	<i>îngîlîzî</i>
trên	tren	train	train
balafir, firinde	uçak	avion	airplane, aircraft
otomobil	otomobil	automobile	motor car
otobus	otobüs	autobus	bus
minîbus	minibüs	minibus	minibus
kamyon	kamyon	camion	lorry, truck
kamyonet	kamyonet	camionette	van
traktor	traktör	tracteur	tractor
çip	jip	jeep	jeep
pîkap	pikab	estafette	pick-up
bisîklet, duçerxe	bisiklet	bicyclette	bicycle
motorsîklet	motosiklet	motocyclette	bike
sêçerxe		tricycle	tricycle
parxêl	at arabası, kağnî	char à bœufs	oxcart
helikopter	helikopter	hélicoptère	helicopter
taksî	taksi	taxi	taxi
mototren	mototren	train diesel	motor train

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

*Mîn ew nivîstî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan*

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

CIVÎNA BRUKSELÊ

Civîna biharê ya li ser pirsên rastnivîsîn û nûkiri-
na kurmancî di rojên 17 - 23ê nisanê 1988an de li bajarê
Brukselê, paytexta Beljîkayê, çê bû.

Ji nivîskar, rojnamevan, ronakbîr û zimannasên
kurd ên derwayî welêt ên ku hatibûn vê Civînê ev in :
Khosrow ABDOLLAHÎ (Selmas), Moayed AHMED
(Behdînan), Kazim BABA (Dêrsim), Lutfî BAKSÎ
(Batman), Rojen BARNAS (Diyarbekir), Egîd DIJWAR
(Bişêrî), Evdo (nûçegihanê Kurdistan Press), Derwêş
FERHO (Mêrdîn), D. ÎZOLÎ (Dêrsim), Mûsa KAVVAL
(Hekarî), K. NEZAN (Diyarbekir), Hiner SALIM
(Behdînan), Şahîn B. SOREKLÎ (Koban), Yücel YEŞİLGÖZ
(Dêrsim), Memo YETKÎN (Semsûr) û Reşo ZÎLAN.

Ji vê listê dixuye ku di civîna biharê de ji bakur
ta başûr, ji rohelat ta rojavayê navçeyên kurmancîxêvên
Kurdistanê beşdar hebûn. Giraniya bernamêya civînê
vêcarê li ser peyvnasiya (termînolojîya) rojnamevaniyê û
ya anatomiyê bû. Sal bi sal hejmara kovarên kurdî zêde-
tir dibe, hewcedariya bi peyvên kurdî ji bo behskirina
bûyer û qewimandinên rojane ji li wê gorê hingî diçe xwe
xurtir nîşan dide. Di Civîna de li ser hin ji van peyvên bin-
gehîn hate axaftin, hinên din, ku bêtir lê fikirin û xebat
dixwazin, man civîna payizê. Heçî anatomiyê, xebatên
civînê dan xuyakirin ku zimanê me di vî warî de gelekî
dewlemend e ; ji bo hin parçeyên laşê mirov di şûna
navêkî de çend nav hene. Lê herwekî ev nav di xwendeg-
gahan de nayên hîn kirin, hin Kurd, nemaze bajarî, baş
nizanin bi rastî kîjan nav ji bo kîjan parçeyê laş e. Lewra
em van navan li ser wêneyên zanistî yê anatomiya mirov
bi çîh dikin, ta ku xeletî, tevlihevî û şaşbikaranîn kêmtir
bibin. Xebata li ser anatomiyê ewê di civînên ku tên de ji
dom bike.


Wekî her car, di bernamêya Civîna Brukselê de
ji, hin pirsên jiyana rojane hebûn. Îca, beşdar li ser navên
biharatan û ên navgînên derwayî xebitîn. Ew wisa ji vege-
riyan ser hin navên îdarî û siyasî ku di civîna berê de zelal
nebûbûn.

Bernameyên civînan şeş meh berê tên kifş kirin.
Komele, kovar an komikên kurd ên ku dixwazin hin pirs-
sên taybetî pêşniyarî van civînan bikin, divê ku di wextê
de daxwaziyên xwe bi name ji Enstîtuyê re binivîsin.
Stûnên *Kurmancî* ji rexne û pêşniyarên xwendevan re
vekiñ ne.

Amanc û merema me ew e ku bi hevkarîya
Kurdên ku bi zimanê xwe dizanin û jê hiz dikin kurman-
ciya nivîskî têkûz, ahengdar, bi mantiq, zelal û spehîtir
be.


KURMANCÎ

ANATOMIYA MIROV



kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
1- 18 SERÎ	BAŞ	TÊTE	HEAD
1 - Tasa serî, tepika serî, tepa serî, qoq	kafa tası, kafa tası zirvesi	crâne, somet du crâne	crown of the head, top of the head
2- patik	artkafa	occiput	back of the head
3- por	saç	chevelure	hair
4-17 RÛ	YÛZ	FACE	FACE
4-5- enî	alın	front	forehead
4- pêşcênîk, beşik	alın çıkıntısı	bosse frontale	frontal eminence
5- navçav	iki kaş arası, belce	glabelle	superciliary arch
6- cênîk	şakak	tempe	temple
7- çav	göz	œil	eye
8- hinarik	elmacık	pommette	cheekbone
9- dêm, lam, rû	yanak	joue	cheek
10- poz, difin, kepû, lût, bêvil	burun	nez	nose
11- bêrûmet		sillon naso-générien	nasolabial fold
12-		sillon sous-nasal	philtrum
13- dev	ağız	bouche	mouth
14- kujê lêvê	dudakların birleşme yeri	commisure des lèvres	labial commisure
15- çene, erzîng	çene	menton	chin
16- çenegeh	çene çukurcuğu	fossette mentonnière	dimple in the chin
17- çelêfik, çen, alçen	üstçene	mâchoire inférieure	jaw
18- guh	kulak	oreille	ear
19-21- STÛ	BOYUN	COU	NECK
19- qirik	bogaz	gorge	throat
20- çala gerdenê		fossette sous-sternal	hollow of the throat
21- çema stû	ense	nuque	nape of the neck

Anatomiya Serî



30-41 QERQÛDE, SKELET

- kilox
30- textikê eniyê, hestiyê eniyê
31- tasa serî
nîve tasa rastê
nîve tasa çepê
32- hestiyê patikê
33- hestiyê beleguhê
34- kerrika guh

35- hestiyê çena jêrîn
36- hestiyê çena jorîn
37- hestiyê hinarikê
38- hestiyê cênîkê
39- hestiyê kortika çav
40- hestiyê kaniya çav
41- hestiyên poz, dîfîn, kepû, lût, bêvil

ÎSKELET

- kafatasî
alın kemigi
çeber kemigi
sağ yan kafa kemigi
sol yan kafa kemigi
arkakafa kemigi
yankafa kemigi
kulak yolu

altçene kemigi
üst çene kemigi
elmacık kemigi
şakak kemigi
göz çukuru kemigi
göz pınarı kemigi
burun kemikleri

SQUELETTE

- crâne
frontal
pariétal
pariétal droite
pariétal gauche
occiput
temporal
conduit auditif

maxillaire inférieur
maxillaire supérieur
os malaire
sphénoide
ethmoide
unguis, os lacrymal
os nasaux

SKELETON

- skull
frontal bone
parietal bone
right parietal bone
left parietal bone
occipital bone
temporal bone
external auditory canal
lower jaw bone
upper jaw bone
cheekbone
sphenoid bone
ethmoid
lachrymal bone
nasal bones

42-55 SERÎ

- 42- mêtî
43- hîpofiz
44- corpus callosum
45- mêtîkok
46- pîrikâ mêtî
47- pîvazoka mêtî
48- mêtîyê piştê
49- sorsoirik, kirkirok
50- zengilor
51- zîmanê kirkirokê/zengilorê
52- zîman
53- valahiya poz, dîfîn,
bêvil, kepû, lût
54- sînûsa cênîkê
55- sînûsa eniyê

BAŞ

- beyin
hipofiz
nasırlı cisim
beyincik
Varoli köprüsü
soğancık
omurilik
yemek borusu
soluk borusu
gırtlak kapağı
dil
burun boşluğu

şakak sinüsü
alın sinüsü

TÊTE



- cervau
hypophyse
corps calleux
cervelet
pont de Varole
bulbe
moëlle épinière
oesophage
trachée
épiglote
langue
fosse nasale

sinus sphénoide
sinus frontal

HEAD

- cerebrum, great brain
hypophysis
callous corps
little brain
pons cerebri
brain-stem
spinal cord
gullet, oesophagus
trachea, windpipe
epiglottis
tongue
nasal cavity

sphenoidal sinus
frontal sinus



56-65 ORGANÊ BIHÎSTINÊ

GUH

- 56- 58 guhê derva
56- kevçika guh
57- nermika guh, gurçika guh
58- kerrika guh
59-61 guhê navîn
59- perdeya guh
60- valahiya guhê navîn
61- hestîkên bihîstinê,
çakûç, sindan, zengû
62-64- guhê hundirîn
62- labîrent
63- şeytanok
64- rehê bihîstinê
65- boriya Ostakî

KULAK

- dış kulak
dış kulak kepçesi
kulak memesi
kulak yolu
orta kulak
kulak zarı
orta kulak boşluğu
orta kulak kemikleri,
çekîç, örs, üzengi
iç kulak
labîrent
salyangoz
işitme siniri
Ostakî borusu
çimika guh
kevîya guh
serçimika guhsarmal




OREILLE

- oreille externe
pavillon
lobe
conduit auditif
oreille moyenne
tympan
caisse du tympan
osselets de l'oreille,
marteau, enclume, étrier
oreille interne
labyrinthe
limaçon
nerf auditif
trompe d'Eustache
tragus
anthélix
hélix

EAR

- external ear
auricle
ear lobe
external auditory canal
middle ear
tympanic membrane
tympanic cavity
ossicles, hammer,
anvil, stirrup
internal ear
labyrinth
cochlea
auditory nerve
Eustachian tube
tragus
helix

14-37 DEV û GEWRÎ	ağız ve boğaz	la bouche et le pharynx	mouth and throat
14- lêva jorîn	üst dudak	lèvre supérieure	upper lip
15- pidî	diş eti	gencive	gum
16-18 DIRAN an DIDAN	DIŞ	DENT	TEETH
16- diranên pêşîn, diranên beşîk	kesici dişler	incisives	incisors
17- diranên tûj, qîl	köpek dişleri	canines	canine tooth
18- diranen kursî, diranên paşî	azı dişler	molaires	premolars
19- kujêdev	dudakların birleşme yeri	commisurre des lèvres	labial commisure
20- esmanê dev, panîka dev, kama dev	damak	palais	hard palate
21- nermika esmanê dev	yumuşak damak	voile du palais	soft plate velum
22- zimanê biçûk, zimanok	küçük dil	luette	uvula
23- behîvok, aloq, gelale	bademcik	amygdale	tonsil
24- gewrî, hefik	boğaz	pharynx	pharynx
25- ziman	dil	langue	tongue
26- lêva jêrîn	alt dudak	lèvre inférieure	lower lip
27- çena jorîn	üst çene	mâchoire supérieure	upper jaw
28-37 DIRAN	DIŞ	DENT	TEETH
28- kîsikê diran	dişkökü zarı	coiffe de la racine	periodontal membrane
29- hesteyê diran	diş çimentosu	cément	dental cementum
30- sedefa diran	emaye	émail	enamel
31- aca diran	fildişi kısma	ivoire	dentine
32- pûka diran	iç/orta tabaka	pulpe dentaire	dental pulp
33- reh û damarên diran	diş sinir ve damarları	nerfs et vaisseaux sanguins	nerves and blood vessels
34- beşîk	kesici diş	incisive	incisor
35- diranê kursi	azı diş	molaire	molar
36- koka diran	diş kökü	racine	root
37- taca diran	diş tacı	couronne	crown
kepîr	kîreç	tartre	tartar
kepîr girtin	kîreç tutmak	s'entarter	to fur up



38-51 ÇAV	GÖZ	CEIL	EYE
38- biñî	kaş	sourcil	eyebrow
39- palikê çavê jorîn	üst göz kapağı	paupière supérieure	upper eyelid
40- palikê çavê jêrîn	alt göz kapağı	paupière inférieure	lower eyelid
41- bijang	kirpik	cil	eyelash
42- reşîka çav, iris	iris	iris	iris
43- bibîk	göz bebeği	pupille	pupil
44- masûlkeyên çav	göz kasları	muscles	ocular muscles
45- gûza çav	göz yuvarlağı, göz küresi	occulomoteurs	muscles
46- spîka çav	göz akı	globe oculaire	eyeball
47- perdeya çav, gilêne	saydam tabaka	corps vitré	vitrous body
48- nîske	göz merceği	cornée	cornea
49- tora çav, retina	ağ tabaka	crystallin	lens
50- piniya kor	kör nokta	rétine	retina
51- reha bînahiyê	görme siniri	papille	blind spot
		nerf optique	optic nerve

Navê navgînên deryayê

Amadekar: Mûsa KAVAL

<i>kurdi</i>	<i>tirkî</i>	<i>fransîzî</i>	<i>îngilîzî</i>				
navgîn	araç	véhicule, moyen	means,	keştiya rêberiyê	kılavuz gemisi	bateau-pilote	pilot boat
derya	deniz	mer	vehicle	keştiya hawarê	cankurtaran	bateau de	lifeboat
deryayî	denizsel	marin,e	de transport	keştiya agirkujiyê	gemisi	sauvetage	fireboat
deryavan	denizci	marin,	vehicle	keştiya geştê	îfaiye gemisi	bateau-pompe	fireboat
deryavanî	denizcilik	navigateur	sea, adj.	keştiya petrolkêş	egence gemisi	bateau de plaisance	pleasure boat
keştivan	gemici	marin, matelot	seaman,	balafirhilgir	petrol gemisi	pétrolier	tanker
keştivanî	gemicilik	marine	navigator	stal	uçak gemisi	porte-avion	aircraft carrier
bixêrî	baca	cheminée	navigation	keştiya rêwiyar	filo	flotte	fleet
bêrik	kürek	rame	navigation	qeyik	yolu gemisi	paquebot	liner
keştî	gemi	navire, bateau	sailor, seaman	mayinçîn	kayık	barque	small boat
xêlî	yelken	voile	navy	mayingir	mayın döşeme	mouilleur de	minelayer
keştiya bi bêrik	kürekli gemi	navire à rames	navy	mayingir	gemisi	mines	minesweeper
keştiya bayî	yelkenli gemi	bateau à voile	chimney	lezbot	mayın tarama	dragueur de	minesweeper
keştiya dükeli,	buharlı gemi	bateau à vapeur	oar	feribot	gemisi	mines	minesweeper
vapor			ship, boat	lezbob	sûrat motoru,	vedette	launch,
keştiya bi motor	motorlu gemi	bateau à moteur	ship, boat	devriye motoru	devriye motoru	vedette	launch,
keştiya bi enerjîya	nükleer	navire à propul-	ship, boat	feribot	feribot	ferry-boat	patrolboat
nuklêrî	güdümlü gemi	sion nucléaire	sail	qeyika hawarê	cankurtaran	canot de	ferry-boat
cenkeştî	savaş gemisi	navire de guerre	noving boat	kayığı	canot de	sauvetage	lifeboat
keştiya barkêş	yük gemisi	navire de transport	sailing boat	denizaltı	sous-marin		submarine
keştiya nexweşxane	hastahane gemisi	navire-hôpital	steamship	sal	radeau		timber float
keştiya xwendegêh	okul gemisi	bateau-école	steam ship	küçük tekne	canot		small or
keştiya masîgiriye,	balıkçı gemisi	chalutier, bateau	motorboat	lengergeh	iskele	échelle,	open boat
masivaniyê		de pêche	nuclear-			embarcadère	landing stage
			powered ship	lenger	çapa demiri	ancree	anchor
			warship	bender	liman	port	port, harbour
			transport ship	sekûya benderê	rihtim	quai	quay,
			hospital-ship	fanosa deryayî	deniz feneri	phare	embankment
			training ship				light house,
			trawler	lenger avêtin	demirlemek	jeter l'ancree	beacon
							cast anchor,
				lenger hildan	demir almak	lever l'ancree	drop anchor
				keştiya hawarê	cankurtaran	bateau de sauvetage	weigh anchor
							lifeboat

Biharat

Amadekar: Reşo ZÎLAN

<i>kurdi</i>	<i>tirkî</i>	<i>fransîzî</i>	<i>îngilîzî</i>	<i>latînî</i>
biharat	baharat	epices	spices	
rîzyane, cehechik	rezene	fenouil	common fennel	foeniculum vulgare
anix, anîs	anason	anis	anise	pimpinella anisum
zîre, kîmyon	kimyon	cumin	cumin	carum carvi
bibera reş, îsota reş	karabiber	poivre noir	black pepper	piper nigrum
bibera spî, îsota spî	beyaz biber	poivre blanc	white pepper	piper albiun
germok		poivre de la Jamaïque	Jamaican pepper	pimenta officinalis
pûng	yarpuz	menthe sauvage	wild mint	mentha silvaticus
nane	nane	menthe poivrée	peppermint	mentha piperita
biberiye	biberiye	romarin	rosemary	rosmarinis officialinus
zaferan	safran	safran	saffron	crocus stavius
gijmîj	kişniş	coriandre	coriander	coriandrum sativum
xaşxaşk	haşhaş	pavot	poppy	papaver
defne	defne	laurier	laurel	laurus nobilis
hêl	kakule	cardamome	cardamom	elettaria cardamomum
zencefil	zencefil	gingembre	ginger	zingiber officinal

darçîn	tarçîn	cannelle	cinnamon	cinnamomum ceylanicum
mêxik	karanfil	clou de girofle	clove	eugenia caryophyllata
vanîl	vanilya	vanille	vanilla	vanilla planifolia
reşreşk, hefsûdank	çörek otu	carvi, cumin des prés	caraway seeds	nigella sativa
simaq	sımak	sumac	sumac	rhus cotinus
rihan	reyhan, fesleğen	basilic	basil	ocimum basilicum
catir, cehtiñ	mercankök	origan, marjolaine	origan	origanum vulgare
tarxûn	tarhûn	estragon	tarragon	artemisia dracunculus
kuñî	kuri	curry	curry	
riha zer, koka zer	hint safranı	curcuma, safran des Indes	curcuma	
pîjinda, şiwît	dere otu	aneth	aneth	anethum
tovxerdel	hardal	moutarde	mustard	
kuncî	susam	sésame	sesame	
zererek	keten	lin	flax	
îsota Kayenê	Kayen biberi	poivre de Cayenne	Cayenne pepper	
xweya limonê, limondûz	limontozu	acide citrique	citric acid	
bîbera sor	kırmızı biber	paprika	paprika	

Termên siyasî û îdarî

<i>kurî</i>	<i>tirkî</i>	<i>fransîzî</i>	<i>îngilîzî</i>
komar	cumhuriyet	république	republic
komarî	cumhuriyetçi	républicain, e	republican
sîstema komarî	cumhuriyetçi sistem	systeme républicain	republican system
komarxwaz	cumhuriyet taraftarı	républicain, partisan de la république	republican, who is in favor of republic
komarparêz	cumhuriyet savunucusu	défenseur de la république	defender of republic
komarperest	koyu cumhuriyetçi	républicain fanatique	fanatic republican
serbajar	başşehir, başkent	capitale	capital
berbajar	banliyö	banlieu	suburbs, outskirts
bergir	savunucu	défenseur	defender
bergirî	savunma	défense	defence
wezareta bergiriyê	savunma bakanlığı	ministère de la défense	ministry of defence
dadmend	adil	juste, équitable	just, fair
dadmendî	adalet	justice, équité	justice, fairness
wezareta dadmendiye	adalet bakanlığı	ministère de la justice	ministry of justice
guhastin (biguhêze !), l.	ulaştirmek, nakletmek	transporter	to transport, to carry, to move
guhastin, <i>n.m.</i>	ulaştırma, nakliye	transport	transportation
wezareta guhastinê	ulaştırma bakanlığı	ministère des transports	ministry of transportation
hîn bûn, fêr bûn, l.	öğrenmek	apprendre	to learn
hîn kirin, fêr kirin	öğretmek	enseigner, instruire	to teach
hînbûn, fêrbûn, n.m.	öğrenme	apprentissage	learning
hînkirin, fêrkirin, n.m.	öğretim, talim	instruction	teaching, training, instruction
hevotin (bihêvoje !), l.	eğitmek, terbiye etmek	éduquer, apprivoiser	to educate, to tame
hevotin, <i>n.m.</i>	eğitim	éducation	education
hînkirin û hevotin	talim ve terbiye	instruction et éducation	teaching and education
wezareta hevotina neteweyî	millî eğitim bakanlığı	ministère de l'éducation nationale	ministry of national education
nehevijî	terbiyesiz	inéduqué	uneducated
gihandin(bighîne !), l.	yetiştirmek	former	to train
gihandin, <i>n.m.</i>	yetiştirme	formation	training
ragihandin, (ragihîne!), l.	iletişim	communication, transmission	communication, transmission
ragihandin, (ragihîne !), l.	iletme	communiquer, transmettre	to communicate, to transmit
tele-ragihandin <i>n.m.</i>	tele-iletişim	télé-comunication	tele-communication
navginên ragihandinê	iletişim araçları	moyens de communication	means of communication

civat	meclis, toplum	assemblée, société	assembly, society
civatkîan civakî	toplumsal, sosyal	social, e	social
civataşaredariyê	belediye meclisi	conseil municipal	town council
encumen	encümen	commission, comité	committee, commission
encumena şaredariyê	belediye encümeni	comité exécutif municipal	town council executive
tax	mahalle	quartier	quarter
awartin(biawêre!), l.	istisna etmek	excepter	to except
awarte	istisnâî	exceptionnel	exceptional
rewşaawarte	istisnâî durum	état d'exception	state of exception
birandin (bibirîne !), l.	yok etmek	exterminer	to exterminate
birandin, <i>n.m.</i>	yoketme	extermination	extermination
nijadkujî	soykırım	génocide	genocide
qir, qirkirin	katliam	massacre	massacre, slaughter
hinare	mesaj	message	message
hinartî, şandî, peyk	elçi	envoyé, messenger	messenger
darayî,maliye	maliye	finance	finance
wezareta darayiyê, maliyê	maliye bakanlığı	ministère des finances	ministry of finance
endustrî	endüstri	industrie	industry
wezareta endustriyê	endüstri bakanlığı	ministère de l'industrie	ministry of industry
balyoz, sefir	büyük elçi	ambassadeur	ambassador
balyozxane	elçilik	ambassade	embassy
konsul	konsolos	consul	consul
konsulxane	konsolosluk	consulat	consulate
ataşe	ataşe	attaché	attaché
pispor	uzman, bilirkişi	expert	expert
desthilat	otorite	autorité	authority
karîn, şıyan	iktidar, kudret	pouvoir	power
dengdan	oylama	vote	vote
hilbijartin	seçim	élection	election
hilbijêr	seçmen	électeur	elector, voter
hilbijartî	seçilmiş	élu	elected
bijare	seçkin	distingué	distinguished
namzed	aday	candidat	candidate, applicant
bernamzed	aday adayı	candidat à la candidature	candidate for candidacy
statu	statü	statut	status
referandum	referandum	référendum	referendum

Rastnivîsîna lêkera **BÛNÊ**

Ez	im	me
Tu	(y) î	yî
Ew	e	ye
Em	in	ne
Hun	in	ne
Ew	in	ne

Mînak:

Ez	kurd	im
Tu	kurd	î
Ew	kurd	e
Em	kurd	in
Hun	kurd	in
Ew	kurd	in

Lê	Ez	gundî	me
	Tu	gundî	yî
	Ew	gundî	ye
	Em	gundî	ne
	Hun	gundî	ne
	Ew	gundî	ne

Lêkera **bûnê** mana rewş guhartinê (fransizî : *devenir*, îngilîzî, *to become*) jî dibe û hingê wekî jêrîn tê bi kar anîn :

Ez	dibim
Tu	dibî
Ew	dibe
Em	dibin
Hun	dibin
Ew	dibin

TERMÊN ROJNAMEVANIYÊ

<i>kurdi</i>	<i>tirkî</i>	<i>fransîzî</i>	<i>ingilîzî</i>
rojname	gazete	journal	newspaper
rojnamevan	gazeteci	journaliste	journalist
rojnamevanî	gazetecilik	journalisme	journalism
kovar	dergi	revue	journal, review
kovara hefteyî	haftalık dergi	revue hebdo- madaire,	weekly hebdomadaire
kovara mehane, mehname	aylık dergi	revue mensuelle, mensuel	monthly
kovara sênehî	üç aylık dergi	revue trimestrielle	quarterly
kovara salane, salname	yıllık dergi	revue annuelle	annual journal
kovara nîvmehî	15 günlük gazete	revue bimensuelle, bimensuel	bimonthly, fortnightly
redaktor	redaktör	rédauteur	redactor
nûçegihan	muhabir	correspondant	correspondent
nivîs	yazı	écrit	writing, written work
nivîsar	yazı, metin	écrit, texte	text
bend	makale	article	article, paper
nivîser	okur-yazar	alphabète, qui sait lire et écrire	literate
nivîskar, nivîsevan	yazar	écrivain	writer
nivîsandin	yazı, yazmak	écriture, écrire	writing, to write
nûçe	haber	nouvelle	news
berpirsiyar	sorumlu	responsable	responsible
berpirsiyarî	sorumluluk	responsabilité	responsibility
nivîskî	yazılı	écrit, par écrit	written, in writing
nivîsyar	katip	scribe, secrétaire	secretary, scribe
nivîsgeh	yazı odası	bureau	office
nivîsxane	yazı kalemi	secrétariat, bureau des dactylos	typing pool, writing section
destnivîs	elyazması	manuscrit	manuscript
destxet	elyazısı	écriture	handwriting
rastnivîsîn	imla kuralları	orthographe	orthography
semivîs	başlık	titre	title
semivîsar	başyazı, başmakale	éditorial	editorial, leading article
semivîskar	başyazar	éditorialiste	editorial writer
roportaj	röportaj	reportage	report
karikator	karikatür	caricature	cartoon

karikatorîst	karikatürîst	caricaturiste	cartooniste
foto	fotograf	photo, photograph	photo, photographie
fotokêş	fotoğrafçı	photographe	photographe
wêne	her türlü resim	image, peinture	image, painting
çîn, neqş	resim	dessin	drawing
neqşkêş	desinatör	dessinateur	drawer
sernûçe, manşet	manşet	manchette	headline
kiriyar, abone	abone	abonné	subscriber
kiriyarî, aboneyî	abonman	abonnement	subscription
çapemenî	basın	presse	press
çap	basım, baskı	impression	printing
weşan	yayın	publication	publishing
çapxane	matbaa	imprimerie	printing house
weşanxane	yayınevi	maison d'édition	publishing house
pirtûk	kitap	livre	book
namilke	broşür	brochure, opuscule	brochure, booklet
bulten	bülten	bulletin	bulletin
belavok	bildiri	tract	tract
rêze	dizi	série	series
rêze-film	dizi film	feuilleton, films à épisodes	serial
wêneçirok	çizgi roman	bande dessinée	strip cartoon
fotoroman	fotoroman	roman-photo	romantic picture story
çirok	hikaye, masal	histoire, conte	story, tale
çîn, neqş	işleme, desen	dessin, motif	motif, pattern
çînîn	işlemek, nakşetmek	graver, dessiner	to engrave, to imprint, to draw
veçînîn, hevrês kirin	dokuma sök- üğünü örmek, örerek, yapmak	reprendre	to darn, to mend, to stitch up
hilçînîn	sarmak, masura sarmak	embobiner, enrouler	to wind up, to roll up

GIYAYÊN DERMANAN

Va ne navên çend giyayên ku di hekimiya
kurmancî de bi kar ûnin. Gelo hun mana
wan bi tu zimanên din dizanin ?
Heke bi eseyî dizanibin kerem kin
ji *Kurmancî* re binvîsin.

- Meyremxurt
- Tirşok
- Qahfûr
- Pelewêsk
- Gûlik
- Karî
- Gûriz
- Nûsek
- Doçbizin
- Hîro

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

*Min ew nivîstî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan*

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Termên rojname û rojnamevaniyê

kurdî	tirkî	fransızî	ingilîzî
helbest, şîr	şîr	poème	poem
kuncnivîsar, quncnivîsar*1	köşe yazısı	billet, rubrique	column
kuncnivîs, quncnivîs	köşe yazarı	billetiste	columnist
rêzenivîsar	serî yazı, dizi yazı	feuilleton	series
stûn	sütun	colonne	column
rêz	satır	ligne	line
tîprêzî	dizgi	typographie	typography
tîprêz	dizgici, tipograf	typographe	typographer
çap	baskı, basım	impression	printing
çap kirin	basmak	imprimer	to print
çapxane	basımevi	imprimerie	printing house
xwendevan	okuyucu	lecteur	reader
belavkirin	dağıtım	distribution	circulation
belavker	dağıtımçı	distributeur	distributor
weşanxane	yayınevi	maison d'édition	publishing house
weşandin	yayınlamak	éditer, publier	to publish
prîtûkfiroş	kitabçı	libraire	bookseller
pirtûkfiroşî	kitabçılık,	librairie,	bookshop,
	kitapçı dükkanı	métier de libraire	booksellership
heyber, mijar, babet	konu, mevzu	sujet, matière	subject
têm	tem, tema	thème	theme
naverok	içerik, muhteva	contenu	content
fihrîst*2	indeks, fihrîst	index	index
berg	kapak	couverture	cover
kiras	şömiz, karton	chemise	jacket
	kaplama gömleği		
nîmînende, nivêner*3	temsilci	représentant	representative
nîmandin,	temsil etmek*4	montrer,	to show,
nîwênandin		représenter	to represent
nîmûne	ömek, misal	exemple, échantillon	example, sample
arîkar, alîkar	yardımcı, muavin	assistant	aid, assistant
rûpel raxistin	sayfa	mettre en page	to make up,
	düzenlemek		to lay-out
rûpelraxer	sayfa düzenleyici	metteur en page	page maker,
			compositor
rûpelraxeî	sayfa	métier de	compositorships
	düzenleyicilik	metteur en page	

*1. kuncnivîsar, quncnivîsar: ji ber ku li hin deverên Kurdistanê **kunc** (kuncik) û li hin deverên dinê **qunc** tê bi kar anîn û Kurmancên ku **kunc** bi kar tînin ji **qunc** tê nagihîjin, herwekî yên **qunc** bi kar tînin ji ya dinê fêm nakin, me di pêşneyara herduvan de ji fayde dî.

*2. fihrîst, pêrist: **fihrîst** gotineke farisî ya kevin e. Ev gotin di hin ferhengên bi kurdî yên kevin de **fihrîst** û di hinan de ji **pêrist** derbas dibe ku di nav Kurdên rojbela (îran) û yên başûr (îraq) de ya dawî bêir belabûyî ye.

*3. nîmînende, nivêner: **nîmînende** di nav metnên kurmancî de û di **Hawarê** de gelek hatîye bi kar anîn. **Nivêner** di nav kurmancîya xwarê (sorani-mukriyani) de tê bi kar anîn ku ev **nivêner** bi awakî guharî û wela **nûner** derbasî kurmancîya jorê biye û bi vî awayî ji aliyê hin kesan ve tê bi kar anîn.

*4. Kurmancên ku **nîmandin** bi kar tînin, piranî ji bo **nîşan dan, şarî dan, raberkirin** û hwd dibêjin. Lê me ew li vir di maneya di derceya didî an de bi kar anîye.

Civîna Berlîne

Civîna payîza 1988an li Berlîne di roja 27 teşrîn 1988an de bi vekirina serekê Enstîtuya kurdî ya Parîsê, Kendal Nezan, dest pê kir. Serekê Enstîtuyê ji bo hevalên nûhatî yên ve civîne, behsa bingeh û awayên civîne kir û mazeretên hevalên vexwendî yên ku ji ber hin sedeman nikarin beşdarî ve civîne bibin, pêşkêşî zanîna hevalên amadebûyî kir.

Di civîne de Khosrow Abdollahî (Selmas), Muzefer Begzade (Şikakan), Mustafa Düzgün (Dersim), Xelîl Dihokî (Dihok), Huseyin Sado (Hesîçe), Reşo Zilan, Mûsa Kaval (Hekarî), Rojen Barnas (Diyarbakir), S.Rêwing (Sêrt) û Derwêş Ferho (Mêrdîn) beşdar bûn.

Serektiya civîne, her weke berê, bi awayê ku bi dorê rojê yek bike, ji Reşo Zilan dest pê kir.

Civîn, li gora bernameya xwe, li ser pirsên jêrîn xebitî: termên rojname û rojnamevaniyê, navên cihan, sistema îdarî ya Îranê, kurmancîya Dîwana Melayê Cizîrî û ya Gigerxwîn û hin xalên gramerê (lêkerên hevedudanî).

Ewê civîna bihara 1989 giraniya xwe bide pîrsa termînolojiya hiqûqî. Ji bo amadekirina van peyvên hiqûqî komek ji hiqûqnasên kurd hatîye pêk anîn û ewê di mehên pêşîya me de li ser ve pîrsê bixebite.

KURMANCÎ

FERHENGOKA Dîwana Melayê Cizîrî

Amadekar : Rojen BARNAS

Ev ferhengoka piçûk a ji Dîwana Melayê Cizîrî, perçekî ji rêzxebata berhevkirina gotinên kurdî ji klasîkên kurmancîya jorîn e.

Çerçewa ve xebatê berhevkirin û hîlbijartina gotinên kurdî yên di nav nivîsarên klasîkan de mayî ne. Ev gotin ji aliyê hin kesan ve bêne zanîn ji mixabin ji aliyê piraniyê ve nayên zanîn; ew li hin herêman bêne bikaranîn ji li herêman mayî yên welat hatine jîbîr-vekirinê. Yaxut hin ji van gotinan di nav axleb Kurdên Tirkîyê de wek gotinên tirkî tene zanîn.

Di berferehkirina zimanekî de rîya belkî dijwar, lê ya esasî, berhevkirina gotinên eslî yên wî zimanî: 1) ji afirandinên wî yên klasîk; 2) ji folklorê devkî û 3) li sahayê ji devê xelqê ye. Di pey de, ji bo hewcedariyên nû yên ziman, gehîneka "gotin çekirînê" tê; ku gava meriv bi endaze û bi baldariyê hûr û xurt hereket neke, dêlva kêr gihandinê wê ziyaneke giran bigihîne ziman, di ziman de bibe sedemê anarşîyê mezin. Lewra beşa zimannasî ya Enstîtuyê

<p>di civîna xwe ya pêşîn a Barselonayê de vê rêzexebebatê wek xebateke bingehîn û berdewam pejirand û da ber xwe.</p> <p>Ev ferhengoka berpêşî we kirî xelesa diduyan a vê rêzexebebatê ye ku herwekî hun pê dizanin xelesa pêşîn ferhengoka Mewlûda Melayê Bateyî bû û ji aliyê mamosta Reşo Zilan ve hatibû amade kirin. Xebata li ser Şêx Ehmedê Xanî, Cegerxwîn û klasikên me yê dinê di çerçewa bernameya xebatê di dorê de ne.</p> <p>Di berhevkirin û hîlbijartina gotinên vê ferhengokê de min ji nusxeyên Dîwana Melayê Cizîrî , çapa ji aliyê mamosta Hejar ve amadekirî, esas girt. Lê wê bi çapa Misrê, bi ya Stokholmê (Zeynelabidin Zinar û M.Emin Narozî pêk anîne) û bi hin xezelên dîsa bi alfaba kurdî-latînî ji wergerandina Qedî Cemîl Paşa di Hawarê de muqayese kir.</p> <p>Di xebata li ser maneyên gotinan berhe- ma bingehîn çapa mamosta Hejar e. Di pey de xebata mustereke e ku ji aliyê beşdarên civîna Bruksel û Berlîlê kêmasî hatine rast kirin. Ji aliyê</p>	<p>tesbîtîkirina hatina orijîna gotinan ji çavkaniyên jêrîn hatiye istifade kirin:</p> <ol style="list-style-type: none"> 1) Ansiklopedîk Lûgat Ferit Develioğlu 2) Okyanus Ansiklopedik Sözlük, Pars Tuglaci 3) Persian-English Dictionary, Steingass 4) Ferhengên kurdî û erebî/fransîzî/rusî <p>Di <i>Dîwana Cizîrî</i> de ji bilî kurdî, gotinên ku bi selê xwe çînî, erebî, farsî, tirkî, yûnanî û hwd gelek in. Ji ber vî çendî di hîlbijartin û tesbîta gotinên kurdî de civîn îhtimameke gelek mezin nişan daye şaşiyek piçûk çî ye, neyê kirin.</p> <p>Di sêwirandina wê ferhengokê de min li gora pîvanên jêrîn gotinan hîlbijart : a) Gotinên ku îro ji aliyê piraniyê ve nayên nasîn; b) Gotinên ji aliyê rastnivîşîn (imla) an bilêvkirinê (telafuz) de têvel in; c) Gotinên ku ji roja Cizîrî heta niha neguhirîne wekî xwe mane.</p> <p>Li hember maneya her gotinê, ji bo numûne dayinê, me malîkek ji <i>Dîwanê</i> daniye da ku xwendevan bizanibe ev gotin li ku derê û bi çî awayî derbas dibe. Hin gotin hene ku li hem-</p>	<p>ber û di pey maneyê de <i>bnr.</i> dinivîsîne ku maneya wê «binêre» li gotina di pey de bi tîpên reştîrîn nivîsandî. Herwekî : «dav: dafik; <i>bnr.</i> li bend. Ku dixwazin ka gotina «dav» di kîjan malîkê de derbas dibe, divê li gotina «bend» binêrin. Li ber wê gotinê malîkek ji zezeleke Cizîrî heye ku gotina «bend» tê de hatiye bikaranîn.</p> <p>Ev xebata pêşkêşkirî bi gotina rastî ne ferhengok e, lê ferhengoka ferhengokê ye. Ji bo ferhengokeke temamî divê hemû gotinên bikaranînî tê de hebin. Ji bo biservebûna edebiyata klasîkî ev pêwîst e, lê îro ne helîz e. Ji ferhengokeke kurdî ya <i>Dîwana</i> wî dîsa divê hemî gotinên kurdî yê ku wî bi kar anîne tê de hebin, lê ev jî xebateke ferehtir divê ku niha li dervayê mebesta çerçewa xebata me dimîne. Di çerçewa van herdiwan de ev ferhengoka pêşkêşkirî, ku gotin caîz be, têtîka ferhengokê ye. Lê hemî gotinên pêwîst tê de hene, ji derva nemane.</p> <p>Hêvîdar im ku bi kêrî têtîkîpêbiran were</p> <p style="text-align: right;">Rojen BARNAS</p>
--	---	---

<p>A</p> <p>afêrin: bijî “Rustem û Cemşîd û Xalid, Hemze ya şêrê Eli Afêrin ya şehsiwarê turk û rimbazê ereb”</p> <p>al'al: helale, lale “Sunbul bi sema têt û gulana perde dirandin Bişkiftine al'al û hişîn bûne terazin”</p> <p>amanc: armanc “Bendeyê sadiq seher amancî reştozê xwe kir Min bi qewlê dijîman det ber xedengan bê sebeb”</p> <p>awaz: deng, sewt “Ney dût e hebîbê me çî feryad û fixan kin Wê guh li zemîra dil e awaz çî hacet?”</p> <p>ax: erd, xweli “Ji axa asîtanê mistekî bîn Li daxan da bibînim xweş seba tîz”</p> <p>azar: êş, eziyet, sancî “Alî ji derdê dil dikit herçî ku dî azarî çerx Derbê li nîva dil didit lami’ sîfet nûbarî çerx”</p> <p>B</p> <p>bac: wêrgî “Cuhtê Hebeşan bi turfet-ul- ‘eyn Anî qederek ji Espehan bac”</p> <p>bal: nik, cem “Li bal ‘ilmê te me’lûm e ji jînê min tu meqsûd î Fidayê canê me dê can bit di qesda wesl û dîne da”</p>	<p>balîn: baliv, balgeh “Da nale û ahên me ji dil seh bikirî Wer guh bide hindavî serê balînê”</p> <p>ba Xoy: bi Xwedê “Bendeyê ba Xoy bivê dê meylî sîm û zer nekit Da ‘etaya padîşahan bê hed û ejmar bit”</p> <p>bazîn: leyistîn, baz dan, revîn “Çerx e felek û melek dibazîn Şemsun we kewakibun we ebrac” “Li ber çogan û kaşûyan ji derba Turk û Hîndûyan Dibazim herwekî goyan dema ew têne meydane”</p> <p>behîtin: helandin “Cewra te behîtin û cefaya te perîtin Qurbanî te bim guh bide carek gilehê min”</p> <p>bejn-afêrî: bejna ku bi naz dimeşe “Da xef nebit bejn-afêrî mey hate şehkasa surî Mînet ku îro dîm-durî dîsa şeraba nab da”</p> <p>belazîz: gezîze, sunbula daristanê, ya kûvî “Ku lê têt ew qebaya asimanî Letîfa şeng û nazik wek belazîz”</p> <p>belg: pel; <i>bnr.</i> li perr</p> <p>benda heyderî: xişrê li ser kofiyê “Kewkeb û qewsê qezeh lu’luê benda heyderî Tên tewafa zulf û xalên dilrubayê rast û çep”</p> <p>bend: girtî, dîl, girêdayî “Dil bendê dava zulfekê keftî kemenda ulfekê Hel fi yed-îl meftûnî şey ew key fe esne’ ya feta”</p> <p>ber ve: ber bi</p>	<p>“Ber ve şerqê di seher westayin Hîndûyên rojperest in çep û rast”</p> <p>ber: kevîr, seng “Çî eser dê li berî xare bikit qetreyî ab Qelemê me bi dosê qetreyê zuha dê çî kit”</p> <p>berî: sade û hêsa “Girîşme û raza berî ‘arif venabin lê derî Hetta di nêva agirî ew xef nebit perwane reqş”</p> <p>berx: birca karîkê, birca berxê “Heyheya reqş û semaya te çî xweş bes-tiye çerx Ku di burcê bi sema têtê li ser destê xwe berx”</p> <p>bestûn: girêdan, rapêçan; <i>bnr.</i> li berx</p> <p>bexşîn: ‘efûkirin, dayin “Yek bûse bexşî ewwel bi îhsan Axir li min kir curm û xeramet”</p> <p>bext: îqbal, talih “Zuhre û ‘îqda sureyya keşşîfî bûn ew di şerq Sayeya bextê me dayê ma li ser perde û nîqab”</p> <p>beyhûde: bêhûde “Kes bi dada me nepirsit gileh û dad çî kit Te nebit dadresek beyhûde feryad çî kit”</p> <p>bêgav: tim, bêwext “Aşîqan bêgav lew kalîn ji dil têt şubhê re’ d Wan ji bala lê dibarin wek brûskan remz û naz”</p> <p>bêt û ret: were û here “Her mecala ew di cengê bêt û ret her carekê Rast û çep de bêxistin, sed bi mizraq û qeseb”</p> <p>bêvîr: nexweşê li ber mirinê, ji hêz keftî</p>
--	--	--

“Herçî bêvîrê ku navê dilberê bêtin li ser Xweş dibit hadir di gavê bê guman û şubhe ye”

biçîn ver: li berê biçîne (deyne)
“Enqa ne şikara kes e davan tu biçîn ver Dava ku enqa tu vedî badî hewa girt”

binosîn: em vexwin
“Heyata dil meya baqî binosîn da bi muştaqî
Ela ya ey-yuhes-saqî edir kes'en we nawil ha”

biretin: herin, biçin; *bnr.* li bêt û ret

biste: bê tirs, bê şerm, bê teklîf
“Were xanim bikuj biste bi xencer
Melê, emma bi destê xwe-y mubarek”

bişko: bişkok
“Çing-çinga bişkoan awaz û dengê zer-goan
Sed melayik guh didin ber wê newayê rast û çep”

bişkoj: xonçegul, xonçe
“Sehergeh endelîb mest in ji bihna werd û bişkojan
Şubeh tûtak û goyînan dinalîn em di firqê da”

biwar: bihart
“Weh ku bê şahid û mehbûb te umrê xwe biwar
Karekî rabe bike weqt e ku êvar e dereng”

biwerîn: werîne, bîne
“Veke lêvê û ji nivê biwerîn qend û nebat
“Ji lebê le'lê şekerbêj û ji şeker meke behs”

bînahî: ronahiya çav, qudreta dîtinê
“Şukur bînahîya min hat û Ye'qûb dîde rewşen bû
Bi bûya Yûsîfê Misrî li Ken'anê beser peyda”

bîz: kerahet, xweparêzî, xwe jê girtin
“Xebais-teb' e, j'ehil seg-sirişt e
Yeçîn ew ker ji canan lew dîkit bîz”

bîzî kirin: hez nekirin, xwe jê girtin
“Bîzî dîkit ji qencan ji remz û naz û xencan Qedre gulan çî zanit ? Kerbeş divêt kerê reş”

buxçe: baxçê gulan
“Me ji buxçe ya yar zeyyînî bê pîrs yek sêvek çînî
Web'ma ceney tû centeyî elqet'eley ye cînyeta”

butperestî: pûtperestî
“Etwarê 'îşq û mestî, esrarê butperestî
Teqîrê sed rîwaret nakit ji bo kifayet”

C

cerg: ceger
“Mehbûb û reyhan pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahlil bû di nav lew saqî ew cul-lab da”

cuht: cot, *bnr.* li bac

Ç

çelek: xwarbûna wekî serê çoganê
“Êsir kirim zulfa çelek ew horiya şubhet melek
Tîr dan ji reştözên helek mecrûhê qewsê purweşîn”

çember: xekek, daîre, muhasere
“Xef da me cama kewserê şîrîn-qed û leb şekkerê
Bayê seba da çemberê hatin sema şetrî û lef”

çendan: ewçend
“Zehrî derdê mezin firqet ciger sot ateşî da dil
Cîhê sebrê nema çendan ferec min dî di sebrê da”

çengal: çengel
“Sur şîrînê, nazenînê, kuştîme nakit yeçî-nê
Wê bi çengala evînê dil ji min bir dil ji min”

çeper: mewzî, sîper
“Tîr sed têne ciger sîne li ber maye çeper
Ji dil û cergê kul û sîneyê ker-ker meke behs”

çerx: daîre, xekek, felek
“Hin zerî ne pur sur in, serbiperr in dêm-dur in
Min ku di çerxê we dî sebr û qerar im nema”

çevandin: tewandina wek çemberê
“Ez dibêjim dê li min dîsa ceger sed pare kin
Wê bi mîzan herdû şîrazî çevandin mahî new”

çîn: xekek, badok, kurîşk
“Çîn çîn kirin zulfên siya kesk etlesê dîba qeba
Îdî nişan nabin xuya têkel kirin lazim seba”

çogan: golf; *bnr.* li bazîn
çokar: xizmetkar
“Her serê dewlet hebit dê her di nêv benda te bit
Herkesê 'aqil bitin dê her di çokarê te bî”

D

dabiristin: rêz bi rêz bûn, sef girêdan
“Zengiyar cewşen vebestî pêşberî coqa Hebeş
Dabiristin yek bi yek çûn ber fiwayê rast û çep”

dad: hawar, edalet, medet; *bnr.* li beyhûde

dane: tene, tane
“Canê xwe meke daneyê dava ku vedayî
Ahû-sîfet ew pê hesya rahî xeta girt”

dav: dafik; *bnr.* li bend

der dest: di dest de
“Ji du'ayê qedehek der dest e

Her seher mestî me'yî-nabî du'a”

derbend: bender, liman
“Xasî teşîra te bin derya û derbendê ecem
Da xelatên her seher sed zerkeş û mex-mûr bê”

destgîr: hamî, alîkar
“Destgîrê te nebit Xidrî 'înayet li qedîm Nagehî abî heyatê bi du esker Elyas”

destûr: îzin, îcaze
“Ji ser dîmê nîqab avêt û destûra tewafê da
Bi se'yê beyt û îhramê û min eswed ziyaret kir”

derîn: dayin
“Qehweya telx digel zehrî helahlil biderî
Me ji destê te mîbarek şeker-amîz e xweşab”

di gavê de: di cih de, tafîlê
“Xedenga firqetê re'd e dilê ew xefletê lê dit
Dibêjim wer cebel bit ew bi ker bit wê di gavê da”

digel: pê re, *bnr.* li derîn
dihnêrim: ji hinartinê; dişînim
“Her seher dihnêrim ez cana bi ahan ra ji dil
Barek-el Bari bi 'îs'adîn 'eleyha yewma 'îd”

dijwar: zor, zehmet
“Sar dibit dil ma bi sed cewr û cefayan zerreyek
'îşq teb'et-nar e hingî dê biçît dijwar bit”

dilgeşte: dilmayî
“Dilgeşte me ji dêrê naçim kinîştêyê qet Mihrabê wê bi min ra wer da biçîne Lales”

dîdar: yê dîtî, rû, dîtin
“Kuştîyên dîdar û dîne bê xeta her deh-sed in
Her seher dîsa ji nû va têne kêrê sed celeb”

dîl: esîr
“Dil me hezar in te di bendê we lê Leyse lena 'enke mecalu bedîl”

dîm: dêm, *bnr.* li bejn-afêrî

dîn: temaşe, dîtin, *bnr.* li bal

dojeh: cehenem
“Ger ji wê hoî siriştê 'îşweyek îzhar bit
Dê bibit narî Xelîl-ul-lah û DOJEH sar bit”

dos: dewş; *bnr.* li ber

E

eger: heke
“Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatê Bibêjit secde bin latê murîdên wî dibin qatî”

Ehremen: xwedayê tarî û xerabiyê yê zerduştîyê
“Ehremen te'limê dabû Ebyedî dest tê hebû
Pur bi vê te'lim û rayê hatibû çûbû xîtab”

ejmar: hejmar
 “Lê şehîdên te bi ejmar bi xencer kuştî
 Hê neçû xûn ji birînan sed û heftad û
 du leş”

endaze: qiyas, pîvan, usûl
 “Remzên te di canan ne bi endaze di raz
 in
 Heryek bi hezar reng rewanê me dixwa-
 zin”

er: eger
 “Ji Hafiz qutbe Şîrazî Mela fehmi er bikî
 razî
 Bi awazê ney û sazê bibin ber çerxê
 perwazî”

Erjenk: piştûka wêne ya Manî pêxemberê îranî
 “Bi sîmavê bi zêravê tu rojê neqşekî
 bavê
 Ku da Erjenk ji wê navê li ber rojê nebit
 perde”

erzen: erzêng, çene
 “Katibê neqşê qudretê zêrî reşandî ser
 xetê
 Erzen û dîm û cubhete pê neqqişand û
 kir nuqet”

eşkere: aşkera, aşîkar
 “Belko dîwar bi guh bin bi Xwedê kî bi
 Xwedê
 Bi tu rengî nekirî eşkere esrafi hudûs”

ev reng: bi vî awayî
 “Hat der ji burc û penceran dil girt û da
 ber xenceran
 Ev reng e halê dilberan lew ‘aşîqan xûn
 bûn ceğer”

evistin: evîn
 “Agir di ab û gil diket qelban ji qelban
 hil diket
 Metqeb di can û dil diket daîm evistin
 karî çerx”

F

find: mûm
 “Fîraqa dilbera rind e behîtim ez wekî
 find e
 Musilmanik di rê min de xeber bit balî
 sultanê”

fira: yê pîr an zû difire
 “Me û nesîm xweş pence têkra wê diçin
 wek teyr vêkra
 Behsê zulfâ yar pêkra bûnî ‘îşqê pur fira
 ye”

firişte: melek
 “Hûr û firişte kê weh dîn nazik û xob û
 sur şîrîn
 Dîmê nimûne ber bikin sûretê çîn numa
 xelet”

fûr bûn: fûrîn, kelîn, bilçîn
 “Her derê ne lê feres şubhet boraqê
 vêkevî
 Çeşmeyê heywan ji ew erdê mubarek
 fûr bî”

G

gaz: kelbetan
 “Serwî-nazê serfirazê şubhê zêr remz
 mecazê
 Dame ber çakûç û gazê dil ji min bir dil
 ji min”

gazinde: gazin, gazinc
 “Şakîsilahî her dem bi kuştina Melê bit
 Gazindeyan ji kê kim, ji kê bikim
 şikayet”

gerçî: herçend
 “Şerhê halê min Mela narit beyadê hê
 tamam
 Vê sewadê gerçî her dem jê birin sed
 întîxab”

gerd: xwefî, toz
 “Suhtim ez pêta evînê têk biwam gerd û
 heba
 Inne lî ayatî sidqîn kane fi haz-en-neba”

gerden: cihê sîng û stû digihîjin hev
 “Wê şepalê misk-xalê dîmdurê gerden-
 şemalê
 Cebheta biskan sema lê dil ji min bir dil
 ji min”

gestin: gez kirin
 “Gestîme xelq û ‘eqrebê mest im ji
 şewqa xebxebê
 Tali’ tinê me d’kewkebê îro ‘eqarîb tene
 der”

geşt: gerr, seyran
 “Buxçeya sorgul di geş tê çiçek û reyha-
 nê reş tê
 Dilrubayan tene geştê sunbûlan ta ta
 sema ye”

gêra: guhart, guhirî
 “Feyza ‘ulûmê hikmet cama sedef ku
 gêra
 Me j’destê muxbeçan dît bi mishef û bi
 ayet”

gil: herî
 “Her gil û seng dibitin zêr bi tedbîrê
 hekîm
 Qabiliyet ku nebit hikmetê ustad çi kit”

gileh: gilî, şikayet; *bnr.* li behîtin

gîrfî: hebsî
 “Dilberê serdarê xûban ez nizam agah
 heyê
 D’hebs û zîndanê esîr girtiyê dermande
 ye”

go : gog; *bnr.* li bazîn

goş: guh
 “Goşî bi ‘amê me de terkî mudamî me
 de
 Ekserûhum fi xuma exlebûhum fi ‘ema”

goyger: gobaz, yê xweş bi gogê dileyize
 “Textê di mîr û begleran meydanê coqa
 goygeran
 Eslan û cotê meyxuran mey dan şeraba
 saxerê”

goyîn: cureke balinde ji malbata pepûkê; *bnr.*
 li bişkoj

gulav: ava gulan; *bnr.* li cerg

gunbed: qube
 “Wê bi sed pencereyan daye şu’aya
 qîdemî
 Gunbedî îşqê li ser kursiyê dewwarî
 hudûs”

H

heçî: herçî
 “Heçî firqet nedî hîcran nebê min dax û
 key lê ne
 Ji bil derbê di hîcranê fîraqa rûh û can
 kê da”

heç wekî: herwekî
 “Secdeya ber eswedan nadim bi sed
 hec-ekberan
 Sond bi wan zulfan û xalan heç wekî
 bêjim we ye”

hela: hê, hêja, hele
 “Pur min ji vê çerxê Mela kêşane afat û
 bela
 Ebleh bibînim wî hela herçî ji dil bit yarî
 çerx”

hema: tafilê
 “Teşbihê bi cedwel me di nêv ateşî îşqê
 Dil qelbê heqîqet bit û iksîrê hema girt”

hempa: emsal
 “Li min pîrsek bi dildarî dibit hempayê
 dîdarê
 Vewestayim di ferwarê li ‘ebdê xwe ke
 fermanê”

henarîn: şandin, hinartin
 “Qasid bi meqsûda me hat ba mujde û
 emr û berat
 Nişan hinarîn hem xelat şehzadeya gul-
 gûn qeba”

heriftin: roxandin
 “Lew heriftim ez ji meylê şubhetê sihlê û
 seylê
 Muhteb û ‘îşqa di Leylê ez kirim yekser
 pilox”

hevdeng: emsal
 “Zerîfê nazikê şengê sifethorê perîrengê
 Bi rojê ra tu hevdengê du reştozên
 siyehrengê”

hevotîn: fêr kirin
 “Hostayê ‘îşqê dil hevot ser ta qedem
 hingî disot
 Remza en-el-Heq her digot bawer bikin
 Mensûr e dil”

hey û hey: timî û daîm, hê jî
 “Qedehek taze ji ‘îşqê di ez el de me
 hekîmê
 Jê dinoşin hey û hey hê bi xwe cama
 me lebaleb”

hilê: (roj) hilê
 “îd e û hebîbê neyr e lê yan dê bi qur-
 ban bî Melê
 Ya Reb bibînim roj hilê sikkîn di dest
 qessabê da”

hindav: raser; *bnr.* li balîn

hingaftin: lêdan, îsabet kirin
 “Kûsê ku hingaft bi şahî li text

Padişehan neqdi rewan dan xerac”
hingî: ewçend; *bnr.* li hevotin
hir: hire, vira, vê, vêder
 “Er ne hudhud ji Seba bêt û wekî bayê Seba
 Dê ji hir ku bigehit dest ve peykê here-
 mê”
hol: topa ji kulav an ji potik çêkirî; binêre li
 gogê
 “Mîr û Kurmanc li holan qederekî westa-
 ne
 Lê di nivê bi sef û ûpê ereb hatine
 ceng”
hosta: osta; *bnr.* li hevotin

J

jehrfî: bi jarî
 “Zulfên bi tew şîrîn leban jehrfî ne
 şubhet ‘eqreban
 Lê min ji biska pur girî îro tinê girtin du
 ta”
jeng: zeng
 “Newaya mutrib û çengê fixan avête xer-
 çengê
 Were saqî heta kengê neşoyin dil ji vê
 jengê”
ji rengê: mîna, wekî, bi mislê
 “Me ra j’ewwel çî bir xamê kişand axir
 bi bednamî
 Ji rengê Se’di û Camî ji şuhret pê hisîn
 ‘amî”
jih: têla sazê muzîkê, rûdiyê zirav
 “Ger şubhetê perwane di bezmê te çî
 sed ger
 Sed nale hezar rengî wekî çeng û jihê
 min”
jiha: ejdeha
 “Zinhar e kesê dest bibit erqemê serwê
 Bê ‘işweyê le’lan ne bi teslîm jiha girt”
ji: umr, temen
 “Muhbet û mihnet di zor in hub dibê
 bê şek bela ye
 ‘Umr û ji xweş pê diborin sotin û derd û
 cefa ye”

K

kalîn: nalîn; *bnr.* li bêgav
kan: xezîne, ciyê maden û xwê jê derxistinê
 “Kan bi gewher çî bikît gewher eger pak
 nebit
 Tu besîret te nebit sîretê ecdad çî kit”
karsaz: jêhatî, yê ku kar pêk tîne
 “Sed baziyan ev huqeqbaz tûnit bi hîle
 karsaz
 Geh geh ku naz e û geh niyaz sehhar û
 pur mekkarî çerx”
kas: piyan, kase
 “Herçî rengê te bivêtin xwe bibinî lillahî
 Nezerê wer bide kasê çî xweş ayîne ye
 kas”

kaşû: kaşo, darê serkaşo yê çoganê; *bnr.* li
 bazîn
kemend: tayê serî bi hilboq; *bnr.* li bend
ker kirin: perçe kirin; *bnr.* li ceng
keyber: kêra mezin, birîn
 “Min di dil kovan hezar in dax û keyber
 bê hesab
 Mihneta werdên bi xar in wên di dil da
 sed nîşab”
kezeb: cegera reş, mêlag
 “Xefletê ew keşşîfî şîr dest bi dest hatin
 ceger
 Go xebînet ya Mela miskîn Melê ker kir
 kezeb”
kêmxew: qumaşê qedîfe ku xew (pûrt)ên wî
 kêmin
 “Nazik letif gerden zerîf lebsê şerîf
 kêmxew qedîf
 Min di bi wext ew nîk-bext îro li text
 fexfûrî bû”
kilox: qafê nehî
 “Dest nehêlim ez ji dinê şubhê Ferhad û
 Şîrînê
 Wer ji ber ‘işq û evînê min di rê çit ev
 kilox”
kok: xweşik, bi edeb, mukemel
 “Tu bimeş kok bi ser derê qesrê
 Bi xwe kokî li şah û qeyser ke”
kovan: derd û hesret; *bnr.* li keyber
kûre: hêtûn
 “Fa’îlek lazîm e da fi’l û eser peyda bit
 Ger tu heddad nebit kûreyê heddad çî
 kit”
kûze: cêrê avê
 “Tu şerabê bi xerabê bi nehingan deh
 demî
 Dê kifayet bi çî rengî me bikin kûze û
 tas”

L

lê miştin: tê gevizandin
 “Bi derbên xenceran kuştin bi xwîna
 sohrî lê miştin
 Di çîna sunbulên qîşt in me dil pur misk
 û mawer de”

M

meger: wisa ku, halbûkî
 “Meger şîrîn bi wê şîraniyê bû
 Ela şems-ul melahet qed tuşarek”
meyfiroş: şerabfiroş, meyxanecî
 “Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tèn
 sema
 Badexwiran noş noş mane li dorê cema”
misrfî: şûrê destkariya Misrê
 “Xencer û tîr û teber barîn şîbih berq û
 brûsk
 Misriyan lami’ ji elmasan didayê rast û
 çep”
mist: kulmekê, kulmek bi dev re; *bnr.* li ax

N

naçar: bêçare
 “Hey’eta keyf û kemê bê keyf e keyfa
 arif e
 Dê bimînit ger nebit naçar bê tiryak rûh”
napak: neqenc
 “Cami ‘işqê paki rûhani tuhûra batin e
 Ê nenosî her we ma hetta ebed napak
 rûh”
neşem: nikarim
 “Mey ber kefê meşha sefê soza defê da
 qerqefê
 Husna li dêm wesfan neşem herçî dibêm
 jê dûrî bû”
neynik: eynik
 “Gerçî her daîm ji mihrê neynika dil
 bedr e min
 Wek hîlala subhe têm ez carinan bim
 napedîd”
nihe: niho, niha
 “Te divê dawî birî bit nihe da
 Bibirim ser bi du enguşt meqes in”
nima: nişan dan, temsîl kirin; *bnr.* li vê ra
noş bit: afiyet bit
 “Herkesê camê ji destê wê binoşit noşî
 bit
 Ê ji wî destî nenosî zehrfî bit lê ew
 medam”
noşîn: vexwarin; *bnr.* li napak
nuhtin: îsabet kirin, hingaftin; *bnr.* li suhtin
nûbar: berê nû teze, cureke kevanê bû ku pê
 çend tîr bi hev re dihatin avêtinê.
 “Gezmeyek qewsê şevîn aşiq bi nêva dil
 kevî
 Dê ji can destan bişot xasma kevan
 nûbar bit”

P

payan: dawî
 “Husn û cemaletî canan nadêritin tu
 payan
 Herçî nebit bidayet esla nehîni nihayet”
pehnî: pehnayî, rastayî
 “Pehniya wê çerx û dolaba dinê
 Nîsbeta erbabê ‘îrfanê xelet”
pencere: pace, şîbak
 “Wê bi sed pencereyan daye şu’aya
 qidemî
 Gunbedî îşqê li ser kursiyê dewwarê
 hudûs”
pergar: pergela xêzkirina çenberê
 “Kes di li lewhê sîne qet neqşek ve hafî
 bê xelet
 Herdem ji nû yek taze xet tavête der
 pergar xet”
perhîz: xwe parastina ji hin xwarin û vexwari-
 nan
 “Şem’ê ser nûr nadirî ger ew nekit per-
 hîz dil
 Zewqê cama îşqê nakit ger nekit îmsak
 rûh”

perr: polik û pereyên xîşirê xemilandinê
 “Şetrî û zulf û belg û perr hemyan li dêm de’we û şer îlan li sewa bûne ger ‘eqreb xuyan ez her teref”

perwane: perperoka li dora çirayê digere, aşiç; *bnr.* li berî

pertew: ronî, purtew
 “Heyf di qeyda xak û gil bit arifê çalak rûh Dê mucerred bit ku pertew dit ji nûra pak rûh”

peyda: hasil; *bnr.* li bînahî

pêt: alav
 “Brûska batînî da dil di pêti sîne wê wer bû
 Ku dê bêtin tebîta dil di nav wê nar û pêtê da”

pilox: bizotê agir
 “Lew herifim ez ji meylê şubhetê sîhlê û seylê
 Muhibet û ‘îşqa di Leylê ez kirim yekser pilox”

pîrê muxan: pîrê meyxanê, serekmelayê zerduştî
 “Xizmeta pîrê muxan dê kit kesê meq-sûd e mey
 “Şîşe û cama zucaî yê divêt dê ret Heleb”

poşîn: pûşî giredan, xêlî kirin
 “Ji wê camê dinoşim ez
 Seher lew ney li hoş im ez
 Ji ‘amê lê dipoşim ez
 Bi can her lê dikoşim ez”

pur sur: cazib, dilkêş
 “Hin zerî ne pur sur in ser bi perr in dêm dur in
 Min ku di çerxê we di sebr û qerarim nema”

pur: pîr, gelek; *bnr.* li cerg

Q

qe: hîç
 “Ji lebê le’lê şeker yar qe nekir pursa Melê
 Misriyan gezme reşandin ku kişandine elmas”

qeyser: împarator, kayzer, çar; *bnr.* li kok

R

rimbaz: leşkerê bi rim şer dike, hostayê rim bikaranînê; *bnr.* li aferîn

rîşî: gulik
 “Netrik û tayên bi rîşî ê di zêr in pê ve wişî
 Min du fêris dîn di pêşî mirwet û insaf yox”

ruswa: rezil, bê îtibar
 “Ruswayê ‘îşqê tenha ne ez bûm
 Kes di zemanan hub bê melamet”

S

saye: hîmaye, alikarî, siyanet, sî; *bnr.* li bext

seng: ber, kevir; *bnr.* li gil

serbîperr: ya ku tûncik û temorîk bi perrîkê zêr in; *bnr.* li pur sur

sermal: pêçeya li serî tê pêçanê.
 “Sosinên taze û muşkên walan
 Bes perîşan ke li ser sermalan”

serw: selwî; *bnr.* li jiha

seywan: şîwan
 “Erzê halê min bigota yê bi ‘inwanê edeb
 “Asîtan bikra ziyaret çetr û seywan û tunab”

sêgah: cureke meqamê muzîkê ye ku zuhdeke xurt û hizneke aşkere distirê.
 “Lillah were saqî bi du caman me ciwan ke
 Mutrib bi defê ra bide sêgah û şebabê”

sîne: sîng, dil
 “Rast û çep têne ceger sîne kulab
 ‘Er’erên şengî dilestin çep û rast”

suhtin: sotin, sewitandin
 “Bi narê firqetê suhtim ji ferqê ser heta pê da
 Xedenga xefletê nuhtim ji berqa lamî’a tê da”

sunbul: simil; *bnr.* li geşt

suxte: feqeh, şagirt
 “Go suxte murada xwe ji min telbe ke îro
 “Min go ji kerîm telbe û daxwazî çî hacet”

Ş

şahbaz: bazê spî
 “Ew dilê min wek kebûter nabitin kes lewme ket
 Lew di vê torê we da keftî me dîn sed şahbaz”

şahîn: şahbaz
 “Teyrê dil bê tem’ekî nayête dest şehzadeyan
 Qûşçiyê şahîn di destê dê dibê azar bit”

şahnuşîn: şaneşîn, balkon
 “Şahnuşînên nazikan zayî mekin
 Da nebîni dil bi xanê xelet”

şehsiwar: şahê siwaran; *bnr.* li aferîn

şek: lédana bi çoganê
 “Mislê goy bê ser û pa bûme li ber derb û şekan
 Lew bi çoganê cefa ya xwe ji dil hûrî kirin”

şeng: bi kêf, bi şîpîl; *bnr.* li belaziz

şepal: bejna lihevhatî û xwînsîrîn, ferxê şêr
 “Xwîn ji dil co co rewan tê wek ‘eqîq û erxewan tê
 Lê ji dest selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox”

şetrenc: setrenc
 “Di meydanê şîfîn xencan bi çerxên

mislê şetrencan
 Turaba ber piyê qencan zabad û ‘enber-rên gerd e”

şîret: nesîhet
 “Xelqno li min kin şîretê ew dilbera zêfîn kemer
 Min di di halê xefletê hat der ji burcê wek qemer”

şîşe: şûşe; *bnr.* li pîrê muxan

T

tar: çenbera pehn a ji dep an metal; tara deholê
 “Tu ji ber perdeya wehmê were der da bibihî
 Çi newa tete bi sed nexme ji ew tarê hudûs”

teba: tev de
 “Sebr û qerarim ku bir can û ceger hûr dikir
 Zulmê we reng kî dikir can dibir û dil teba”

tenha: tenê, xalî; *bnr.* li ruswa

tepanî: bi serî de anîn, tûşî kirin; *bnr.* li wer ne

terazin: mêrg û çayira li keviya; *bnr.* li al’al

tewizandin: givaştin, xemilandin
 “Nesrîn û binefşe tewizandin
 Mawerd direşand şûşê ‘ac”

teyîn: tewîn
 “Tiliyên nazik şemalîn min li ser çehvên xwe malîn
 Talibê werdên bi xal in dil di vê fikrê teya ye”

tê werbûn: çeng kirin, êrîş kirin
 “Cin û teyarek me di wer bû di min winda kirim
 Dame ber pence w kulaban hilfirandin wek ‘uqab”

têkel kirin: tevlihev kirin
 “Wajîgûn dewrê numa min çerx û bayê lewleban
 Kewkeban seyra muxalîf girt û têkel kir hîsab”

tîne: tenê; *bnr.* li jehrî

tîp: deste leşker, deste siwar; *bnr.* li hol

tu: hîç; *bnr.* li kan

tundî: tûjî, tûjî (gurr)
 “Da me şehzade bi destê xwe mubarek qedehek
 Ne xubarek ji xumarî û ne tundî û ne xeş”

tûle: cewrik, dêlik
 “Ku tûlê asitanî dûr nekî êdî ji dergahê
 Ji ba Xwo vî rucû nakîn di babê lutt û rehmê da”

tûtak: tûtû, dûtû
 “Sehergeh ‘endelib mest in ji bihna werd û bişkojan
 Şubeh tûtak û goyanan dinalîn em di firqê da”

U

umîd: hêvî

“Bi umîda te humayê ne Melê tûr veda
Wer temaşayê cihan bûye hemî tûr û
şebek”

V

vajî: ters

“Munqelib min dî menazil vajî ew seyrê
dikin
Yek bi yek xwîn jê dibarin atêş û lem' û
şîhab”

ve: ecêb, veh

“Ve Melê sur periya hûrî sifet
Sed melek destî be dest in çep û rast”

vebestin: xwe rapêçan

“Zengiyar cewşen vebestin pêşberî coqa
Hebeş

Daberistin yek bi yek çûn ber liwayê
rast û çep”

vejîn: ji nû ve jîn

“Ji remza dîlberê dîsa li min hatin vejîn
derd e

Di lebsê tariyê min dî xwiya bû ew
siyah-çerde”

vemal: bimale

“Zulf çûne ser nûra zelal carek were
bayê şîmal
Biskan ji ser dêmê vemal zulfan ji ber
cotê esed”

vestestan: sekinîn, rawestan; *bnr.* li hempa

vexwendin: dawet kirin

“Bi tûlên asitanî ra vexwendim mîr bi
dergahê

Bi vî çavî hebîb dîtîm şukur ev şefqê
Mewlê da”

vêk ra: pê re

“Zuhre rengê mal û xurşîdê ji bala wê nîma
Lew du kewkeb çûne vê ra istîwayê rast
û çep”

vêk ketin: yekdişer bûn, bûne yek

“Vêk ketin şems û zuhel îro di burca
‘eqrebê
Seyf çû destê merîxê mulkê dil lew bû
xerab”

vêkra: bi hev re, bi hevûdu re

“Bi werdan zeyyînî gulşen çîmen da
lale bişkiftin
Binefş û çiçekan vêkra şefeq da yek di
rewdê da”

vi: bi

“Şox û şepala meyperest ew zalima
hişyar û mest
Vê nameyê xef dî vi dest fi teyyiha
neşrun-neba”

vîn: îrade

“Husn û cemalê xwest evîn vêkra di yek
zatî civîn
Nûra qedîm bû ‘îşq û vîn wan li êk naz
û ‘îşwe da”

W

wajîgûn: berevajî, bê oxir; *bnr.* li têkil kirin

we: weha; *bnr.* li pur sur

weh ku: wisa ku; *bnr.* li biwar

werhatin: gevîzîn

“Bi dama muhbetê bend im xedenga fir-
qetê dil nuht
Bi şubhê murxê nîm-besmel di hev wer
têm di xwînê da”

wer ne: heke na

“Şetweta Leylê yeqîn Mecnûn tepand
Wer ne Qeys nakit beyabanê xelet”

westan: muhlet dan, navbir, man, rawestan

“Ber vi şerqê di seherê westayin
Hindûyên rojperest in çep û rast”

wêran: kambax

“Alemek wêranî zulfên te ji rengê ‘enberê
Çerx û perwazê didin carek li bayê rast
û çep”

wîşî: gûştî; *bnr.* li rîştî

X

xak: erd, ax

“Da di çesman min werîna xakê her wek
tûtiya
Ya hebîb pê lê nihayî baniya wê ew
turab”

xal: nuqte, deq

“Bi xalên werd û nesrînan ji Qudret xet
kişandî lê
Bi terha nêrgîza ‘êlî sehergahan nesîm lê
da”

xasma: nemaze; *bnr.* li nûbar

xemrevîn: ya xemên meriv direvîne, yar
“Xema ‘îşqê perihîtim ez hebîba xemre-
vîn kanê
Seraser têk behîtim ez ji derdê firq û
hîcranê”

xêlî: pûşîya ser rû

“Li ber rojê bibit xêlî binêrim qameta ‘êlî
Qedîf û zerkeş û têlî zebad û misk û
‘enber da”

xunav: aviya li ser gul û giya

“Li gulên tey’ terr û nazik ku seher girtî
xunav
Di ebarîq û qinînan ji hesed suhtî gulab”

xwe spartin: tewekul, îtimad

“Kor e xwe nasîpêrit carek bi dest deli-
lan
Ebleh çi kit tewafê nabînitin berê reş”

Y

yeksan: beranber, wekhev

“Ê bi Xîdrî ra divê avê heyatê bit nesîb
Dê bi se’y û cehdê yeksan bin li bal wî

roz û şeb”

yekta: bê emsal, li ser tayekî

“Nisbet perî zîba ye ew wek nêrgîza
yekta ye ew
Ya men rea xillî fe hel yuşbî bî şey’în
qameta”

Z

zehr: zar, uslûba peyivîne

“Bi zehrê xwe î şerîf xwendim ku xiz-
metkarî dêrînî
Te pur cewr û cefa dîne silûk û se’y û
cehdê da”

zend: milê jêrin, ji enîşkê heta qevdika dest

“Wan dest û zend û sa’idan mey dane
şeyx û zahidan
Mestî bi çêşmê şahidan ew nêrgîza sey-
rab da”

zengar: kesek, sewz

“Herfên ji qudret nuqte pur madarê
hewza le’l û dur
Ev rengî kê dî weh bi sur qudret-nimûn
zengar xet”

zengî: zencî; *bnr.* li vebestin

zerbaf: qumaş an perçeyên ji hevdayên zêr têkel

“Zulfa siyah ‘enber bike xemlê ji zêrê
zer bike
Zerbaf û dîba ber bike misk û gulavê lê
reşin”

zervav: kanarya

“Reyhan û sunbul tê hene sed çiçek û
gul tê hene
Zervav û bulbul tê hene ew baxçeya
gulzar xet”

zergo: guharê zêrin; *bnr.* li bişko

zerkeş: li ava zêr xistî

“Wer guh de çeng û nayê şîrîn ku bèn
semayê
Camê binoşe vê ra çi sade û çi zerkeş”

zêrav: ava zêr

“Bi sîmavê bi zêravê tu rojê neqşekî
bavê
Ku da Erjeng ji wê navê li ber rojê nebit
perde”

zînar: eman ha!; *bnr.* li jiha

zîwer: xişir, tiştên xemlê yên ji zêr

“Zêr û zîwer dikirim celbê qulûban haşa
Husn û sur zatî nebit qameta meyyad çi kit”

zox: zoxav, kêman

“Ah û oxên min ji dil tèn lê ji ber tîra
qizil tèn

Yan ji kovanên di kul tèn jê dizêt her xwîn û
zox”

(dumahîka *Termên rojname û rojnamevanîyê*)

raxistina rûpelan	sayfa düzenleme	mise en page	make-up, making-up, lay-out
montaj	montaj	montage	setting
sekreter	sekreter	secrétaire	secretary
beşdar	katılan	participant	participant
beşdarî	katılım	participation	participation
tevkar	katkida bulunan	contribuant	contributor
tevkarî	katkı, kat- kıda bulunma	contribution	contribution
hevkar	işbirlikçi, iş arkadaşı	collaborateur	collaborator
hevkarî	işbirliği	collaboration	collaboration
xwudan, xwedî	sahib	propriétaire	proprietor, owner
Xwedê, Xuda	Tanrı, Allah	Dieu	God
wergerandin	tercûme etmek	traduire	to translate
werger/wergerandin	tercûme	traduction, action de traduire	translation
wergêr	mütercim, çevirmen	traducteur	translator
wergerandî	çeviri, çevrili	traduit	translated
wergêrî	çevirmenlik mütercimlik	métier de traducteur	translatorship
tercuman, paçvan	tercûman	interprète	interpreter
paçve, tercume	tercûme (tercûmanlık)	interprétation	translation
tercumanî, paçvezanî	tercûmanlık	interprétariat	interpreting
arşiv	arşiv	archive	archive
rast kirin	düzelte, tashih etmek	corriger	to correct, to read (proof)
rastkirin	düzelte, tashih	correction	proof-reading
rastker	düzelteci, tashihci	correcteur	proof-reader

JI PIRSÊN GRAMERA KURDÎ

Mîr Celadet BERDIRXAN
& Roger LESCOT

KETINA FONEMAN Û SIVIKBÛYÎN*

Yek ji xasîyetên zimanê kurdî ew e ku timî sivikbûyî û wecîyê digere. Ev meyl li nemaze di hevoksaziya (sentaksa)1 vî zimanî de tê dîtin. Emê di paragrafên jêrîn de bibînin ew çawa xwe di qanûnên fonetîkê2 de nîşan dide. Her gotinekî kurdî, bi veguherîneke xwezayî (tabîî), hingî diçe kurtir dibe, hin bi hin hejmareke ta mimkin mezin a dengên xwe davêje, ta ku bibe yekîteyî (yekheceyî). Ev veguherîn geh bi avêtina hin elemanan, geh bi vekîşînê3 dibe. Emê yek bi yek li van her du awayan binêrin.

KETINA DENGÊRAN

Em dizanin ku dengdêrên e û î, gava ku nêzî dengdêrên dirêj bin pişcar dikevin. Va ne hin mînakên (mîsalên) din ên ketina dengdêrên kurt û dirêj:

Rizyang, giyayek, ji bo *rizyanik*.

Dargerîng, giyayek ku xwe li daran dipêçe,
ji bo *dargerînek*.

Argûşk, keviyê paşîn ê çena jêrîn, ji bo *alîgûşk*
Parxan, ji bo *parûxan*.

KETINA DENGARAN

Piştir çend dengdar bi hev re dikevin ji bo ku gotin siviktir bibe:

a) Di nava gotinan de.

Mînak: *Desgeh*, ji bo *destgeh*.
Domam, ji bo *dotmam*.
Desmal, ji bo *destmal*.
Cênîk, ji bo *cêndîk*.
Biçeng, ji bo *binçeng*.
Cihar, ji bo *cehwar*.

b) Di dawîya gotinan de. Gelemperane

ji her du dengdêrên dawî ya diduyan winda dibe.

Mînak: *Yeksem*, ji bo *yeksemb*.
Por, ji bo *port*.
Ben, ji bo *bend*.
Berçav, ji bo *berçavik*.
Erzîn, ji bo *erzînik*.
Gir, ji bo *girs*.

Lê çend mînakên ketina dengdara pêşî, ya ji her du yên dawîya gotinê, ji te dîtin:

Mînak: *Zengelok*, ji bo *zengelork*.
Pêpik, derece, ji bo *pêping*.
(ji pêpeling).

KETINA KOMÊN FONEMAN. Di gelek gotinan de, dengdêr an dengdêrên bi serê xwe na lê çend fonem bi hev re winda dibin. Guherandinên wilo gelemperane dogitînen ku sê an bêtir kêteyên (heceyên) wan hene de xwe nîşan didin û dixwazin ew bikin du - an sê kêteyî.

Mînak: Di dawîya radera (infinitiva) lêkeran (fîlan) de - *ayîn dibe* - *an*.

- *ihan*

Nêrîn, ji *nihêrîn*.

Gurçîk, ji *gurçîlik*.

Ar, ji *agir*.

Tevnepîrk,

tora pîrhevokê, ji *tevna pîrikê*.

Zêrker, ji *zêringer*.

Parsû, ji *peransû*.

Mestir, ji *mezintir*.

Vekişîn. Emê fonemên vekîşînê di du koman de ji hev veqetînin:

a) ên ku berhemên rasthatînen tesadufî (daçek û pronav, pêşlêker û lêker, hwd.) ne.

b) ên ku bi awayekî timî di nav gotinan de xwe nîşan didin. Encama wan hemûyan ew e ku hin komên sabît ên ji dengdêran (gelemperane yên kurt) û ji dengdaran pêkhatî winda dibin, cihê xwe ji dengdêrên dirêj ên yekta re dihêlin.

Di tabloyên jêrîn de me teşeyên (formên) ku di hin devokên çiyayî yên bi awayekî giştî kevnaperêztir (Botan, Hekarî, Behdînan û heta Tor Abdîn) de mane û peyvên devokên destê dane ber hev. Hejmar û lihevkerina van mînanan wisa ne mirov dike teoriyek çêke û bêje ku ev veguherîn di pêşveçûna sîstema dengî ya kurdî de qûnaxek nîşan didin.

Nivîsarên klasîk ên kevn ên li ber dest kêmin û kêma faîde ne ji bo teyî da vê teoriyê: em hê li hêviya çapên wan ên zanistî ne û ji xwe di wan de gelek peyvên erebî û farisî hene.

a, yek di şûna komên *-eh-*, *-we-*, *-ebe-*, *-ebi-* de xwe nîşan dide.

Mînak: *Kanî*, ji *kehni*.
Patin, ji *pehtin*.

<i>Danû</i> , ji	<i>dehnû</i> .
<i>Daşîk</i> , ji	<i>dehşîk</i> .
<i>Canî</i> , ji	<i>cehnî</i> .
<i>Ra</i> , ji	<i>reh</i> .
<i>Bajo</i> , ji	<i>behjo</i> . (fermana <i>ajotin</i>).
<i>Bavêje</i> , ji	<i>behvêje</i> . (fermana <i>avêtin</i>).
<i>Bawer</i> , ji	<i>beher</i> (bawer kirin).
<i>Şar</i> , ji	<i>şehir</i> .
<i>Panî</i> , ji	<i>pehnî</i> .
<i>Paîz</i> , ji	<i>pehîz</i> .
<i>Fam</i> , ji	<i>fehîm</i> .
<i>Xastin</i> , ji	<i>xwestin</i> .
<i>Xwar</i> , ji	<i>xweher</i> .
<i>Par</i> , ji	<i>behîr</i> .
<i>Tal</i> , ji	<i>tehil</i> .
<i>Çav</i> , ji	<i>çehîv</i> .
<i>Pan</i> , ji	<i>pehin</i> .

ê, yek şûna komên *-eh-, ehi-, -ej-* digre.

Mînak:

<i>Rê</i> , ji	<i>reh</i> .
<i>Bêvil</i> , ji	<i>behvîl</i> .
<i>Şê</i> , ji	<i>şeh</i> .
<i>Rêl</i> , ji	<i>rehîl</i> .
<i>Avêtin</i> , ji	<i>avehtin</i> .
<i>Mêvan</i> , ji	<i>mehvan</i> .
<i>Bêtir</i> , ji	<i>behtir</i> .
<i>Rêtin</i> , ji	<i>rehtin</i> .
<i>Çêlek</i> , ji	<i>çehlek</i> .
<i>Pê</i> , ji	<i>pey</i> .
<i>Kêf</i> , ji	<i>keyf</i> .
<i>Elêh</i> , ji	<i>eleyh</i> .
<i>Hêv</i> , ji	<i>heyiv</i> .
<i>Mêw</i> , ji	<i>meyiw an mehiw</i> .

î, yek şûna komên *-ih-, ihi- û -iyi-* digre.

Mînak:

<i>Tirî</i> , ji	<i>tirih</i> .
<i>Bî</i> , ji	<i>bih</i> .
<i>Cî</i> , ji	<i>cih</i> .
<i>Pêçî</i> , ji	<i>pêçih</i> .
<i>Sipî</i> , ji	<i>sipih</i> . (heywanek wekî <i>kêçê</i>)
<i>Sîwan</i> , ji	<i>sihwan</i> .
<i>Sî</i> , ji	<i>sih</i> .
<i>Dîtin</i> , ji	<i>dihîtin</i> .
<i>Bibine</i> , ji	<i>bihihne</i> .
<i>Rîtin</i> , ji	<i>rihtin</i> .
<i>Mî</i> , ji	<i>mih</i> .
<i>Tî</i> , ji	<i>tihîn</i> .
<i>Mîvan</i> , ji	<i>mihvan</i> .
<i>Gîlî</i> , ji	<i>gîlih</i> .
<i>Bîn</i> , ji	<i>bihîn</i> .
<i>Dîn</i> , ji	<i>dihîn</i> .
<i>Hîv</i> , ji	<i>hiyiv</i> .

Koma *-hi-*, di destpêka gotinan de gelek car dibe î.

ŞANEK I. Dixuye ku koma *-eh-* geh dibe *a* geh *ê*.

ŞANEK II. Teşeyên paralel, destpêkî (iptidaî) an vekîştî, ku di tabloyên jorîn de tînin, wekî mehvan û mihvan, ku dibin mêvan û mîvan; heyiv û hiyiv, ku dibin hêv û hîv, tînin îzah kirin

ji ber ku *e û i* bi hêsaniyê şûna hev digrin an cih diguhêrin.

Mîrov dikare bibîne ku buyêrên vekîştina peyvên biyaniyê ku ketine nav kurmancî eynî wekî yê gotinê bi eslê xwe îrani ne. Wekî di gotinê fehm de. *keyf, eleyh*. Mînakên wîla di listeyên jêrîn de jî tînin.

o, yek dikeve şûna komên *-uh-, -we-, -wî-, -wî-, -ihu-, -weyi-*.

Mînak:

<i>Gotin</i> , ji	<i>guhîtin</i> .
<i>Ronî</i> , ji	<i>rihnî</i> .
<i>Ronahî</i> , ji	<i>rihmahî</i> .
<i>Cot</i> , ji	<i>ciht</i> .
<i>Sotin</i> , ji	<i>sihtin</i> .
<i>Ordek</i> , ji	<i>uerdek</i> .
<i>Go</i> , ji	<i>guh</i> .
<i>Sond</i> , ji	<i>swind</i> .
<i>Kor</i> , ji	<i>kuwîr</i> .
<i>Goz</i> , ji	<i>guwîz</i> .
<i>Stiro</i> , ji	<i>stirih</i> .
<i>Ajotin</i> , ji	<i>ajihîtin</i> .
<i>Movik</i> , ji	<i>mihvik</i> .
<i>Motac</i> , ji	<i>mihtac</i> .
<i>Don</i> , ji	<i>dihun</i> .
<i>Bost</i> , ji	<i>bihust</i> .
<i>Borîn</i> , ji	<i>bihurîn</i> .
<i>Xong</i> , ji	<i>xweying</i> .

û, yek ji komên *-uî-* û pîrî kêm car, ji *-ih-* tê.

Mînak:

<i>Dûr</i> , ji	<i>duwîr</i> .
<i>Kûr</i> , ji	<i>kuwîr</i> .
<i>Qûz</i> , ji	<i>quwîz</i> .
<i>Xûn</i> , ji	<i>xuwîn</i> .
<i>Xûşk</i> , ji	<i>xuwîşk</i> .
<i>Hûr</i> , ji	<i>huwîr</i> .
<i>Stûr</i> , ji	<i>stuwîr</i> .
<i>Tûj</i> , ji	<i>tuwîj</i> .
<i>Şûr</i> , ji	<i>şuwîr</i> .
<i>Şûjin</i> , ji	<i>şihjin</i> .

ŞANEK I. Koma *-ih-* dikare him *o* him *î* bide wisa jî, *-uî-*, ku pîranî dibe *û*, carna *o* dide.

ŞANEK II. Peyvên tabloyên jorîn bi pîranî ji rehên îraniya kevn tînin û di wan de komên deg-dêr û dengdar hebûn, û me di mînakên jorîn de vekîştina *dûr, dîtin, kanî, hwd.* tenê dengdêrên dirêj hebûn.

* Ev bend jî pirtûka *Grammaire Kurde*, Emir Djeladet Bedir Khan & Roger Lescot, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris, 1970, hatiye wergerandin.

1. hevokazî (sentaks): rêza gotinan di hevokê (cumlê) de; awa û rastekên (qaîdên) çêkirina hevokan.

2. fonetîk: beşê zimannasiyê ku bi pîrsên foneman (her yek jî dengên ziman) mijûl dibe. Fonemên kurmancî di alfabe ya kurdi ya latîni de bi 31 tîpan (herfan) tînin nivîsîn. 8 ji wan dengêr in: *a, e, ê, î, o, u, û*. 23 ên mayî dengdar in.

3. vikişîn bi mana contraction, çûn ser hev, kurt bûn, kişan ser hev hatiye bi kar anîn.

JI NAMEYÊN XWENDEVANAN

Xwendevanekî *Kurmancî* ji navçeya Midyadê, navên hin gîyayan şandine.

karî: Giya ye, reng kesk, bejn 30 cm, sapê wê pan e, nîvgera wê 2 cm ye. Pelên wê wekî yê darê ne, tînin hişk kirin û tevî xwarinê dikin, tama goşt dide, bi xavî tama wê tûj e; li çolê tê dîtin (li gor Eleşkirtî).

tîrşok: Giya ye, biharê der dîçe, bi xavî tê xwarin, tama wê tîrş e. Reng kesk, bejn 50cm, sap gilover û nîvgera wê 2 cm ye (li gor Midyadê û Eleşkirtî).

gûriz: Giya ye, biharê derdîçe, ji bo xwarinê tê kelandin (wekî espanax), hêk û rûn tevî dikin, bi xavî tama wê şor e, reng kesk, gava şîn e kulîlkên wê pembe ne (bejn: 1cm), gava mezin dibe bejn 1 m ye (li gor Midyadê).

qahfûr: Ji sapa gûrizê tê çêkirin, wekî teneka çopê tê bi kar anîn (li gor Midyadê).

nûsek: Li ber avê çêdibe, wekî pelewêsk e, wekî espanax tê xwarin (li gor Eleşkirtî).

pelewêsk: Li ber avê çê dibe, bejn 10cm., sapa wê tê avêtin û ji pelên wê dolme tê çêkirin (li gor Midyadê û Eleşkirtî).

gûlik: Mehên nîsan û gulanê derdîçe, bej, 5cm., wekî tiliyeke qalîn e, reng kesk, bi kêra tê çînin, tê kelandin, hêk û rûn tevî dibe (bi tirkî çiliş).

reşîk: Li ser avê derdîçe, zirav wekî sapan tî ye, tê kelandin û rengê reş dide, ji bo rengdana rîsê tê bi kar anîn (naye xwarin).

mendik: Biharê derdîçe, bejn 30-40cm., wekî cigareyek qalîn e, qaçilê ser radikin û bi xwaviyê tê xwarin, tam û rengê kelenka dide.

cax: 2 tîlî pan e, bejn 20-25 cm, serê wê şax dide û tê de çêva hûr wekî pincar heye (ew tê avêtin), tama wê tûj e, tê kelandin û xwarin, ji ber tîrşî jî çêdikin.

Ribês: Derbiharê dertê, di ciyê qumlxaxê de mezin dibe, koka wê li ser erdê de pel dide, sapa wê 40 cm. radibe, qaçilê sapê radikin û sapa wê bi xavî tê xwarin (tirkî ışkın).

Hevalên hêja,

Hejmara kovara we ya *Kurmancî* ya duda kete destê min. Mala we ava. Ew rojnama delal dikare kêfê her mirovekî zane jî bê.

Ez jî dixwazim hine bîr û bawerî û serdazêdekirinêd xwe bêjim, belkî we gerek bin. Em jî renga dest pê bikin: Navê renga li bal me ev in:

Sipî: çil, qerqaş, sîs, boz (hespê boz), kever, çal

Reş: qer, hemis (seyê hemis), qemer, esmer (reşê vekirî)

Sor: al, gevez, kumeyt, xanimreng

Şîn: hêşîn, kesk

Sût : şîrkî, şînboz

Zer: qîçîk, şê, çûr, kej, çeçel, soron, narincî.

(Çend rengêd din): belek, gewr, qawereng

Têmuêrê XELÎL

Rewan-Ermenistana Sovyetî

Bêjeyên ku cihan nîşan didin

Amadekar : Mûsa KAVAL

1- Navên ku cihêkî bi awayekî giştî nîşan didin:

Weke: cih, cî, cîh (li hinek navçan "cî", "cîk" jî dibêjin).

- der - şûn
- erd - dews
- avahî - teng
- xanî - rêç
- mal
- war
- şop

2- Navên cihan ku bi arîkariya paşpirtikên istan, xane, geh, dank û ok ê tên çêkirin;

A) ISTAN

Bi arîkariya istanê navên hinek cihan çêdibin ku li wan cihan bê hijmar ruhber û tişt hene.

Ev cih jî bo wan wek war an welat e.

- Weke:** Kurd + istan → Kurdistan
 Afxan + istan → Afxanistan
 mor + istan → moristan
 mar + istan → maristan
 gul + istan → gulistan
 dar + istan → daristan
 şehir + istan → şehiristan
 dib + istan → dibistan

B) XANE

Bi arîkariya xaneyê navên cihan çêdibin ku dorgirtî û sergirtî ne.

- Weke:** derman + xane → dermanxane
 mêvan + xane → mêvanxane
 nexweş + xane → nexweşxane
 mey + xane → meyxane
 girtî + xane → girtîxane
 çay + xane → çayxane
 pirtûk + xane → pirtûkxane

C) GEH

Bi arîkariya gehê jî navên cihan çêdibin.

- Weke:** havîn + geh → havîngeh
 seyran + geh → seyrangeh
 kêlan + geh → kêlangoş
 dirûn + geh → dirûngeh
 şer + geh → şergeh
 zanîn + geh → zanîngeh

D) DANK

Bi arîkariya dankê navên wan aletên ku cih in tên çêkirin.

Binyatê dankê dan e û k li ser hatiye zêde kirin ji ber ku ew û rader (mesder)ên lêkerên hevedudanî jî hev bîn cihê kirin (weke: avdan, xwêdan)

Weke:

- xwê + dank → xwêdank
 av + dank → avdank
 kil + dank → kildank
 dew + dank → dewdank
 xwefî + dank → xwefîdank

Ok

Bi arîkariya paşpirtika okê jî navên cihan çêdibin.

Weke:

- serşo + k → serşok
 cilşo + k → cilşok

(Gava rehê gotinê bi o yê biqede oya okê dikeve, k dimîne.)

- 3- hir vir }
 hê re vira } ku cihên
 hê ve vê rê } nêzik nîşan didin
 vê dê
 vê derê

- wir wê de }
 wira wê dê } ku cihên dûr
 wê rê wê derê } nîşan didin.
 wê ve

4- Bêjeyên ku aliyekî ji aliyan nîşan didin.

- alî nîkar ba
 rex la
 kêlek kenar
 mil cem dev
 tenişt nik
 teng

5- Bêjeyên ku hemû aliyan nîşan didin:

- dor hawîr
 dormandor hawîrdor
 rexanrex dorhêl
 çarnîkar dorûber
 çarrex dorali
 rastûçep derûber
 çarkenar derûdor
 çarali

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

*Min ew nivîstî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan*

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Biskops Arnöyê li Swêdê

Civîna pêncemîn a li ser zaravayê kurmancî li Stockholmê, roja 1ê nîsana 1989an dest pê kir û heta 9ê nîsanê dewam kir.

Hevalên ku di civînê de beşdar bûn ev bûn; Khosrow Abdollahî (Selmas), Rojen Barnas (Diyarbakir), Lutfî Baksî (Xerza), Firat Cewerî (Mardîn), Xelîl Dihokî (Dihok), Mustafa Düzgün (Dersîm), Derwêş M.Ferho (Tor), Musa Kaval (Hekarî), Hazim Kiliç (Hekarî), Asî Rebatî (Sulêmanî), S. Rêwing (Sêrt), Kendal Nezan (Diyarbakir), Huner Salem (Akrê), Mehmed Uzun (Swêrek), Memo Yetkîn (Semsûr) û Reşo Zilan (Agirî).

Civîn, li gora bernameya xwe, hem li ser pirsgrêkên rêzimanî û hem jî li ser terman xebitî. Herwekî ku hûn dê di rojnamê de bibînin, civîn bi firehî li ser du pirsgrêkên dijwar yê rêzimana kurdî rawesta: lêkerên hevûdudanî û raweya neyînî. Ji bilî van pirsgrêkan, civîn li ser devoka Behdînî jî xebitî. Lê em rapora vê xebatê ku ji aliyê S. Rêwing hat pêşkêş kirin, di Kurmancî de naweşînin, ji ber ku ew di kovara Federasyona Kurd li Swêdê Berbangê de (hejmar 4/88) weşiyaye.

Heçî term bin civînê xebata xwe ya li ser anatomiya meriv, peyvên şal û şepik û peyvên ku cih nîşan didin domand û dest bi termên hiqûqî kir. Di beşa «ji klasikên me» de, vê carê, dor ya şairê nemir Seyda Cigerxwîn bû.


Ev xebata ku roj bi roj hin çetir û tekûztir dibe, îroj bêtir bala xwendevanên kurd dikişîne û ew jî bi pêşniyar û dîtînen xwe, vê xebatê hîn dewlementir dikin. Em her li hêviya pêşniyar û dîtînen xwendevanan in.

KURMANCÎ

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
22-41 BEDEN	GÖVDE	LE TRONC	TRUNK
22-25 PIŞT	SIRT	LE DOS	BACK
22- mil, serpi, sermil	omuz	l'épaule	shoulder
23- pî	kürek kemigi	l'omoplate	shoulder blade
24- navpişt, kodika piştê	bel	les lombes	loins
25- kortikên qorikê, kortikên kemaxê	kiç çukuru	les fosses lombaires	small of the back
26- binçeng, binkefş	koltuk altı	l'aisselle	armpit
27- pûrtê binçengê, mûyê binçengê, pirça binçengê	koltuk altı kılı	les poils, axillaires	armpit hair
28-30 SÎNG, PÊŞÎR	GÖĞÜS	LE THORAX	THORAX (CHEST)
28-29 memik, çiçik	meme	le sein	Breasts
28- sermemik, gupika memikê	meme ucu	le mamelon	nipple
29- xala memikê	ayla	l'aréole	aréola
30- navçiçik, navmemik, sersîng	gögüs	la poitrine	bosom
31- navteng, newq	bel	la taille	waist
32- kêlek	yan, böğür	le flanc	flank (side)
33- qorik, kemax	kalça	le hanche	hip
34- navik	göbek	le nombril	navel
35-37 ZIK	KARIN	L'ABDOMEN	ABDOMEN
		(le ventre)	(stomach)
35- serzik	kann üst bölgesi	l'épigastre	upper abdomen
36- til	alt karın	l'hypogastre	abdomen
37- binzik, zikê piçûk	göbek altı	le bas-ventre	lower abdomen
38- berran	kasık	l'ain	groin
39- berzik, rûv, rêv	ferç, etek	le pubis	puvenda (vulva)
40- qûn, gurmik, tilmiqûn	kiç	la fesse	seat (backside, coll, bottom)
41- qelişteka qûnê	kiç yolu	le sillon, inter fessier	anal groove, anal cleft
42- qurmiçka qûnê	kiç kırışığı	le sillon sous fessier	gluteal fold

Anatomiya mirov

(dûmahîka hejmar 3an)



43-54 ENDAMÊN, LAŞÎ	UZUVLAR, KOL VE BACAKLAR	LES MEMBRES	LIMBS
43-48 ÇENG, MIL, ÇEPİL, PÎ	ÛST UZUV	LE MEMBRE SUPERIEUR	ARM
43- bend, pazû	kol	le bras	upper arm
44- qurmiçka enîşkê	dirsek kırışığı	le pli du coude	crook of the arm
45- enîşk	dirsek	le coude	elbow
46- zend, bask, bazend	bilek, alt kol, önkol	l'avant-bras	forearm
47- dest	el	main	hand
48- kulm, mist,	yumruk	le poing	fist (clenched clenched hand) fist.girmist
49-54 LING, QOR	BACAK	LE MEMBRE INFÉRIEUR	LEG
49- ran, hêt	bud	la cuisse	thigh
50- çok, jinû	diz	le genou	knee
51- binçok, binjinû	diz altı	le creux poplité	popliteal space
52- çip, çim	bacak	la jambe	shank
53- paq, baq	baldir	le mollet	calf
54- pê	ayak	le pied	foot

Lêkerên hevedudanî

(verbes composés)

Amadekar : Rojen BARNAS

Di kurmançî de du cur lêker hene ku ya pêşî lêkerên bingehîn in. Lêkerên bingehîn, besî in ku di gewda lêkerê di halê mesderî (infinitif) de perçeyên dîtir wekî navdêr (ism/substantif), rengdêr (sifet/adjectif), hoker (zêrf/adverbe), pronav (zemir/pronom), pêrkît (préfix) an parkît (suffix) tune ne. Gewda lêkerê ya di halê mesder (infinitif) de xwerû ye.

Cura diduyan lêkerên hevedudanî (verbes composés) ne, ku gewda lêkerê bi piranî ji lêkerê û ji pêrkîteke xwerû an ji pêrkîteke hevedudanî, ji navdêrekê, ji rengdêrekê, an ji hokerekê pêk tê.

LÊKERÊN HEVEDUDANÎ YÊN

A. Tofa Pêşîn

1. Lêkerên hevedudanî yên ku ji pêrkîteke xwerû û ji lêkerê pêk tên:

da	:	dadan, dahatin, daketin, dawêşandin, dakirin.
hil	:	hılanîn, hilavêtin, hilawistin, hildan, hilkirin.
ra	:	rabûn, rakişandin, rakirin, raxistin.
ve	:	vebûn, vedan, vejîn, vekirin, vekuştin, veniştin.
vê	:	vêketin, vêxistin.
we	:	weşandin.
wer	:	wergirtin, wergelandin.

2. Lêkerên hevedudanî yên ku ji pêrkîteke hevedudanî û ji lêkerê çêdibin.

Pêrkîten hevedudanî

jê	=	ji	+ wê/wî
lê	=	li	+ wê/wî
pê	=	bi	+ wê/wî
tê	=	di	+ wê/wî

Herwekî tê dîtîne pêrkîten hevedudanî ji daçekek û ji pronavek pêk tên.

LÊKERÊN HEVEDUDANÎ YÊN BI JÊ, LÊ, PÊ, TÊ ÇÊBYÎ:

jê	:	jêkirin
lê	:	lêkirin
pê	:	pê vedan
tê	:	têderxistin, têgihandin, têgihîştin, têxistin.

Rastnivîsîna lêkerên hevedudanî yên ku bi jê, lê pê û tê çêdibin:

a) Di lêkerên mîna jêkirin, lêkirin, têgihîştin ku pêrkîten wan hevedudanî ne û di laperandinê de ev pêrkît ji hevûdu nabişifin, divê pêkve bêne nivîsandin. Herwekî:

lêkirin (ava kirin, nivîsîn): Min diwar lêkir.
Min xanî lêkir.
Ez xanî lédikim.

b) Di lêkerên ku pêrkîten wan ên hevedudanî di laperandinê de ji hev dibişifin, divê pêrkît ji lêkerê cihê bête nivîsandinê.

Herwekî:

bar lê kirin: Min barê xwe li kerê kir.

3. Lêkerên hevedudanî yên ji pêrkîteke navdêrî, rengdêrî an hokerî û ji lêkerê çêdibin.

Pêrkît herçend wek navdêr/rengdêr an hoker xwiyan bike jî, li vê derê erka wê êdî ne navdêrî/rengdêrî an hokerî ye, lêbelê tiqûtenê pêrkîtbûn e. Ji ber hindê pêrkît jêderka wê ji çî cur gotîne hatibe bila were, bi lêkerê ve tê nivîsîn.

P Ê R K Î T A

Lêkera

hevedudanî	hokerî	navdêrî	rengdêrî	lêker
berdan	ber	-	-	+ dan
berketin*	ber	-	-	+ ketin
çêbûn	-	-	çê	+ bûn
çêkirin	-	-	çê	+ kirin
derkirin	der	-	-	+ kirin
derxistin	der	-	-	+ xistin
girêdan	-	girê(k)	-	+ dan
rêdan	-	rê	-	+ dan
rêkirin**	-	rê	-	+ kirin
rokirin	-	ro	-	+ kirin
rûdan	-	rû	-	+ dan
rûniştin	-	rû	-	+ niştin

* *berketin* lêkerê hevedudanî ye, bi/li ber ketin biwêjeke (tabîr) lêkerî ye.

** *rêkirin* lêkerê hevedudanî ye, bi rê kirin biwêjeke lêkerî ye.

Xusûsiyetên laperandina lêkerên vê tofê:

a) Di laperandina zemanên fermanî (imperatif), dahatû (futur), bilaniya bûrî (imparfait du subjonctif) û şertê bûrî (conditionnel 1ère forme) de; berlêkera bi-nayê bikaranîn.

Herwekî:

Çêke, rabe, lêxe. Ne ku: Çêbîke, rabîke, lêbîxe.
Ezê çêkim, ezê rabim, ezê lêxim.
Min çêkira, ez rabûma, min lêxista.
Minê çêkira, ezê rabûma, minê lêxista.

b) Berlêkera di- wek qatîdeyek gelemper tê ber koka lêkera eslî.

<p>Herwekî:</p> <p>rabûn</p> <p>gewda lêkerê : rabûn</p> <p>pêrkît : ra</p> <p>koka lêkerê/ lêkera eslî : bûn</p> <p>paşlêker : -n</p> <p>rabûn : ez radibim, ez radibûm.</p> <p>çêkirin : ez çêdikim, min çêdikir.</p> <p>Lê wek îstisna li hin navçeyên mîna Bişêriyê, Hevêrkan û Torê ev berlêkera di- di pêşiya gewdê de wekî ku lêkereke xwerû be tê bikaranîn.</p> <p>Herwekî: dirabim, dirabûm, dilêxim.</p> <p>c) Di laperandina neyînî (négation) ya lêkerên vê tofê de berlêkerên neyîniyê wekî me-, ma-, ne- dikevîne navbera pêrkîtê û lêkera eslî.</p> <p>Herwekî: Ez ranabim, ez ranedibûm, ezê ranebim, ramebe, bila ranebe.</p> <p>B. Tofa diduyan</p> <p>Lêkerên hevedudanî yên vê tofê ji navdêrekê an rengdêrekê û ji lêkerêkê pêk tî.</p> <p>1. Navdêr an rengdêr + lêker:</p> <table border="0"> <tr><td>Ava bûn</td><td>Ava kirin</td></tr> <tr><td>Hazir bûn</td><td>Hazir kirin</td></tr> <tr><td>Pîr bûn</td><td></td></tr> <tr><td>Qaîl bûn</td><td>Qaîl kirin</td></tr> <tr><td>Vala bûn</td><td>Vala kirin</td></tr> <tr><td>Av dan</td><td></td></tr> <tr><td>Guh dan</td><td></td></tr> <tr><td>Mikur hatin</td><td></td></tr> <tr><td>Rast hatin</td><td></td></tr> <tr><td>Limêj kirin</td><td></td></tr> <tr><td>Nas kirin</td><td></td></tr> </table> <p>2. Lêker + navdêr, rengdêr an hoker</p> <table border="0"> <tr><td></td><td>Anîn cih</td></tr> <tr><td></td><td>Çûn ava</td></tr> <tr><td></td><td>Dan pey</td></tr> <tr><td></td><td>Ketin pey</td></tr> <tr><td></td><td>Kirin der</td></tr> </table>	Ava bûn	Ava kirin	Hazir bûn	Hazir kirin	Pîr bûn		Qaîl bûn	Qaîl kirin	Vala bûn	Vala kirin	Av dan		Guh dan		Mikur hatin		Rast hatin		Limêj kirin		Nas kirin			Anîn cih		Çûn ava		Dan pey		Ketin pey		Kirin der	<p>Di laperandina (kişandina) teşeyên erîni û neyîni de ya tê laperandine lêker bi xwe ye, perçeyên dinê yên wekî navdêr, rengdêr an hoker nayên laperandine. Di rastnivîsina lêkerên hevedudanî de gava lêker bin hêmanên lêkerê ji hevûdu cihê, gava navdêr bin pêkve tene nivîsîn. Herwekî:</p> <table border="0"> <tr><td><u>Lêker</u></td><td><u>navdêr</u></td></tr> <tr><td>Av dan</td><td>avdan</td></tr> <tr><td>Rast hatin</td><td>rasthatin</td></tr> </table> <p style="text-align: center;">BIWÊJÊN (TABÎRÊN) LÊKERÎ (<i>locution verbales</i>)</p> <p>Biwêjên lêkerî ji hêmaneke lêkerî çî xwerû an hevedudanî û ji çend hêmanên dinê yên nelêkerî pêk tî. Ev hêman wekî pêşdaçek (préposition), paşdaçek (postposition); pronav, rengdêr an ji navdêr in.</p> <p>ji lêkerên tabîrî çend numûne:</p> <table border="0"> <tr><td>Biwêja lêkerî</td><td>Navdêr</td></tr> <tr><td>Bin av bûn</td><td>binavbûn</td></tr> <tr><td>Li hev ketin</td><td>lihevketin</td></tr> <tr><td>Bi hev ketin</td><td>bihevketin</td></tr> <tr><td>Li ber xwe ketin</td><td>liberxweketin</td></tr> <tr><td>Hatin ser xwe</td><td></td></tr> <tr><td>Lê gerîyan</td><td>lêgerîn</td></tr> <tr><td>Bi rê ketin</td><td>birêketin</td></tr> <tr><td>Ji hev danîn</td><td></td></tr> <tr><td>Li berdan</td><td></td></tr> <tr><td>Dev jê berdan</td><td></td></tr> <tr><td>Dest pê kirin</td><td></td></tr> <tr><td>Baweriya xwe (pê) kirin</td><td></td></tr> <tr><td>Bala xwe dan</td><td></td></tr> <tr><td>Ji bîr rakirin</td><td></td></tr> <tr><td>Berê xwe dan</td><td></td></tr> <tr><td>Dnîn ber hev</td><td></td></tr> </table>	<u>Lêker</u>	<u>navdêr</u>	Av dan	avdan	Rast hatin	rasthatin	Biwêja lêkerî	Navdêr	Bin av bûn	binavbûn	Li hev ketin	lihevketin	Bi hev ketin	bihevketin	Li ber xwe ketin	liberxweketin	Hatin ser xwe		Lê gerîyan	lêgerîn	Bi rê ketin	birêketin	Ji hev danîn		Li berdan		Dev jê berdan		Dest pê kirin		Baweriya xwe (pê) kirin		Bala xwe dan		Ji bîr rakirin		Berê xwe dan		Dnîn ber hev	
Ava bûn	Ava kirin																																																																								
Hazir bûn	Hazir kirin																																																																								
Pîr bûn																																																																									
Qaîl bûn	Qaîl kirin																																																																								
Vala bûn	Vala kirin																																																																								
Av dan																																																																									
Guh dan																																																																									
Mikur hatin																																																																									
Rast hatin																																																																									
Limêj kirin																																																																									
Nas kirin																																																																									
	Anîn cih																																																																								
	Çûn ava																																																																								
	Dan pey																																																																								
	Ketin pey																																																																								
	Kirin der																																																																								
<u>Lêker</u>	<u>navdêr</u>																																																																								
Av dan	avdan																																																																								
Rast hatin	rasthatin																																																																								
Biwêja lêkerî	Navdêr																																																																								
Bin av bûn	binavbûn																																																																								
Li hev ketin	lihevketin																																																																								
Bi hev ketin	bihevketin																																																																								
Li ber xwe ketin	liberxweketin																																																																								
Hatin ser xwe																																																																									
Lê gerîyan	lêgerîn																																																																								
Bi rê ketin	birêketin																																																																								
Ji hev danîn																																																																									
Li berdan																																																																									
Dev jê berdan																																																																									
Dest pê kirin																																																																									
Baweriya xwe (pê) kirin																																																																									
Bala xwe dan																																																																									
Ji bîr rakirin																																																																									
Berê xwe dan																																																																									
Dnîn ber hev																																																																									

<p style="text-align: center;">JI KLASÎKÊN KURDÎ</p> <p style="text-align: center;">F erhengoka</p> <p style="text-align: center;">D îwana Cegerxwîn</p> <p style="text-align: center;">- I -</p> <p style="text-align: center;"><i>Amadekar : Khosrow ABDOLLAHÎ</i></p> <p><i>Di çerçewa bernameya xebata li ser afirandinên klasîkên kurdî em di vê hejmara Kurmancî de ferhengokeke Dîwana Cegerxwîn belav dikin. Ev ferhengok li ser bingehê Dîwana yekem hatiye pêk anîn. Eslê peyvên ku ne xwerû kurmancî ne di nav kevanekê de hatiye nîsan dan :</i></p> <p>A</p> <p>Abidar (f.) avdar, bi av, pîr bi av; zebêş abidar e; bi av e.</p> <p>Aheng miqam, melodî</p> <p>An (f.) ew, ewa</p> <hr/> <p>(e.) : erebî ; (f.) : farişî ; (fr.) : fransîzî ; (t.) : tirkî</p>	<p>Ap mam</p> <p>Arezû (f.) daxwaz, xwezî</p> <p>Asitan (f.) erd, cîh</p> <p>Ateş (f.) agir</p> <p>Ateşîn (f.) agirîn, pîr ji agir</p> <p>Avanî avahî</p> <p>Awaz deng, awazê bilûrê:dengê bilûrê</p> <p>Ayîn rêç, dîn; ayîne Kurdan yê berê zerdeştî bû.</p> <p style="text-align: center;">B</p> <p>Bad ba; bayê havînan pîr gurr nîne.</p> <p>Badegîr (f.) meygir</p> <p>Balafir firoke, teyare</p> <p>Barî Xwedê, Barî Teala, (e.) xwedêyê mezin</p> <p>Bazîn bezîn</p> <p>Başok épervier (fr.)</p> <p>Bedgo (bed gotin), pîsî-bêj, dev-pîs</p> <p>Bedxwaz xêmxwaz, pîsxwaz</p> <p>Bêgan bêgane: biyanî</p> <p>Behîv badem (f.), amande (fr.)</p> <p>Behmen 1) navê yekemîn Şahê bine-mala keyaniyan, 2) navê firîşteyekê ye di dîne zerdeştî de.</p> <p>Behram 1) navê serdarekî pîr bi nav</p>	<p>û deng ê zemanê Hormozê Çaharan şahê Sasaniyan e. 2) navê stêrkekê ye 3) navê firîşteyekê ye di dîne zerdeştî de.</p> <p>Benc beng, giyayê bengê</p> <p>Bende kole,</p> <p>Ber hasil, ber birin serî: hasil kirin</p> <p>Ber kevir; di ser me de ber dibarin: di ser me kevir dibarin</p> <p>Berbadî çûn berbad bûn, ji dest çûn</p> <p>Berberî îxtîlaf, duberekî</p> <p>Beyaban, biyaban çol</p> <p>Beşt kêran</p> <p>Bêmirês bê mirûz, bê sîkûm</p> <p>Bênîn bîn kirin, gulê bibênin : gulê bîn bikin</p> <p>Bêserî bê xwendan, bê serok û bê rehber</p> <p>Bêş 1) bac: filan kes hate bêş kirin : bac ji wî hate stendin, 2) malîyat, filan kesê bêşa xwe daye : filan kesê malîyata xwe daye.</p> <p>Bi hezar rengî bi hezar awayî</p> <p>Bihuşt bêhişt, cinnet (e.)</p> <p>Bijarte élite (fr.)</p>
---	---	---

Meyger	kesê ku di meyxanê de meyê di gerîne, saqî	Pêyxam (f.)	mesaj	Siyehgûnpoş (f.)	wekî reş li xwe kirî
Mezra kirin	mêze kirin, nêrîn	Pêşrew	pêşeng	Sifirne	sîvander
Mêlak	kezeb (kezev)	Pişkoj	hebin, bendê ku davêjin serê sing û bi wî kon girêdidin	Sikke (e.)	polik
Mijde (f.)	mizgînî	Polad	pola	Siyah (f.)	reş
Mirdal	mirdar	Pûtxane	cihê pûtan	Siyahçerd (f.)	reşolekî
Mirdû (s.)	mirî			Sîma (f.)	rû, sûret
Miskar	kaniya ava madenî			Sîwak (e.)	miswaka erebî ku hecî ji hecê tînin û pê didanên xwe paqij dikin
Mitêl, miñil	lihêf				
Mitan	mîntan, kiras			Stêle	beradayî
Moxil	cureyek bêjîngê			Surşirîn	dilrevîn
Murx (f.)	miñîşk, teyr, murxê bazî, teyrê bazî			Suxen (f.)	peyv, axavtîn
Muxbeçe	zarokên ku di zemanê berê de di meyxanan de meygirî dikirin.			Sûxte (f.)	şewitî (ji derdan)
Mûdî	şûm, bedyûm				
N		Q		Ş	
Nagah (f.)	nişkave	Qad	meydan, cih, erd	Şadî	şahî
Nagehan (f.)	nişkave	Qadûk	beroseke piçûk	Şanî dan	nîşan dan
Namidar (f.)	navdar, bi nav û deng	Qed û qamet (e.)	bejn û bal	Şax (s.)	çiya
Naqos (e.)	zengil	Qend	şekir	Şeb (f.)	şev
Nasazî	nesazî	Qeraş	aşvan	Şebnem (f.)	xunav
Nasufte (f.)	qul nekirî	Qerij	qirêj, gemar	Şecaet (e.)	dilêrî, mêrxasî
Naşor	perçeyê ji risê zirav	Qerpal	1) cilên kevn û ji hev ketî, 2) li ser hev û din de kom-bûn û kevnare bûn	Şek	derb, şekel lê da, derbek lê da
Nebîrbîr	kure-fem	Qerqef	surahî, cama şerabê	Şekeramîz (f.)	şekirdar
Nemerdd	bêbext, ne camêr	Qewî (e.)	xurt, qewîn	Şel	şil, nexweşiya şilbûnê
Nepax	pişik an tîfik a hesinkeran, soufflet (fr.),	Qews û qezeh (e.)	keskesor	Şekerxend (f.)	şekir ken
Nermî	musamaba, tolerance (fr.)	Qirak	qijika reş	Şewişîn	muwazena xwe winda kirin, perde le'équilibre (fr.)
Nêrdewan	derence, pêlekan	Qunbere, Qurix	stêrkeke ku durust di nîveka havînê de der dikeve û pîr jî bi şemal e.	Şewq û tereb (e.)	şahî û xweşî
Nêrîz	cureke xencer	Qutb (e.)	serok, ji hemûyan mezintir	Şext	şexte, perçe perçe bûn
Nihan	nihên, veşartî			Şeyda (f.)	bê tewat, evîndar
Nijdevan	rêbirr, rêgir			Şeyl (e.)	hal û hereket
Nik	cem, ba, nik min: cem min, ba; min			Şêrîn	dengê kewê nêr gava ku dixwîne
Nuxwurî, nûxwîrî	zaroyê yekemîn			Şêt (s.)	dîn; şêt bûn: dîn bûn
				Şikêr	kevîrên gir ên li ser hev di çiyân de
P		R		T	
Paketeb' (k+e.)	pak+teb': paqij tînet	Rastgo	rastbêj	Tar	tarî
Pare (f.)	pirtî, pare pare bûn, pirtî pirtî bûn	Raz (f.)	sirr	Tazî (f.)	ereb
Pargon, pargûn	coyêke piçûk e ku li dora kon, çadir an her tiştekî din vedidin, ji bo ku ava baranê neçe hindur.	Reftar (f.)	tevger, helwest	Taçîk	taçîk, faris
Parsek	kesê ku parsê dike	Reg	reh, bê reg: bê reh	Tebeqe (e.)	qat
Parsîw	parsû	Renber, rêncber	zehmetkêş, emekdar	Tebîb (e.)	doxtor, bijîşk
Paye	derece, paya mamostatiyê	Rewa	cayîz	Teblix (e.)	reklam, nasandin
Pehlewan	mirovêkî pîr xurt û bi qewat	Rêberî	rehberî	Telebkar (e.+k.)	deynxwaz
Perwane, pervane (f.)	minminîk, pepûle, pipirok	Ritbe (e.)	derece, paye	Temezî	sermala rengîn a ku keç û jin li dora kofîya xwe dialînin an dialandî
Perwa	tîrs; bê perwa: bê tîrs, bê minet	Rîp	fêl, hîle	Ten	beden, laşê mirov
Pesendîde (f.)	baş, bijartî	Robar	çem	Tenha	tenê, bi tenê
Peyam (f.)	mesaj, wilam	Rojcebûn (k+e.)	enî ya wê wekî rojê ye	Terbûş (e.)	şaşîk
Peyk (f.)	qasid	Rux (f.)	rû	Ters	heywanên kedî kirî
Pêlek	demek, qasek	Ruxsar (f.)	rû, sûret	Terx	bê qusûr, bê 'eyb
Pêrgî	berve çûn; ez çûbûm pêrgîya wî: ez ber wî ve çûbûm.	Rûmah (f.)	rûyê wê wekî hîvê ye	Tewizîn	têk çûn
Pêtazî	pêxas	Rûnpêj	tawe, miqilîk, rûnbirêşk	Text û pa	hukum, selteten
		Rûro, rûroj	rûyê wê wekî kilora rojê ye	Teylesan (e.)	1) şaşîka dora kumê melan, 2) xirx
		Rûsiyahî (f.)	rûreşî	Têrmal	zengîn, dewlemend
				Tifaq (e.)	hevgiirtin, yekîti
				Tiral	tembel
				Tix (f.)	keybir, teraşa (cilêta) ku mirov pê rihê xwe diteraşe

Tog	bêheya, effrontée (<i>fr.</i>)	Xap	xapîn, fêl	Ûemze (<i>e.</i>)	1) bijang, 2) naz û tîz
Tol	jina daw ne paqij, jina doxîn sist	Xedeng	tîreke rast û dirêj ku ji dara gezê dihate çêkirin	Ûemzerim (<i>e.+k.</i>)	bijangrim, bijang wekî rimê
Tor û tey	tim û tim	Xerîdar (<i>f.</i>)	muşterî, kiriyar	Ûerîq (<i>e.</i>)	xenîqî
Torîk	çeçel; chacal (<i>fr.</i>)	Xeste (<i>f.</i>)	1) nexweş, 2) westiyayî	Ûezeb (<i>e.</i>)	hêrs, bela
Tûre, torre (<i>e.</i>)	bisk, serê biskan	Xezan (<i>f.</i>)	payîz	Ûunce, Ûunçe (<i>f.</i>)	bişkoja gulê
V		Xeşm (<i>f.</i>)	hêrs, pertû; brutalité (<i>fr.</i>)	Y	
Vebestîn	careke din girêdan	Xol	zeng, şîşa ku serê wê tûj e xwelî	Yadigar (<i>f.</i>)	diyarî
Vejin, vejyan	vejiyandin, careke din zindî bûn an zindî kirin	Xubar, Xubar (<i>f.</i>)	toz	Yar	heval, dost
Vewestan	rawestan	Xuda	Xwedê	Yekser	hemû, pêkve, têkre
Vîn	evîn	Xumpare (<i>f.</i>)	mêrkuj; meurtier (<i>fr.</i>)	Yeksû (<i>f.</i>)	1)yekalî, 2) wekhev
W		Xurd (<i>f.</i>)	xwarin	Yema, yexma (<i>f.</i>)	talan, yexma kirin, talan kirin
Waris (<i>e.</i>)	mîratxwer	Xurşîd (<i>f.</i>)	tav, hetav	Yexsîr	dîl, êsîr
Wer	eger, heke	Xwedan	Xwedî, xweyî, sahib	Yezd Gurd	şahêk ji şahên xanedana Sasaniyan
X		Xweser	1) otoriter (<i>fr.</i>), despot (<i>fr.</i>) 2) otonom	Yezdan	xwedê di dînê Mezdayî de
Xak	ax; xaka Kurdistan: axa Kurdistan	Xweserî	1) otoritarîzm, despotîzm (<i>fr.</i>), 2) otonomî (<i>f.</i>)	Z	
Xaltîk	xatî, xûşka dayika mirov	Xweşnewaz (<i>f.</i>)	xweş aheng	Zax (<i>f.</i>)	qijika reş
Xame (<i>f.</i>)	qelem, pênûs	Û		Zehr (<i>e.</i>)	gul
Xan û sera	koşk û qesr	Ûed-dar (<i>e.</i>)	zordar, stemkar	Zehr (<i>f.</i>)	jehr, jar
		Ûemhilgir (<i>e.+k.</i>)	kesekî ku xema kesên din dixwe an dikişîne	Zendî	zindî, zindû, jîndar
				Zinnar (<i>e.</i>)	kemberbend
				Zingar	jeng
				Zuhd (<i>e.</i>)	xwe parêziya dînî

Ji pîrsgirêkên rêzimanî Raweya neyînî

Amadekar: Reşo ZÎLAN

<p>Di zaravayê kurmançî de raweya neyînî ya perçeyên axaftinê yên wek ber- nav, rengdêr, hoker, daçek, navdêr, gihanek, baneşan û hwd bi alîkariya pirtika neyînî ya ne-yê têne çêkirin. Di rewşên holê de pirtika ne-yê ser- bixwe ye, cihê û bi tena serê xwe tete nivîsîn. Di raweya neyîniyê de pirtika ne-yê her tim tete pêşiya parçeya axaftinê ya ku divê bête neyînî kirin. Bo nimûne:</p> <p>Raweya erîni</p> <p>Yê ku ew gotiye, ez im. Av sar e. Ma tu sibehî diçê gund? Ev diyariya ji bo min e? Ew zeviya han zeviya Dara ye. Zizê weke te kej e.</p> <p>Lo, lo!</p> <p>Raweya neyînî</p> <p>Yê ku ew gotiye, ne ez im Av ne sar e. Ne sibehî, lê dusibehî. Na, ew ne ji bo te ye. Ew zevî ne zeviya Dara ye. Zizê ne weke min, lê weke Fodilê kej e. Ne lo lo, lê lê!</p> <p>Awarte: Di hin devokên kurmançî de, di rex vî awayê han yê jorîn de, awayekî din yê raweya neyînî jî heye. Heçî ew rawe ye, herwekî hin zaravayên din yên kurdî, bi alîkariya nîne ve tete çêkirin. Ev gelek caran yan hema bi dû rengdêr, hoker, daçek, navdêr, gihanek, baneşan û hwd re têt yan jî diçe dawîya hevokê. Herwekî pirtika ne-yê, nîne jî peyveke serbixwe ye û cihê û bi tena serê xwe tete nivîsîn. Bo nimûne:</p>	<p>Lîloz ew nîne. Av sar nîne. Ew zevî zeviya Dara nîne. Lo lo nîne, lêlê ye! Na, ew ji bo te nîne. Rojbûna min sibehî nîne, dusibehî ye. Ew bi şekir nîne.</p> <p>Lê herwekî emê piştê jî çêl bikin, nîne bi xwe raweya neyînî ya hebûnê ye, angò: nînbûn, tunebûn. Ji lewre jî ew li gor bernavan tete tewandin.</p> <p>Neyîniya bi vî awayî, hem di zimanê axaftinê û hem jî bi teybetî di zimanê nivîsandinê de hin tevlihevî û aloziyan tîne pêş. Bo nimûne, heke Kurmancek ji hêla bakurê Kurdistanê bibêje «Konê min nîne.» dê Kurmancek ji hêla Botan, Toriyan, Behdînan û hwd welê têbigihê, ku ew dibêje «Min kon nîne.» angò «Konê min tune ye.»</p> <p>Ji ber vê têkilhevî û aloziyê, divê em hewil bidin da ku bi kêmanî di zimanê nivîsandinê de vê forma han ya neyîniyê nehête bi kar anîn.</p> <p>RAWEYA NEYÎNÎ YA LÊKERA «BÛN»Ê</p> <p>A. Dema niha Herwekî ku li jorê jî diyar dibe, pirtika neyînî ya ne-yê her tim tete pêşiya perçeyên axaftinê yên tével. Ew her dîsan serbixwe ye. Di hevokan de,</p>
--	---

cihê û bi tena serê xwe ye û wilo jî têtê nivîsîn. Ew li gor bernavan nahê-te tewandin. Lê herwekî ku li jêrê jî dixuyê, guhartoya devokî her tim li gor bernavan têtê tewandin. Di pêkhatineke weha de êdî ew rola lêkerekê neyînkiri dilîze. Wek:

1. Li gor qaîdeya **bêdeng - dengdar - bêdeng** (B+D+B):

<u>Raweya erîni</u>	<u>Raweya neyîni</u>	<u>Guhartoya devokî</u>
Ez cotkar im.	Ez ne cotkar im.	Ez cotkar nînim.
Tu şagirt î.	Tu ne şagirt î.	Tu şagirt nîni.
Ew gavan e.	Ew ne gavan e.	Ew gavan nîne.
Em Kurd in.	Em ne Kurd in.	Em Kurd nînin.
Hûn sazband in.	Hûn ne sazband in.	Hûn sazband nînin.
Ew çûk in.	Ew ne çûk in.	Ew çûk nînin.

2. Li gor qaîdeya **dengdar - bêdeng - dengdar** (D+B+D):

Ez gundî me.	Ez ne gundî me.	Ez gundî nînim.
Tu bajarî yî.	Tu ne bajarî yî.	Tu bajarî nîni.
Ew rovî ye.	Ew ne rovî ye.	Ew rovî nîne.
Em zane ne.	Em ne zane ne.	Em zane nînin.
Hûn akincî ne.	Hûn ne akincî ne.	Hûn akincî nînin.
Ew çiyayî ne.	Ew ne çiyayî ne.	Ew çiyayî nînin.

Carina hin kes, gava ku forma guhartoya devokî bi kar tînin, wê lêkera tewandî ji hev vediqetînin û wek lêkerekê hevedudanî, cihê dinivîsin. Bo nimûne:

1. Li gor qaîdeya **B+D+B**

Ez cotkar nîn im.
Tu şagirt nîn î.
Ew gavan nîn e.
Em Kurd nîn in.
Hûn sazband nîn in.
Ew çûk nîn in.

2. Li gor qaîdeya **D+B+D**

Ez gundî nîn im.
Tu bajarî nîn î.
Ew rovî nîn e.
Em zane nîn in.
Hûn akincî nîn in.
Ew çiyayî nîn in.

Heçî pirtika *im, î, e, û in e*, mirov dizane ew tewangên lêkera *bûn-ê* ne. Lê heçî pirtika *nîn e*, wek xuya ye, rola pirtika neyîniyê dilîze. Lê bele herwekî ku jê jî daî çav dibe, di guhartoya devokî ya neyîniyê de qaîdeya «D+B+D» derbas nabe. Ango lêkera *bûn-ê* li gor dengdarê berî xwe, yê ku di hevokê de, pêwîstî tewandinê nabe. Ji ber ku nîne bi bêdeng dest pê dîke, tewanga lêkera *bûnê jî*, her li gor qaîdeya «B+D+B»-yê dimîne.

Eşkere ye, ku nîne ji «nebûnê têt. Ji nebûnê re, di hin devokên kurmançî de, dibêjin nînbûn... Her çi be, heke ev forma han carina ji ber neçariyê bête bi kar anîn jî, divê pirtika nîn-ê bi lêkera bûn-ê ve bête nivîsîn.

DI DEMÊN LÊKERAN DE RASTNIVÎSÎNA NEYÎNIYÊ

B. Dema pêş

<u>Raweya erîni</u>	<u>Raweya neyîni</u>	<u>Guhartoya devokî</u>
Ez ê bibim.	Ez ê nebim.	Ez ê nînbim.
Tu ê bibî.	Tu ê nebî.	Tu ê nînbî.
Ew ê bibe.	Ew ê nebe.	Ew ê nînbe.
Em ê bibin.	Em ê nebin.	Em ê nînbîn.
Hûn ê bibin.	Hûn ê nebin.	Hûn ê nînbîn.
Ew ê bibin.	Ew ê nebin.	Ew ê nebin.

Li vir, pîrsa sereke ya ku ji aliyê rastnivîsînê de derdikeve pêşiya me, ew e: aya em ê pirtika NE-yê, wek li jorê, di gel lêkerê, pêkve binivîsin? Yan divê em wê, wek li jêrê, cihê û bi tena serê xwe binivîsin? Ango:

Ez ê ne bim.
Tu ê ne bî.
Ew ê ne be.
Em ê ne bin.
Hûn ê ne bin.
Ew ê ne bin.

Têbînî: Herçendî ji aliyê pêkhatina zimanê kurdî de cihê nivîsandina yê pirtikê rastir be jî, ku piraniya zimanên hindoewrûpî welê dinivîsin, di pêk ve nivîsandinê de feyde bêtir e. Sûd û feydeya herî mezin, bê guman ya pedagojîk e. Pêkve nivîsandina pirtika neyîniyê hem di nivîsandin û xwandin, hem di bilêvkirin û hem jî di hinkirinê de hêsanî kû gengaziyên gelêkî mezin derdixîne.

C. Dema boriya berdest

<u>Raweya erîni</u>	<u>Raweya neyîni</u>
Ez dibûm	nedibûm
Tu dibûyî	nedibûyî
Ew dibû	nedibû
Em/Hûn/Ew dibûn	nedibûn

D. Dema boriya têdeyî

Ez bûm	nebûm
Tu bûyî	nebûyî
Ew bû	nebû
Em/Hûn/Ew bûn	nebûn

E. Dema boriya çirokî

Ez bûbûm	nebûbûm
Tu bûbûyî	nebûbûyî
Ew bûbû	nebûbû
Em/Hûn/Ew bûbûn	nebûbûn

F. Dema boriya dûdar/sade

Ez bûme	nebûme
Tu bûyî	nebûyî
Ew bûye	nebûye
Em/Hûn/Ew bûne	nebûne

G. a) Reweya hekinî: Dema borî I

Ez bûma	nebûma
Tu bûya(yî)	nebûya(yî)
Ew bûya	nebûya
Em/Hûn/Ew bûna	nebûna

G. b) Dema borî II

Ez ê bibûma	ê nebûma
Tu ê bibûya(yî)	ê nebûya(yî)
Ew ê bibûya	ê nebûya
Em/Hûn/Ew bibûna	ê nebûna

H. a) Raweya bilanî: Boriya berdest.

Ez bûbiwam	ne bûbiwam
Tu bûbiwa	ne bûbiwa
Ew bûbiwa	nebûbiwa
Em/Hûn/Ew bûbiwan	nebûbiwan

H. b) Dema niha û pêş I

Ez bibim	nebim
Tu bibî	nebî
Ew bibe	nebe
Em/Hûn/Ew bibin	nebin

H. c) Dema niha û pêş II

Ku ez bim	nebim
Ku tu bî	nebî
Ku ew be	nebe
Ku em/Hûn/Ew bin	nebin

1. Raweya fermanî

a) Yekhejmar	Bibe! (be!)	nebe ! mebe !
b) Pirhejmar	Bibin! (bin!)	nebin ! mebin !

Têbînî: Di zaravayê kurmançî de du cure raweya fermanî hene. Yek ji wan bi alîkariya pirtika me-yê têtê çêkirin, ya din jî bi alîkariya pirtika ne-yê. Ferqa di navbera wan de ev e: «ME» her tim ferman e û fermaneke misoger e. Lê di ne-yê de tawsiye heye. Mixa bin, ku îro li ba hin Kurmancan me bi temamî asîmîle bûye û di şûna wê de bi tenê ne û forma bi wê têtê çêkirin, maye.

LÊKERA «HEBÛN»-Ê

A. Dema niha

<u>Raweya erînî</u>	<u>Raweya neyînî</u>	<u>Lêkera alternatîv</u>
Mîn heye	min nîne	... min tune
Te heye	te nîne	... te tune
Wî/Wê heye	wî/wê nîne	... wî/wê tune
Me/We/Wan heye	me/we/wan nîne	... me/we/wan tune

B. Dema pêş

Mîn dê hebe	min dê nînbe	... min dê tune be
Te dê hebe	te dê nînbe	... te dê tune be

C. Dema boriya têtdayî

Mîn hebû	min nebû	... min tune bû
Te hebû	te nebû	... te tune bû

D. Dema boriya çîrokî

Mîn hebû	min nebû	... min tune bû
Te hebû	te nebû	... te tune bû

E. Dema boriya dûdar

Mîn hebûye	min nebûye	... min tune bûye
Te hebûye	te nebûye	... te tune ye

F. a) Raweya hekinî; dema borî I

Mîn hebiwa	min nebiwa	... min tune bûya
Te hebiwa	te nebiwa	... te tune bûya

F. b) Dema borî II

Mîn dê hebiwa	min dê nebiwa	... min dê tune bûya
Te dê hebiwa	te dê nebiwa	... te de tune bûya

G. a) Raweya bilanî; boriya berdest

Mîn hebe	min nînbe	... tune be
Te hebe	te nînbe	... tune be

G. b) Dema niha

Mîn hebe	min nînbe	... min tune be
Te hebe	te nînbe	... te tune be

H. Raweya fermanî

Hebe!	Mebe!
Hebin!	Mebin!

LÊKERA «HEYÎN»Ê

A. Dema niha

Raweya erînî	Raweya neyînî
Ez heme	tune me
Tu heyî	tune yî
Ew heye	tune ye
Em/Hûn/Ew hene	tune ne

B. Dema boriya têtdayî

Ez hebûm	tune bûm
Tu hebûyî	tune bûyî
Ew hebû	tune bû
Em/Hûn/Ew hebûn	tune bûn

C. Dema boriya dûdar

Ez hebûme	tune bûme
Tu hebûyî	tune bûyî
Ew hebûye	tune bûye
Em/Hûn/Ew hebûne	tune bûne

D. Boriya çîrokî

Ez hebûm	tune bûm
Tu hebûyî	tune bûyî
Ew hebû	tune bû
Em/Hûn/Ew hebûn	tune bûn

E. Dema pêş

Ez dê hebim	dê tune bim
Tu dê hebî	dê tune bî
Ew dê hebe	dê tune be
Em/Hûn/Ew hebin	dê tune bin

F. a) Raweya hekinî; dema borî I

Ez hebûma	tune bûma
Tu hebûyayî	tune bûyayî
Ew hebûya	tune bûya
Em/Hûn/Ew hebûna	tune bûna

F. b) Dema borî II

Ez dê hebûma	dê tune bûma
Tu dê hebûyayî	dê tune bûyayî
Ew dê hebûya	dê tune bûya
Em/Hûn/Ew hebûna	dê tune bûna

G. a) Raweya bilanî; Boriya berdest

Ez hebûbiwam	tune biwam
Tu hebûbiwa	tune biwa
Ew hebûbiwa	tune biwa
Em/Hûn/Ew hebûbiwan	tune biwan

G. b) Raweya bilanî; Dema niha û pêş

Ez hebim	tune bim
Tu hebî	tune bî
Ew hebe	tune be
Em/Hûn/Ew hebin	tune bin

G. c) Dema niha û pêş II

Ku ez hebim	ku ez tune bim
Ku tu hebî	ku tu tune bî
Ku ew hebe	ku ew tune be
Ku em/hûn/ew hebin	ku em/hûn/ew/ tune bin

H. Raweya fermanî

Hebe!	mebe!
Hebin!	mebin!

RAWEYA NEYÎNÎ YA LÊKERAN

A. Dema niha

Da ku mirov lêkerê ku li gor dema niha hatiye tewandin bike raweya neyînî, divê mirov pirtika di ku pirtika dema niha ya lêkeran e, hilde. Di şûna wê de pirtika neyînî ya na-yê, ku lêker bi bêdengê dest pê bike, yan jî bi tenê n -yê, ku lêker bi dengdara «a»-yê dest pê bike, bi lêkerê ve binivîse. Bo nimûne:

Lêker	Raweya erîni	Raweya neyînî	Raweya Fermanı Neyînî
Kirin	Ez dikim Tu dikî Ew dike Em/Hûn/Ew	nakim nakî nake dikin nakin	meke!, neke! mekin!, nekin!
Nivîsîn	dinivîse	nanimivîse	menivîse!, nenivîse!
Sûtîn	disû	nasû	mesû!, nesû!
Jiyan/Jîn	dijî	najî	mejî!, nejî!
Barîn	dibare	nabare	mebare!, nebare!
Qajîn	dijaqe	naqaqe	meqaqe!, neqaqe!
Xwarin	dixwe	naxwe	mexwe!, nexwe!
Alastin	dialêse	nalêse	mealêse!, nealêse!
Eşin	diêşe	naêşe	meêşe!, neêşe!
Iskîn	diiske	naiske	meiske!, neiske!
Orîn	diore	naore	meore!, neore!
Ûrîn	diûre	naûre	meûre!, neûre!
Enîrîn	dienire	naenire	meenire!, neenire!

LÊKERÊN HEVEDUDANÎ

Dil şikandin	dil dişkêne	dil naşkêne	dil meşkêne!, dil neşkêne!
Lê xistin	lê dixe	lê naxe	lê mexe!, lê nexe!
Pê şewirîn	pê dişewire	pê naşewire	pê meşewire!, pê neşewire!
Jê rijandin	jê dirije	jê narije	jê merije!, jê nerije!
Tê dan	tê dide	tê nade	tê mede!, tê nede!
Vexwarin	vedixwe	venaxwe	vemexwe!, venexwe!
Dadan	dadide	danade	damede!, danede!
Raxistin	radixe	ranaxe	ramexe!, ranexe!
Derketin	derdikeve	dernamekeve	dermekeve!, dernamekeve!
Wergirtin	werdigire	wernagire	wermegire!, wernegire!
Hilavêtin	hildivêje	hilnavêje	hilmeavêje!, hilneavêje!

Hin ji Kumancan, raweya neyînî ya lêkerên bi pêspirtikên wek bi «ra-», «ve-», «der-», «hil-» û hwd ve hevedudanî ne lê di tewangê de ji hev nahêne veqetandin, her yekser pirtika na-yê bi serê lêkerê ve dinivîsin. Bi vî rengî raweya neyîniyê çê dikin. bo nimûne:

	vexwarin	navexwe		
	raxistin	naraxe		
	wergirtin	nawergire		
Lêkerên wek «karîn» û «zanîn»-ê bi pirtika ni-yê tene neyînî kirin. Wek;	Zanîn	dizane	nizane	mezane, nezane!
	Karîn	dikare	nikare	

B. Dema pêş

Raweya neyînî, di gişt demên pêş yên hemû lêkeran de (karîn û zanîn ne tede), her bi alîkariya pirtika «NE»-yê tene çêkirin. Wek;

Lêker	Dem
Çûn	ez ê neçim neçûma neçûbim

C. Dema borî

Hemû lêker, lêkera zanîn û karîn ne tede, di gişt demên borî de bi alîkariya pirtika ne-yê tene neyînî kirin. Bo nimûne;

Kirin	min	nekir
		nedikir
		nekiriye
		nekiribû

TERMÊN HIQÛQÎ

Amadekar : Musa KAVAL

kurdi	tirkî	fransîzî	îngilîzî
Kes	şahıs	personne	person
Kesane	şahsı	personnel	personal
Keşî	şahıs	personnel	personal
Kesahî	şahsiyet	personnalité	personality
Netewe	ulus	nation	nation
Neteweyî	ulusal	national	national
Neteweyîfî	ulusallık,	carectère national	nationhood
	millilik		
Neteweperwer	ulussever,	nationaliste, qui	nationalist
	ulusçu	aime sa nation	
Neteweparêz	ulusçu,	nationaliste,	nationalist -
	milliyetçi	qui défend	
		sa nation	
Neteweparêzî	ulusçuluk,	nationalisme	nationalism
	milliyetçilik		
Neteweperest	koyu ulusçu,	chauvin	chauvinistic
	şöven milliyetçi		
Navneteweyî	uluslararası,	international	international
Gelempêr	genel	général	general
Bi gelempêrî	genellikle,	généralement	generally
	genel olmak		
Giştî	kamu	public	public
Giştî	genel	général	general
Civat	toplum	société	society
Civafî, civakî	toplumsal	social	social
Exlaq, sinc	ahlak	morale, ethique	ethics
Seredan	görüŝme	visite	visit
Danberhevî	karşılaŝtırma	comparaison	comparaison
Dan ber hev	karşılaŝtırmak	comparer	to compare
Bi dananberhevî	karşılaŝtırmak	comparé	compared
Peyketin	takib	poursuite	pursuit,
			prosecution
Dad	adalet	justice	justice
Dadî, qeza	adli, tûzel	judiciaire	judicial
Hiqûq	hukuk	droit	law
Hiqûqî	hukuksal	juridique	juridical
Qanûn	kanun	loi	law
Hiqûqê neteweyî	ulusal hukuk	droit national	national law
Hiqûqê	uluslararası	droit international	international
navneteweyî	hukuk		law
Hiqûqê giştî	kamu hukuku	droit public	public law
Hiqûqê	karşılaŝtırmalı	droit comparé	compared law
danberhevî	hukuk		

Anatomiya mirov

(dumahîka hejmar 5)

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilizî
1 - 29 QERQÛDE, SKELET	ISKELET	SQUELETTE	SKELETON
1. kilox	kafatası	crâne	skul
2 - 5 Stûna piştê	bel kemiği	colonne vertébrale,	vertabral column
		épine dorsale	spinal column
movik	omur	vertèbre	vertebra
geh, girêçik	eklem	jointure	joint
2. movikên stû : 7 lib in,	boyun omurları	vertèbres cervicales	cervical vertebra
ji tevahiya wan re stûkurk tê gotin.			
3. movikên piştê : 7 lib in.	sırt omurları	vertèbres dorsales	dorsal vertebra
4. movikên mazmazkê		vertèbres lombaires	lumbar vertebra
hestiyê kortîxê	sağrı kemiği	sacrum	sacrum
5. kilêjî, hestiyê boçîkê	kuyruk kemiği	coccyx	coccyx
6 - 7 kembera mil		ceinture scapulaire	shoulder gridle
6. pirika mil	köprücük kemiği	clavicule	clavicle
7. bêrok, pîl	kürek kemiği	omoplate	shoulder blade
8 - 11 sebeta sîng, qefesa sîng, nîkeha sîng	göğüs	thorax	thorax
8. depê sîng	göğüs kemiği	sternum	breastbone
9. parsû	kaburga	côte	true rib
10. zirparsû, parsûyên kurt	serbest kaburgalar	côtes flotantes	false ribs
11. kirkirka parsûyê	kaburga kıkırdağı	cartilage costal	costal cartilage
12 - 14 mil, pî, bask, çeng	kol	bras	upper arm
12. lûla pazû	üst kol lülesi	humérus	humerus
13. lûlezenda zirav	döner kemik	radius	radius
14. lûlezenda stûr	dirsek kemiği	cubitus	ulna
15 - 17 dest	el	main	hand
15. hestiyên bazinê (qevdika) dest	bilek kemikleri	carpe	carpus
16. şeyvê dest	tarak kemikleri	métacarpe	metacarpal bone
17. hestiyên tiliyan	parmak kemikleri	phalanges du doigt	phalanx
18 - 21 legen, kodik	leğen, havsala	bassin	pelvis
18. hestiyê qorîkê, hestiyê kemaxê	kalça kemiği	os iliaque	ilium, hip bone
19. hestiyê qûnê	verek, iskiyon	ischion	ischium
20. hestiyê rûv	kasık kemiği	pubis	pubis
21. hestiyê kortîxê	sağrı kemiği	sacrum	sacrum
22-25. ling	bacak	jambe	leg
22. hestiyê ran, hestiyê hête	uyruk kemiği	fémur	femur, high bone

Civîna Stockholmê


Civîna şeşemîn a li ser zaravê kurmancî li Xwendegeha bilind a Biskops Arnö, nêzî bajarê Stokholmê, roja 12ê teşrînê dest pê kir û heya 18ê teşrînê dom kir.

Hevalên ku di vê civînê de beşdar bûn ev bûn: Rojen Barnas (Diyarbakir), Lutfi Baksî (Xerza), Mahmûd Baksî (Xerza), Cemal Batu (Mêrdîn), Xelil Dihokî (Dihok), Mûsa Kaval (Hekarî), Hazim Kiliç (Hekarî), Kendal Nezan (Diyarbakir), Huner Salim (Akrê), Mehmed Uzun (Swêrek), Reşo Zilan (Ağirî).




Civînê vê carê jî li ser peyvên hiqûqî û yê anatomiya mirov xebitî. Paşê Hazim Kiliç rapora xwe li ser termên ku di çandiniyê de tên bi kar anîn pêşkêş kir. Beşdar bi firehî li ser van peyvên rawestiyên.

Ewê civîna bihara 1990an giraniya xwe bide termînolojiya edebî û kurmanciya nivîskî ya *Hawar* û *Roja Nû*.

KURMANCÎ



23. serçok, serjinû, keşka çokê, çortanok, kasika çokê, kodika çokê	diz kapağı	rotule	patella, kneecap
24. lûlaqa zirav	kamış kemiği	péroné	fibula, splint bone
25. lûlaqa stûr, gûtik, hestiyê birçî	kaval kemiği	tibia	tibia, shin bone
26-29. pê	ayak	pie	foot
26. hestiyên	ayak bileği	tarse	tarsus
bazinê pê	kemikleri		
27. hestiyê paniyê	topuk kemiği	calcanéum	calcaneum, heelbone
28. hestiyên şeyê pê	ayak tarağı kemikleri	métatarse	metatarsus
29. hestiyên pêçiyân	ayak parmağı kemikleri	phalange de l'orteil	phalange
52-63. PÊ	AYAK	PIED	FOOT
pêçî	ayak parmağı	orteil	toe
52. pêçiya beranê, pêçiya mezin	ayak baş parmağı	gros orteil	big toe
53. pêçiya dirêj	orta ayak parmağı	deuxieme orteil	second toe
54. pêçiya navîn		troisieme orteil	third toe
55. pêçiya babelîçkê		quatrieme orteil	fourth toe
56. pêçiya qilîçkê	küçük ayak parmağı	petit orteil	little toe
57. neynûka pêçiyê	ayak parmağı tırnağı	ongle de l'orteil	toenail
58. girêka pê		éminence de l'articulation	ball of the foot
59. gûzika derve		malléle externe	lateral malleolus
60. gûzika hundir		malléle interne	medial malleolus
61. piştêpê	ayak sırtı	dos de pied	dorsum of the foot
62. hevêsa pê, zengiya pê, kefa pê	ayak tabanı	plante de pied	sole of the foot
63. panî	topuk	talon	heel
64-83. DEST	EL	MAIN	HAND
64. tiliya mezin, tiliya beranê	baş parmak	pouce	thumb
65. tiliya nişandanê	işaret parmağı	ilindex	index finger
66. tiliya navîn, tiliya dirêj	ortak parmak	majeur	middle finger
67. babelîçk, tiliya gustîlkê	yüzük parmağı	annulaire	ring finger
68. qilîçk, tiliya biçûk	küçük parmak	auriculaire	little finger
69.		bord radial de la main	radial side of the hand
70. teniştâ dest		bord cubital de la main	ulnar side of the hand
71. hevêsa dest, kefa dest	el ayası	paume	palm of the hand
72-74. xêzikên dest	el çizgileri	lignes de la main	lines of the hand
75. gurçika dest, nermika dest		éminence thénar	ball of the thumb
76. qevdika dest, bazinê dest		poignet	wrist
77. movikên tiliyan		phalange	phaan
78. gûpika tiliyê		pulpe de la phalangette	finger pad
79. sertilî	parmak ucu	bout de doigt	fingertip
80. neynûk	tırnak	ongle	nail
81. spîka neynûkê		lunule	lunule of the nail
82. girêkên dest		noeuds de l'articulation	knuckles
83. piştdest	el sırtı	dos de la main	back of the hand



Termên Çandinî

Amadekar : HazimKILIÇ

kurdi	tirkî	fransîzî	îngilîzî
nm. (navê nêr)	eril isim	masculin	masculine
nm. (navê mê)	dişil isim	féminin	feminine
çandin	tarım, ziraat	agriculture	agriculture
çandinî	tarımsal, ziraatsal	agraire, agricole	agrarian, agricultural
ber	ürün	produit	product, fruit
ber hilanîn	ürün almak, ürün kaldırmak	récolter	to harvest
erd, nm.	toprak, mülk, arazi	terre, terrain	earth, ground
ax, nm.	toprak	sol	soil
hêşinahî, şinkatî, nm.	yeşillik, nebat	légume	vegetable
xwelî, nm.	kül, toz	poussière, cendre	dust, ash
hêman, nm.	unsur, eleman	élément	element
xîz, şilik, sêlax, rîk, nm.	kum	sable	sand
xireber, xîçik, nm.	çakıl	gravier	gravel
gil, kîlte, nm.	kil	argile	clay
kîls, kîşil, nm.	kireç	chaux	lime
gêç, cixs, cils, cis, nm.	alçı	gypse	gypsum, plaster stone
humus, nm.	umus	humus	humus
axa bi xîz	kumlu toprak	sol sablonneux	sandy soil
axa bi kîlte	killi toprak	sol argileux	clayey soil
axa bi kîls	kireçli toprak	sol calcaire	chalky soil
kêlan, cot kirin,	toprak sürmek	labourer	to plough, to plow, to till
erd ajotin			
kêlangeh, nm.	sürtime ayrılmış toprak	terre de labourage	plowing land
kolan (bikole!)	toprağı kirizma etmek, kazmak	creuser, bêcher	to dig, to turn over (earth)
toz kirin	tohum ekmek	ensemencer, semer	to sow, to seed
mañgêr, nm.	tırmık, kùltivatör	herse	harrow
mañgêr kirin	tırmık çekmek	herser, biner	to harrow
binkol, tivrik, nm.	çapa	houe, hoyan	hoe, mattock
binkol kirin, tevrik kirin	çapalamak	houer	to hoe
şene, nm.	tırmık	râteau	rake
şene kirin	tırmıklamak	enfouir au râteau,	to rake râteler
serav, nm.	ilk sulama	premier arrosage d'un jardin	first watering of a garden
serav kirin	ilk sulamak	arroser pour la premi- ère fois un jardin	to water for the first time a garden
toz, toxim, nm.	tohum	graine, semence	seed
zibil, peyn, nm.	gübre	engrais, fumier	manure, dung, fertilizer
ziblê xwezayî,	doğal gübre	fumier, engrais naturel	dung, manure
ziblê heywanan			
ziblê kîmyayî	kimyasal gübre	engrais chimique	chemical fertilizer
avezibil	gübre şerbeti	engrais liquide, purin	liquid manure
giyazibil	ot gübresi	engrais végétal	vegetal manure
zilq, çirt, zîrç	kuş gübresi	fiente d'oiseaux et de volaille	droppings of birds
ziblê sar	sığır gübresi	fumier de bovins	cattle dung
ziblê germ	at, eşek, gübresi	fumier de cheval, de mule	horse and donkey dung
pişkil, pişkul, nm.	koyun, keçi dışkısı	crotte, crottin	droppings of sheep
rêx, rîx, nm.	büyük baş hayvan gübresi	bouse	cow dung, cowpat

Bêr û Mer

Bêr li aliyê rojava û bakur, **mer** li aliyê Hekarê ji bona alatê kolanê tete gotin ku tirkiya wê "kürek" e. **Mer** li aliyê rojava û bakur, metirke li aliyê Hekarê ji bona alavê binkolanê tete gotin ku tirkiya wê "bel, belküreği" ye.

Çend peyvên din

Di civînê de li ser navên hin giyayên din jî hate axaftin, lê mixabin me nikañ van navan wergerînin zimanên biyanî. Heke ji xwendevanên *Kurmancî* hin kes bi tirkî, erebî, farsî, îngilîzî, fransîzî an rûsiya van navan biza-nîbin, bira ji kerema xwe re em agahdar bikin.

tûsî, nm : giyayek e, li biharê hêşîn dibe, bejna wê qasî du bihustan e, rengê wê morê vekirî ye, pelên wê hûrik û bi dirî ne, qaçî-lê wê diqêşêrin û wekî çerez tê xwarin.

baxoxe, nm : giyayek ji malbata kerenga ye, serê wê bi pel e, berên wê girover in û wekî pelên wê bi dirî ne; berên wê tén xwarin, ew bi xwe jî tê qêşartin û xwarin.

bendik, nm : giyayek avî ye, biharê wekî tûzikê li ber devê kanî an çeman hêşîn dibe, tama wê nêzî ya bexdenûsê ye.

kûzrek, nm : giyayek e, di gulanê de hêşîn dibe û qasî mehekê dijî, pelên wê ji çar pelikan pêk tén, qirna wê di rûn û hêkan de diqewirînin û dixwin.

pêmîrîşk, nm : giyayek e demî ye, pelên wê wekî piyê mirîşkê ne, qirna wê dikelînin û dixwin.

sping, nm : giyayek e, pelên wê zirav û dirêj in û bi xavî wekî çerez tén xwarin, ew bi xwe wekî nîvesêvek e û bi şîr e.

xenclîsk, nm : giyayek e, sêvika wê ya binaxê qasî gûzekê ye, rengê sêvikê qeh-weyî ye tarî ye.

kesil, kospil, fişqî, <i>nm</i> ziblê tevlihev, ziblê têkel giyajeng, <i>nm</i> ka, <i>nm</i> tenî, <i>nm</i> herî, celb, <i>nm</i> bermayî, <i>nm</i> ziblê madenî AVDAN derav, qetek, <i>nm</i> awayên avdanê reşandin (bireşîne!) awayê deravî xewnandin, <i>nm</i> destedêr kirin avdêr, <i>n.</i> KANIYÊN AVDANÊ çem, rûbar, <i>nm</i> co, <i>nm.</i> , cok, <i>nm.</i> kêfte, liç, <i>nm.</i> ger, <i>nm.</i> bîr, <i>nm.</i> bincan AMÛRET, ALAV, HACET, ALETÊN ÇANDINÎ dirûn (bidirû!), çinîn (biçîne !) çandin (biçîne!) gêre, <i>nm.</i> , xarman, <i>nm.</i> daweşandin (daweşîne !) dirûngeh, bêder kirin, bênder kirin bêder, coxîn, <i>nm.</i> cot, <i>nm.</i> côt kirin hevcar, <i>nm.</i> nîr, <i>nm.</i> gêsin, gîsin, <i>nm</i> mahlû, <i>nm.</i> mangêr, <i>nm.</i> kotan, <i>nm.</i> parxêl, <i>nm.</i> makîna dirûnê makîna dirûn û gêrê mîbzer, makîna tovreşanê, <i>nm.</i> patos, <i>nm.</i> moşene, kam, gam, <i>nm.</i> cercere, cencere, <i>nm.</i> cendere AMÛRETÊN GIYA KİŞANDINÊ garte, <i>nm.</i> qol, <i>nm.</i>	at, eşek, katır gübresi karışık gübre yabani ot, alınması gereken otlar saman kurum çamur artık madeni gübre SULAMA su tevzi kanalları, tevzi ağı sulama türleri serperek sulamak tüm arazi parçalarının enlemesine birden sulanması dinlendirici sulama, gece sulaması çabuk sulama sulamacı SULAMA KAYNAKLARI dere, ırmak, nehir kanal, ark gölet akarsudaki göl kısmı kuyu akarsu üzerinde yapılan sed vasıtasıyla su yükseltülerek araziye su verilmesi TARIM ARAÇLARI tahıl ve ot biçmek biçmek, devşirmek, toplamak ekmek, dikmek harman dövme silkmek, silkelemek biçim alanı harmanlamak harman yeri karasaban çift sürmek karasaban gövdesi boyunduruk saban demiri tırmık, tapan disk, diskaro pulluk öküz, atla toprak üzerinde çekilen kızak biçer makinası biçer-döğer makinası tohum ekme makinası döğme makinası döğen silindirik tekerlekli ve döğme makinası silindirleri balta ağızlı pres makinası, sıkıştırma makinası OT TAŞIMA ARAÇLARI kızak kızaksız, yalnız halat üzerinde yapılan ot çekimi	fiente de cheval, de mule et d'âne engrais mélangé mauvaise herbe paille suie boue reste, résidu engrais minéral ARROSAGE points de distribution de l'eau procédés d'arrosage arroser arrosage en largeur de toutes les parcelles arrosage de nuit arroser rapidement arroseur, arroseuse SOURCES D'ARROSSAGE ruisseau, rivière, fleuve canal réservoir d'eau, pièce d'eau, étang eaux stagnantes d'une rivière puits irrigation à partir d'une écluse INSTRUMENTS ARATOIRES moissonner cueillir semer, cultiver, planter battage de céréales secouer aire de moisson battre (les céréales) aire de battage charrue labourer le bâti de la charrue joug soc râteau brabant traîneau de transport, moissonneuse-batteuse moissonneuse- semeuse batteuse batteuse à traction animale batteuse à roues cylindriques presse, presse à comprimer MOYENS DE TRANSPORT DU FOIN, TRÂÎNEAU véhicule que l'on traîne sur la neige transport du foin sur des câbles	droppings of horse, donkey, etc mixed dung weed straw soot mud, slush remaining, residium mineral fertilizer WATERING IRRIGATION water supply points watering forms to water watering in breadth all parcels of land night watering to water quickly sprinkler WATERING SOURCES stream, river channel pond stagnant waters a river well irrigation from a look AGRICULTURAL INSTRUMENTS, TOOLS to harvest to gather, to pick, to pluck to seed, to cultivate, to raise, to grow threshing of corn to shake harvest area to thresh threshing-floor plough to plough plough frame yoke ploughshare rake all-metal wheel plough transportation sledge, schlitte timber sledge, dray harvester, reaping machine combine (harvester) drill (for sowing) thresher, threshing machine thresher cylindrical wheel thresher press, pressing machine HAY TRANSPORTATION MEANS sledge, sleigh cable transportation of hay
---	--	--	---

ereba ga	kağrı	char à beufs	oxen cart
dadan (dade!)	1) kaymak, 2) konmak	1) glisser 2) se poser, se percher	1) to slip 2) to settle, to perch
tehisîn, (bitehesel)	gayrı ihtiyari kaymak	glisser involontairement	to slip unintentionally
tehesandin, (bitehesîne!)	kaydırmak	faire glisser	to slide
şemitîn (bişemite!)	kaymak	glisser	to slip
şemitandin (bişemîîne!)	kaydırmak	faire glisser	so slide
xirxal, <i>nm.</i>	teker	roue	wheel
fîrxûn, <i>nm.</i>	bir tür at arabası,	charrette à cheval	horse cart
bêr, mer, <i>nm.</i>	kürek	pelle	shovel
mer, metirke, <i>nm.</i>	bel, belküreği	bêche	spade
tevir, <i>nm.</i>	kazma, biri kesici, ağızlı kazma diğeri kazıcı çift	pioche à deux pointes	mathock
tevrîk, <i>nm.</i>	çapa	houe	hoe
kulling, <i>nm.</i>	1) inşaat ve taş çıkarma kazması, 2) manivella, murc	1) pioche, riveleine, pic à deux pointes 2) manivelle, levier	1) mathock, pickaxe 2) crank, lever
tîrmix, <i>nm.</i>	tırmık	râteau	rake
melhêb, <i>nm.</i>	yaba	fourche	fork, hayfork
meqes, <i>nm.</i>	makas	ciseaux	scissors
şeyê dest	el tarağı	peigne	comb
birrek, <i>nm.</i> , mişar	bıçkı, destere	scie	saw
çakûç, <i>nm.</i>	çekik	marteau	hammer
sindan, <i>nm.</i>	örs	enclume	anvil
daş, <i>nm.</i>	orak	faucille	sickle
şalok, dasa paleyiyê	biçme orağı	faucille de moissonneur	harvester's sickle
dasa daran	dehre	serpe	billhook
kêlîndî, qırım, <i>nm.</i> , tırpan	tırpan	faux	scythe
kêlîndîkêş, <i>nm.</i> , tırpankêş	tırpancı	faucheur	reaper, mower
kêr, <i>nm.</i>	bıçak	couteau	knife
kêrik, <i>nm.</i>	çakı	couteau de poche	pocket knife
zevî, <i>nm.</i>	tarla	champ	field
lat, <i>nm.</i>	küçük tarla	portion de champ, petit champ	small field
berxwêr, şeqîşa, <i>nm.</i>	büyük tarla	domaine agricole, latifundium	domain, estate
bax, <i>nm.</i>	ağaç bahçesi	verger	orchard
baxçe, <i>nm.</i>	sebze, meyve bahçesi	jardin	garden
bostan, bîstan, <i>nm.</i>	sebze tarlası yada bahçesi	potager	kitchen garden
parêz, werz, <i>nm.</i>	kavun, karpuz tarlası	champ de pastèques et de melons	melon, watermelon field
rez, <i>nm.</i>	bağ	vignoble	vineyard
malîk, mişar, <i>nm.</i>	tarh	rangée d'un jardin	row of a garden
kertik, <i>nm.</i>	çeltik evleği	rangée d'une riziêre	row, line of a rice field
kerdî, latik, <i>nm.</i>	bahçe, bostan evleği	parcelle d'un champ ou d'un jardin	parcel of a field or garden
tixûb, <i>nm.</i>	sınır, hudud	frontiêre	border, boundary
mişkane, <i>nm.</i>	rehin, ipotek	gage, hypothèque	mortgage
zeviya xwe bi mişkane dayin	tarlasını hipoteğe vermek	hypothéquer son champ	to mortgage a field
pişkane, <i>nm.</i>	müşterek hisseli mülk	propriété indivise, collective	undivided, collective land
nîvekârî, <i>nm.</i>	ortakçılık	métayage	sharecropping
givande, <i>nm.</i>	topraktan tarla sınırı	tallus de remblai	slope, embankment
hewd, <i>nm.</i>	fide tarhı, fidelik	pépiniêre	seed bed
axesor, <i>nm.</i>	kırmızı toprak	terre rouge	red soil
axereş, <i>nm.</i>	kara toprak	terre noire	black soil
axeşin, <i>nm.</i>	gri toprak	terre grise	grey soil
kîlte, <i>nm.</i>	killi toprak	sol argileux	clayey soil
berespî, <i>nm.</i>	kireç taşı	Pierre à chaux	clayey stone
tevş, <i>nm.</i>	küçük, yassı, sivri ağızlı taş	galet	pebble
helan, <i>nm.</i>	yassı, tabaka tabaka oluşmuş taş	dalle	flagstone
reşe, <i>nm.</i>	korkuluk	épouvantail	scarecrow
heska hirçê	kepçe şeklindeki korkuluk	épouvantail en forme de louche	bugbear
dexil, tene, <i>nm.</i>	tahıl	céréales	cereal, corn
genim, <i>nm.</i>	buğday	blé	wheat

şilêl, çexdar, <i>nm.</i>	çavdar	seigle	rye
ceh, <i>nm.</i>	arpa	orge	barley
garis, <i>nm.</i>	darı	millet	millet
genimşamî, gilgil, lazût, <i>nm.</i>	mısır	maïs	maize, Indian corn
şûv, şov, <i>nm.</i>	nadas	jachère	fallow
adan, <i>nm.</i>	besin, gıda	aliment, substance nutritive	food, nutriment
bi adan	besleyici	nutritif	nutritive, nourishing
aşêv kirin, adê kirin (ade)	yabani otlardan ayıklamak	sarcler	to weed(garden), to clean (a field)
fasûlî, lobî, <i>nm.</i> (ji latîni phaseolus)	fasulya	haricot	bean
maş, <i>nm.</i>	Hint fasulyesi	haricot d'Inde	Indian bean
polik, bezelî, <i>nm.</i>	bezelye	petit pois	garden pea
birinc, riz, <i>nm.</i>	pirinc	riz	rice
kulind, kulindir, <i>nm.</i>	kabak	course	marrow
dolmik, kulindterk, <i>nm.</i>	dolmalık kabak	courgette	courgette
bamye, <i>nm.</i>	bamya(y)	gombo	gombo
tirozî, kilyar, ecûr, <i>nm.</i>	acur	concombre russe	Russian cucumber
gulberojk, <i>nm.</i>	ayçiçeği	tournesol	sunflower
xas, xes, kahû, <i>nm.</i>	marul	laitue	lettuce
sîlk, <i>nm.</i>	pancar	bette, poirée	beet
şêlim, <i>nm.</i>	şalgam	betterave	beetroot
giyadermank, <i>nm.</i>	hekimlikte kullanılan otlar	herbes médicinales	medicinal herbs
qorîngan	kırmızı çiçekli yonca	trêfle rouge	red clover
ketezer	sarı çiçekli yonca türü	trêfle jaune	yellow clover
zil, qeram, <i>nm.</i>	kamış	roseau	reed
D A R	AĞAÇLAR	ARBRES	TREES
pejnandin(bipejne!)	budamak	élaguer, émonder	to prune, to trim
kezaxtin(bikezêxe!)	bağ budamak	tailler la vigne	to dress vine
pejik, <i>nm.</i>	küçük ve ince dal parçası	branche, brindille	twig, sprig, brushwood
spîndar, hewr, <i>nm.</i>	kavak	peuplier	poplar
pelg, <i>nm.</i>	titrek kavak	peuplier tremble	aspen
bî, <i>nm.</i>	söğüt	saule	willow
şengebî, şorebî, bişeng	salkım söğüt	saule pleureur	weeping willow
benav	diş budak	frêne	ask (tree, timber)
berû	meşe palamudu	gland	acorn
darberû	meşe ağacı	chêne	oak
mazî	mazı	noix de Galle	oak apple
darmazî	mazı ağacı	variété de chêne	variety of oak
kevat	akça ağaç	érable	maple
evris, qaç	ardıç	genévrier	juniper
çınar	çınar	platane	plane tree
DARÊN MEYWE	YEMİŞ AĞAÇLARI	ARBRES FRUITIERS	FRUIT TREES
zirişk, qermox, <i>nm.</i>	diken üzümü	épine vinette	barberry
dirîk, dirîmok, dendüreşk, <i>nm.</i>	böğürtlen	mûron	blackberry
şilank, <i>nm.</i>	kuş burnu	églantier	wild rose
findeq, <i>nm.</i>	fındık	noisette	hazelnut
gûz, <i>nm.</i>	ceviz	noix	walnut
xurme, qesp, <i>nm.</i>	hurma	datte	date
gul	gül	rose	rose
sosin	zambak	lys, iris	lily
DAR, nm	AĞAÇ	ARBRE	TREE
reh, <i>nm.</i>	kök	racine	root
rîşe, <i>nm.</i>	kökçük, ince kök teli	radicelle	radicel, rootlet
qurm, <i>nm.</i>	ağaç gövdesi	tronc	trunk
ta, <i>nm.</i>	dal	ramification, branche	branch, ramification
şax, <i>nm.</i>	küçük dal	rameau	small branch, twig
çeç, çiqil, <i>nm.</i>	ince dal	brindille	twig, sprig
ajfiliz, aj	filiz	pousse	sprout
patrome, lûl	aşı	greffe	graft, scion
patrome kirin	ağaç aşılamaq	greffer	to graft
goyin, <i>nm.</i>	nöbet, sıra	garde, surveillance	guard
goyinger	nöbetçi	gardien, veilleur	keeper, watchmen

TERMÊN HIQÛQÎ

Amadekar : Musa KAVAL

kurdfî	tirkî	fransîzî	îngilîz
çavkanî	kaynak	source	source
çavkaniyên	hukukun	les sources	the sources
hiqûqê	kaynakları	de droit	of law
qanûn	yasa	loi	law
qanûna bingehî	anayasa	constitution	constitution
qanûnî	yasal	légal	lawful, legal
biryar	karar	décision	decision
biryarname	kararname	décret, ordonnance	decree, ordinance
xweza	doğa	nature	nature
xwezayî	doğal	naturel	natural
hiqûqa xwezayî	doğal hukuk	droit naturel	natural law
hiqûqa bacê	vergi hukuku	droit fiscal	fiscal law
hiqûqa kar	iş hukuku	droit du travail	labour laws
hiqûqa giştî	kamu hukuku	droit public	public law
hiqûqa gelemperî	genel hukuk	droit général	general law
hiqûqa xwedaniyê	mülkiyet hukuku	droit de propriété	property law
bank	banka	banque	bank
bankî	bankasal	bancaire	pertaining
bankgêr	bankacı	banquier	banker
bankgêrî	bankacılık	la banque, le métier de banque	banking
hiqûqa	bankacılık	droit	banking law
bankgêriyê	hukuku	bancaire	
hiqûqa malbatî	aile hukuku	droit de famille	family law
ewlehî	emniyet, güvenlik	sécurité	security
ewlehiya	sosyal	sécurité	social
civakî	güvenlik	sociale	security
ewlehiya giştî	kamu güvenliği	sécurité publique	public security
sîgorte, bîme	sigorta	assurance	insurance
pêşniyar	öneri, teklif	proposition	proposal
pêşniyara qanûnê	kanun önerisi	proposition de loi	law proposal
peyman	antlaşma, misak	pacte, traité	pact, treaty
hevalbendî	ittifak	alliance	alliance
lihevkinin	anlaşma	accord	agreement
lihevhatin	barışma	réconciliation	reconciliation
testîq kirin	tastik etmek, onaylamak	approuver,	ratifier
mafê	kendi	droit à l'auto-	right to selfdeter-
çarenûsî	kaderini tayin hakkı	right to détermination	mination
mafê penaberî	sığınma hakkı	droit d'asile	asylum right
avûkat, parêzer	avukat	avocat	lawyer, advocate
dadgeh	mahkeme	tribunal, court	court
seza, ceza	ceza	peine	sentence
dadgeha sezayî	ceza mahkemesi	tribunal criminel	criminal court
lihevanîn	sulh	réconciliation	reconciliation
dadgeha lihevanînê	sulh mahkemesi	tribunal d'instance	magistrates' court
bendname, girêdan	akd, akid	acte	acte


KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîstî ne ji bo sahibrewacan


Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)



Anatomiya Mirov

(dûmahika hejmar 6)



1-57 - ORGANÊN HINDURÎN

- 1- toşpî, n.m.
toşpiya tîroidê
2-3- GEWRÎ
2- hestiyê hiyoîde
3- kirkirka tîroidê
4- zengilor
gûzika zengilorê

5- bronş
bronşik
6-7 pişik, ceger, şîpelk
6- pişika rastê
7-loba jorîn a pişikê

- 8- dil
9- perdeya navbirê, diyafragm
10- cegera reş, kezêb, mêlak
11- kîsikê zirav
12- faterêşk, xalxalk, sipil
13- asik, made

14-22- RÛVÎ

14-16- RÛVIYA ZIRAV

- 14- donzdetilk, donzdegirêk
15- rûviya birçî
16- rûviya badayî
17-22- RÛVIYA STÛR
17- rûviya kor
18- apandîs, rûviya zêde
19- zablota hilkêşayî
20- zablota berwarkî
21- zablota dakêşayî
22- rûviya dawîn, tortorîk

- 23- sorsonk
24-25 dil
24- guhik
25- tîşika pêşîn a dil

İÇ ORGANLAR ORGANS

- salgî bezi
tîroid bezi
LARİNK, GIRTILAK
hiyoîd kemiği
tîroid eklemi
soluk borusu
Adem elması, girtlak çikintisi
bronş
bronşçuk
ak ciğer
sağ akciğer
akciğer üst lopu

- yürek, kalb
diyafram
kara ciğer
safra kesesi
dalak (Arapça talak)

BAGIRSAKLAR

İNCE BAĞIRSAK

- oniki parmak barsağı
boş bağırsak
kivırım bağırsak
KALIN BAĞIRSAK
kör bağırsak
apandis
colón ascendand
colón transverse
colón descendant
rektum

- yemek borusu
kalb, yürek
kulakçik

ORGANES INTERNES INTERNAL

- glande
corps tyroide
LARYNX
os hyoïde
cartilage thyroïde
trachée
pomme d'Adam

- bronche
bronchiole
poumons
poumon droit
lobe supérieur
du poumon
cœur
diaphragme

- foie
vésicule biliaire
rate

- estomac
INTESTINS
INTESTIN GRÊLE
duodenum

- jejunum
iléon
GROS INTESTIN
caecum
appendice
colón ascendant
colón transverse
colón descendant
rectum

- oesophage
cœur
oreillette
sillon inter-ventriculaire antérieur

- gland
thyroid gland
LARYNX
hyoid bone
thyroid cartilage
trachea
Adam's apple

- bronchus
bronchiole
lung
right lung
upper pulmonary lobe
heart
diaphragm

- liver
gall bladder
spleen

- stomach
INTESTINES
SMALL NTESTINE
duodenum

- jejunum
ileum
LARGE INTESTINE
cecum, caecum
appendix
ascending colon
transverse colon
descending colon
rectum

- oesophagus, gullet
heart
auricle
anterior longitudinal cardiac sulcus

Civîna İsmail Beşikçi

Civîna heftemîn ya li ser zimanê kurdî, zaravê kurmancî, li Swêdê, li Biskops Arnöyê civiya. Civîn hefteyekê, ji 7ê nîsanê heta 14ê nîsanê, dom kir. Civîna bihara 1990an, îcar, bi firehî li ser termên edebî bû ku em di vê hejmarê de, beşê yekemîn yê terman diweşînin. Tevî termên edebî, hevalên beşdar li ser termên hiqûqî û anatomiye jî xebitîn. Herçî pîrsegirêkên gramatika kurdî be, beşdar li ser rapora Reşo Zilan, ku di derheqa rastnivîsîna hin hoker û daçekan de bû, xebitîn. Em vê xebatê jî di vê hejmarê de diweşînin.

Hevalên ku beşdarî li civîna bihara 1990 an kirin ev in : Khosrow Abdollahî (Selmas), Lutfî Baksî (Xerzan), Mehmûd Baksî (Xerzan), Rojen Barnas (Diyarbekir), Cemal Batun (Mêrdîn), Joyce Blau (Fransa), Nûra Cewarî (Rewan), Firat Cewerî (Nîsêbîn), Zeynelabidîn Zinar (Batman), Remzî Kerîm (Sêrt), Hazim Kiliç (Hekarî), Kendal Nezan (Diyarbekir), Zinar Soran (Mêrdîn), Mehmed Uzun (Siwêrek), Veysî Zeydanî (Bêdlîs) û Reşo Zilan (Ağirî).


Di vê civînê de du navên nû hebûn : folklorîsta hêja Nûra Cewarî ku ji Ermenistana Sovyetî hatibû û xanima Joyce Blau ku li Zanîngeha Sorbonnê, ya Parîsê, mamosteya zimanê kurdî ye. Nivîskarê kurdê Yekitiya Sovyetî Tosinê Reşîd jî, êvarekê, hat ziyareta me. Em bi dîtina wan kêfxweş, bi xebat û pêşniyarên wan hîn têkûztir bûn.

Hevalên ku ji Rewanê hatibûn daxwaz û pêşniyar kirin ku niwênerên kurd ên Yekitiya Sovyetî jî di civînên me de beşdar bin. Me dil û daxwaz û hêvî heye ku hevalên ji Yekitiya Sovyetî jî bikaribin di civînên bê de hazir bin û vê xebata pîroz hîn geştir û berferehtir bikin.

Bi biryara hevalên beşdar navê vê civînê bû *Civîna İsmail Beşikçi*. Herwekî ku tê zanîn, Dr. İsmail Beşikçi, nivîskar, sosyolog, ji mêj ve ye li ser doza Kurdistan û pîrsa Kurdistanê dixebite û wî gelek kitêb, di vî warî de weşandine. Û ji ber vê yekê, ew gelek caran hatiye girtin û bi dirêjahiya salan li zindan û girtîxanên Tirkîyê maye. Niha, wî du kitêbên din ku li ser pîrs û pîrsegirêkên Kurd û Kurdistanê ne, li Stembolê, weşandine. Ji lewre, ew hatiye girtin. Ji bo nişandana piştigirtiyê û protestkirina girtina İsmail Beşikçi, civînê telegramek ji serekkomarê Tirkîyê Turgut Özal re şand û kopiyek ji telegramê jî ji İsmail Beşikçi re bi rê kir.

KURMANCÎ

26-perdeya navbirê	diyafram diyafragn	diaphragme	diaphragm
27- faterêşk, xalxalk, sipil	dalak	rate	spleen
28- gurçika rastê	sağ böbrek	rein droit	right kidney
29- toşpiya sergurçikî	böbreküstü salgı bezi	capsule surrénale	suprarenal gland
30-31- gurçika çepê	sol böbrek	rein gauche	left kidney
30- kovên gurçikê, kalîks	böbrek piramidleri	calice	calyx
31- legena gurçikê	leğen	bassinot	renal pelvis
32- mîzkêş	sidik yolu	uretère	ureter
33- mîzdark	sidik kesesi	vessie	bladder
34-35- KEZEB, CEGERA REŞ	KARA CİĞER	FOIE	LIVER
34- navika kezebê	kara ciğer göbeği	hile du foie	falciform ligament of the
35- lobê kezebê	kara ciğer lopu	lobe du foie	lobe of the liver
36- kîsikê zirav	safrâ kesesi	vesicule biliaire	gall bladder
37-38- DUCOYA ZIRAVÎ	SAFRA KANALI	CANAL CHOLÉDOQUE	COMMON BILE DUCT
37- coya kezebe	hepatik kanal	canal hépatique	common hepatic duct
38- coya ziravî	sisitik kanal	canal cystique	cystic duct
39- derîdamar	kapı damar	veine porte	portal (hepatic portal vein)
40- sorsorik	yemek borusu	oesophage	oesophagus
41-42- MADE, AŞIK	MİDE	ESTOMAC	STOMACH
41- serdevka made, aşik	mide ağızı	cardia	cardiac orifice
42- bindevka made, aşik	mide kapısı	pylore	pylorus
43- donzdetilk	on iki parmak bağırsağı	duodénium	duodenum
44- pankreas	pankreas	pancréas	pancreas



Li ser rastnivîsîna çend tiştan

Reşo ZÎLAN

1. Rastnivîsîna hin daçek û hokeran

Herçendî daçekên kurdî ji çend cureyan pêk bân jî, di rastiyê de, yên bingehîn ev in; **ji, li, di, bi, bê**. Heçî daçekên din in, êdî ew bi alikariya van daçekên han yên bingehîn tên afirandin. Ji ber vê yekê jî, di warê rastnivîsîna daçekan de, tiştê ku em bal û dêna xwe bidinê ew e, ku divê em timî van daçekên bingehîn çu caran bi peyvîne din ve nezeliqînin.

Wek:

*Cerdoyê Biro mala xwe **ji** gund guhaste bajêr.*

*«Apê min têye **ji** destê, barek strî li piştê.»*

*Keç û xortên gundê Yekavê **li** guhera gund civiyabûn.*

*Ev koloz û ev şal û şapik xweş **li** bejna te hatine.*

*«Me ji narê diye nûra te **di** dil*

Lew ji "işqa te her atesperes in»

Melayê Cizîrî

*Wê ev melhema han **di** birîna xwe da û pak bû.*

Gelo ew bi kurdî dizane?

*Tiştê ku hukûmetê anîbû serê me, ne **bi** dilê xelqê bû.*

*Wê şevê **bê** (bêî) wan kes nehat.*

Ez çayê bê şekir vedixwim.

Hin caran mirov dikare bi alikariya hin peyvên din kompleksên daçekî çêbike. Ji kompleksên daçekî mebest kompeyvek (komek peyv) e, ku ji çend daçekan, yan ji yek yan jî ji çend daçek û paşdaçekekê pêk tên. Ev kompeyvên han yên daçekî dikarin bi rola rengdêr yan hokerê jî rabin. Heçî ev kompeyvên daçekî ne, bêî ku em yek bi yek li maneyên peyvên ku ew jê pêk tên bigerin û bibêjin ka ew hîç maneyekê didin yan na, divê em her yekê ji wan bi tena serê xwe binivîsin. Li milekî din jî, ji aliyê hebûna maneyê ve, bê guman her perçeyek ji wan xwedî maneyekê ye.

*Baran **ji ber** sîtema axayê êlê warê xwe terikand.*

*Wî xwe **ji ser** serê çiyayê Kose berda xwarê.*

*Ez ne **ji ba** wan têm.*

*Min destê xwe **ji bin** kumê xwe dermeanî.*

*Zorav **ji bilî** kara xwe tiştêkî din hizir nake.*

*Ev diyarî **ji bo** destgirtiya min e.*

*Dijmin **ji pişt** çiyayê Zozikê derneketiye.*

*Ew herduk **ji hev** bez dikin.*

*Memir **ji nik** pismamê xwe têt.*

*Werin van hûrûmûrên xwe **ji rex** malê hilînin!*

*Mêvan **ji derve** hatin hundir û derbasî*

dîwanxaneyê bûn.

***Li ber** dergêhê koşkê pûtekî mermerîn hebû.*

*Guldank **li ser** maseyê ye.*

*Ew wê çaxê çend rojan **li ba** me mabû.*

*Gulzar **li bin** darê rûdine.*

*Tu **li hember** wî zimandirêjiyan meke!*

*Êdî Kurd **li dijî** mercên koledariyê radibin.*

*Ev yeka han ne **li gor** dilê wî ye.*

*Bager û Diljar ne **li derve** ne.*

*Ew û ev qet **li hev** naçin.*

*Eskeran hema **li pêşberî** gundê me kemîn danî.*

*Ka tu **di gel** min were bajêr, ez ê alî te bikim.*

*Here **jê re** bibêje, ku bila ew êvarê zû vegere.*

*Dilop **jê de** dihatin xwarê.*

*Ew cotesolên ku te kirîbûn, **lê** nehatin.*

*Ka **pê re** here gund û serxweşiyê bide gundiyar.*

*Em hingê jî **pê de** ketin, lê nebû.*

*Ma te ew **pê ve** zeliqand?*

*Ma min negote te, ku tiliya xwe **tê de** meke?*

*Wî derziyek **tê re** kir û pîjîk derêxist.*

Heçî hokerên pêşdaçeka wan kefî û bi tenê paşdaçeka wan mayî ne, divê mirov paşdaçeka mayî bi tena serê xwe nenivîse. Wê her yekser bi peyvê ve binûse (bizeliqîne).

Wek:

***Paşve, paşde, pêşve, pêşde, şûnve, şûnde, serve, serde, piştire, piştve, dûre, binre** û her wekî din.*

*Welatê me bi destê dijmin **paşde** maye.*

*Ez ê bi alikariya vê kursê zimanê xwe **pêşve** bibim.*

*Min taştê xwar û **piştire** du îskan çay vexwarin.*

*Dibêjin **piştve** fişek berdanê.*

<p>Lê heke çu tiştê ji daçekê neketibe û daçek, daçekeke tam be, divê qaîdeyên ku li jorê hatine behs û çêl kirin, derbas bibin.</p> <p>Ango: <i>Hezare ber bi gund ve çû.</i> <i>Wî diviya duhî bi dû min re bida rê.</i> <i>Ev nîr û mercên han Kurdan ber ber bi paş ve dibin.</i> <i>Ez ê ji sibehî û pê de li ser karê xwe nemînîm.</i> <i>Ji êvarê û bi vir de xew neketiye çavên dayika min.</i></p> <p>Ji bilî van, divê perçeyên ku di pêkanîna daçek, hoker yan jî pêslêkerên hevedudanî de roline mezin dilîzin jî çihê û bi tena serê xwe bêne nivîsandin.</p> <p>Bo nimûne: <i>Di nav hev de, li ser hev, di rex hev de, li dor hev, li tenişt hev, tev li hev, ser bi ser, qor bi qor, roj bi roj, gund bi gund, pel bi pel, dan ber hev, dan ser hev, dan tenişt hev û hwd.</i></p> <p>Lê belê, eger ji wan perçeyan peyveke nû bête afirandin, ku ew peyv mefhûmek be û mefhûmeke xweser û taybetî be, êdi ew hingê bi hev re tete nivîsandin.</p> <p>Wek: <i>Curbicur, derbider, gorbigo, rûbirû, serejêr (=nişûv, serbijêr), serejor (=serbijor, hevraz,</i></p>	<p>kaş), <i>hevber</i> (=wekhev), <i>hevgel</i> (= hogir, destek), <i>demildest</i> (=di wê bîskê de), <i>berepaş, serhevraz, kerrekerr û hwd.</i></p> <h2>2. Rastnivîsîna raweya çêbiwar</h2> <p>Raweya çêbiwar (partisîpa dema borî) ya zara-vayê kurmancî bi -î û bi -yî -yê dawî tên. Lêkerên ku radera wan bi -in û -în dawî tên, mirov di şûna wan de bi tenê -î -yekê, yên ku bi -an û -ân -ê dawî tên jî, mirov di şûna wan de bi tenê -yî -yekê li koka lêkeran zêde dike. Mirov bi vî awayî raweya çêbiwar ya sade bi dest dixê.</p> <p>Wek: <i>Hatî</i> (hatin), <i>ketî</i> (ketin), <i>mirî</i> (mirin), <i>kuştî</i> (kuştin), <i>kirî</i> (kirin) <i>Girî</i>, (girîn), <i>firî</i> (firîn), <i>nihêrî</i> (nihêrîn), <i>perçîfî</i> (perçifin) <i>Mayî</i> (man), <i>payî</i> (pan), <i>dayî</i> (dan), <i>kutayî</i> (kutan) <i>Çûyî</i> (çûn), <i>bûyî</i> (bûn), <i>cûyî</i> (=cûtî) (cûn, cûtin)</p> <p>Raweya çêbiwar ya hevedudanî jî bi alikariya daçekên têvel tene çêkirin. Di warê rastnivîsînê de, divê mirov berî her tiştî lê binihêre ka ew raweya çêbiwar ya hevedudanî tewandî ye yan na. Eger ne tewandî be, divê ew bi hev re bête nivîsandin.</p>	<p><i>Gul û giyayên avnekirî çilmisibûn.</i> <i>Wî tiştên jibîrkiyê dianîn bîra mirovî.</i> <i>Xortê sergermbûyî bi pêsîra wî girt.</i> <i>Ew ji kesên navnedayî ye.</i> <i>Mîha serjêkirî hilawistin.</i> <i>Dêleseya dermanxwarî sekiî.</i> <i>Bi ya kalê jîhevdeketî be, ew hîn jî xort e.</i> <i>Me perçeyên otomobîla jîhevderxistî disan li hev siwar kirin.</i> <i>Eskeran agir berda gundê dorlêpêçayî.</i> <i>Pereyên bidendayî ji kîsê wî çûn.</i> <i>Xwarina jîbermayî bû para pisîka malê.</i> <i>Eger raweya çêbiwar ya hevedudanî tewandî be, divê wê çaxê em wê bi hev re nenivîsin.</i></p> <p>Bo nimûne: <i>Dîwarê ji nîvê de qelişî, hilweşiya.</i> <i>Sêva ji darê ketî, nedihat xwarin.</i> <i>Guletoşa li nîveka gund ketî, neteqiya.</i> <i>Rondikên ji çavan barî, nişana hesretê bûn.</i> <i>Navê çîroka di bîrê de mayî, Enter Pehlewan bû.</i> <i>Gelo navê gundê bi bajêr ve girêdayî, çi bû?</i> <i>Endamê ji partiyê vekîşiyayî, hevalê dostekî te ye.</i> <i>Kesê bi wî re çûyî, êvarê vegeyî.</i> <i>Pêş mergeyê gule li hêtê ketî, pak bû.</i> <i>Polîsan Mevlûda ji bav û kalan mayî, bi xwe re bir.</i></p>
---	--	--

Termên çandiniyê

(dumahîka bejmarê 6)

Amadekar : Hazim KILIÇ

kurdi	tirkî	fransîzî	îngilîzî
nûber, nûbar	turfanda	primeur	early fruit or vegetable
şitil	fide	semis	seedling, young plant
mişteli	fidan	plant	plant
çevrebî	hedik		
dîndar, tirşe	Lübnan palamudu	chêne libanais	oak of Lebanon
qaç, qarç	yayvan yabancı ardıç	une variété de genévrier	a variety of juniper
evris, merx	boylu yabancı ardıç	une variété de genévrier	a variety of juniper
çam	çam	pin	pine
dirî	diken	épine, ronce	thorn, thorn bush, bramble
strî	diken	épine	thorn
gers, gez	ilgin	tamaris, tamarix	tamarisk
mêw	üzüm ağacı	vigne	vine
dêli	asma	variété de vigne grimpante	creeping vine
gûnî	geven	astragale	astragalus
MEYWE	YEMİŞ	FRUIT	FRUIT
hilû, alû	erik	prune	plum
hilûreşk	kara erik	prune noire	black plum
hilûzerk	sarı erik	prune jaune	yellow plum

alûçe	can eriği, yeşil erik	varieté de prune verte	variety of green plum
qeyşî, zerdele	kaysı	abricot	apricot
gêlas, gilyaz, qerasî	kiraz (yunanca kerosos'tan)	cerise	cherry
fişne	vişne (rûsça vişniya'dan)	griotte	Morello cherry
hirmê	armut	poire	pear
gîrsk, şekok, karçîn	yaban armudu	poire sauvage	wild pear
hejesor, parz, sinc	iğde	éléange	oleaster
şilan	kuşburnu	églantier	dog rose
kezwan, şengêl	çitlembik, menengüç	térébinthe	terebinth
xêxik	son baharda yetişen yaban eriği	prune sauvage d'automne	autumnal wild pear
helhelok	kızılıçık	comaline	comel berry, comelian cherry
beybûn	sarı sümbül	marguerite	daisy
sosineber	papatya	camomille	cammomilla
sosin	süsen (farsça süsen'den)	iris	iris
helale	lale (farsça)	tulipe	tulip
nêrgiz	nergiz (yunanca narkisos'dan)	narcisse	narcissus
yasemîn, asmîn	yasemin	jasmin	jasmine
salep	salep	orchis	orchis
kaktûs	kaktûs (yunanca kaktos'tan)	cactus	cactus
hêro	Hatmi çiçeği	mauve	hollyhock, marsh mallow
mijmijok	sığırdili	buglosse	bugloss
sûs	meyan	régliste	licorice
mêxik, qerefil	karanfil (yunanca karyonfilon'dan)	oeillet, girofle	carnation
binefş	menekşe	violette	violet
canemerg, gula bê miraz	kardelen	perce-neige	snowdrop
leylaq	leylak (fasça lila'dan)	lilas	lilac
bûkik, bûkanî, gulebûk	gelincik	coquelicot	poppy
guharak	küpe çiçeği	fuchsia	fuchsia
sinbil	sümbül (farsça sunbul)	jacinthe	hyacinth
şîwanok	şemsiye çiçeği	ombellifère	umbellifer
gulqedîfe	kadife çiçeği	amarante	amaranth

Termên Edebî

Amadekar : Rojen BARNAS

Zengîniya zimanekî ji zengîniya bêje û termên di wî zimanî pêk tê. Term, nav an nasnavê mefhumên ilmî û hunerî ne. Edebiyat ji alîkî ve ilm, ji alîkî ve jî hunermendî ye. Ji bo nasîn, lêkolîn, nerpêdan û bi nasîn dayina ilmekî an hunerekî hewcedariya meriv bi van nav an nasnavên taybetî (term) heye, ku ji vê hewcedariyê termînolojî hatîye afirandin, da herkes ji gotinekê an ji nasnavêkî eynî tiştî fêhm bike.

Wekî her zimanê zindî û yê afirandina fikr û hunerê, hewcedariya zimanê me jî bi termînolojîya şaxên ilmî û hunerê cihê cihê heye. Ji vê dîtinê em bi rê ketin û me xebata bihevghandina termên edebî da ber xwe.

Me bernameye xwe ya «termên edebî» ji edebiyata klasîk ber bi edebiyata nûjen danî. Di

vê hejmarê de giranî li ser termên edebiyata klasîk, di hejmarê bê de nivî dê li ser edebiyata klasîk û nivî jî li ser ya nûjen be. Di xebatên pêş me de li gora hewcedarî û fersendê emê li ser termên edebiyata cihanî jî rawestin.

Bi kurmancî binavkirin an tesbîta rastnivîsîna terman xebata hevalên beşdarî civîne ye. Hin term hene ku ew bi xwe erebî ne; wekî *xezel*, *qesîde*, *mesnewî* ku di giştî edebiyatên Rojhelata Navîn de wisa tên binavkirin, ji bona wan navekî kurdî danîn ewçend ne pêwîst e.

Kurmanciya termên vê xebatê bi tinê di maneya wan a edebî de ye. Hin term gengaz e ku di zimanên dinê de ji bilî edebiyatê di hin şaxên ilm û hunerên de jî bêne bikaranîn û maneyên wan ên cihê hebin. Lê kurmanciya wan her di maneya wan a edebiyatê de hatîye danîn. Divê xwendevan lê miqate bin.

Di amadekirina vê de, min metoda «rêber» an «ansîklopedî» hilbijart ku di pêş de ev bibe binaxeya «rêbera edebiyata kurmancî» an «rêbera termên edebî». Ji vê bonê heta diva me bi nimûne û şema terman îzah kir.

Hêvidar im ku ne îro be jî siberoj bi kêrî hewcedaran bê.

Edebiyat : Di maneya fereh de navê giştî yê hemî tiştên devkî û nivîskî yê hunermendî, zanistî û pêşeyî ye.

Edebiyata bedew : Navê giştî yê hemî hunerên devkî û nivîskî ye ku şîr, roman, tiyatro, çîrok, û h.w.d dikevîne navê.

Edebiyata pêşeyî : Navê giştî yê nivîsarên zanistî (tib, matematîk, fîzîk) û yê pêşeyî (meslekî) ye.

Pêşe : Kar, meslek

Vegotin : (vebêje)/**vegêrîn** (vegêre) Çîrokek, bûyerek, serpêhatîyek gotin.

Vebêj / vegêr : Ew kesê ku tiştêkî vedibêje.

Riyên vegotinê : Riyên ku meriv xwezî û daxwaziyên xwe pê vedibêje, ku ev dido ne

1. **nesr / pexşan :** Vegotina bê kêş û bê aheng, wek axaftina rojane.

2. **nezm** : Vegotina bi kêş û beşavend.
Mensûr : Berhemên bi nesrê hatine vegotin.
Menzûm : Berhemên bi nezmê hatine vegotin.
Edebî 1. Tiştê ku bi edebiyate re têkil-dar e, 2. Berhema ku di warê hunermendiya edebiyata bedew de xwedî rûmetekî ye.
Kêş : Wezin, pîvan
Kêşên çendahîn : Weznên bi jimarên kîteyan çêdibin.
Çendahîn : Kemmîyet, kantite
Kêşên çawahîn : Kêşên ku li gora hêjayiya kîteyan -wek kîteya dirêj û kurt, ya vekirî û girtî- çêkirî.
Çawahîn : Keyfîyet, kalik.
Kêşa kîteyî : Kêşa ku li gora jimara kîteyan çêdibe.
Rawest : Di kêşên kîteyî de cihê rawestîne ye. Herwekî di kêşeke 4+4+3=11 de, rawest di pey kîteya çaran û ya heştan de tê. Ku kêş 4+3+4=11 be wê gavê rawest di pey kîteya çaran û heftan de heye. Ku kêş 5+6=11 be rawestek bi tenê heye û ew jî di pey kîteya pêncan de tê.
Kanî Dêrşew, / ka Herekol, / ka Kepir

Ka zozanên / Bavê -Têlî / ka kê bir
Dibêjin ku / Birca-Belek / hilweşî
Text û bextê / botiyan de / ka geşî
 (Herekol Azîzan)
 Rewest bi nîşandeka (/) hatiye nîşandan.
Kêşa erûzê : Kêşeke çawahîn e, ku li ser bingehê dirêjî û kurtî, vekirîbûn û girtîbûna kîteyan çêdibe. Ji edebiyata ereb derbasî edebiyata faris û ji edebiyata faris jî derbasî edebiyatên klasîk ên welatên musulman biye. Nezmên edebiyata kurd ên klasîk gişt bi vê kêşê hatine nivisandin.
Qalib : Kêşa rêzeke nezmê ye, ku ji çend perçeyên («cuz») kêşê pêk tê.
 Herwekî
Di fesla nûbiharê da diqel dîlber biçin geştê
Ji ew xweştir "umur nabit, li min ew hal qewî xweş tê.
 (Xanî)
Di fes la nû bi har ê da

Beşavenda tam : beşavenda ku bi dengdêrek û dengdarek wek-hev biqede «mil», «kil», «dil».
Îd e îro bê qerar im ez ji feqda dêmduwê
Bê hebîb im, bê hebîb im, bê hebîb im, bê hebîb
Herkesek ba yarê xwe d'meşyan di selhrayan li rê
Pur keîb im, pur keîb im, pur keîb im, pur keîb
 (Şêx Evdîrehmanê Axtepî)
Beşavenda zengîn : beşavenda ku dawîya wan bi diduyan zêdetir dengdar û dengdêrên wekhev biqede «man», «zeman», «deman», «ziman», «guman».
Gelî biran werin cengê
Bîşoyin dil ji vê jengê
Bibêjim ez heta kengê
Nehin yek j'me bi vê rengê
 (Mustefa Ehmed Botî)
Beşavenda hevdeng : beşavenda ku bi du an zêde gotinên dengdar û dengdêrên wan wekhev, lê maneya wan cihê tê çêkirin
Şahînşehê textekê Medîne
Mu'ciz ji te ew qeder me dîne
 (Xanî)
Beşavenda rast : beşavenda ku wek rêza aa, bb, cc, dd li dû hev tên.
Bînoe xweşîya dil û du çavan (a)
Dadê ji te re her ro nîgehban (a)
Da zû tu mezin bî Bedîr-Xan (a)
Bînoe kezeba min bin ve lo! lo! (b)
 (Emîr Alî Bedîr-Xan)
Beşavenda çeprast : beşavenda ku wek rêza a b a b, c d c d, tê danîn.
Hê ji min dil herîşandê (a)
Sulhtiyê arê te me (b)
Hiş û aqil şewîşandê (a)
Sews û bîmarê te me (b)
 (Osman Sebrî)
Beşavenda pêçayî : beşavenda ku li rêza a b b a tê danîn.
Bedewî çilmisî l'ber pêlên zeman (a)
Lê şabaş! di dêlwe jîrîtî geş bû (b)
Dilbera ku di wextê de keleş bû (b)
Gula geş e, li baxê aqilmendan (a)
 (R.Barnas)
Redîf : bêje an kîteyên di nivisandin û maneyê de wekhev ên di dawîya beşavendê de tên.
Bizan ko min yar tî wî
Dil jî bîrîndar tî wî
 (Feqiyê Teyran)

<i>di gel dîl ber</i>	<i>bi çin geş tê</i>		
<i>Ji ew xweş tir</i>	<i>'u mur na bit,</i>	<i>li min ew hal</i>	<i>qe wî xweş tê.</i>
Me fa î lun	me fa î lun	me fa î lun	me fa î lun
. / / /	. / / /	. / / /	. / / /

c u z			

q a l i b			
Pevgihandek : Ji bona vekirî xwendina kîteyêke girtî, dengdara (konson) dawîya bêjeyê-			

kê jê veqetandin û bi gihandina bêjeya di pey a ku bi dengdêr(voyel) destpêkirî xwendin e. Herwekî:
Hin gul û hin enber in, hin şîrîn û esmer in.
 (Cizîrî)
 Meriv dikare vê rêzê bêje bi bêje ji hevûdu veqetandî (bi «fesil») bixwîne;
Hin / gul / û / hin/ enber / in, / hin/ şîrîn/ û esmer / in.
 û meriv dikare bi awayê jêrîn bixwîne;
Hin gu / l û / hin / enbe / r in / hin / şîrî / n û es me / r in.
 Li vê derê di «**gu** / l û», «**r in**», «**n û**» de pevgihandek hatiye kirin ku dengdara dawîya «gul», «enber», «şîrîn», «esmer» bi dengdêra serê bêjeya berî xwe ve bi riya xwendinê hatiye gihandin ku pevgihandek ev e. Ji vê re «wesil» jî tê gotinê.
Jêveqetandek : Jê re fesil jî tê gotinê ku berevajiyê pevgihandekê ye. Çi pevgihandek û çi jêveqetandek ji bona ahenga kêşê tê kirinê. Jê

re «fesil» jî tê gotinê. (Binêre li nimûne-ya pev-gihandekê).
Kîteya vekirî : Kîteya ku bi dengdêrekê diqede, herwekî *ba, şe, rê, bi, kî, ko, du, zû.*
Kîteya dirêj : Kîteya ku bi dengdêreke dirêj (*a, ê, î, û*) diqede.
Kîteya kurt : Kîteya ku bi dengdêreke kurt (*e, i, o, u*) diqede.
Kîteya girtî : Kîteya ku bi dengdarek (konson) diqede, herwekî *kal, berf, zêr, cil, pîr, bor, kûr, cur.*
Beşavend : qafiye. Drûvpêketina dangan a di kîteya dawin a bêjeyan de ye.
Beşavenda çaryek : beşavenda ku bi nêzedengdarekê diqede «**guj**» û «**kaş**».
Nivbeşavend : beşavenda ku bi dengdareke wekhev diqede «**mil**», «**pal**», «**bel**».
Tu yî qadîr bi yek emrê te yê «kun!»
Mukemmel bûye alem bêserûbin
 (Şêx Eskerî)

re «fesil» jî tê gotinê. (Binêre li nimûne-ya pev-gihandekê).
Kîteya vekirî : Kîteya ku bi dengdêrekê diqede, herwekî *ba, şe, rê, bi, kî, ko, du, zû.*
Kîteya dirêj : Kîteya ku bi dengdêreke dirêj (*a, ê, î, û*) diqede.
Kîteya kurt : Kîteya ku bi dengdêreke kurt (*e, i, o, u*) diqede.
Kîteya girtî : Kîteya ku bi dengdarek (konson) diqede, herwekî *kal, berf, zêr, cil, pîr, bor, kûr, cur.*
Beşavend : qafiye. Drûvpêketina dangan a di kîteya dawin a bêjeyan de ye.
Beşavenda çaryek : beşavenda ku bi nêzedengdarekê diqede «**guj**» û «**kaş**».
Nivbeşavend : beşavenda ku bi dengdareke wekhev diqede «**mil**», «**pal**», «**bel**».
Tu yî qadîr bi yek emrê te yê «kun!»
Mukemmel bûye alem bêserûbin
 (Şêx Eskerî)

yar û birîndar beşavend in.
ti wî redîf e.

Rêz : rêza nivîsarê ya nezmê an nesrê.

Malik : beyit. Durêzeya nezmê.

Azade : rêza bi serê xwe ya nezmê ku ne bi malik an bi perçekî nezmê ve ye.

Takemalik : malika bi serê xwe ku ne di nav xezel an qesîdekî de ye.

Malika destpêkî : metle'. Di xezel û qesîdeyan de malika destpêkirinê.

Xweşmalika destpêkê : husnî metle'. Malika diduyan a xezel an qesîdeyê.

Xweşmalika dawiyê : husnî meqte'. Malika diduyan a paşî ya xezel an qesîdeyê.

Malika dawîn : meqte'. Malika dawîn a xezel an qesîdeyê ku di xezelan de navê şair di vî malikê de derbas dibe.

Şahmalik : şahbeyt, beyt ul xezel. Malika heftî bedew a xezelê.

Bend : koma rêzên nezmê ku ji çar, pênc, şeş... deh rêzan pêk tên.

Xezel : teşeya sereke ya nezmê edebiyata dîwanî ye. Ji malikan pêk tê. Bi gelemperî, bi hindikî ji pênc malikan dest pê dibe û heta bîst, bîst û pênc malikan jî dirêj dibe.

Numûne

XEZEL

*"Er"er xerame bi qedd û qamet
Yek bûse da me bi sed qiyamet*

malika destpêkî (metle')

*Yek bûse bexşî ewwel bi îhsan
Axir li min kir cirm û xeramet*

xweşmalika destpêkê(husnî metle')

*Ji jeng û zerqê da dil bişotin
Cama sedef bîn rind û keramet*

*Ji herdû çêşmên te y' mest û xûnrêz
Nûra du çêşman kê dî selamet*

*Li derdû êşan peykan û nîşan
Me j' herdû çêşman kifş in 'elamet*

*Ruswayê 'îşqê tenha ne ez bûm
Kes dî zemanan hub bê melamet*

sahmalik(beyt ul xezel)

*Du secde ferz in filhal bibin ber
Dema xuya bit ew qed û qamet*

*Da eybê rindan nekî bi badî
Nufûsu qewmîn biha tesamet*

xweşmalika dawiyê (husnî meqte')

Mela li 'umrî bêfayde bûrî

Kêşa bi zorê qehr û nedamet

malika dawîn (meqte')

(Melayê Cizîrî)

----- a
----- a
----- b
----- a
----- c
----- a
----- d
----- a
----- e
----- a
----- f
----- a

Xezela rêzkirî : xezela ku rêzên wê di nîvekê de jî bi beşavend e û gava meriv rêzê di nîvê de dişkêne malik dibe kerte. Jê re xezela musammat jî tê gotin.

Numûne

Serwînazê **serfirazê** şubhê zêr remza **mecazê**
Dame ber çakûç û **gazê** dil ji min bir dil ji min

malika xezela rêzkirî

(Melayê Cizîrî)

Serwînazê serfirazê

Şubhê zêr remza mecazê

Dame ber çakûç û gazê

Dil ji min bir dil ji min kerte

Nezîre : carina şair ji xezelekê ku şairek din nivîsandiye gelek hez dibe. Ji ber vî hezkirinê an jî ber rêzgirtina wî şairî, şair xezelekê dinivîsine ku ev xezel bi babet, kêş, beşavend, redîf, di dirûvê wê xezelê de ye.

Qesîde : ji curên nezmê yên edebiyata dîwanê ye ku bi mebesta pesindayîn an navnokirina yekî an tiştekî tê nivîsandin. Teşeyê qesîdeyê wek yê xezelê ye, ji malikan pêk tê. Malikên qesîdê ji sihî heta not û neha ne. Lê yên zêdetir jî hene.

Avakirina qesîdeyê bi gelemperî li gora vî rêzê çêdibe

1. **Xweşkirin** (teşbîb) bira pêşî ya qesîdeyê ye, ku şair bi teswîrkirina tiştekî dest bi qesîdeya xwe dibe. Ev teswîr dibe a cejn, bihar, bajar, şûr, roj, gul, havîn, payîz, zivistan, hesp, sunbil, remezan û h.w.d be.

2. **Gurîzgeh** malika derbasok a ji bira xweşkirinê derbasî bira mebestê ango pesindanê bûn e.

3. **Pesindan** (medhiye) bira bingehî ya qesîdeyê ye ku mebesta şair di vî de kom dibe. Şair di vî birê de pesnê merivêkî mezin dide.

4. **Texezzul** xezela di pey pesindanê de ye.

5. **Xwepesindan**(fexriye) di vî birê de şair pesnê xwe dide.

6; **Tacmalik** malika ku navê şair tê de derbas dibe, ku ev malik di dawîya bira xwepesindanê(fexriye) de tê.

7. **Hêvî**(du'a) di vî birê de şair ji bo ew kesê ku pesnê wî daye duayên qenc dibe, û bi

vê birê qesîde diqede.

Mesnewî : yek ji teşeyên nezmê edebiyata dîwanê ye, ji malikan tê honandin û her malik di nav xwe de hevbeşavend e. Di babetên dirêj û çirokan de ev teşe tê bikaranîn. Mem û Zîn û Mewlûd bi vî teşeyî hatine nivîsandin.

Kerte : qit'e. Bi hindikî ji çar rêzan pêk tê.

Sêyîn : perçeyên sêreze ne. Hevaxaftina Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran bi sêyîna ye.

Çarîn : rubaî

Çarane : murabba'. Ji bendên çar rêz pêk tên.

Pêncane : muxemmes. Ji bendên pênc rêz pêk tên.

Sesane : museddess. Ji bendên şeş rêz pêk tên.

Heftane : musebba'. Ji bendên heft rêz pêk tên.

Hestane : musemmen. Ji bendên heşt rêz pêk tên.

Nehane : mustessa. Ji bendên neh rêz pêk tên.

Dehane : mueşşer. Ji bendên deh rêz pêk tên.

Çaranekirî : terbî'. Bi du rêz zêdekirina li malikên xezela şairekî dinê çêkirina çarane ye.

Çaraneya hevrêz : çaraneya ku rêza çaran a benda pêşî di dawîya her bendî de tê tîkîr kirinê.

Çaraneya hevbesavend : çaraneya ku rêzên dawîn ên her bendê bi rêza dawî ya benda pêşî re hevbeşavend e.

Serdeyî : ji bona çêkirina çaranekirî(an pêncanekirî, şeşanekirî, ... dehanekirî) li serê malikên xezela dê bê çaranekirin (û yên din) zêdekirina bi du rêzan e. Di pêncanekirinê de sê, di dehanekirinê de heşt rêz tên zêdekirin.

Nêvdeyî ji : bona çêkirina çaranekirî (an pêncanekirî... dehanekirî) di nav rêzên malikên xezela dê bê çaranekirin (an yên din) zêdekirina bi du rêzan e. Di pêncanekirinê de sê rêz, di dehanekirinê de heşt rêz lê tene zêdekirin.

Numûne

----- malika xezela ecibandî

x x x x x x x x x x x x x x x x x x

x x x x x x x x x x x x x x x x x x du rêzên çaranekirinê yên şair

x x x x x x x x x x x x x x x x x x

x x x x x x x x x x x x x x x x x x (serdeyî)

----- çaranekirîya serdeyî

x x x x x x x x x x x x x x x x x x

x x x x x x x x x x x x x x x x x x (nêvdeyî)

----- çaranekirîya nêvdeyî

Pêncaneya nehevbesavend : terdiye. Pêncaneya ku rêzên pêncan ên bendan ne hevrêz in û ne jî hevbeşavend in.

Vegerbend : terciî bend. Teşeyek ji teşeyên nezma dîwanê ye ku ji bendan pêk tê. Her bend bi drûv mîna xezelê ye û malika dawîn a benda pêşî di nav xwe de hevbeşavend e, ku ev malik(vegermalik) di pey her bendê de bêguhartin tê.

Vegermalik : malika di dawîya bendên vegerbendê de ye, ku erka wê bi vegera li ser benda pêşiyê bendan bi hev ve girêdide.

Girêbend : terkîbî bend. Wek vegerbendê ji bendan pêk tê. Malikên di dawîya her bendê de bi serê xwe hevbeşavend e û erka wê girêdana du bendan e.

Girêmalik : malikên di dawîya bendên girêbendê de nê.

Hunerên edebî : hunerên gotin û vegotinê ne.

Hevdengî : hunerê hev deng çêkirinê (binêre li hev deng).

Hevreh : hunerê bikaranîna gotinên ji rehekê ye.

Pircare : tekrîr. Ji bona xurtkirina tesîra gotinê, hin gotin an hevokan pir car dîsakin e. Herwekî «merheba» yên di Mewlûdê de.

*Merheba ey sirrê Furqan merheba
Merheba ey derdê derman merheba*

*Merheba ey canê baqî merheba
Merheba 'uşşaqê saqî merheba*

*Merheba ey alî sultan merheba
Merheba ey kanê 'irfan merheba
(Melayê Bateyî)*

Jêwergirtin/Jêveguhastin : îqîbas. Ji bona bihêzkirina gotina xwe, bikaranîna gotinek ji yekî dinê ye. Di edebiyata dîwanî de ev bi piranî bi bikaranîna ayetek an hedîsekî pêxember dihate kirin.

Pêç û belav : lef û neşir. Berê vebîrandina du an çend tiştan e, û di pey de gotina tiştên ku girêdayê bi wan ve ne. Bi vî awayî sîmetriya bêjeyan tê çêkirin.

*Bes niye her dil te xûyê Pîrê Sen'anî mesel
Bendê benda kafirê bê dîn û bê îmanekê.
(Pertew Begê Hekarî)*

Lêveger : hunereke edebî ye, ku meriv gotina dawîn, an gotineke bingehîn a dawîya rêza an malika berê di serê rêza an malika nû de dubare dike û bi vê, li rêza an malika berê vedigere.

*.....
Berê xwe da bi min carêk hilîna xadimê çarik
Me dît hîlbû ji wê nalek çî ku zêra şefeq dabû*

*Şefeq dabû me qenc dîtîna guhar û berben û tîtin
Mixalîf new' û textlît in, muresse' cumle lêdabû*

*Muresse' teyr û qemçî ne, rex û rex belg û rêşî ne
Hemî zêr û mirarî ne, li ser eniyê temenna bû.*

.....

(Bekir Begê Erzî)

Nezaniya bi zanîn : tecahul ul-'arif. Tevî ku meriv bi rastiyê dizane lê ji bo zêdekirina hêza pêjnê, xwe li nezaniyê datîne.

*Xoceyê Xidrî xelet çû kaniya ava heyat
Lêvê le'lê te y' şeker-rêz bê guman ew kanî ye.
(Cegerxwîn)*

Xwesbehane : husnî ta'lîl. Bûyîna tiştêkî an bûyerekê, ne bi sedemê wê yê rastîn, lê bi baha-neke xweş nîşandayin e.

*Telbe kir weslê ji dilber me bi 'mwanî zekat
Go tu ebd î û bi ebdê xwe zekatê nadim.
(Melayê Cizîrî)*

Kesandin : teşxîs. Kesayetiya(şexsiyet) mirovan dayîna tiştên neheyber wekî dar û ber, û heywanan e. Di şî'r û çîrokên de heywan, û tiştên ne heyber(bi ruh) wek ku xwedî kesayetiya mirovî bin, ango wek mirov bin bi mirovan re didin û distînin an wek mirovan dilivin.

*Tawis bi wî şiklê melîh şermendeyê saqê di reş
Ew qijika gûxwir binêr, qij qij dîkît»elwan im ez»
(Axayok)*

Şermendebûn(berxweketin) û pesindarî taybetiya mirovan e, perçekî ji kesayetiya mirovan e ku bi heywan û tebyan re peyda nabe. Lê li vê derê şair kesayetiya mirovan daye tawis û qijikê ku tawis şermî û qijik jî qure ye.

Peyivandin : întaq. Heywan û heyînên neheyber wekî ku mirov bin, bi peyivîna dayin e.

*Rovî gotê ez xulam Ji Kurdistan heya Şam
Min nedîn wek gurê zer Bê mêjî û zirt û ker
(Roviyê Jîr-Osman Sebrî)*

Lihevî : tenasub. Bi hev re bikaranîna du an çend gotinên ku ji aliyê mane, babet an cureyî ve têkiliya wan bi hev re hebin.

*Serxweşê cama şerbetê dêm şubhê şem'a zulmetê
Horiya d' baxê cennetê serdarê çendîn mehweş e.
(Eliyê Herîrî)*

Di vê malikê de serxweş - cam(piyan) - şerbet(mey), şem'(find) - zulmet(tarî), horî - baxê cennetê û mehweş(mîna hîvê/heyvîn) ji aliyê

mane, babet û cureyî ve têkildar in.

Pîrs : Ne ji bona bersîv stendina tiştêkî ku meriv pê nîzane, lê ji bona balkişandin û xurtkirina pêjnê hunera gotinê ya bi riya pîrsê ye.

*Ew çî bejn e, ew çî qamet, ew çî qedd e, dilruba?
Ew çî exbar in, te can de, ew çî durr in, pur buha?*

*Ew çî narinc û turunc in, ew çî sêv in, sîmeca?
Ew çî mehtab in, binagûş, ew çî subh e, nûrfeza?
Rohniya şama firaqê, şem' û mala kê yî tu?
(Macin)*

Kî pê dizane?

Gelo kî ji we bi zimanekî ewropî an rohelaî navên dar an kulîlkên jêrîn dizane? Yên ku dizanin bila ji kerema xwe ra ji *Kurmançî* re binivîsînin, arîkariya me bikin.

Ji niha ve spas.

kinêr : darek e ku donê wê di bîrovê didin û ew sax dike.

masîjark : giyayê ku ji bo girtina masiyan bi kar tînin. Li aliyê Hekariyê jê re *masîcark* dibêjin, bi bejn e û tayê wê stûr e, havînî û demî ye.

Hun meyweyek bi navê *germox* an *zersik*, kulîlkek bi navê *xemla bûkê* dinasin?

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîstî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

BERLÎN II

Civîna heştêmîn a li ser zimanê kurdî, zaravayê kurmancî li Almanyaya yekbûyî, li bajarê Berlînê civiya. Civîn pênc rojan, ji 10 heta 15ê kanûnê dom kir. Giraniya xebata vê civînê li ser termên dezgehên cotkarî, çandinî û navên pez û dewaran bû. Ji van pê ve civîn li ser dûmahîka termên edebî, anatomiya mirov, ferhengoka *Sewra Azadî* ya Cegerxwîn, a *Memê Alan* û ya kovara *Stêrê* xebitî.

Hevalên ku beşdarî civîna pahîza 1990 an bûn, ev in: Khosrow Abdollahî (Selmas), Mahmûd Baksi (Xerza), Rojen Barnas (Diyarbakir), Muzeffer Begzade (Şikakan), Mûsa Kaval (Hekarî), Zeynelabidîn Zinar (Batman), Hazim Kılıç (Hekarî), Hemîd Kılıçaslan (Mêrdîn), Huseyin Kurdo (Amûd), Kendal Nezan (Diyarbakir), Zinar Soran (Mêrdîn), Mehmed Uzun (Sivêrek) û Reşo Zilan (Ağırî).

KURMANCÎ

Termên Edebî

Rojen Barnas

Niçlêdan : taariz kirin. Bi mebesta tinaz pêkirinê an yekî piçûkxistinê an jî niçlêdanê, gotina xwe bi maneyeke bi temamî bervajiyî wê gotinê gotin e. Herwekî ku ji yekî derengmayî re meriv bêje, ev çî heliza te bû tu çima ew çend zû hati.

Niç : taariz (t) *dokunma, taşlama* (f) *satire* (e) *satire*.

Dirûvpêxistin : Teşbih. Du tiştên an kesên ku dirûvê wan bi hev kevin, dirûvê yê qels bi yê xurt xistin e. (t) *benzetme* (f) *allégorie* (e) *allegory*.

Herwekî: Zozan *wek gulekê xweşik* e.

HÊMANÊN DIRÛVPÊXISTINÊ: Çar hêmanên dirûvpêxistinê hene.

- Dirûvpêketî**: Muşebbeh. Yê dirûvê dayî (yê qels). Zozan *wek gulekê xweşik* e. Zozan dirûvpêketî ye.
- Dirûvdar**: Muşebbehun bîh. Yê dirûvê xistî (yê xurt). Zozan *wek gulekê xweşik* e. Gul dirûvdar e.
- Dirûv**: wechî şebêh. Aliyê an awayê dirûvpêketinê ye. Zozan *wek gulekê xweşik* e. Xweşik aliyê dirûvpêxistinê ye, dirûv e.
- Daçeka dirûvpêxistinê**: edatî şebêh. Zozan *wek gulekê xweşik* e. «Wek» daçek e û li vê derê daçeka dirûvpêxistinê ye. Ji bili «wek»-ê daçekên dirûvpêxistinê ev in: mîna, nola, asa, misl, manend, weş, goya, sankî, meger, çawa, çendş

CURÊN DIRÛVPÊXISTINÊ:

- Dirûvpêxistina tevekî**: Teşbihî mufessel: dirûvpêxistina bi her çar hêmanan e; dirûvpêketî, dirûvdar, dirûv û daçeka dirûvpêxistinê pêkve hene. Herwekî:

Termên çandiniyê li hêla Mêrdînê

Amadekar: Zinar SORAN

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilizî
cot	çift	charrue	plough
cotkarî	çiftçilik	agriculture	agriculture
cotkar	çiftçi	cultivateur	farmer
erd	arazi	terre, terrain	earth, ground
erdê avî	sulak arazi	terre irriguée	irrigated land
erdê bejî	kurak, susuz arazi	terre non irriguée	non irrigated land
erdê best	kumlu yamaç arazisi	terre sablonneuse	sandy soil
erdê qiraç, xîç	kıraç arazi	terrain friche	waste land
erdê beyar	boş bırakılmış, ekilmemiş arazi	terre non cultivée	uncultivated land
erdê bûr	başboş arazi	terre abandonnée	abandoned land
erdê kirêb	bir kez sürülmüş tarla	champ labouré une fois	field ploughed once
şûv / şov	ekime hazır tarla	champ prêt aux semailles	field ready for sowing
kat	ekilmiş fakat herhangi bir nedenle biçilmemiş tarlanın ertesi yıl sürülmeden kendiliğinden ürün vermesi	champ labouré et semé mais non récolté pour une raison quelconque, qui l'année suivante donne des récoltes sans être à nouveau labouré	ploughed and sown field but for some reason not harvested, which will yield a crop the year after without having to be ploughed again
zîl dan	çimlenmek	germer	to sprout
hêşîn bûn	yeşermek	verdier	to turn green
ketina beqê,	başğa durmak	amorce de formation	initial forming of
avis bûn, pîk bûn		des épis	ears (corn, etc.)
seridîn, şirik girtin	başaklanmak, başağın sütle dolgunlaşması	former des épis emplissage du tégument du grain	to form ears filling up of seed's integument (dumahîk rûpel 3)

Zozan wek gulekê xweşik e.

2. **Dirûvpêxistina kurtane:** teşbihî mucmel. Dirûvpêxistina ku bê hêmana dirûv tê çekirin. Herwekî: *Zozan wek gul e.*
3. **Dirûvpêxistina xurtkirî:** teşbihî mukked. Dirûvpêxistina ku bê daçek tê çekirinê. Herwekî: *Bi xweşikbûnê Zozan gul e.*
4. **Dirûvpêxistina rewan:** teşbihî belîx: dirûvpêxistina ku bi tenê bi dirûvpêketî û dirûvdar tê çekirin. Herwekî: *Zozan gul e.*
5. **Dirûvpêxistina kurt:** teşbihî mûce: teşbiha bi gotinên herî hindik tê kirin.

Hinarîk gul, temorîk gul

Çav û dev pêkve gulxonçe

Ne guldan e dilbera min

Lê gulistan e, rinda min.

(R.Barnas)

Di vê numûnê de: hinarîk wek gulê sor e, temorîk mîna gulê bi xweşbihn e, çav nola gulê geş e, û dev ji mîslê gulê lihev, xwezîbij û dilkêş e. Ji van heryek bi awakî dişihîbin gulê. Ev piranî ji dibê di gulekê de bi serê xwe peyda nebe, lê bi tenê di gulistanê de hebe.

6. **Dirûvpêxistina nimandî:** teşbiha temsîlî. Di navbera dirûvpêketî û dirûvdar da carina gelek aliyê dirûvê hene ku hunermend ne bi tenê bi aliyekî lê bi gelek aliyên dirûvdarîyê dirûvpêxistin çêdike. Ji vê dirûvpêxistinê re dirûvpêxistina nimandî tê gotin.

Mecaz: bikaranîna gotinê ya ji maneya wê ya bingehîn bi maneyeke dîtir e. (t) *mecaz* (f) *métaphore* (e) *metaphor*.

Mecaza hinartî: mecazî mursel : Bê mebesta dirûvpêxistinê bikaranîna mecazê ye. (t) *mecazi mürsel* (f) *métonymie* (e) *metonymy*

Îstiare: dirûvpêxistina ku bi tenê an ji dirûv-

pêketî an jî ji dirûvdar pêk tê.

Îstiarê vekirî: îstiarê musarraha. Îstiarêya bê dirûvpêketî (muşebbeh) ye.

Îstiarê girtî: Îstiarê mekniye: Îstiarêya ku bê dirûvdar tê çekirinê.

Mezmûn: îstiarêyên vekirî ne. dêlva bejnê ve serw, dêlva çav ahû, dêlva bijang ûr, zulf: kafir, perîşan, dev: hoqe, nuqte.

ÇEŞNÊN EDEBÎ

(t) *edebi türler* (f) *genres littéraires* (e) *literary genres*

1. **Çeşnên bingehîn:** Ji bilî şîrê li gora mebest û teknikên xwe, ji sê koma pêk tên.

a. **Çeşnê vegotinê:** Destan, çîrokên xeyalî (bi perî, dêw, cin), çîrokên gelêrî (serpêhatiyên mirovî ên gelêrî); **fabl:** (çîrokên ku qehremanên wan rawir in), kurteçîrok, mesnewî, çîrokên hunerî (yên nivîskarî), roman.

b. **Çeşnê rapêşiyê:** Çeşnên şanûgeriyê (tiyatroyê).

c. **Çeşnê ramanî:** Nivîsarên wek bend, cêribandin ((f) *essai*), suhbet.

2. **Çeşnên alîkar:** Çeşnên alîkar hem di nav çeşnên bingehîn de wek hêmanek alîkar tene bikaranîn, hem jî bi serê xwe lixwêser hene: Biografi (jînenîgarî), bîranîn, ger, name, gotar, rexnenivîs, dîrok.

Destan: (t) *destan* (f) *épopée* (e) *epic*

Destanî: (t) *destansal* (f) *épique* (e) *epic*

Efsane: (t) *efsane* (f) *légende* (e) *legend*

Efsaneyî: (t) *efsanesel* (f) *légendaire* (e) *legendary*

Bend: (t) *makale* (f) *article* (e) *article*

Gotar: (t) *nutuk* (f) *discours* (e) *speech*

Cêribandin: (t) *deneme* (f) *essai* (e) *essay*

Dram: Afirandina tiyatroyê ya dilpêşewitîn û pêkenî pêkve ye (t) *dram* (f) *drame* (e) *drama*.

Dramnivîs: Nivîskarê dramê.

Komedî: Afirandina tiyatroyê ya pêkenî ye.

Komedînivîs: Nivîskarê komediyê .

Trajedî: Afirandina tiyatroyê ya dilpêşewatê ye.

Trajedînivîs: Nivîskarê trajediyê.

Şanûgerî: Tiyatro.

Şanû: (t) *sahne* (f) *scène* (e) *stage*

Şanûger: Lîstikvanê tiyatroyê.

Ramana sereke: Di nivîsarekê de fikra esasî, fikra bingehîn. (t) *ana fikir* (f) *idée principale* (e) *main idea*.

Hevtîp: (f) *Anagramme*. Hunera bikaranîna gotinên ku tîpên wan wek hev in, lê mane û xwendina wan cihê ye. Herwekî : Selma û Elmas, Nisan û Nasîn, Ber û Reb.

Deredemî: Hunera bûyerekê an kesekî bi zanî di tarîxeke dîtir de nîşan dayin (f) *anachronisme*.

Bênav: Nivîsarên ku nivîskarên wan ne diyar in, û wek malê gel gişt bi kar tînin. Çîrokên bênav; çîrokên gelêrî. (t) *anonim* (f) *anonyme* (e) *anonymous*.

Bênavî: (t) *anonimlik* (f) *anonymat* (e) *anonymity*.

Navber: Di leyistika tiyatroyê de navbera du perdeyan (t) *fasıla* (f) *entracte* (e) *intermission*.

Peyvnasî: termînolojî.

Vegotin: (t) *anlatmak* (f) *conter, raconter* (e) *to relate, to tell*.

Çîrok: (t) *hikaye, masal* (f) *conte* (e) *tale, story*.

Çîrokbêj: (t) *masal, hikaye anlatan*

Rapêşî: (t) *gösteri* (f) *représentation* (e) *performance*.

Rapêş kirin: (t) *temsil etmek* (f) *représenter* (e) *to perform*.

Leyîzvan, lîstikvan: (t) *oyuncu* (f) *acteur, comédien* (e) *actor, comedian*.

Şadîk: (t) *eğlendirici* (f) *amuseur, divertisseur* (e) *entertainer*.

Hevmane: (t) *eşanlamlı* (f) *synonyme* (e) *synonymous*.

<i>(dumahiika rûpela 1an)</i>			
kulîlkdan, şalik girtin	(baklagiller) tanenin sütle dolgunlaşması	emplissage du tégument des grains de légumineuses	filling up of integument of leguminous plant's seed
zer bûn, zergulî bûn	sararmak	blondir, mûrir	to turn golden, to ripen
xubarî	yağmur öncesi tohum ekme	semilles avant les premières pluies	sowing before rainfall
gîsnê zêr	yağmur sonrası yabancı otlann yeşermesi ardından sürüm ve ekim	labourage et semilles après les pluies et la pousse des herbes sauvages	ploughing and sowing after rainfall and growth of wild grasses
gîsnê reş	yeşerme ile birlikte don ve ayazın vurduğu ekin	récolte atteinte par les gelées	harvest affected by frost
serav	yağmur sonrası ekim	semilles d'après les pluies	sowing after rainfall
bizar kirin / tov	ekmek	semer	to sow
kirin / çandin			
bizir / tov	tohum	semence	seed
zad / tene	tane, tahıl	grain	seed
çînîn / dirûn	biçim, biçme	récolte, moisson	harvest, crop
paleyî	orakçılık	métier de moissonneur	harvester's trade
pale	orakçı	moissonneur	harvester
serpale	başorakçı	moissonneur en chef	chief harvester
dûpale	artçı orakçı	aide-moissonneur	harvester's help
qefil	bir kaç desteden oluşan demet	gerbe formée de quelques javelles	sheaf made up by several swathes
qefilvan	demet toplayıcı	ramasseur de gerbes	collector of sheaves
liqat	oraktan kurtulmuş başakları elle koparma işi	glane	handful of ears left over after the sheaves have been collected
liqatvan	liqat işini yapan	glaneur, glaneuse	person who picks up leftover ears in the field
berdas	bir oraklık alan	édendue de champ pouvant être récoltée d'un coup de faucille	expanse of field ready for harvesting by sickle
dîk	oraktan kurtulmuş başak	épi non coupé par la faucille	ear which is not cut by sickle
şixre, kişre	sapları harmana taşıma işi	transport des épis vers l'aire de battage	transport of ears to threshing area
darşixre	sap yükleme askısı	cadre de bois à deux versants que l'on met sur le bât des bêtes de somme pour le transport du foin	two sided wooden frame which is put on packsaddle to carry hay
şixrevan	harmana sap taşıyan	transporteur de foin ou d'épis de céréales	person who transports hay or cereals' ears
selb, sepl, darcêrk, xerek	su, taş, v.b hayvanla taşımada kullanılan askı	cadre de bois que l'on met sur le dos des bêtes de somme pour le transport d'eau, de pierres etc.	wooden frame which is put on packsaddle to carry water, stones etc.
qûncêrk	testilik, testi konulan ağaçtan veya topraktan yapılmış özel yer	porte-cruches en bois ou en terre cuite	wooden or earthenware jug carrier
qalûçik, şalok	küçük orak	faucillon	small sickle to cut kindlings
qeynax	orakla biçimde sol ele geçirilen parmaklıklık biçim yardımcı aleti	protège-main des moissonneurs	harvester's hand protection
tar	tahtadan yapılmış -S- biçimindeki orakla biçimde sol ele geçirilerek kullanılan biçme yardımcı aleti	instrument en bois en forme de "S" que le moissonneur met dans sa main gauche pour tenir l'herbe ou le foin qu'il vient de couper par la faucille de sa main droite	wooden tool in the shape of an "S" that the harvester keeps in his left hand to hold the grass or the hay which he just cut with the sickle in his right hand
kosere, xarik	yumuşak bir tür zımpara taşı	variété de pierre ponce	variety of pumice stone
heste	bileme demiri	fer à affûter	sharpening or grinding iron
hesan	bileyi taşı	pierre à aiguiser	sharpening or grinding stone, whetstone
sêgulî	üçlü çatal	fourche à 3 branches	3 pronged pitchfork
bolvir	bir tür iri elek	tamis à grosses mailles	wide meshed sieve
(Heyvcot: Ji ber ku di nav xelkê da herdu heyvên dûmahîkê yê payîzê û herdu heyvên pêşîn yê zivistanê wekî «çirî, çirî û kanûn, kanûn» tene zanîn, lewma jî bo wan heyva, heyvê cot tene gotin.)

Şevzengil : Ji bo sihê heyva çile (kanûna paşîn) tete gotin. Ev nîşane li ser bûyerekê hatiye danîn :

Li welatê Hekarîya; mirovekê sê kur û sê bûk hebûne. Ew mirove, yekî zana û serwext bûye. Şeva berî heyhotê anku sihê heyva çile (kanûna paşîn) hemû li mal rûniştine. Mêrik di nişkê da guhên xwe bel dîke û dibêje biçûkê xwe ku bêdeng bin. Dengêkê jî kêriya (zinarên biçûk yê li dora gund) piştta gund dibihîze. Hema dibêje ku ew şeva dê befireke giran bêtin. Kurên xwe radike û dibêje ku biçin gayê xwe ser jê bikin. Dibêje bûkên xwe jî ku haziriya kelam-dîna goşt bikin. Ga tete ser jê kirin û qazan li ser agir tene danîn. Di vê demê da ew bi xwe jî dareki 2-3 bihosta dirêj tîte û zengilekê bi serî ve girêdide û diçe ser ban û diçikilîne. Befir dibare, hem jî bêsekinîn. Ew li jor dest bi xwarina goşt dikin. Gava dengê zengilê disekine kurê xwe rêdike ser ban ku befirê bimalin. Heta sipêdê vî karî didomînin. Bi vê yekê jî bin befira giran xilas dibin. Sipêdê derdikevin gund ku çî bibînin! Gund pêkve maye di bin befirê da û mirov hemû fetisîne. Tenê ew xilas bûne. Ji wê rojê pê ve, şeva berî heyhotê wekî şevzengil bi nav dikin û ewe li nav xelkê dibe nîşanek.

20ê sibatê : Hatina firindên sorewêr yê koçer e. Nîşana guhurîna hewa ye. Anku sarma dişikê.

Zîpe an jî **zîpik** : Du cure zîpe hene : **zîpêt sibatê** : Çar rojên dûmahîka sibatê zîpên sibatê ne; **zîpêt adarê** : Çar rojên pêşîne adarê jî zîpên adarê ne.

Gava zîpeyan dest pê kir, êdî seqayê hewa dişikê û hewa ber bi germê ve diherike. Di zîpeyan adarê da, av li dara digere û eve nîşana hatina biharê ye.

Li ser zîpeyan çend gotin jî hene:

Berî zîpeyan heşt roja heke befir bibare, hingê befir zêde dimîne anku direng dihele. Belêm, piştî zîpeyan heşt roja befir bibare, namîne û zû dihele.

Li ser befira piştî zîpeyan metelokek jî heye:

*18ê adarê 18 bihostêt befirê hatine xwarê
Xwe negirt heta danê êvarê*

Agirxweşî : 9ê adarê, bi manaya «xweşiyê», agir tête hilkirin.

Avetîkê nîsanê : 10 rojê serê nîsanê ne. Carina heta 20ê nîsanê jî diajon. Di vê demê da baran gelek dibare û hewa sar dibe. Heke baran bibare dîsa hewa gerimtir e. Belêm, heke hewa sahî be jî çilê zivistanê jî sartir dibe. Di nav xelkê da wekî nîşana sarma biharê tête zanîn û nexweşî pê têt. Nexweşiyên wekî *ta* û *persîfê*.

Stêrê pêrû, pêwir : Eve komestêr in û wekî şilxê mêşan e. Nîşana hatina havînê ne, ji milê rojhilatê ve tene dîtin. [(t) ülker, süreyya yıldızı, (f) la pléiade, (i) the pleiade.]

Stêrê terazî : Ev stêre jî 25ê hezîranê ji milê rojhilatê ve tene dîtin. Komek in. Sê li milê rastê, sê jî li milê çepê û yek jî di nîveka wan da wekî terazîyê xûya dibin. Lewma jê ra stêrê terazî dibêjin.

Nîşana destpêka çilê havînê tene zanîn. [(t) terazi takım yıldızları, (f) constellation balance, (i) libra.]

Çilê havînê : Ji dûmahîka hezîranê heta 20ê tebaxê dom dike. Kela hewayî bilind e.

Stêrka gelavêj, qorix : 15-20ê tebaxê, stêrka gelavêjê derdikeve. Ev stêrke nîşana şikestina germa hewa ye. Hewa ber bi sarmayê ve ye. Piştî stêrka gelavêjê derket, dewar li ser tewlê nayên girêdan. Wekî nîşana xilasiya havînê tête zanîn. [(t) çoban yıldızı, (f) étoile du Berger, vénus, (i) shepherd's lamp, Venus.]

Li ser hatina stêrka gelavêjê nîşanek jî tête gotin: Sipêdê here binê dara kezwanê, heke te belgê zer dîtin ew nîşana derketina gelavêjê ye.

(Stêrê Perû, terazî û gelavêj heta serê kanûnê (kanûna pêşîn) li esman in. Serê kanûnê ava dibin. Eve jî wekî nîşana hatina zivistanê tête zanîn.)

Canemêrg : Kulîlkek e, ji 10ê îlonê pê ve derdikeve. Nîşana payîz û sarmayê û destpêka çandina payîzê ye.

10ê îlonê : Eydil siliv e. Adû, anku mar, kimkime, dûpişk, kêvcale, kirim û ev cûre heywanên dikevin binê axê. (Adû, heywanên xwûşikîn in.)

Aveşûtik : Dema baran gelek dibare ji beten û pesara ber bi dolan ve aveşûtik çêdibin. Nîşana lehiyê ye. Gava aveşûtik hatin divê ji wan dera dûr bikevin... [(t) yamaçlardan hızla akan su akıntı ya da derecikleri, (f) torrent, gave, (i) torrent.].

Termên aborî

Amadekar : Salim ÇELÎKER

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
aborî	ekonomi, iktisat	économie	economy
binavahî	altyapı	infrastructure	infrastructure
butçeya salane	yıllık bütçe	budget annuel	annual budget
daxwazî	talep	demande	demand
derbas bûn, derbas kirin	transfer edilmek, transfer olmak	être transféré	to be transferred
veguhastin, guhastin	aktarmak, transfer etmek	transférer	to transfer
deyndêr	alacaklı	créancier, créateur	creditor
hêvî	beklenti, umut	espoir, espérance	expectation
hêza kirînê	satınalma gücü, alım gücü	pouvoir d'achat	purchasing power
jêkêm	açık	déficitaire	in deficit
jêkêmî	açık	déficit	deficit
jêkêmiya butçeyê	bütçe açığı	déficit budgétaire	budget deficit
jêzêde	fazla, artık	excédentaire	excess

jêzêdeyî	fazlalik	excédent	surplus, exess
jêzêdeyiya butçeyê	bütçe fazlalığı	excédent budgétaire	budget surplus, budget exess
mişehî	bolluk	abondance	abondance
nesafî	gayri safî, brüt	brut	gross, crude
pêşkêşî	arz	offre	supply, offer
pêşkêşî û daxwazî	arz ve talep	offre et demande	supply and demand
safî	net	net	net
sala butçeyê	bütçe yılı	année budgétaire	budget year
vexwazî	alacak	créance, crédit	crédit, claim (financial)
yekîne	birim, birlik	unité	unity

F e r h e n g o k a

HAWARÊ

Amadekar : **Zinar SORAN**

kurdî	tirkî	fransizî	îngilizî
arok	bir cins köfte	une sorte de boulette farcie	sort of meat ball
avtav	yağmur yüklü bulut	nuage chargé de pluie	rain claud
bazbazing; bazingê bazûyê	bazî bileziği	bracelet du bras	bracelet
bê ser û saman: perişan	perişan	déseparé	bewildered, distraught
belgihê derwêşiyê	dervişlik hırkası	manteau rudimenta- taire du derviche	dervish's cloak
bêlîte, bêlimte, bêrite, bêrûte	karşılıklı türkî eşliğinde oylanan geleneksel bir kürt oynu	danse kurde traditionnelle executée accompagnée de chants alternés	traditional danse accompanied by al temating songs
berpêşkî	ön açıklama	préliminaire	preliminary
bi qîma dilê xwe	gönlünce, gönlünün istediği gibi	à sa guise, selon les vœux de son coeur	according to one's heart's desire
bişkoj; bişkov, gupik	tomurcuk	bourgeon, bouton	bud
biqbîqok	su kabarcığı	bulle	bubble
bîraver; yê ku di bîrê de dimîne	unutulmayan, hafızada kalan	mémorable	mémorable, unforgettable
biryana, biraşî	biryana	rôti	roasted
bor, bihur	su geçiti	passage, gué	ford
çandbar	ekilebilen	cultivable	cultivable, suitable for cultivation
canrevîn	canrûba, gönül kapan (dilber)	qui ravit le coeur, ravissante	soul-ravishing
çarparsû	(taş, ağaç) dört köşeli	équarri	squared
dêmîr	valide sultan	reine mère	the queen mother
dêris kirin	viran etmek	ruiner, réduire en ruines	to ruin, to cause the ruin of
dêris: kavi, wêran	virane, harabe	ruine	ruin
derpêş kirin	göz önüne getirmek, ileri sürmek	mettre en avant, mettre en vue	to put forward
dîlrast	dürüst	franc, honnête	honest, frank, straight
dîlsar	kırgın olmak, soğumak	distant, deçu	unwilling, disappointed
dîlsar bûn	kırgın olmak, soğumak	être deçu, désabusé	to be disappointed
dûmat: musîbet	bela, musibet	calamité, malheur	calamity, misfortune
ekfî	bir çeşit karkasya hançeri	poignard caucasien	Caucasian dagger

firolek gidêmî go; gog	uçucu bir çeşit Arap hançeri ağaç ya da kıldan yapılan küçük top	volatile, qui peut voler une variété de poingard arabe balle en bois ou en poils utilisée dans le hockey	volatile, flying a kind of Arab dagger hockey ball
gulîvk,0 gulik heyber jûvan bûn	püskül nesne pişmanlık duymak, yaptığına üzülme	pompon objet regretter, être désolé	tassel, pompon objet to regret, to feel sorry
kavil: kevil, post kavilandin: kevilandin, kevil kirin kilox kudandin kumribkirî: kumê dora wî bi rib kirî lawjebêj: stranbêj	deri, post derisini yararak yüzmek kelle, hayvan başı izlemek, peşine düşmek etrafı çeyrek altın liralarla bezenmiş kadın başlığı türkü, ilahi okuyan	peau d'animal écorcher (un animal) tête d'animal poursuivre coiffure féminine parée de piécettes en or chanteur (de chants longs ou religieux) se classer, être classé classer reste, résidu îlot situé au milieu d'un fleuve magie, charme variété de rose, rose de Van endormir coller se coller, adhérer nouveau né, tendre, frais, jeune miséricordieux miséricorde	skin, undressed skin to skin (an animal) animal's head to pursue woman's hair style adorned with gold coins singer, chanter (of long religious chants) to be classified, sorted out to classify, to file remnant, residue island (in a river) magic, charm, enchantment a variety of rose, rose of Van to send to sleep; to lull to sleep to glue, to stick to adhere new borne, tender, very young and fresh merciful, compassionate compassion, God's mercy and grace
lêk ve bûn lêk ve kirin mayî navro nêreng nesrîn nivandin nûsandin: zeliqandin nûsîn: zeliqîn nûza	tasnif olmak tasnif etmek artık ırmak içindeki adacık büyü yaban gülü, Van gülü uyutmak yapıştırmak yapışmak turfa, körpe	se classer, être classé classer reste, résidu îlot situé au milieu d'un fleuve magie, charme variété de rose, rose de Van endormir coller se coller, adhérer nouveau né, tendre, frais, jeune miséricordieux miséricorde	to be classified, sorted out to classify, to file remnant, residue island (in a river) magic, charm, enchantment a variety of rose, rose of Van to send to sleep; to lull to sleep to glue, to stick to adhere new borne, tender, very young and fresh merciful, compassionate compassion, God's mercy and grace
piyar piyarî	rahim rahmet	miséricordieux miséricorde	merciful, compassionate compassion, God's mercy and grace
pizrûk: hûrbaran qelîsêl	çiseleme saç kavurması	brume viande frite sur un pla- que métallique chauffée disque de musique goudron caille tourterelle tisser meubles, mobilier, ameublement	mist meat fried on hot sheet iron gramophone record tar quail turtle dove to weave (tissue) furniture, carpets
qewan: sêlik qîr qîtik qumrî raçandin raxer	müzik plağı katran bildirçan kumru dokumak sergi, mefruşat	disque de musique goudron caille tourterelle tisser meubles, mobilier, ameublement	gramophone record tar quail turtle dove to weave (tissue) furniture, carpets
rêman rik rikdar rîşik saman sergirdan: sergerdan	kavram, mefhum inat inatçı saçak zenginlik, rahatlık, divan başı dönen, sersem	notion obstination, entêtement obstiné, têtu, entêté frange richesse, confort qui a la tête qui tourne, ivre, grisé chef de bande superficiellement abri, muret ou cloison construit sur le toit plat des maisons où l'on dort l'été pour se protéger de la vue	notion, concept obstinacy, stubbornness obstinate, stubborn fringe wealth, comfort giddy, perplexed, bewildered, stunned, drunk chief raider, gang chief superficially shelter, wall or partition on the flat roof of a house behind which one can sleep, in summer, out of sight
sernijdevan serpilkî sîngtalde	akıncı başı, çete başı yüzeysel olarak damlarda kurulan dalda	chef de bande superficiellement abri, muret ou cloison construit sur le toit plat des maisons où l'on dort l'été pour se protéger de la vue	superficially shelter, wall or partition on the flat roof of a house behind which one can sleep, in summer, out of sight

Devoka Qerejdaxê

— III —

Amadekar : Mehmûd LEWENDÎ

kurdi	tirkî	fransîzî	îngilîzî
hicimîn	hafif aksamak	boiter légèrement	to limp, to hitch slightly
hîm; xîm	temel	fondation, fondement	foundation
hînd	bir çeşit döğüş horozu	une variété de coq de combat	a type of fighting cock
hirço-pirço	dağınık, birbirine karışmış tüy veya ip gibi şeyler	emmêlé	tangled
hirhop	hoppala !	vas-y saute !	now then, jump!, what an idea
hirhop	hoppa	écervelé, frivole	flighty, fop
hirşo	yün yıkayan	lavoir de laine	wool washer
hîro; hêro, xêrî	hatmi çiçeği	rose trémière	hollyhock
histirî: stîrî	diken	épine, écharde	thorn, spine
histirîbirk	dikenli bitkileri biç- mekte kullanılan alet	instrument servant à couper les épineux	tool for cutting thorny plants
histûn: stûn	direk, sütun	colonne, mât, pilier	column, pillar, mast
histûr: stûr	kalın, kaba	gros, grossier	thick, coarse, rude
histûrî kirin	kabalık etmek	se comporter d'une manière grossière, arrogante	to behave in a rude way, with arrogance
hît; çûr	tiftik keçisi	chèvre d'Angora	Angora goat
hîvastin: hevrêstin	örgüyle onarmak	reprendre	to darn
hîz; eyarê rûn	yağ tulumu	outré à beurre en peau d'agneau ou de brebis	lambskin for storing butter
hoç kirin	kalkmak (çocuk dilinde)	se lever (dans le langage enfantin)	to get up (baby talk)
hogirî hev bûn	birbirine alışmak	s'habituer l'un à l'autre, s'accoutumer l'un à l'autre	to get used to one another
hogirî qumarê bûn	kumar alışkanlığı edinmek	prendre l'habitude du jeu	to get used to a game
hol kirin	harman dövmek, harman sürmek	battre la moisson	to thresh
hol: hor	1) harman dövme, harman sürme işi, 2) harman sürme sırasında harmanı daha çabuk sürmesi için hayvana söylenen söz	1) battage 2) allez ! (pour les bêtes de battage)	1) threshing 2) go! goahead (for the threshing animals)
holbûn	şıçramak, fırlamak, zıplamak	bondir	to leap, to jump
hutik; kulm, gumsik, mist	yumruk	poing, coup de poing	fist, blow with a fist
îpilme	ruam hastalığı	vet. morve	glanders
îs, îsik, errik	hayret ifade eden bir ünlem, vay be, abo	oh là là !, interjection d'étonnement	oh dear !
îsk-îsk: îskeîsk	hıçırma	sanglot	sob
îskîn	hıçırık, hıçırma	sanglot	sob

îspat, îspatî jan jan dan	iskambil kağıtlarında «sinek» sızı, acı sızlamak, acı vermek	carte, trèfle mal, douleur souffrir d'un mal, éprouver des douleurs	clubs (cards) ache, pain to ache, to suffer sharp pain
jardadayî jardadayî kirin jirra; birra, bi rastî kadiz kakil	zehirlenen, zehirlenmiş zehirmek sahi samanyolu ceviz, badem gibi yemişlerin içi yetişmemiş, ham	empoisonné empoisonner vraiment voie lactée cerneau (de noix, d'amande), pas mûr, vert (fruit)	poisoned to poison really, truly the Milky Way halved walnuts, almonds or fruit
kal kalo: xalxalik kalome	uğur böceği eski bıçak veya kılıç	cochenille vielle lame (de couteau, ou d'épée)	unripe, immature, green ladybird old blade (of knife or sword)
kalşwîv	nadas süresi bittikten sonra sürülüp ekilen tarla	champ labouré après une période de jachère	tilled or ploughed field after a fallow period
kamaş	kalitesiz tütün	tabac de rebut, de mauvaise qualité	bad quality tobacco
kanîn: karîn, şıyan kapik: pêwend kapol karî, kardî kawuk	yapabilmek, edebilmek şerit, kemend ufak ve toz halindeki saman pazı aval, saf	pouvoir corde fêtu de paille simplet, simple d'esprit, naïf naïveté, simplicité d'esprit	to be able lasso, rope chaff, cut straw chard simpleton, fool
kawukî kayık kedî kedik	avallık, saflık geviş evcil küçük ayran tulumu	rumination apprivoisé, domestique petite outre à petit-lait en peau d'agneau	feeble mindedness rumination domesticated, tamed small lambskin for storing buttermilk
kefkefk: kefkefok kel û kût; kal û kût	sabun otu uyuz, sakat topluluğu, işe yaramayan, değersiz	saponaire bande, d'éclôpés	soapwart bunch of worthless people
kelmîzek, kelmo, kelmisk, mîzek, şetek kelmîzekî kelxwî; kelxweydan kun	altını ıslatan kimse, işeyen işegenlik aniden gelen terleme keçi derisinden su tulumu	incontinent (d'urine), énurétique énurésie, incontenance sueur soudaine outre à eau faite de peau de chèvre	incontinent, enuretic enuresis, incontenance sudden sweat goatskin for water
lîçik; lik, çilm lîço; lîko, kilmîso	sümük sümüklü, devamlı sümüğü akan	morve morvœux	mucus (of the nose) slimy, snivelling
likîn likumîn lîrandin: lîlandin, tilîlî kirin	melemek (keçiler için) sendelemek zilgit çekmek	bêler, chevrotier trébucher pousser des you- vous, des cris de joie d'encouragement	to quaver, to bleat to totter, to stagger to screams trilling cries of joy
lod londer	saman veya ot yığını bir yığın, bir sürü, pekçok	meule de foin, ou de paille tas, amas	stack of hay or straw pile, heap

TERMÊN HIQÛQÎ

— VI —

Amadekar : Veysi ZEYDANLÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
dayîn, <i>n</i>	ödeme, tediye	paiement	payment
dayîn, <i>l</i>	ödemek	payer	to pay back (a debt)
deyn dayîn	borç ödemek	payer une dette	to pay back a debt
fît bûn	ödeşmek	être quitte avec quelqu'un	to settle accounts (with one another)
gilîname	şikayetname	plainte écrite	written complaint
gilîdar	şikayetçi	plaignant, demandeur	complainant, plaintive
gilîlêkirî	şikayet edilen	défendeur	defendant
balkişandin	ihtar, ihtar etme	avertissement	warning
balkêşname	ihtarname	notification, avis d'avertissement	official warning
bal kişandin	ihtar etmek	avertir	to warn
mikur, mikur hatin	ikrar, ikrar etme	aveu	avowal
li xwe mikur hatin	ikrar etmek, ikrarda bulunmak	avouer, faire des aveux	to admit, to confess
venasîn, <i>n</i>	itiraf	confesser, reconnaître	to confess, to admit
rave	açıklama, izahat, yorum	explication, commentaire	explanation, comment
rave kirin	açıklamak, izah etmek	expliquer, commenter	to explain, to comment
made (ji pehlewî <i>madeg</i>)	madde	article	article
xal	fıkra	paragraphe	paragraph
bend	bend	alinéa	paragraph
rêxistin	teşkilat, örgüt	organisation	organization
pardar, pişkdar, behrdar	hissedar	actionnaire	shareholder
beşdarî	iştirak, katılım	participation	participation
hevbeş	müşterek	commun	common, joint
jicirakirin	sürgün	exil, déportation	exile, deportation
jicirakirî	sürgün, adj.	exilé, déporté	exiled, deported
ji cih rakirin	sürgün etmek	exiler, déporter	to exile, to deport
desteserî	hacız	saisie	distrain, seizure
desteserkirin	haczetme	saisie	seizing, distraining
desteser kirin	hacız etmek	saisir	to distrain, to seize
desteserkirî	mahcûz	saisi(e)	distrained, seized
destdanîserî	zabt	mainmise, prise	seizure
destdanîser	zabt etme	mainmise	seizuring
dest danîn ser	zabt etmek	prendre, conquérir	to conquer, to take
jêstandin	müsadere	confiscation	confiscation
jê standin	müsadere etmek	confisquer	to confiscate
jêstandî	müsadere edilmiş	confisqué	confiscated
diyarkirin	belirleme, tayin	détermination	determination
diyar kirin	belirlemek	déterminer	to determine
diyarker	belirleyici	déterminant	determinant, determining
diyarkirî	muayen, belirlenmiş, belirli	déterminé	determined

Çend pirsên rastnivîsînê

Reşo ZÎLAN

PIRSA PARASTINA KOKA PEYVÊ :

Herwek gelek zimanên din, di zimanê axaftinê yê zaravayê kurmançî de jî, peyv li hin deveran têne kurt kirin. Di dema bilêvkirinê de ji koka peyvyan hin deng, nemaze dengên hin tîpên dengdar, têne daqurtandin. Yan jî ew cihên xwe bi hinekên din re, gelek caran bi riya tewangê, pev diguhirînin. Carina guhartinên wisan mezin dibin, ku mirov nema dikare koka peyvê binase û ji wê tevliheviya ku peyv duçar bûyê, koka peyvê zelal bibîne.

Ji xwe, ferq û cihêtiya di navbera zimanê axaftinê û yê nivîsînê de ew e, ku mirov bi riya zelal xuyakirina peyvyan riyê li ber tevliheviyê digire. Bi risteke birêkûpêk, bi nivîskî, pêşçavkirina peyvyan riyê li ber çavên xwandevanan xweş dike, da ku ew bêî zor û astengiyekê peyvyan nas bike û navero-ka hevokê xweş têbigihê.

Helbet feyde û kelka zimanê nivîskî ne bi tenê ev e. Di gel çendînan diyardeyên din, ew rê li ber sergêjiyên devokî jî digire û dibe ho û sedemên afirîna zimanekî standart û xwedînorm. Heçî ev rûyê han ya pirsê ye, ji bo me girîngtirînê ho û sedeman e. Ango em çawan bikin û di nivîsarên xwe de bi çî rengî têbikoşin, ku riyê li ber sergêjiyan bigirin. Çawan hewil bidin da ku zimanê me jî ji aliyê nivîsînê ve bibie xwedînorm û standartekê.

Ji ber vê yekê jî, hewce ye, ku em bala xwe bidin hin qaîde û bingehên rastnivîsînê. Bê guman, ev qaîde û bingeh, li ser bingehên rêzimanê bejin didin. Bêî ku mirov bingehên rêzimana zimanekî bide ber çavan, danîna stûnên rastnivîsîna zimanekî jî ne mumkun e. Li milekî din, pirsê rastnivîsînê ne bi tenê pirsêke xweser ji bo zimanê me ye. Lê îro zimanên gelekî pêşdeçûyî jî bi van

pirsan mijûl dibin. Lê helbet ne bi qasî me...

Bi kurtî, di warê nivîsînê de, divê em guh bidin parastina kok û qurmen peyvyan. Di nav hevokê de, di tewangan de, li kû dibe bila bibe, jê tîpan kêman nekin. Ser û guhên wê neşikênin û dest nedin kok û qurma wê. Bihêlin ew li ser qurma xwe bimîne û welê tiştê lê zêde bibin. Bo nimûne:

Li hin deveran, di zimanê axaftinê de dibêjin:

«Ez ê perdeke/perdake bikirim»,

«Navê zavê me Mendo ye»,

«Zarok li aşxanê ne»

û hwd.

Herwekî di van nimûneyan de jî diyar dibe, ji koka peyvyan tîpin hatine kuştin. Peyv hatine kurt kirin. Ser û guhên pirtikên tewangan hatine şikandin. Dibe ku mirov di dema axaftinê de têbigihê, ku merama hevokê çî ye. Lê heçî ji aliyê analîtîk ve lêhurnêrin e, bi me xuya dibe, ku li gor cihên peyvyan yên di hevokê de, di tewangên peyvyan de nesazkariyeke mezin heye.

Em nikarin ji peyvên «perdekê/perdakê», «zavê» û herweha «aşxanê» kok û tewangan ji hev derxînin. Ji ber ku koka rastîn «perde», «zava» û «aşxane» ye û tewangên wan jî «-yekê», «-yê» û «-yê» ne. Ango divê bibe «perdeyekê», «zavayê» û «aşxaneyê» da ku em bikaribin laş û seriyên wan bibînin û wan ji hevûdu cihê bikin. Dibe ku kurtkirina wan, ji hin kesan re xweştir be û bilêvkirinê gengaztir bike. Lê heçî ji bo nivîsînê ye, bi taybetî jî ji bo ferhengnivîsiyê (leksîkografî) ev celeb nivîsîn sergêjiyên bêderman diafirin.

Ji lewre jî, divê em bal û dêna xwe baş bidin parastina kok û tewangan û wan di nivîsînê de, herwekî ku pêdivî ye, binivîsin. Çend nimûne:

Ez dê sibehî ji bo serdanê herim

nexweşxaneyê.

Zavayê mala Berwariyan ji gund vege-riya.

Me ji bo odeya rûniştinê perdeyên spehî kirin.

Peyayên axayê me belaya xwe bi me didin.

Jinbirayên min ne ji mermalên me ne.

De em herin baxçeyê cîranê me.

Diya min cotek goreyên rîsînî dane

min.

Zarokan çanteyên xwe `ecibandin.

PIRSA TEWANDINA HIN NAVAN :

A) Navên kovar û rojnameyan

Heçî pirsê tewandin yan jî netewandina navên kovar û rojnameyan e, girêdayî pirsêke ye. Ew jî, heke navê kovar û rojnameyê ji navdêrekê pêk hatibe, yan jî heke navê wê bi navdêrekê dawî bêt, divê ew wek navdêrên xwedîzayenda mê bête tewandin. Wek:

Min ew di vê hejmara **RONAHÎYÊ** de xwand.

SERXWEBÛNÊ li ser wê pirsê dinivîsand.

DENGÊ KOMARÊ

DENGÊ AZADIYÊ

RIYA ŞOREŞÊ

DENGÊ KURDISTANÊ

ARMANCÊ ew wêne weşandibû.

Wî ji bo **ÖZGÜR ÜLKEYÊ** dinivîsî.

Di kovara **NOKTAYÊ** de roportajek heye.

Wî di rojnameya **AKŞAMÊ** de bendek nivîsibû.

Ez nûçegehînanê **MORGONPOSTÊ** dinasim.

LE MONDEê li ser şerê birakujiyê nivîsiye.

DAGENS NYHETERA swêdî rojnameyêke rojane ye.

THE GUARDIANê li ser wê pirsê raporeke pîralî weşandiye.

KEYHANÊ ew nivîsibû.

Ew hîn jî di **EL-CÛMHÛRIYÊ** de kar dike.

Wî ew nûçe ji **ÎZVESTIYAYÊ** veguhastibû.

Lê heke navê kovar yan jî rojnameyê, ji navê êl û `eşîrêkê yan jî herêmekê pêk hatibe, yan jî bi navekî wisan dawî bêt, ew nahête tewandin. Ji ber ku, di zimanê me de, navdêrên ji navên êl û `eşîran pêkhatî, eger bûbin navên herêman jî, ew çu caran nahên tewandin. Bo nimûne:

Ez nikarim **DENGÊ MUKRIYAN** guhdarî bikim.

Ew nivîsar di **DENGÊ METÎNAN** de belav bûye.

Kovara **BOTAN** bi tîpên latînî derdiket.

Herweha, eger navê kovar yan jî rojnameyê ji rengdêrekê pêk hatibe, yan jî bi navekî wisan biqede, ew nahête tewandin. Ji ber ku, di zimanê me de rengdêr çu caran wek navdêran

nahên tewandin. Wek:

*Di kovara ROJA NÛ de çîrokeke wî heye.
Di STÊRKA SOR de wêneyek hatibû
weşandin.
Di KURMANCÎ de babetên helez derdike-
vin.*

B) Navên herêman

Herwekî tete zanîn, di zimanê me de, zayenda navên coğrafîk hemû mê ne. Ji ber vê yekê jî, gava ku ew di hevokê de yan jî weke din tèn tewandin, divê li gor qaîdeya navdêrên mê bèn tewandin. Wek:

*Ez çûbûm BERLÎNê û ji wir jî çûbûm
HELSÏNKÏYê.
Ew duh ji MÛŞê ber bi AMÊDÏYê bi rê
ket.*

Ji van nimûneyan jî xuya dike, ku divê navên coğrafîk, li gor tîpên ku nav pê diqedin, divê pirtikên tewangê werbigrin. Ew jî, eger nav bi tîpên bêdeng biqedin, «-ê» û eger bi tîpên dendar biqedin, «-yê» ne.

Lê di kurdî de hin navên herêman hene, ku ji navên êl û `eşîran, yan jî ji rengdêrekê çêbûne.

Bo nimûne :

Botan, ango herêma Botîyan. Devera ku Kurdên Botî lê dijîn. **Mukriyan**, ango herêma Kurdên Mukrî. Devera ku Kurdên Mukrî lê dijîn. **Behdînan**, **Soran**. **Germiyan**, ku ji hawîrdora Kerkûkê re û **Serhedan**, ku ji bakûra rojhelata Kurdistanê Tirkîyê re tete gotin. Hin nav jî hene ku ji du navan çêbûne. Wek: **Dola Şehîdan**, **Newala Guran**, **Girê Sîran**, **Geliyê Zîlan**, **Çiyayê Bêxêr**, **Kevirê Reş** û hwd.

Heçî ev qaîdeya jorîn e, ji bo nevdêrên ku ji navên êl û `eşîrekê, ji du navan û yan jî ji rengdêrekê pêkhatî derbas nabe. Ji ber ku ew navdêr berî her tiştî jî pirhejmarekê pêkhatine û ev yeka han jî cureyek tewang tete hesêb û nabe ku ew careke din bête tewadin. Wek :

*Şerek li herêma BOTAN derketiye.
Kurdên BEHDÏNAN wek me naaxivin.
Zerê çûbû GELIYÊ ZÏLAN û lê geriyabû.
Mîrê SORAN serî li ber dijmin neçer-
mand.
Pêşmerge ji DOLA ŞEHÏDAN derneketine.*

*Hevalê min ji gundê QESRIKA PIÇÛK e.
Wî ji DAREBIYA JORÏN bar kiriye.
Serek Clinton ew di KOŞKA SPÏ de kiri-
bû mêvan.
Ew duh ji DELHIYA NÛ vegeriya.*

Lê ji piraniya wan navdêran rengdêr tete afirandin. Wek: Ji Soran; **Soranî**, **Sorî**. Ji Botan; **Botanî**, Botî. Ji Behdînan; **Behdînanî**, **Behdînî**. Ji Mukriyan; **Mukriyanî**, **Mukrî**. Ji Serhedan; **Serhedî**, Ji Germiyan; **Germiyanî** û hwd.

Divê bête gotin, ku hindêk navên din yên coğrafîk hene, ku navên hevedudanî ne. Piraniya wan ji nevdêr û rengdêrekê pêkhatî ne. Divê ew li gor qaîdeyê bête tewandin. Bo nimûne:

*Ez ji gundê BERDEREŞê me.
Mala me hê jî li AVŞÏNê ye.
Mala me ji MÊRGESORê derketiye û
çûye bajêr.*

PIRSA BIKARANÏNA NÏŞANA BIH- NOKÊ Û KU

Berî her tiştî divê em bêjin, ku ne bi tenê maneyek lê çend maneyên peyva **KU**yê hene. Ji bo zelalkirina vê pirsê hewce ye, ku em berê wan çend maneyên **KU**yê bidin zanîn û pişt re vegeirin ser pirsê bikaranîna nîşana bihnokê.

Maneyên peyva **KU**yê, li gor ka ew ji kîjan perçeyên axaftinê tete hesêb, tete guhartin. Maneyeke peyva **KU**yê, ku gihanek be, «eger, heke, heger, herke, hek û ger» e. Di zimanê axaftinê de, li hin deverên Kurdistanê **KU**yê bi vî rengî bi kar tînin û vê maneyê didinê. Maneya didwan, **KU**ya ku di gel piraniya lêkeran û maneyeka dawîn jî, ku pronav be, **KU**ya ku di gel nav û navdêran tete bi kar anîn e.

Heçî **KU**ya ku wek gihanek di maneya «eger»ê de ye, bi vî rengî ye:

*Ku Baran neçûya sînemayê, dê me
hevûdu bidîta.
Ku tu neçî, telefonî min bike.
Ku berf barî, em ê perîşan bibin.*

Ango di şûna ku peyva «eger/heke» bête gotin, **KU** hatiye bi kar anîn û merama gotinê qenc tete tîgi-hîştin.

Lê **KU**ya ku wek pronav e, bi vî awayî ye:

*Gulbîna ku te dîtibû, xwîşka min e.
Karzanê ku nexweş ketibû, hîn pak nebûye.
Gulên ku me tovên wan reşandibûn,
hêşîn bûne.
Kesên ku te duh dîtibûn, mermalên me ne.*

Ev **KU**yên ku li vir hatine bi kar anîn, hemû jî ji bo veqetandin û fer-qêxistina navbera du yan jî çend tiştan e. Yan jî ji bo bêtir balkişandina ser tiştêkî ye. Ji ber vê jî, **KU**yên jorîn, her-tim di gel pirtikên «-an, -ê, -ên» hatine bi kar anîn. Ango, ji bo manedayîna «ya ku, yê ku, yên ku» ye.

Heçî **KU**ya din e, ew hertim di gel lêkeran tete bi kar anîn. Pirsê me ya di nivîsînê de rast bikaranîna nîşana bihnokê jî bi vê deqê ve girêdayî ye.

Di nivîsînê de, divê em bîknokê daynin berî vê **KU**ya ku em bi lêkeran re bi kar tînin. Ne ku piştî **KU**yê. Wek:

*Ew di benda xwe de dinivîse, ku Bilind
bi vî karî rabûye.
Ez dibînîm, ku tu ne li ser riya rast î.
Ez bawer dikim, ku dê karê me sibehî
kuta bibe.
Doktor digot, ku divê tu hertim guh
bidî tenduristiya xwe.
Min şîva xwe xwar, ku ez dermanên
xwe bixwim.
Ew çû bajêr, ku ji me re hin hûrûmû-
ran bikire.*

Carina, di hin hevokan de, bihnok dikare bête berî **KU**ya ku pronav e. Bo nimûne:

*Desteyek hevalên me, ku li gundê
Kanîmasiyê bûn, di vegeerê de rastî çend
serbazên Tirk hatin.*

Heke mirov ji vê hevokê perçeya **ku li gundê Kanîmasiyê bûn** derxîne jî, di maneya hevokê de çu guhartineke mezin nabe. Ji ber ku hevoka sereke dimîne û tete de kêmasiyeke gelekî mezin peyda nabe û bi tenê zanyariyeke piçûk ji hevokê derdikeve.

Ji milekî din ve, gava mirov hevokê dixwîne, mirov bi xwe jî dibîne, ku berî **KU**yê rawestî û piçêkî bêhnvedan gerek e. Ji xwe nîşana bihnokê jî her ji bo vê yekê ye.

Îdyomên kurdî

Amadekar : Hemîd KILIÇASLAN
Mustafa AYDOGAN

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
aşê betalan	aşırı konuşan	moulin à paroles	chatter box
aşê hawarê, aşê nokan	doymak bilmeyen, sürekli yiyen	insatiable, goulu	greedy, gluttonous
agir bi erdê keve	ilgisiz, lakayt, gamsız	indifférent,	indifferent, have
gurzek pûşek wî naşewite		insouciant	been struck by
			lod of strokes
agir bi serê me ketiye	başımıza bir	un malheur s'est	we have had a
	bela geldi	abattu sur nous	stroke of bad luck
agir li me bariyaye	büyük bir musibetle	une grande calamité	we have been struck
	karşılaştık	nous est arrivée	by a disaster
agir xistiye dawa	bela satan, nifak,	il sème discorde	he is looking for
xwe: li fesadî û belaye digere	kavga arayan	et cherche querelle	(making) trouble
agir di çava de ye	gözü kan bürümüş	il voit rouge	he sees red
agir ji ber diçe: agir jê	ateş püskürüyor	il est très en colère	he is spitting fire,
dibare; agir ji dêv			he is very
dibare, agir ji dêv diçe			angry
agir ketiye	1) paniğe kapılmış,	1) paniqué, exacerbé,	1) panic-stricken
	2) azmış, azgın	2) très excité, féroce	2) very agitated
agir li ber kulîna xwe	evini kendi eliyle	Il a causé	he caused
dada: mala xwe bi	yaktı	son propre malheur	his own
destê xwe xera kir			misfortune
agir tê de bûn	(cinsel) ateşli	avoir le feu au cul	having ants in the pants
agirê li heriyê diçe	etkinliği yok, etkisiz, verimsiz	inefficace, improductif	inefficient, unfruitful
agirê pûş	saman alevi	feu de paille	quick, passing, flame
			or passion
agirê qoçan,	kütük ateşi (tecrübe-	peronne âgée et	old and experienced
	li yaşlı kimseler için)	expérimentée	(person)
agirê qurman	kalıcı ateş	feu de souche, feu	slow burning,
		durable, persévérant	persistant, lasting,
		dans son action	fire or passion
agirê Xwedê	1) çok çalışkan, çok	agile, vif, intelligent	agile, intelligent,
	becerikli, ateş gibi		very quick
	2) azgın, inatçı		
alifê vala	1) çocuk yapamayan,	1) femme qui ne peut	1) a woman who is
	kısırlaşmış kadın	plus enfanter	past child-bearing
	2) başı olmayan ev, aile	2) famille sanschief	2) family without a chief

aqil berdan aqil bi ser kum ketiye	kafayı takmak, sevdalanmak aklı havada	être obsédé par qui a la tête dans les nuages casse-pied, collant	to be obsessed by scatterbained head in the clouds irritating, pestering, a pest
aqilê sivik, barê giran ardê cehînî arvanê sala teng; arvanê sala xerab	baş belası, 1) bitmek bilmeyen 2) kalitesiz kara gün dostu	ami des jours d'ad- versité, ami fidèle il a dit son mot aussi	faithfully friend, friend of hard times he also has said his word
arvanê xwe li êş kir; a xwe got; got ez ji heme	boş konuştu, o da ağzını açtı	sans fondement, bâti sur la neige il est devenu pubère, il a atteint la puberté	baseless, unfounded built on snow hi has reached puberty
asasê ser berfê: xîma ser cemedê, xîmê ser avê av di gunikên wî de wergeriyaye: av li şeko- kên wî geniyaye: balix bûye av li ser xwe zelal kir	temelsiz, kum üzerinde kurulu (şato) ergenleşmiş, ergenliğe ulaşmış sessiz kaldı, izini kaybettirdi	il est parti pour revenir vite, mais n'est pas revenu calculateur, sournois de même eau, du même acabit ça lui a mis de l'eau dans la bouche vain effort	he has gone for a short time but he is not back crafty, cly calculating in the same style, of the same type it made his mouth water wasted effort
ava bin kayê: kesê ku tiştên xwe bi dizî ava buhurekî; pîvazê mişarekê ; ji eynî malî av ji dev çû; gilêz ji devê wî hat ava qûna cêr : çî qenciyê pê dike, bê feyde ye ava reş bi çavan de hatin: kor bûn, nedîtin ava serî germ kirin	içten hesaplı, sinsi aynı bezin parçası ağzının suyu aktı beyhûde emek görmemek suyunu ısıtmak	être aveugle préparer la fin de quelqu'un vergogne devenir effronté, sans vergogne perdre l'appétit se dit d'enfants ou d'ovins n'ayant pas d'appétit pour cause de maladie aller un à un à la recherche de quelqu'un et ne pas revenir déplorer une belle occasion ratée vaurien, vil, sans valeur couper la branche sur laquelle on est assis, agir contre ses intérêts	to be blind plot someone's end or downfall shy shameless, become shameless to loose one's appetite said for children or sheep who have has lost their appetite through illness to go one by one tech s.o. and not to come back to regret missing a good opportunity good for nothing, worthless cutting one's own throat, acting against one's own interests
ava rû: abrû, avrû: heya ava rû teqandin an qetandin avpizavî kirin: ji bo zarok an pezên ku ji ber nexweşiyê xwarin naxwin tê gotin aviya kulîlkê: yek li pey yekî çû û nehat avî çûyin ax bi çavan ketin axa bin gû: bi kêrî tu tiştî nayê axurê xwe xera kirin: bi nanê xwe leyistin	haya hayasızlaşmak iştahsızlaşmak, hastalık nedeniyle yemek yemeyen çocuk ya da hayvan için söylenir ardı ardında gidip gelmeden kaybolmak hayıflanmak, kaçırılmaması gereken fırsatı kaçırmak hiç bir işe yaramayan, değersiz bindiği dalı kesmek, çıkarmaya aykırı hareket etmek		

Min ew nivîstî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

SIMBEL

(t) Bıyık (f) Moustache (e) Moustache



simbêlboq

Rengên simbêlan

1- simbêlê sor

2- simbêlê reş

3- simbêlê kizirî

4- simbêlê henekirî

5- simbêlê kerteboz (qerteboz)

Civîna Biskops Arnöyê ya 20emîn

Civîna 20emîn ya *Kurmancî* li Biskops Arnöyê (Swêdê) di navbera 13-20. 10. 1996an de çêbû. Di vê civînê de kesên beşdar li ser termên aborî, temên hiqûcî, devoka Qerejdaxê, îdyomên kurdî, cureyên simbêlan, ferhengoka *Roja Nû* û *Hawarê* xebitîn.

Di vê civînê de Mistefa Aydogan (Mêrdîn), Lutfî Baksî (Xerzan), Rojen Barnas (Diyarbakir), Abdullah Emîn Bêtasî (Behdînan), Salim Çeliker (Diyarbakir), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Selam Nouman (Cizîrê), Mûsa Kaval (Hekarî), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Kendal Nezan (Diyarbakir), Zinar Soran (Dêrik), Behroz Sucaî (Şikak), Veysi Zeydanli (Bidlîs), Reşo Zîlan (Agirî) û Zeynelabîdîn Zinar (Batman) beşdar bûn.

Çend pirsên rastnivîsînê

Reşo ZÎLAN

Pirsa rastnivîsîna navên mirovan

Heçî pirsê rastnivîsîna navên mirovan e, ne bi tenê di zaravayê kurmancî, lê bi awayekî giştî di zimanê kurdî de, bi rastî jî, pirsgirêkeke mezin e. Mezinbûna pirsgirêkê ne bi tenê ji hebûna hinde zarava û devokên kurdî ye. Lê, berî her tiştî, ji tunebûna lêkolînên hûr û kûr yê fonolojîk (dengnasi) e, ku bi me nîşan bide ka li kû û dengên çilo hene. Hevpişkiya wan li kîjan deveran û di navbera kîjan zarava û devokan de hene. Ka guhîrîna hin den-

gan çawan pêşde tên û herweha bandora dengên hin zimanên biyanî û cînar yê li ser zimanê me çi ne û hwd. Di gel vê yekê, nivîsîna kurdî bi çend alfabeyên têvel jî welê dike ku astengên heylî hê mezintir bibin. Zaravayên kurdî yê ku ketine nivîsarê jî, ji danîna hin normên zelalkirî bê par in. Ji lewra jî her kesek li gor kêfa xwe, a rastî jî li gor zimanê ku wî xwe pê kiriye xwand û bi xurtî ketiye bin bandor û tesîra wî, rîyeke rastnivîsînê daye ber xwe.

Em ê di vê nivîsarê de zêde li ser pirsên dengên ranewestî. Lê, hewce ye ku em bi kêmanî piçekî li ser pirsê alfabe-yên ku kurdî pê tene nivîsîn, rawes-

tin. Ew alfabe jî, sê alfabe ne; *kîrîlî*, *'erebî* û *latînî*.

Ji van, heçî alfabeya kîrîlî ye, êdî ber bi mirinê diçe. Nema wek berê tete bi kar anîn. Lê bê guman edebiyateke dewlemend ya zaravayê kurmancî pê hatiye nivîsîn. Piştî nemana Sovyetistanê, ew hêdî hêdî ji meydana nivîsînê winda bû. Cihê xwe ji alfabeya latînî re hişt. Dîsan jî, ji ber ku edebiyata ku bi kîrîlî derdiket, hema hema qet dernediket derveyê Sovyetistanê, ku bêtir piştî salên 1970yî giha destên Kurdên derveyê Sovyetistanê, rê û awayên rastnivîsîna wê çu bandor û tesîr li ser kurdiya bi tîpên latînî û 'erebî nekir. Rê û awayên rastnivîsîna wê, ku ketibû bin bandora rê û awayên rastnivîsîna zimanê rûsî, her di nav Kurdên Sovyetistanê de bi kar hat. Ji xwe ne mumkun bû ku ew bibe alfabe-yeke giştî ji bo hemû Kurdan û bi vî rengî ji aliyê wan ve jî

<p>bête bi kar anîn. Ji lewra jî, di warê rastnivîsîna navên mirovan de, tişteki ku mirov tê de wek sûdbexş bibîne, tune ye. Di vî warî de, pirsên ku ew tîne pêş her eynî pirsgirêk in, ku ji aliyê taybetmendîya xwe ve, di nivîsîna alfabea 'erebî de hene. Ji ber vê yekê jî, em ê her yekser dest biavêjin alfabea 'erebî û pir bi kurtî li wan hûr bibin. Çi ne ev taybetmendî? Berî her tiştî, divê em bidin zanîn, ku sîstema alfabea kîrîlîk û nivîsîn û rastnivîsîna wê û ya 'erebî, ji hev dûr in. Lê, bi tenê di warê rastnivîsîna navên mirovan de (herweha navên coxrafîk û hwd jî) hevpişkiyeke mezin di navbera herdu alfabeayan de heye. Ango di herdukan de jî nav li gor bilêvkirinê, ne ku li gor orjînalê têne nivîsîn. Hindek caran, ji ber tunebûna dengêkî di wî zimanî de, bo nimûne dengê «H»yê di zimanê rûsî de û dengên wek Ç, F, G, J, P, V û hin dengdarên din di zimanê 'erebî de, dibe sedemê ku navên hinde mirovan bi rengekî din bête bi lêv kirin. Bê guman, alfabeiyên modifiyekirî yê kurdîya kîrîlî û 'erebî, ji bo van dangan tîpên xweser danîne. Tevî vê jî, gelek caran navên bi riya van zimanan ketine nivîsîna kurdî ya bi alfabeiyên kîrîlî û 'erebî, her wek xwe mane û li gor bilêvkirina xwe ya kurdî nehatine guhartin û nivîsîn.</p> <p>Bi taybetî jî zimanê 'erebî hem bi riya dîn û hem jî bi riya alfabeiyê gelek navên 'erebî, ku di nav Kurdan de mişe ne, wisan ku navên 'Ereb bi xwe li xwe nakin xistine nav Kurdan û di nav Kurdan de bûne navên birewac û normal. Herweha bi vê riyê dengên ne kurdî jî, yê ji kurdî re pir xerîb in, ketine zimanê kurdî û nivîsîna wê.</p> <p>Baş e, gelo em Kurd di gel hinde dijiwariyên heyî, pirs rastnivîsîna nava çawan çareser bikin? Bi a me, du rê hene li ber me. Ya yekê ew e, ku hema em bibêjin bila hemû li gor bilêvkirina kurdî bêne nivîsîn. Bêî ku em guh bidin orjînalê wan. Heye ku ev rê jî bo gelek kesan cazîbedar be û herweha kurdîkirina (kurdîfîzekirin) wan paqijî, zelalî, rewanî û rehetiyek be. Lê bê guman ev karekî zehf aloz û tevlihev e, ku heke mirov vê riyê bide ber xwe, ji bin derketina hin barên ku ev rê bi xwe re tîne û dike nivîsara kurdî,</p>	<p>ne gengaz e. Ji bilî vê yekê, ev dê bibe sebeba îzolekirina ziman û herwisan xwe li derveyê pêşdeçûnên pîralî hîştinê. Riya didwan jî ew e, ku dan ser riya navneteweyî û li gor rê û normên navneteweyî yê hevpişk pêkanîna rastnivîsîna nava e. Bi a me, dê rêçêke weha rê ji ziman re xweş bike da ku ew di qalibêke neteweyî de îzole nemîne û rê li ber hin tengbîniyan jî bigire.</p> <p>Vêca pêdivî ye ku bête gotin, di warê nivîsîna navên mirovan de çend rê û normên navneteweyî yê hevpişk hene, ku zimanên tîpên latînî bi kar tînin ew ji rastnivîsa xwe re wek destûr danîne. Ew jî bi kurtî ev in: Zimanên ku alfabea latînî bi kar tînin, navên ku bi alfabea latînî hatine nivîsîn, weke ku ketine nivîsînê dinivîsîn. Sadiqî orjînalê wan dimînin. Eger di alfabea wan de hin tîp tune bin jî, yan tîpa ku ji aliyê wêneya xwe ve herî nêzik e yan jî tîpa ku ji bo dengê nêzîki wî hatiye danîn, bi kar tînin. Bo nimûne : Di gelek zimanan de tîpên «ö, ø, ä, å, æ, è, ê, é, ú, í, ş» û hwd tune ne. Ew di şûna wan de, tîpên ku nêzîkî wêneyên wan in, wek «o, o, a, a, e, e, u, i, s» dinivîsîn. Yan jî, ji bo dengê «ö»yê, «œ», ji bo dengê «ä» û «æ»yê, «ae» ji bo dengê «ü»yê, «ue» bi kar tînin. Li gor vê, divê em di nivîsarên kurdî yê bi tîpên latînî de navên wek: Izetbegovič —> Izetbegovic, Miša —> Misa, Åsa —> Asa, Göta —> Gota (Goeta) û Müller —> Muller (Mueller) binivîsin.</p> <p>Herwek me got, divê em jî, di pîrsa rastnivîsîna navên bi alfabea latînî de sadiqî orjînalê wan bimînin. Lê helbet ji bo rehetiyê di nav dukevanekê de bilêvkirina wan jî binivîsin. Bi vî rengî, navên ku ji aliyê nivîsînê ve gelekî çetin in, dikarin bi hêsanî bêne bi lêv kirin.</p> <p>Dibe ku ev di destpêkê de gelekî zehmet bête xuya kirin. Lê, nemaze di vê dewranê de, dewrana ku teknolojiyê serê xwe hildaye û bi çargavî berê xwe daye deşt û rastên dawîtuneyî, divê em Kurd jî bizanibin ku ziman di çarçoveyêke teng de hew tete zîndan kirin. Divê em jî wek mîletên din fêrî nivîsîn û xwandina navên biyanî bibin. Bizanibin ku guhîrîna bi tenê tîpekê me tûşî sergêjiyên çendî mezin dikin. Bo</p>	<p>nimûne: Navê -Corc-yê ewropî bi çend awayan tete nivîsîn; George, Georges, Georg, Gorge. Di qeyd, katalog, kompiyûter û fêhrîst û hwd de li navê -Corc- gerîn û ew bi rehetî dîtin ne gengaz e, ku heke ew nav, nemaze orjînalê wî, weha bi çend awayên curbicur hatibe nivîsîn. Ev pîrsa han ne bi tenê ji bo navên ewropî, lê ji bo hinde zimanên din jî hene. Di gel vê jî, hinde nav jî hene ku her weke nivîsandî tene bi lêv kirin.</p> <p>Çend nimûne: George Bush (Corc Bûş), Richard Nixon (Rîçird Nîkson), Tom Jones (Tom Cons), Bill Cosby (Bîl Kosbî), Vaclav Havel (Vaklav Havil), Kofi Annan (Kofî Annan), Theodore Pangalos (Teodor Pangalos), Netanyahu (Netanyahû), Kengo Wa Dondo (Kengo Wa Dongo), Franz Vranitzky (Frantz Vranitzkî), Roger Lescot (Rojê Lesko), Viollette (Vîyolêt), Berisha (Berîşa), Le Pen (Lô Pen).</p> <p>Me divê em li vir bi têtîniyeke piçûk behs bikin, ku hinde nav hene ew di her zimanekî de bi rengekî tene nivîsîn û lê her zimanek jî wê li gor fonetîka xwe bi lêv dike.</p> <p>Wek: Mayk (Mayk), Mike (Mayk), Mike (Mîk), Micke (Mike), Mike (Mîke) û hwd.</p> <p>Lê heçî navên ku ne bi latînî hatibin nivîsîn e, divê em jî li gor transkrîbsiyona wan ya navneteweyî binivîsin. Helbet gelek caran demûdezhêhên wî welatî bi xwe li ser transkrîbsiyona nava, ku wê jî bi riya biryara zimanasên xwe û saziyên jê berpirsiyar, bi xelqê didin zanîn. Bo nimûne, Çînê berî çendsalekê norm û sîstema nû ya transkrîbsiyona navên çînî da daxuyanî kirin û got, ku ev cure transkrîbsiyona nû ya bi latînî nêzîktirê bilêvkirina orjînalê ye. Me divê hûn navên me yê çînî watov binivîsin. Welê jî bû. Êdî xelqê jî bi a wan kir û navên çînî li gor sîstema resmî ya transkrîbsiyona çînî nivîsandin. Jê çend nimûne: Deng Xiaoping (Deng Ksîyaoping), Chang Kai-shek (Çiyang Kay-şek).</p> <p>Ji aliyekî din ve, navên ji alfabea kîrîlî, divê li gor bilêvkirina kurdî bêne nivîsîn.</p>
---	--	--

Wek: Nîkîta Xrûşov, Gorbaçov, Yêltsîn, Maksîm Gorkî, Aleksandir Lebed, Pûşkîn, Mayakovskî û hwd.

Heçî ji bo navên bi zimanê erebî ne, 'Ereb bi xwe negihane biryarekê. Navên 'erebî, di zebatên zanistî de, wek her zimanekî rojhilatê, bi alfabeya traskrîbsiyona zimanên rojhilatî dinivîsin. Lê di navnivîsîn û qeydan de, yan li gor alfabeya fransî yan jî ya îngilîzî dinivîsin. Welatên 'erebî yên ku ketibûn bin destên Îngilîzan, li ser traskrîbsiyona îngilîzî, yên ku ketibûn bin destên Fransîyan, li ser traskrîbsiyona fransî dimeşin. Bo nimûne: Eger navê camêrekî Şukrî be û eger ew jî Sûriyê yan jî jî Cezayirê be, navê wî wek «Choukri/Choukry», na eger jî Îraqê yan jî jî Misrê be, navê wî wek «Shoukry/Shoukri/Shokry/Shokri» dinivîsin. Ji bilî vê, tevî ku 'ereb bi xwe navên xwe bi tîpên 'erebî bi rengên curbicur dinivîsin, her miletek jî wê li gor bilêvkirin û rastnivîsîna xwe dinivîse. Wek navê Mihemed, ku bi van çend awayan li qelemê didin: Mohamed, Mohammed, Mohamad, Mohammad, Muhammed, Mehmet.

Gelo em Kurd bi çî awayî binivîsin? Divê em, çî navên 'erebî bin û çî jî yên farisî bin, ango navên ku traskrîbe dibin, li gor alfabeya kurdî binivîsin.

Heçî navên ku 'erebî yan jî farisî ne, lê Kurd jî li xwe dikin û bi kar tînin, divê em wan li gor bilêvkirina kurdî binivîsin.

Ji bo tîkneçûna zimanê me divê em bi xurtî hewl bidin ku nekevin bin bandor û tesîra zimanê neteweyên serdest û navan li gor rastnivîsîn û bilêvkirina wan nenivîsin. Pêwîst e em li vir bibêjin, ku Kurdên bakur di vî warî de nimûneyeke helez radixin ber çavan. Ew, di nivîsarên xwe yên kurdî de, navên wek Xumeynî, Mehmûd, Ferhad, Ehmed, Evdilezîz, Siltan, Belqîz, Zeyneb, û hwd, wek Humeynî, Mahmût/Mehmût, Ferhat, Ahmet/Ehmet, Abdulazîz/Ebdulazîz, Sûltan/Sultan, Belkiz, Zeynep dinivîsin. Ji bo kesên ku tirkî nizanin, pêdivî ye ku mirov şerh bike, ku di zimanê tirkî de, gotinên tirkî di halê xwe yê netewandî de, ji bilî hin awarteyan, divê çu caran bi bédengên nerm dawî nehên. Ji ber hindê jî Tirk li gor destûra zimanê xwe nikarin bibêjin Ferhad, Zeyneb û hwd. Ji ber ku «D» û «B» ji bédengên dengên nerm in. Divê ji dêlva wan bédengên «T» û «P»yê bi kar binin û bibêjin Ferhat û Zeynep...

Lê kurdî çî şol pê ye ! Divê kurdî li ser destûra zimanê xwe here, ne ya zimanekî din. Ew nav çawan li gor fonetîka

kurdî dihêne bi lêv kirin wisan jî bihêne nivîsîn. Ji lewra, di warê rastnivîsîna navên ji zimanê 'erebî ketine kurdî de, me divê em çend nimûneyan berpêş bikin. Navên ku bi gotina «Abd-ê dest pê dikin, divê wek «Evd-» bêne nivîsîn. Wek: Evdal. Navên ku tê de veqetandeka «-el-, -ul-, -us-,...» hene, divê li gor navan bi xwe yan wek «-il-» yan jî her «-ul-» bêne nivîsîn. Wek: Evdilmelîb, vdilrehman, Evdilsamed, Evdilmecid, Evdilmelîk, Evdîlqadir, Evdîlxaliq, Evdîlxenî, Evdîlkerîm, Evdîlcebar. Navên ku bi gotina «-lah» dawî tînin, divê li gor navan yan wek «-le» yan jî «-la» bêne nivîsîn. Wek: Kerîmulla, Se'dulla, Evdîlle û hwd. Navên din jî her li gor bilêvkirina kurdî, wek: Silêman, Êsiv, Cebâr, Setar, Kamil, Feysel, Xalid, Xelîl, Xidir, Kerîm û hwd. Ji bo bilêvkirineke rast ya navên ku tê de dengê «eyn» hene, mirov dikare vê nîşana han « ' » bi kar bîne. Wek: 'Îsa, 'Emer, 'Umran, 'Isam, Si'ûd, 'Arif, Ne'man û hwd.

Herweha divê navên farisî jî li gor alfabeya kurdî bêne nivîsîn. Ev jî çend nimûne ne ji navên farisî: Xeyam, Firdewsî, Elî Ekber Vêlayetî, Xamêneî, Xelxalî, Jîla, Hesên Ebbasnejad, Fêreydûn Xosrozadê, Ferîborz Tebatebaîyan, Sîmîn Şahîndost, Jalê, Ehmed Şamlû, Qasimlû, Hesênpûr.

Îdyomên kurdî

(II)

Amadekar : Mustafa AYDOGAN
Hemîd KILIÇASLAN

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
agir berra nav wan da: agir berda nav wan, agir xist nav wan; ew berdand hev	aralarına fitne fesat soktu, başlarını belaya soktu	il a semé la discorde, l'animosité entre eux	he makes mischief (stirs up trouble) between them
a (ya) wî lê hat: kêsa wî lê hatiye	eline fırsat geçti: şansı yaver gitti	la chance lui a sourit; il a eu de la veine	he was in luck, good luck (good fortune) smiled on him
agir bi erdê xistin: fesadî belav kirin;	fitne fesat yaratmak; birbirine düşürmek	semmer la discorde	make mischief, stir up trouble
aş betal kirin	faaliyete son vermek	cesser ses activités	to retire, to cease working
av di navbera wan de naçe	aralarından su sızıyor	ils sont comme cul et chemise	they are hank in glove,
av reşand gunê wî: 1) vala veğerandin, 2) rê li ber biserketîne girtin	1) eli boş çevirmek 2) başarısına engel olmak	1) renvoyer quelqu'un bredouille, les mains vides, 2) faire échouer être fichu, être perdu,	1) to send someone away empty handed 2) to fail, to be lost, lost without trace
av û av çûn	umulmaz bir şekilde yok olmak	disparaître sans laisser de trace	
ava aşekî ji dev çûn;	taaccüp etmek, ağzının	être ébahi,	to be breathless, gpping with
ava heft şorbeyan ji dev çûn:	suyu akmak	baver d'étonnement	astonishment

pir ecêbmayî man ava buharekî ava serî germ kirin	aynî tarağın bezi başının suyunu ısıtmak, ölümünü hazırlamak ecnebi, yabancı	du même accabit, du même bord comploter la perte ou la mort de quelqu'un étranger se perdre, s'égarer ils ne peuvent pas se sentir	the same type, same side plot against someone, plot someone's death foreigner to get lost they can't stand one another
avî: xerîb avî çûn, hawî çûn, ava wan bi cokekê de naçe: li hevdu nakin axê (derzîyê) biavêjî li erdê nakeve: pir qelebalix e	kayb olmak anlaşamıyorlar iğne atsan yere düşmez; çok kalabalık	foule très dense (où une aiguille ne pourrait toucher terre) faire la sourde oreille, négliger avoir vent de quelque chause.	a dense crowd turn a deaf ear, neglect, to have wind of something
avêtin paş guhê xwe ba bi ber guh ketin	kulak ardı etmek kulağına kar suyu kaçmak, sezmek	s'apaiser, décolérer qui propose et qui change d'avis	to calm down, cool down someone who blows hot and cold
ba ji ber çûn: perça wî danîn ba ji te baran ji te	yatışmak, sakinleşmek kendi önerip kendi cayan	lâcher des vents, péter faire faillite	to break wind, to fart to go bankrupt,
ba bi ber ketin barê xwe li tajiyê kirin	hava kaçmak, yellenmek sermayeyi kediye yüklemek, iflas etmek	têtu, tête de bois	stubborn, mule headed
barê êzingê min	Nuh deyip peygamber demeyen, inatçı	rabattre ses prétentions	to climb down, to knuckle under
baskê wî sist bûn; tengê wî sist bûn	yelkenleri suya indirmek	couper les ailes de quelqu'un, quelqu'un à l'impuissance mentir sans vergogne	hamstring someone to lie shamelessly
basko kirin basko nekirin	kolunu kanadını kırmak, güçsüzleştirmek fütursüz yalan söylemek, desteksiz atmak	s'entre déchirer, se couvrir mutuellement de honte se déchirer, s'entre-déchirer	sling mud (or abuse) at one another to tear one another to pieces
bav ji hev re çêkirin, bavê hev anîn pêş çavê hev bavê hev şewitandin: hevdu perîşan kirin bayê sor pê ketin	birbirini rezil etmek anasını ağlatmak eli ayağı tutulmak	avoir pieds et poings liés; être immobilisé par le rhumatisme	be tied hands and feet, to be bed-ridden with rhuma tism
bayê wî bilind e bayê wî rabûye bayek ji ber serê xwe berdan bê nan û xwê: bê wefa bê serberate çûn; bê ser û bê berat çûn; bê ser û şûn çûn bê xwê bûn; bê tam bûn bê zirav bê dil belika guhê wî xwê nade (ji yekî re) bêmal bûn	havalıdır, fiyakalıdır işleri yolunda tebdili hava etmek vefasız iz bırakmadan kaybolmak tatsız olmak, münasebetsiz olmak ödlek, korkak gönülsüz tinmiyor varını yoğunu biri için feda etmeye hazır olmak	il a grand air, il a la superbe il a le vent en poupe changer d'air infidèle, déloyal partir sans laisser de traces; disparaître être désagréable, inconvenant lâche, poltron involontaire ile ne réagit pas; il subit sans réagir être prêt à se sacrifier corps et âme pour quelqu'un	high and might, haughty has the wind in his sails change of air unfaithful, disloyal to leave will leaving an address, to disappear to be disagreeable, unsuitable coward unwilling, unintentional he does not react submits to be ready to sacrifice oneself body and soul for someone
-an /-yan (II) : Wek nîşana piraniyê navê el û eşîretêke dide xuya kirin.
Nimûne: heyderan, demenan, kikan, milan, reşkotan, celalîyan, gawestîyan, Goyîyan

-an /-yan (III) : Navê herêmekê ku el û eşîreta navkirî lê dijî yan jî lê dima nîşan dide.
Nimûne: Botan, Soran, Mukrîyan, Behdînan

-an /-yan (IV) : Wek nîşana piraniyê ji navdêran navdêreke nû û xwedan maneyêke nû diafirîne.
Nimûne: gulan, xalan, apan

-ane (I) : Paşgirek e ku pê hoker tene çêkirin û maneya "bi awayê, bi rengê, bi tehrê, bi şiklê" dide peyvê.
Nimûne: kurdane, serxweşane, mîrane, dostane, şêrane, mêrane, yekane, tekane, jinane, sextekarane, şahane, merdane

-ane (II) : Hoker dem û zemanan çêdike û maneya "her..., wek her..., " dide peyva ku ew pê ve tete girêdanê.
Nimûne: rojane, mehane / heyvane, heftane, salane,

-ane / (III) : Bi alîkarîya vê pirtikê hoker yan jî navdêr tên çêkirin.
Nimûne: yekane, perane, tekane

-anê / -anî : Bi alîkarîya vê pirtikê navên listik û yariyan tên çêkirin.
Nimûne: topanê (talanê), goganê / goganî, kêlanê / kêlanî, bersinganê, çoganê, hêlanê, beranê

-anî (I) : Bi alîkarîya vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji rengdêran navdêrên abstrakt tên çêkirin.
Nimûne: piranî, mêranî, xortanî, koranî, kêmanî, keçanî, qîzanî, jinanî

-anî (II) : Bi alîkarîya vê paşgirê navên hin xwarinan û hwd tên çêkirin.
Nimûne: boranî, çortanî, şiranî, doşanî

-anok : Bi alîkarîya vê paşgirê navdêr tên çêkirin.
Nimûne: tiştanok, çivanok

-ar (I) : Ji bo çêkirina navê tiştêkî bi kar tê.
Nimûne: destar, guhar

-ar (II) : Tete dawîya peyvên ji qurma lêkeran afirî û heysê û rengêkî dide gotinê. Heye ku ji kurtbûna paşgira "-dar" be.
Nimûne: nivîsar, gotar, didar, reftar, kuştar, kirdar, mirar

-ar (III) : Ji bo çêkirina navê kesê ku karekî dike û pê radibe" tete bi kar anîn. Heye ku ji kurtbûna paşgira "-yar" be.
Nimûne: cotar / cotyar, xewar, mirar, kirar

-ar (IV) : Ji rengdêran rengdêreke nû çêdike.
Nimûne: kevnar, jengar / jingar / zengar / zingar

-ar (VI) : Ji hokeran hokereke nû diafirîne.
Nimûne: pêrar

-are (I) : Ji rengdêran rengdêreke nû çêdike.
Nimûne: kevnare

-are (II) : Ev paşgir bi maneya "xemilandî, bi xemil" de ye.
Nimûne: dilare

-asa : Bi maneya "wek, mîna, fena, mînanî, şitî, şubhê" de hokeran çêdike.
Nimûne: dêwasa, hûtasa

-asî : Ji rengdêr yan jî ji navekî navdêreke abstrakt çêdike. Heye ku ev pirtik ji guhirîna "-asa" ya bi maneya "wek, mîna, fena, mînanî, şitî, şubhê" de be.
Nimûne: kêmasî, kurtasî, kurdasî

-atî /-yatî : Bi alîkarîya vê paşgirê navdêrên abstrakt tên çêkirin.
Nimûne: kirîvatî, êzdîyatî, mirovatî, xizmatî

-avêj : Paşgira ji lêkera "avêtin, havêjtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê avêtinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: topavêj, bombeavêj, tîravêj, dûravêj, gûavêj

-avî : Di zaravayê kurmançî de peyva "avî" bi tena serê xwe xwedîmane ye, maneyeke taybetî dide. Ev peyv jî bo tiştê "avdar, bi av û herikok" tete gotin. Bo nimûne: sêveke avî, xwarineke avî, erdê avî, avî û dêmî. Lê, herwekî di van çend nimûneyên jêrin de xuya dibe, peyva "avî" jî vê maneyê piçekî dîr e. Ew êdî bi rola paş girîyê radibe. Bi alîkarîya vê paşgirê jî navdêreke hokerek tete çêkirin.
Nimûne: ewravî, çiravî, giravî, qiravî

-wî / -yî : Ji vê paşgirê navê hin nexweşîyan tete çêkirin.
Nimûne: tawî, bawî

-awer : Paşgira ji lêkera "awerden" a farisî û "awirden, hawirden" a kurdîya jêrin e, ango "anîn, hanîn, înan, hînan". Lê wek paş gir jî maneya bingehîn ya lêkerê bi dîr ketîye, bûye xwedî maneyeke duhemîn, ku ew jî maneya "xwedîbûn, têdehebûn"ê ye.
Nimûne: cengawer, dilawer

-wend : Xudawend

-ayetî : Ev paşgir di van çend dehsalên dawîn de ji zaravayê soranî ketîye kurmançî. Bi alîkarîya vê paşgirê navdêrên abstrakt tên çêkirin.
Nimûne: kurdayetî, birayetî

-bar (I) : Ev paşgir bi maneya "destûr heye ku bikî, dikare bête kirin, qabilî kirinê" ye.
Nimûne: guhêrbar, guhêzbar, birbar, dîtbar / dîbar, nedîbar, xwarbar

-bar (II) : Ev ji lêkera "barîn"ê afirîye û wek paş gir bi maneya "tîjî (bi), dagirtî (bi)" de ye.
Nimûne: gunehbar, tawanbar, xembar, çavnebar, zîyanbar, xetabar

-bar (III) : Ev paş gir jî zimanê pehlewî hatîye û bi maneya "perav, qirax, kenar, rêya avê" ye.
Nimûne: rûbar, cobar, zêbar

-bare : Bi maneya "car"ê de ye.
Nimûne: dubare, sêbare

-baz (I) : Paşgira ji lêkera "bazdan"ê, ango "lîstin"ê ye. Di kurmançîya bo nimûne Berazîyan û ya hêla Ruhayê de, jî bo lîstina bi maneya "dîl kirin û reqs"ê de, dibêjin "bazdan". Ji ber vê yekê, gava ku ev paşgir tete dawîya peyvekê, maneya "kesê ku bi karê lîstinê radibe" dide peyvê. Peywendîya vê lêkerê bi "bazdan" a ku bi maneya "revîn, xwe nedan dest, xwe hilavêtin, xwe çeng kirin, hop kirin û hwd"ê tune ye.
Nimûne: fêlbaz, qumarbaz, canbaz, kindirbaz, serbaz, şûrbaz, rimbaz, jinbaz, kiçbaz, dilbaz, sêhrbaz, hîlebaz, hoqebaz, dekbaz, tewlebaz (fêlbaz), çenebaz

-baz (II) : Ji lêkera "bazdan"ê ku peywendîya wê bi "çûn"ê heye.
Nimûne: derbaz, , rêbaz

-bêj : Paşgira ji lêkera "gotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê gotinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: dengbêj, stranbêj, çirokbêj, henekbêj, xweşbêj (xoşbêş), gotûbêj, gotinbêj, Pîrbêj, ezberbêj

-bend (I) : Paşgira ji lêkera "bestin"ê, ango "girêdan"ê de ye.
Nimûne: bazbend, derbend, girêbend, çiçikbend, terkîbend, destbend, dolbend, rûbend

-bend (II) : Bi maneya "girêdan û bestin"ê de kar û pêşeyekê nîşan dide.
Nimûne: solbend, nalbend

-bend (III) : Bi maneya "xwe bi tiştê ve girêdayî dîtin"ê dide.
Nimûne: sazband, hevalband

-ber (I) : Paşgira ji lêkera "burden" a farisî û "birin" a kurdî ye ku maneya "kesê / tiştê ku bi karê birinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: rêber, dilber, rêveber, emirber, nameber, fermanber, penaber, pêxamber / pêxember / peyamber, ajneber

-ber (II) : Bi maneya "hebûn"ê de ye.
Nimûne: sîber, ruhber

-best : Paşgira ji lêkera "bestin"ê, ango "girêdan"ê ye ku maneya "kesê / tiştê ku bi karê girêdanê radibe dide peyvê.
Nimûne: darbest, serbest, benbest, helbest

-bir : Paşgira ji lêkera "birin"ê ye û maneya "kesê/tiştê ku bi karê birinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: barbir, avrûbir, zorbir, bîrbir

-birr : Paşgira ji lêkera "birrîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê birrînê radibe" dide peyvê.
Nimûne: darbirr, rêbirr, cawbirr, çolbirr, avbirr, serbirr, navbirr, kurtebirr, qutbirr, destbirr, dewbirr (yê ku pezê xwe liserhev difroşe), tabirr, çilbirr (yê ku çilê zarokan dibire), şikêlbirr (nexweşîya zarokan e û heta dibin 3-4 salî nikarin bimeşin. Yê ku şikêlê dibirre), mehrbirr, cobirr

-bihêrk / -buhêrk /-bêrk : Paşgira ji lêkera "bihartin / buhartin"ê ye û maneya "tiştê ku bi karê bihartinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: şevbihêrk, rêbuhêrk, dilbuhêrk

-bîn : Paşgira ji lêkera "dîtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê dîtinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: dûrbîn /dûrebîn, bedbîn, hûrbîn, xweşbîn, nebîn, geşbîn, rastbîn

-ç : Paşgira ji bo piçûkkirinê ye û kurtbûyîya "çe"yê ye.
Nimûne: rêç, riç (rîçal, reh û rîçal)

-çe : Paşgira ji bo piçûkkirinê ye.
Nimûne: alûçe, baxçe, parçe, boxçe, nîvçe (nîvcî, nîvco), kemaçe, xaliçe, nalçe

-çik : Paşgira ji bo piçûkkirinê ye. Ji du pirtikên piçûkkirinê, jî "ç" û "ik"ê pêk hatîye.
Nimûne: rûçik, rêçik

-çin : Paşgira ji lêkera "çinîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê çinînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: mazîçin, gulçin, pembûçin, titûnçin

- çing:** Paş girek e, ku ji pirtika "çin"ya ya ji lêkera "çinîn"ê û pirtika "g"yê, ku ji paş gira "ing" a ji bo piçûkkirinê ye, pêk hatîye. Bi vê paş girê navên alavan tête çêkirin.
Nimûne: mûçing
- çîn :** Paşgira ji lêkera "çandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê çandinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: derewçîn, gulçîn
- çolkî :** Ji rengdêrekê hokerê diafirîne.
Nimûne: spiçolkî
- da :** Paşgira ji lêkera "dan / dayîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê dayînê radibe" dide peyvê.
Nimûne: nanda / nande, xwedêda
- dan (I) :** Derdana tiştêkî nişan dide.
Nimûne: derdan, şimadan, mûmdan, agirdan, çaydan, guldan, kildan,
- dank :** Derdaneke piçûk ya tiştêkî nişan dide. Paş gireke hevedudanî ye û ji peyva "dan" û pirtika piçûkkirinê ya "k"yê pêk hatîye.
Nimûne: agirdank, avdank, avildank, çaydank, derdank, derzîdank, gulçîdank, kevçîdank, kildank, mîzdank, mûmdank, pîfdank, pîzdank, şekirdank, şimadank, xwêdank, xwelîdank
- dar /-(e)dar (I) :** Paşgira ji lêkera "daştin" a farisî ye ku di hin zaravayên kurdî de "darîn" e û hevmaneya lêkera "hebûn"ê ye. Paş gira "dar" bi maneya "heye / heyî"yê de ye.
Nimûne: agahdar, ahengdar, avdar, bêhndar, birîndar, çekdar, cindar, dêndar, derdedar, deyndar, dikandar, dîndar, evîndar, fermanदार, kirdar, kirêdar, maldar, mêvandar, nandar, nedar, payedar, piştedar / piştîdar, remildar, serdar, sermayedar, xwîndar, zordar,
- dar (II) :** Di zaravayê kurmançî de bi tenê di peyva "guhdar" de, ku bi awayekî ş aş , paş gira "dar" di maneya "dan / dayîn"ê de ye. Rastîya vê, herwekî di klasîkên me de ji derbas dibe, "dêr" e û ji lêkera "dêrîn / dêran"ê ye. Di klasîkan nivîskî de ev wek "guh bidêre" ye û peyva "guhdar" jî di edebîyata devkî de "guhder" e.
Nimûne: guhdar / guhder
- de :** Paşgira ji lêkera "dan / dayîn"ê ye û maneya "dayîn"ê dide peyvê.
Nimûne: nande (nanda, nandar), dîyarde, qûnde
- dek :** Navên alav û hacetekê nişan dide.
Nimûne: badek, nişandek
- der /-eder (I) :** Ev paşgir maneya "derve" dide peyvê.
Nimûne: şevder / şeveder, çavder (çavlider), dader
- der (II) :** Paşgira ji lêkera "dan / dayîn"ê ye û maneya "dayîn"ê dide peyvê.
Nimûne: fermander
- derz :** Paşgira ji lêkera "dirûn, dirûtin"ê ye û maneya "kesê ku bi karê dirûtinê radibe" dide peyvê. Peyva "derzî" û "terzî" jî her ji vê peyvê hatine.
Nimûne: qûnderz (cureyek kêlê / dirûtinê ye), duderz
- dêr :** Paşgira ji lêkera "dêran / dêrîn"ê ye û maneya dayînê dide peyvê. Li „-dar (II)"an binihêre.
Nimûne: avdêr, guhdêr, çavdêr, kardêr, kirêdêr
- dêrî / -dorî :** Paşgireke hevedudanî ye û ji "dêr" a ji lêkera "dêran / dêrîn"ê, ku bi maneya "dan / dayîn"ê ye, û ji pirtika "î"yê pêk hatîye. Navdêreken abstrakt diafirîne.
Nimûne: gadêrî / gadorî, şevdêrî / şevdorî
- dirû :** Paşgira ji lêkera "dirûn, dirûtin"ê ye û maneya "kesê ku bi karê dirûtinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: soldirû, kurtandirû, cildirû (kinçdirû)
- dîn :** Bi maneya "cih, sitar"ê de ye.
Nimûne: kadîn, gîyadîn
- doş :** Paşgira ji lêkera "dotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê dotinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: çêlekdoş, pezdosh, kerdoş
- doz / -diz (I) :** Paşgira ji lêkera "dirûn, dirûtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê dirûtinê radibe" dide peyvê.
Nimûne: pînedoz / pînediz, çewaldoz / çewaldiz,
- doz (II) :** Paşgira ji lêkera "dozîn, doz kirin"ê ye û maneya "kesê ku bi karê peydakirin û bidestxistinê radibe" dide peyvê. Di zaravayê soranî de ev lêker bi tenê bi maneya "peydakirin"ê de ye û gelekî berfirehtir tête bi kar anîn. Lê di kurmançî de, "doz kirin" bi maneya "da'we kirin, xwastin"ê de ye. Lê, bi maneya "peydakirin"ê de, bi tenê di kurmançîya li hêla Depê / Xarpêtê de tête bi kar anîn.
Nimûne: nandoz, wardoz
- e (I) :** Tête dawîya peyvên ji qurma lêkeran afirî û heysê û rengê dide gotinê.
Nimûne: bijarte, bijare, bêje, jimare, bende, kêşe, beste, hinare, şikeste, kirde, xwende, male, awarte
- e (II) :** Tête dawîya peyvên ku rengan nişan dide û maneya "rengê ku ber bi wî rengî diçe, rengê ku dişibe wî rengî" dide peyvê.
Nimûne: sore, keske, zere, gewre
- e (III) :** Tête dawîya hin peyvên ku peywendîya wan di gel zeman heye yan jî zeman nişan didin û maneya "bi wê demê ve girêdayî, di wan wextan de" dide peyvê.
Nimûne: bihare, êvare, payîze, sere, navsere, hefte, çile (çele)
- e (IV) :** Ji peyvên navdêr yan jî rengdêr navdêreke nû û xwedan maneyeke nû û taybetî diafirîne.
Nimûne: deste, dermale, çilmêre, şewate, sebze, kore, nerme
- ek (I) :** Gelek caran navên tiştan, nemaze navên hacet û alavan diafirîne.
Nimûne: destek, badek, rastek, piştêk, birrek, xizek, nîvek, şeşek, heştêk, heftêk, fitlek, xwastek, kotek, xurek (xwarek / xwerek)
- ek (II) :** Navên ku xuy û xeyseteke taybetî dide mirovan diafirîne.
Nimûne: virrek, serek, kulek, silek, çilek, zirtek, fisek, tirrek, tirsek, mîrek, pîrek, wêrek, newêrek, fenek, parsek, kulek
- el :** Ev paşgir maneya "bi rengê" dide peyvê û wê dike xwedan xeyseta navdayî û jê rengdêrekê diafirîne.
Nimûne: çepel, komel

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Parîsê ya payîza 2005an

Civîna 37an ya Kurmancî rojên di navbera 10 - 17/12-2005an de li Parîsê kom bû. Beşdarên civînê li ser peyvên kêmnas, termên fûtbolê, termên komputerê, peyvên di stranan de, tiştên xanî û mal û navmalê, devoka Berrîyê û paşgir û pêşgirên kurdî xebitîn.

Ev hevalên han di civînê de beşdar bûn: Salih Akin (Xerzan), Xosro Ebdullahî (Salmas),

Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Lutfî Baksî (Xerzan), Newzad Hirorî (Dihok), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Emîn Narozî (Batman), Kendal Nezan (Diyarbakir), Selam Nûman (Qamişlo), Cemal Onursal (Cizîr), Zinar Soran (Dêrik), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zilan (Agirî).

Encamên ji xebata vê civînê di vê hejmara Kurmancî de tîn belav kirin.

Peyvên kêmnas

Amadekar : Kendal NEZAN

kurdî	tirkî	fransizî	ingilizî
ajaldarî (m)	hayvancılık	élevage de bétail	cattle breeding
ajaldar	hayvan besleyen	éleveur de bétail	cattle breeder
belot, belût, berû, palût, pelût	palamut	noix de galle	oak apple
şahbelût, şahbelot	kestane	marron, châtaigne	chestnut
berisandin	hesaplamak	calculer	to calculate
berisandin (m)	hesap	calcul	calculation
mazî	mazi	gland	acorn
berjenek (n)	dokuma tezgahı parçası	élément de métier à tisser	part of a loom
dîndoq, cîncox, cîncix, (m)	incik, boncuk	verroterie brillante	brilliant glass beads
dîndoqî; cîncoxî, (r); xara cîndoqî	incikten, incikten cam bilya	bille en verre brillant ; bille	made of brilliant glass, glass bead
birûsîn: teyisîn, îsîn	ışıldamak	scintiller	to glitter
cigur, cigor (m)	şubat ayında üç gün boyunca kutlanan bir hıristiyan bayramı	fête chrétienne célébrée en février pendant trois jours où il y a notamment des processions suivies d'agapes comprenant des panses farcies (zimbeloq)	christian holiday in February celebrated for three days with processions and feasts featuring stuffed intestines
çetiyar (r); şûrê han çetiyar e	vasat, düşük kaliteli / bu kılıç düşük kalitedir	médiocre ; ce sabre est médiocre	mediocre, this sword is of poor quality
çetiyarî (m)	orta durum, orta değerlilik	médiocrité (n.f.)	mediocrity
cizirandin	incitmek, rencide etmek	humilier	to humiliate
cizirandin (m)	incitme, rencide etme	humiliation	humiliation
xiş bûn	kırlmak	se briser, se casser, être cassé	to be broken
xiş kirin	kırmak	briser, casser	to break
çûr kirin	paha biçmek	priser (v.tr.), mettre un prix	to value, to bid
çûr û xiş kirin	(oyunda) almak, elde etmek	s'appropriier au cours d'un jeu, (d'osselets, etc.)	to win
çûr (m)	1) bir oyunda sermayesini tükettikten sonra son avans; 2) avans; 3) bir mecliste asıl şarkıcıları teşvik için söylenen bir ezgi	1) prise dans un jeu une fois que l'on a épuisé son capital, se donner pour une ultime fois un acompte ; 2) avance, acompte ; 3) chanson chantée dans une soirée pour inviter un chanteur à chanter	1) mackings wager after losing ones money; 2) a deposit; 3) a song sung at party, to encourage singer
ev jî cûra filankesê ye	buda falancanın şarkı söylemesi için benden	c'est un acompte pour un tel pour que celui-ci chante	advance payment for a singer
feriqîn (biferiqe)	1) geriye çekilmek, gerilemek; 2) dağılmak (bk... ferikîn)	1) battre en retraite, reculer ; 2) se disperser (voir ferikîn)	1) to retreat; 2) to disperse
feşkirîn (bifeşkire) (v.i.), fişkilîn, bişkivîn	çözölmek, kırılmak	se défaire, se dissoudre, se briser	to be undone, to be dissolved, to break up
feşkirandin (bifeşkirîne), bişkivandin	dağıtmak, çözmek	défaire, disperser, dissoudre	to undo, to dissolve, to break up
filhurco (r)	mahvolmuş, yıkılmış	anéanti	annihilated
filhurco kirin	imha etmek	détruire (v.tr), anéantir	to destroy, to annihilate
finû (r û nav), fenek	asalak, kaypak	scélerat(e), parasite, filou, gredin	scoundrel, swindler, parasite
gilêr (r), gêr, xir, xilor	toplu, toparlanmış	rassemblé(e), assemblé(e),	assembled, gathered
gilêr bûn	yuvarlanmak, toparlanmak, sarılmak	s'enrouler, se lever, être enroulé, être collecté	to be rolled up, to get up, to be collected
gilêr kirin	sarmak, yuvarlamak	rouler, enrouler	to roll
di gîrnîkê de lîxistin	burnunu sürtmek	humilier qqn, frapper qqn au nez, rabaisser le nez de qqn	to humiliate somebody
gîrnîk (m)	burnun ortası	milieu du nez	bridge of the nose
goştewî (m)	ekime elverişli toprak	terre meuble	loam
gulmanîn (adj.), pîrxur, xure, kulp, gulpişî, kulb, hilpo	pisboğaz, doyumsuz	gourmand(e), vorace, avide	greedy
gulik (n)	bitkilerde asalak bir mantarın oluşturduğu hastalık	(bot.) maladie de certaines plantes (tabac, tomate, etc.), mildiou	mildew
gulikê li tûtîne xistiye	tütün mantarlanmış	le tabac est atteint de mildiou	tobacco is mildewed
gumgumok (m), kumkume	kertenkele	variété de lézard	type of lizard
margîsk (cureyeke maran e)	bir tür yılan	variété de serpent	type of snake
marîjek, mazîzerk	çayır kertenkelesi	lézard de près	meadow lizard
mêşên gumreh	bir kovanın kalabalık arı topluluğu	abeilles nombreuses et actives (dans une ruche), essaim d'abeilles	swarm of bees
gumtil (n), kêstek, kêstil, şel	toprak topağı	motte de terre	clod of earth
hewaneyî (m)	muhalefet	rare, opposition	rare, opposition

hîç (m)	küçük taşların bir deliğe atıldığı bir kız oyunu	1) pin ; 2) jeu de filles qui consiste à faire entrer des cailloux ou "morik" dans un trou (voir aussi xîç)	1) pine; 2) girls' game of throwing stones into a hole
înik (m), pînik ji ber ... ve kirin	kümes (Serhed bölgesinde) birinin yerine tutmak, birinin yerine bir iş yapmak	(dans le Serhed) poulailler se substituer à qqn, remplacer qqn, agir à la place de qqn	(in Serhed) chicken coop to replace somebody, act on behalf of s.o.
înk (m), înt, rik, i'nt; ketin înkê, ji yekî înk kirin	inat, inat etmek	obstination, entêtement; s'obstiner, avoir une dent contre qqn	stubbornness, to insist, to be spiteful
karkenar (n)	emekli	retraité(e)	retired person, pensioner
karkenarî (m)	emeklilik	retraite	retirement, pension
kel (n), qot, ser, zîrwe	zirve	sommet, pic	summit, peak
kelê çiyê	dağın zirvesi	sommet de la montagne	summit of a mountain
kelmezo (r)	çağa uymayan, demode	anachronique	anachronistic
kelmezoyî (m)	zamana uymama, demode olma	anachronisme	anachronism
kelmizo (m), kelmij	buhar	vapeur	steam
ker (m); qerz, deyn	borç	prêt	loan
ker dan	borç vermek	prêter (v.tr.) voir qer, qerz	to lend
kerecî (m), qeyix, belem	kayık	barque	boat
kerq (n)	tavuk	poulet	chicken
kerikê kerajo, pezko gurko kerbîn (bikeribe)	bindirbir 1) üzölmek; 2) merak etmek; 3) özlemek, arzu etmek; 4) öfkelenmek	saute-mouton 1) être attristé ; 2) se faire du souci, s'inquiéter (v.pr.); 3) désirer ardemment ; 4) se mettre en colère	leap-frog 1) be saddened; 2) worry; 3) to desire ardently; 4) to be angry
kekûş (n)	ağustos aylarında olgunlaşan küçük taneli ve çok tatlı bir üzüm türü	variété de raisin très sucré utilisée dans la fabrication du raki, aux petits grains, mûrissant début août	very sweet grapes ripening in August used for raki
kerşît (m)	güney Kürdistan yemeklerinden	(culin.) nom d'un mets du Kurdistan méridional	Southern Kurdish dish
kesber, kesper (adj.)	gözleri mavi ile yeşil arası bir renkte olan	qui a les yeux pers	green-eyed
kesperî (m)	mavi ile yeşil arası bir renk	couleur entre le bleu et le vert	blue-green
keskaw (m),silqas	pancar çorbası	soupe de betterave	beetroot soup
keşkele (n), keşkêlene	ağaç kakan	pie	magpie
kevêl (m), keví	bir kabin kenarı	bord d'un récipient	edge of a dish
kewderî (m)	kar kekligi	(ornith.) perdrix des neiges, lagopède, gelinotte	ptarmigan, grouse
kewş	kuru otlar	brindille	twig, kindling
kewş û kelaş, qirş û qal, pûş û pal	çalı çırpı	petit bois de chauffage, herbes sèches	kindling
kelaş: gelaş	kuru otlar	herbes sèches	dry grass
kewîşandin (bikewîşîne)	1) silkelemek, düşürmek 2) budamak	1) ébranler, abattre, faire trembler ; 2) tailler, émonder	1) to demolish, chop down, shake; 2) to cut, to trim
kewê gozel	kırmızı keklık	bartavelle, perdrix rouge	red partridge
kewê súsik: kewşusk	kır keklık	perdrix grise	gray partridge
kewê çirik: kewçîr	beyaz keklık	perdrix blanche	white partridge
kewê rabat ou ribaş	erkek keklık	perdrix cacabe	partridge
kewte an kewde (n)	müfreze, askeri birlik	détachement, groupe, unité militaire	military unit
kewteyine xweser	özerk birlikler	unités autonomes	autonomous units
kezab (m)	kezzap	eau-forte, acide nitrique dilué d'eau	diluted nitric acid, aqua fortes
kêr (r), bêoxir	uğursuz	néfaste, porte-malheur	unlucky
kêş (m) kêşa çiyê, sing, darçît	1) dağ yamacı, yamaç; 2) türban; 3) (farsça) inanç (bkz. kîş)	(pers rare) 1) flanc, versant d'une montagne ; 2) turban ; 3) (pers culte) religion, croyance (voir kîş)	1) slope of a mountain; 2) turban, religious, belief (see kîş)
kêzm	1) kazık; 2) destek direği	1) pieu, pal, piquet ; 2) appui, étale	1) stake; 2) support
kêzim (n); feqîrî jê re ne bû kêzim	1) diken; 2) engel, yoksulluk onun için bir engel oluşturmadı	1) écharde ; 2) obstacle ; la pauvreté n'a pas été un obstacle pour lui	1) splinter; 2) obstacle; destination has not been an obstacle to him
kilîta devger	ingiliz anahtarı	clef anglaise	adjustable wrench or spanner
kilîta pêşgir	civata anahtar	clef à boulon, clef à vis	spanner
kilkemişke	fare kuyruğu gibi sıra	file en queue de rat	queue
kilkehelşîne, şivanxapînok	kuyruk sallayan, çaban aldatan kuşu	hochequeue	wagtail
kirêb (m), xozan	nadas	terre en jachère, jachère	fallow land
erdê kirêb	bir defa sürölmüş tarla	champ labouré une fois	field plowed once
kirêb (r)	bir defa sürölmüş	labouré une fois superficiellement	a field plowed superficially once
kirêb kirin	toprağı bir defa sürmek	labourer une fois superficiellement	to plow superficially once
koçek	bir yezidi kasti; mensupları şeyh Adî'nin kabrini gözetler ve ayinlerde dans ederler. Kendi aralarında yada müritlerle evlenebilirler, cenazeleri yıkamakla da görevlidir	caste yézidie dont les membres surveillent les gardiens de la tombe du Cheikh Adi et qui dansent lors des cérémonies. Ils peuvent se marier avec des fidèles (murîd). Ils sont chargés de la toilette des morts	Yezidi caste whose members watch over the tomb of Sheik Adi and who dance in ceremonies. They can marry with believers. They prepare bodies for burial
koçek, moîde	köçek	jeune danseur travesti en femme	young male dancer dressed as a woman
kod, koda kilîte	anahtar silindiri	barillet de serrure	cylinder of lock
koga (m)	büyük mağaza	grand magasin	department store
kors (sor.) (r)	sağlam (bkz. qurs)	solide (voir qurs)	solid
kuş, kuşe ; erdê kuşe	kurak, kurak toprak	aride ; terre aride	arid, arid land
kovik, guzvank, tilîvank	yüksük	dé à coudre	thimble
kozlax (m)	siper dizisi	groupe de tranchées	set of tranches
kortika dizan	kafatası tepesinden saçların birleştiği nokta	le creux du sommet du crâne où les cheveux se rejoignent	crown of the head
kubandin (bikubîne)	susturmak	interdire, imposer le silence, (voir kipandin)	to forbid, to impose silence
kud (m)	1) felç (bkz. kût); 2) öcü alınmamış cinayet	1) paralysie (v. kût) ; 2) meurtre non vengé	1) paralysis; 2) unavenged murder
kulk an kurk (m)	yüksek kaliteli keçi yünü; eldiven, çorap ve geleneksel Kürt giysilerinin (şal, şapık) yapımında kullanılır	laine de chèvre de haute qualité épaisse utilisée pour la fabrication de gants, de chaussettes, de costumes traditionnels kurdes (şal, şapık) imperméables	high-quality water-proof goat wool used for gloves, socks and traditional Kurdish costumes
kulk, devşeh	tarak dibi, kalitesiz	laine inutilisable pour filer	wool not suitable for weaving
kulmêrû (m), kumorî, mûrîstan	yüzde kuru beyaz lekeler oluşturan bir ekzema türü	une variété d'eczéma sur le visage sans purulence avec des plaques blanchâtres	psoriasis
kumbir (n)	taşsız ve düz zirve	sommet arrondi et plat sans pierres	flat, round summit without stones
kurad: pirasa	pirasa	poireau	leek
kurîfî (m)	dalma	plongeon	a dive
kurîfî avê bûn, noq çûm (qurî) qurîfî avê bûn	su içmek için kafasını suya veya su birikintisine daldırmak	plonger le museau dans l'eau pour boire, (flaque) (v. aussi qorî, qorîtk, qurisî an qurîyê avê bûn)	to lap

qurî kirin (m)	bir su birikintisinden su içirtmek	faire boire dans une flaque d'eau	to make drink from a puddle
kurmîkêz (m)	parazit hastalığı	maladie parasitaire	parasitic disease
kîp kirin	sıkıca kapatmak	fermer hermétiquement, sceller	to seal
kîp	sıkı kapanmış	hermétique	air tight, water tight
kîp (r)	sessiz, suskun	silencieux	silent
kîp kirin, kîpandin	sesini kesmek, susturmak	empêcher de parler, rendre silencieux	to silence (s.o.)
kurm û kêz	kurt, haşere	vermine	vermin
kurm û kêz bi canê te keve	canına kurt dökülsün	que ton corps soit dévoré par la vermine	may vermin devour you!
kurtepank (m)	bir tür mercan	variété de corail, abramis	type of coral
kurûşik (m)	gerilim, tansiyon	tension	tension
kevîrê kuş	sünger taşı	Pierre ponce	pumice stone
kuş	oyuk, delikli	poreux, creux	porous, hollow
kuşîş (m)	gayret, gayretkeşlik	application, zèle	zeal, fervor
kûsiyê avê, req	su kaplumbağası	tortue d'eau	turtle
kuşk, qûz, delek, kûze	sansar	martre, zibeline	sable
kûşk (m)	kum kırlangıcı	hirondelle des sables	sand martin
lawandin: lûvandin	yakınmak, ağıt yakmak	se lamenter, faire une élégie	to lament, to write an elegy
hîlawêstin (bihîlawêse), lawandin	asmak, askıya almak	suspendre	to suspend
lepke (m), bela; lepkeya me gihîşt wî	bela, müsibet; belamız ona bulaştı	calamité, infortune; il a été atteint par notre infortune	calamity, misfortune; he has been harmed by our bad luck
levkîne (m)	dedikodu	médiance	slander
levkînebar (r)	vasat	médiocre	mediocre
levkînebarî (m)	vasatlık	médiocrité	mediocrity
lewendî (m), ûçîk, hûçîk	1) incelik, ince uzun boy, 2) geleneksel Kürt kadın giysilerinin uzun kol uçları	1) sveltesse ; 2) cordon de la manche des habits traditionnels kurdes	1) slenderness; 2) a cord attached to the sleeve of traditional Kurdish robes
leze (m), hêwirze	kargaşa, gürültü, patırtı	tumulte (n.m.), vacarme, charivari	a din, row, racket
lê dan mandelayê, mandel kirin	inkar etmek	nier (v.tr.), renier (v.tr.)	to deny, to reject
lêbûk, lêpok, şadik	oyuncu, palyaço	acteur(trice), clown, bouffon	actor, clown, jester
lêbûkî	komiklik, palyaçoluk	clownerie, bouffonnerie	buffoonery
lêkandin (m)	bölme	division	division
lêkandin (lêkîne), lêk vekirin	bölmek	diviser (v.tr.)	to divide
lêl, leyl (m)	biri doğu'da biri batı'da olup Leyla ve Mecnun'un ayrılıklarını temsil eden iki yıldız	le nom d'une constellation formée de deux étoiles dont l'une est à l'Est l'autre à l'Ouest symbolisant les amours contrariées de Leyla et Majnoun	a constellation with 2 stars symbolizing the thwarted love of Leyla and Majnoun
lêmişt (m), lehî	1) çamurlu sel; 2) selin götürdüğü çalı-çırpı; 3) lav seli	1) torrent boueux ; 2) brindilles emportées par un torrent ; 3) coulée de lave	1) a muddy stream; 2) dead twigs in a stream; 3) a lava flow
limûzirav	turna balığı	brochet	pike
lok (n)	erkek deve	chameau	camel
lûlikgur	bacakları içe çarpık	qui a des jambes tordues vers l'intérieur	a knock kneed person
maçe (m)	1) dişi eşek; 2) dişi katır	1) ânesse ; 2) mule femelle	1) jenny; 2) mule (female)
maçe (ital), gurz (n)	balyoz	massue	club
malkir, malker, malkirî	tutumlu	économe, ménager, diligent	prudent, thrifty
maman: pîrik	ebe	sage femme	midwife

Xanî

Mal û navmal

-I-

Amadekar: Selam NÛMAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilizî
xanî	ev	maison	house
vîlla	villa	villa	villa
xanîk	evcik	maisonette, petite maison	cottage
rûxanî	cephes, ev cephesi	façade	front, façade, frontage
deriyê hewşê	bahçe kapısı	portail, porte d'entrée dans la cour	gate (to a courtyard)
deriyê derve	dışkapı	portail, porte d'extérieur	outer gate
dergeh	sokak kapısı	porte sur rue	front door, street door
hewş	ev veya bina avlusu	cour	courtyard
dîwarê hewşê, sûra hewşê, benda hewşê	avlu duvarı	mur d'un enclos ou d'une cour	wall (of yard)
saûna	sauna	sauna	sauna
garaj	garaj	garage	garage
tengala xanî	evin yan cephesi	pignon	gable
çavî, ode, jor, menzel	göz, oda	pièce, chambre	room
metbex, aşxane	mutfak	cuisine	kitchen
şirik, mezzîb	oluk	gouttière	[rain]gutter
odeya mêvanan	misafir odası	salon, salle de réception	reception room
odeya rûniştinê	oturma odası	salle de séjour	living room
kîler	kiler	cellier	cellar
kewar	erzak dolabı	garde-manger	larder
malnivîn, malvînk	yüklük	range-matelas	mattress storage
kulîn	1) yüklük ve yüklük altı erzak yeri; 2) bazı yerlerde kiler anlamındadır	1) garde-provision ; 2) cellier (dans certaines régions)	1) food store; 2) cellar (in some regions)
navmale	mefruşat	ameublement, mobiliers, équipements	furnishings
kêzîn	lağım	égout	drain, sewer
curnê serşokê	banyo küveti	baaignoire, bassine de bain	bath tub

Devokê Berriya Mêrdînê - IV

Amadekar : Hemîd KILIÇASLAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilizî
doxteşî	kabakulak	oreillons	mumps
dûdayî	tütsülenmiş	fumé	smoked
masiyê dûdayî	tütsülenmiş balık	poisson fumé	smoked fish
dûdayî kirin	tütsülemek	fumer (poisson)	to smoke (fish)
dûdayî bûn	tütsü kokmak	sentir la fumée	to smell smoke
dûzerkî	sararmış, dumandan sararmış	jauni (par la fumée)	yellowed (by smoke)
dupelkî: cotperkî	taze yeşeren, iki yapraklı, filiz	plant qui commence à pousser, plant avec deux feuilles	seedling
duserî	iki başlı	bicéphale	two-headed
dûserk, dûserik	1) ikinci (oyunda); 2) oynayan	deuxième, la personne qui joue en deuxième	second
duser	iki misli, bire karşı iki takası	double, d'une quantité contre son double (dans un troc)	double, bartering two items for one
sêser	üç müşlı	triple	triple
erc (nf): erk	kadir-kıymet	valeur, estime	value, worth
evor: ebor, gevşol	taranmamış karmaşık saç	chevelure hirsute	hairy
erdî (m)	has yünden yapılan renkli dört köşe örtü ya da şal	châle en laine fine de forme carrée aux motifs colorés	shawl
ewravî	bulutlu	nuageux	cloudy
eyn (n), di eynê xwe de neanîn der / li eynê xwe dananîn	umur, umursamamak, önemsememek	souci, ne pas s'en soucier, ignorer	concern, matter of concern, not to worry, to ignore, not to care about
ezezi (m)	bencilik	égoïsme	selfishness
fendo: fendok, fendoyî, fenek	hilebaz, düzenbaz, oyunbaz, hileci	intrigant, tricheur	deceiver, trickster, deceitful
feq: qaper	tuzak	piège, trappe, traquenard	trap
firk (adj), porên firk	seyrek, seyrek saç	clairsemé, cheveux clairsemés	sparse, sparse hair
firk (m)	spasma	spasme	spasm
firk ket pišta min û pišta min firikî	belime kramp girdi	j'ai eu un tour de reins	I have a backache
fiskirandin: fizikandin, fiskîlandin, viz kirin	sıvışmak, yan çizmek tüymek	filer à l'anglaise, déguerpir discrètement	to take French leave, to leave without being noticed
findirandin	çekip gitmek	s'en aller, déguerpir	to leave
firdik: hewrik, hûrikê nanî	ekmek kırıntısı	miette (de pain)	crumb
navikê nan	ekmek içi	mie de pain	bread
firtefirt: qilqilandin	kaynama, yerinde duramama	bouillonnement (d'impatience)	bubbling (withing impatience)
firtî firtî xelasbûn, filtî filtî xelasbûn	kıl payı kurtulmak, zor bela kurtulmak	échapper de justesse	to have a narrow escape
fisek	1) osurgan, yelli; 2) kirli işler seviren; 3) gevşek, tembel	1) pêteur ; 2) faux jeton, qui ourdit de mauvais coups; 3) paresseux	1) hypocrite; 2) plotter; 3) idler
fît: qerase, fitê mêran	devasa, devasa adam	géant, un homme gigantesque	giant
fîta fîta	zoraki, zorla	de force, par la contrainte	forced, coerced
fîta fîta jê re man	ettiği yanında kar kalmak	agir impunément	to act with impunity
fîta fîta jê standin	zorla almak	prendre par la force	to capture
fnêsk: fêşk	kötü iş, kötü eylem	mauvaise action, méfait	bad behavior
fîrêz (nf)	ayrık otu	chiendent	couch grass
gadorî: gadêrî	nöbetle sığır otlatma	gardiennage des bœufs à tour de rôle	taking turns guarding cattle
gav qelaştin	çok hızlı ve büyük adımlarla yürümek	avancer vite et à grandes enjambées	to stride
gepekî	böbürlenlen, azamet satan	arrogant, hautain	arrogant, haughty
gepekî kirin	böbürlenmek	prendre des airs	to be pompous
gerase, qerase, girnose	kocaman, iri	grand, gros, colossal	enormous
gereşûn	artık, yemek artığı	reste, surplus, excédent, résidu	surplus
germijandin	1) ısıtmak; 2) harereti yükseltmek	1) chauffer ; 2) faire monter la température	1) to heat; 2) to raise the temperature
germixandin	sıcaktan bunaltmak	provoquer un malaise par excès de chaleur	to make s.o. ill from heat
germijîn:	1) ısınmak; 2) harareti yükselmek	1) se chauffer ; 2) avoir de la température qui monte	1) to warm oneself; 2) to have a rising temperature
germixîn	sıcaktan kokuşmaya yüz tutmak	commencer à pourrir, à se putréfier à cause de la chaleur	to begin to spoil because of the heat
germik: germav, çêrmûk	ılıca, kaplıca	source thermale	hot spring
germiron: derbihar, deraxlêve	baharın ilk dönemleri	début printemps	early spring
germişk	ısırgın	bouton de chaleur	pimple
germoxekî: sermixî	sıcaktan kokuşmaya yüz tutmuş	qui commence à se putréfier sous l'effet de la chaleur	begins to spoil because of the heat

Termên komputerê

Amadekar : Newzad HIRORÎ

kurdî	turkî	fransizî	îngilizî
firehband	geniş band	bande large (large bande)	broadband
internet (bilêvkin: înternet)	internet	internet	internet
e-meyl (posteya elektrônîk)	e-posta	courrier électronique	e-mail
e-name (nameya elektrônîk)	e-mektup	courriel	e-letter
e-pirtûk (pirtûka elektrônîk)	e-kitab	e-book, livre électronique	e-book
e-nûçe (nûçeyên elektrônîk)	e-haber	e-news, informations électroniques	e-news
e-rojname (rojnameya elektrônîk)	e-gazete	journal électronique	e-newspaper
e-çap (çapa elektrônîk ya...)	e-yayın	éditions électroniques	e-edition
e-weşan (weşana elektrônîk)	e-yayınçılık	publications électroniques	e-publishing
e-kovar (kovara elektrônîk)	e-dergi, elektronik dergi	magazines électroniques	e-magazines
e-kartpostal (kartpostala elektrônîk)	e-kart	carte électronique, carte virtuelle	e-postcard
e-bilêt (bilêta elektrônîk)	e-bilet, elektronik bilet	billet électronique	e-ticket
chat (bilêvkin: çat), axaftin	sohbet	chat, conversation	chat
çat kirin, axafkirin	sohbet etmek	chater, converser	to chat

Peyvên di stranan de

Amedekar : Emîn NAROZÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
hebûn	sahip olmak	avoir	to have
hebûn (inf)	varlık, zenginlik	avoir, richesse	assets, wealth
berê xwe dan	1) yönelmek; 2) bakmak, seyretmek	1) s'orienter, prendre la direction de ; 2) regarder, observer	1) to head toward, to go toward 2) to observe
dizgîn (ji destgîn)	dizgin	rêne	rein
pate (inf), pate avêtin, pate dan	saygiyla, selam için eğilmek, selamlamak, eğilerek selamlamak	salut, révérence, saluer, se pencher respectueusement pour saluer, faire une révérence	to bow, to show reverence
neheqî	haksızlık	injustice	injustice
parî (n)	parça	morceau	piece
parîyek nan	bir parça ekmek	un morceau de pain	piece of bread
vêga; vê gavê	şimdi, şu an	maintenant	now
tevde	birlikte, beraber, topluca, hepsi	ensemble, tout	together
sûr; sûrh, şûrh	kale duvarı	rempart, muraille	rampart, wall
stil: stêl, tewle; tewlexane, tewle, stewl	tavla	étable	stable
piştevala; piştvala	giyinip kuşanmamış, silahsız	(personne) non équipée, sans armes	an unarmed persone
şilf:	bıçak, hançer, kılıç, mızrak gibi aletlerin demir kısmı	manche (métallique) de couteau, poignard, épée etc.	handle
henek; yarî	şaka, alay	blague, plaisanterie, moquerie	a joke, a jibe
laqirdî	şaka, lakırdı	blague, plaisanterie	a joke
stûkur	boyun yaka	encolure	neck, collar size
xan	han	auberge, caravansérail	inn
meyizandin : nêrîn, mêze kirin, nihêrîn, fikirin, se kirin, berê xwe dan, temaşa kirin	bakmak, seyretmek	regarder, observer	to look at, to observe
xatûn	hatun	dame	lady
file	hristiyan	chrétien	christian
dêmgul	yanağı güllü, gül yanaklı	qui a des joues roses	rosy cheeked
tûzî	dilim	tranche, rondelle	slice
kehreban : karîban, kehrîbar	kehrîbar	1) ambre, ambre jaune ; 2) électricité	1) amber, yellow amber ; 2) electricity
şirrik (n)	1) pul ; 2) oluk, çörten	1) paillette ; 2) gouttière, chéneau	1) sequin; 2) gutter
şirrika avê	su oluğu	chéneau	channel
gulîbend: qeytanê guliyan	saç kordelesi	ruban servant à nouer les tresses	hair ribbon
zerbab: zêrbav	zerbaf	brocard	brocade, cloth of gold
heke: eger, ger	eğer	si	if
kêmayî	kusur, eksiklik	défaut, faute, manquement	error, defect
sik	çirkin, uygunsuz	laid, sordide	ugly, dirty
bertîlxur	rüşvet alan, rüşvetçi	corrompu	corrupt
bertîl dan	rüşvet vermek	corrompre, donner un pot de vin	to bribe
bêziman	zavallı, suskun	pauvre, privé de parole	poor, silenced
qewimîn	olmak, meydana gelmek	se produire, arriver	to happen
edilandin	1) süslemek ; 2) düzeltmek, onarmak	1) parer ; 2) arranger, refaire, réparer	1) to decorate, to dress; 2) to repair
bezîn, beziyan	koşmak	courir	to run
asêbûyî	asi, isyankar, başkaldırmış	rebelle, insurgé	rebel, insurgent
li ber hukûmetê asêbûyî	hükûmete baş kaldırmış	rebelle au gouvernement	rebel against the government
bastêq	pestil	friandise faite de jus de raisin ou de mûre bouillis, épaissis à la farine appréciée en fines plaques	fruit pulp dried in thin layers on cloth
mewîj	kuru üzüm	raisin sec	raisin
nazdar	nazlı	coquette, maniérée	coquettish, affected
dehl	koru, koruluk	bois, bosquet	a wood, a grove
xavik, xavek	böğür	flanc	flank, side
xavika serî	bingıldak	fontanelle	fontanelle

Fûtbol

Amadekar : Mistafa AYDOĞAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
fûtbol: topanê, gogeling	futbol	football	football, soccer
meydana lîstikê	oyun alanı	terrain de jeu	field of play, pitch, playing field
meydana fûtbolê	futbol sahası	terrain de football	football field
pîvanên meydana lîstikê	oyun alanı ölçüleri	mesures de terrain de jeu	measurements of playing field
dirêjîya meydana lîstikê	oyun alanı uzunluğu	longueur de terrain de jeu	playing field length
berê (berahîya) meydana lîstikê	oyun alanı genişliği	largeur de terrain de jeu	playing field width
gol	1) gol; 2) kale	1) but ; 2) cage	goal
golavêj, golker	golcü	tireur de but	kicker
xêza golê	kale çizgisi	ligne de but	goal line
stûn	yan direk	montant, poteau	upright post
kêran	üst direk	barre transversale	crossbar
devera golê	kale sahası	surface de but	goal area
deqa penaltiyê	penaltı noktası	point du coup de pied de réparation (point de penalty)	penalty mark
devera penaltiyê	penaltı sahası	surface de penalty, surface de réparation	penalty area
kevana penaltiyê	ceza yayı	arc de cercle du point de réparation	penalty arc
deqa nîvekê	başlangıç noktası/orta nokta	point central	centre mark, centre spot
çembera nîvekê	orta yuvarlak	cercle central, rond central	centre circle
xêza nîvekê	yarı saha çizgisi/orta saha çizgisi	ligne médiane	halfway line
nîvmeydan	yarı saha	moitié de terrain	halfway field, half of the field

xêzkenar	taç çizgisi	ligne de touche	touch line, sideline
goşe, korner	korner	coin, corner	corner
devera kornerê	korner alanı	coin de corner	corner arc
darê alaya goşeyê	köşe bayrağı direği	poteau de drapeau de coin, de corner	corner flagpost
alaya goşeyê	köşe bayrağı	drapeau de coin, drapeau de corner	corner flag
top, gog	top	ballon	ball
dadwer	hakem	arbitre	referee
dadwerê alîkar	yardımcı hakem	arbitre assistant	assistant referee
dadwerê çarem	dördüncü hakem	quatrième arbitre, arbitre remplaçant, quatrième officiel	fourth official
devera teknîkî	teknik alan	surface technique	technical area
serwêrê teknîkî	teknik direktör	directeur technique	technical manager
antrenor	antrenör	entraîneur	coach
lîstik, yarî	oyun	jeu	play
sîstema lîstikê	oyun sistemi	système de jeu	playing system, playing formation
dema lîstinê	oyun süresi	temps de jeu, durée de match	game duration
dirêjkirin	uzatma (ekstra zaman)	prolongation	extra time
dema lêzêdekirî	uzatma (kayıp zaman için)	temps additionnel	additional time, added time
destpêka lîstikê	oyunun başlaması	engagement, coup d'envoi	kick-off
lîstikvan, yarîker	oyuncu	joueur	player
fûtbollîz	futbol oyuncusu	footballeur, joueur de football	football player, soccer player
guhertina lîstikvanan	oyuncu değişikliği	changement de joueurs, remplacement	players' replacement, substitution
lîstikvanên cîgir	yedek oyuncular	joueurs remplaçants	players' substitutes
fûtbollîzê cîgir	yedek futbolcu	footballeur remplaçant, suppléant	football players' substitute

Paşgirên kurdî

-II-

Amadekar : Reşo ZÎLAN

-end / -yend : Bi alîkarîya vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji qurmên lêkeran navdêrên nû tên çêkirin.

Nimûne: navend, revend, zayend, govend

-ende / -inde : Bi vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji rengdêr û qurmên lêkeran navdêrên nû tên çêkirin.

Nimûne: şermende, berfende, gerînende, balinde, firinde, gazinde, ayinde

-emenî : Navên koma tiştên ku ji bo mebestekê tene bi kar anîn nîşan dide.

Nimûne: sotemenî, xwardemenî, teqemenî, sardemenî

-er / -yer : Bi alîkarîya vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji qurmên lêkeran navdêrên nû tên çêkirin.

Nimûne: koçer, raxer, bûyer, parêzer, nivîser, têkoşer, bîner, firoşer

-eve : Paşgireke lêkerî ye û timî bi dawîya lêkerê ve tete girê dan û maneya "dîsan, careke din" dide lêkerê.

Nimûne: geraneve, ketineve, çûneve, dîtineve, kirineve

-ê : Ji bo forma bangkirina navdêrên bi zayenda mê ya yekhejmar e.

Nimûne: keçê!, dayê!, etê!, bûkê!, gêjê!, dînê!

-êr : Bi alîkarîya vê paşgirê hem ji navdêr û hem jî ji qurmên lêkeran rengdêr yan navdêrên nû tên çêkirin.

Nimûne: qulêr, dilêr, panêr, werzêr

-ezar "bnr" -zar : Paşgira -zar bi maneya cih e, cihê lê çandina tiştê ye. Tîpa "e"yê jî bo pevgirêdanê ye. Bi alîkarîya wê rengdêr yan jî navdêr tên çêkirin.

Nimûne: şermezar, tengezar

-ewar : Bi vê paşgirê jî navdêrekê rengdêrek tete afirandin û maneya "wekî, mîna, fena, şibhê" dide peyvê.

Nimûne: bendewar, bextewar

-ewarî / -warî : Bi alîkarîya vê paşgirê jî navdêr yan jî ji rengdêrekê navdêreke nû ya abstrakt tete çêkirin .

Nimûne: kurdewarî

-ewer : Bi vê paşgirê jî navdêrekê rengdêrek yan jî navdêreke nû tete afirandin.

Nimûne: bîrewer, bextewer, canewer / cinawir

-firoş : Ev paşgira jî lêkera "firotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê firotinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: gulfiroş, zembîlfiroş, xwefiroş, belafiroş, pirtîfiroş

-gar : Ev paşgir maneya "kesê ku dike, kesê ku karekî tîne cih" dide peyvê.

Nimûne: pîgar, amojgar, rojgar (ev paşgira di vê peyvê de bi wext re mane guhartîye).

Peyva rojgar di maneya "serdem, zeman, dewran, dewr"ê de ye.

-geh : Ev paşgir maneya "cih, dever, şûn, war" dide.

Nimûne: seyrangeh, havîngêh, şargeh, bingeh, tavgeh, çêregeh, bergeh, kêlangêh,

wargeh, zanîngêh, çivgeh, hêwirgeh

-gelan : Ev paşgir maneya "kom, piranî û pirhejmarî"yê dide peyvê.

Nimûne: xezûrgelan, xînamîgelan, mozgelan

-ger (I) : Paşgira jî lêkera "gerîn / geriyan"ê ye û maneya kesê / tiştê ku bi karê gerînê radibe dide peyvê.

Nimûne: şevger, bager, banger, şopger / rêçger, peyger, temaşeger, dadger

-ger (II) : Ev paşgira maneya "kesê ku bi wî karî radibe" dide peyvê û navê pêşeyekê nîşan dide.

Nimûne: hesinger, zêrînger / zêrger, kîmyager

-gêr : Paşgira jî lêkera "gêrîn (gêran / gêrandin)"ê ye û maneya "kesê ku karê binavkirî digêrîne, dike" dide peyvê.

Nimûne: şoreşgêr, wergêr, meygêr, govendgêr, çilingêr, pîlangêr, kargêr, civatgêr, dolabgêr

-gez : Paşgira jî lêkera "gestin, gezîn, gez kirin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê gestinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: pelgez

-gihan : Paşgira jî lêkera "gihandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê gihandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: nûçegihan

-gir : Paşgira jî lêkera "girtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê girtinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: masîgir, sawgir, alîgir, xûgir, hogir, dilgir, mîratgir, rexnegir, rêgir, piştgir, malgir

-gîr : Paşgira jî lêkera "girtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê girtinê radibe" dide peyvê. Li ser forma xwe ya kevn maye.

Nimûne: avgîr, pêşgîr, bergîr (bargîr, bergîl), kefgîr

-gîn : Ev paşgir maneya "tîjî, tîjî bi ... "ê dide peyvê.

Nimûne: lezgîn, xemgîn, mizgîn, xwazgîn, şermgîn, sawgîn / sehimgîn,
-go : Paşgira ji lêkera "gotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê gotinê radibe" dide peyvê.
 Nimûne: rastgo, bilindgo, xweşgo
-gon / -gûn / -gwîn : Maneya "reng" e.
 Nimûne: avgon / argûn, argon / argûn, algon, genimgon / Genimgûn, gulgon
-guhêz : Paşgira ji lêkera "guhastin (neqil kirin)"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê guhaztinê radibe" dide peyvê.
 Nimûne: xeberguhêz, warguhêz, barguhêz
-hêl : Paşgira ji lêkera "hêlan (hılanîn, hiştin, terikandin, terkkirin)"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê hiştinê radibe" dide peyvê.
 Nimûne: cîhêl, warhêl, meydanahêl, jinhêl, mêrhêl, êlhêl, gundhêl, pezhêl, dêhêl, bavhêl, kurhêl, keçhêl
-hilgir : Paşgira ji lêkera "hilgirtin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê hilgirtin û rakirinê radibe" dide peyvê.
 Nimûne: barhilgir
-hingêv : Paşgira ji lêkera "hingaftin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê hingaftinê radibe" dide peyvê.
 Nimûne: şûrhingêv, rimhingêv, fîrhingêv, derbhingêv, darhingêv
-hî /-yî : bnr > -ahî
-ik (I) : Pirtika ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînnîşandanê ye.
 Nimûne: keçik, qîzik, lawik, kurik, pîrik, jinik, mêrik, pitik, bavik, kalik, reşik, zerik, sorik, gewrik, rindik, xweşik, cewrik, qirdik, berxik, karik /kehrîk,
-ik (II) : Pirtika ji bo navên tişt, hacet û alavan e.
 Nimûne: devik, destik, lepik, berçavik, kerik, pifik, pirik, bêrik, berik, palik, çoçik, hestik, girik, boçik, elbik, kincik, koxik, sîrik, qirşik, refik, pizik, rêçik, şimik, zendik
-ik (III): Pirtika ji bo navên hin xwarinan e.
 Nimûne: avik / afik, tirşik, dolmik, lorik, çolîk, xilorik, kilorik, nanik, pelik
-ik (IV): Pirtika ji bo navên hin nexweşîyan e.
 Nimûne: zerik, sorik, xurik, kuxik, xeneqûtîk, bûkîk, efnîk, kufîk, kamîk
-ikî : Navdêrê abstrakt ya nexweşîyan e yan jî tişt û mirovê bi wê nexweşîyê ketîye.
 Nimûne: zerîkî, efnîkî, virîkî, kufîkî, kamîkî, kasîkî
-il : Navê cihekî nîşan dide.
 Nimûne: paşil, pêşil, zengil, xwazil (xwazî), paxil
-inc : sarinc, gazinc
-incî : navincî
-ing / -ng / -wing : Pirtika ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînnîşandanê ye.
 Nimûne: rojîng, arîng, sorîng, xweyîng, poşîng, rêwîng / rêwîngî, birang, çîyang
-king : Pirtikeke cotpiçûkkirinê ye, tiştan du caran li ser hev piçûk dike. Ev pirtik jî her ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînnîşandanê ye.
 Nimûne: biraking, xweyking, dayking
-ino / -no / -nino : Ji bo forma bangkirina zayenda hem mê û hem jî nêr ya piraniyê ye.
 Nimûne: xortino! (xortno), keçino! (keçno), kurino! (kurno), gundîno! (gundînino)
-istan / -stan (I) : Bi maneya cih, dever û şûn e.
 Nimûne: goristan, gulistan, bostan (bustan, bîstan), mûristan, daristan, çolistan, qûmistan, şaristan / şehristan
-istan (II) : Bi maneya welat e.
 Nimûne: Kurdistan, Afxanistan, Bulxaristan, Gurcistan
-istan (III) : Bi maneya dem û zeman e.
 Nimûne: germistan (havîn), zivistan,
-işk / -îşk/ -oşk : germişk, hevrişk, kurîşk, nermoşk
-î/-yî (I): Ev paşgira mensûbbûn û girêdana bi kom, eşîr, gel, netewe, ziman, zarava, devok, dîn yan jî mezhebêkî nîşan dide.
 Nimûne: samî, arî (aryanî), ertoşî, botî, milî, kurdî, erebî, almanî, kurmancî, lurî, alewî, êzîdî, behayî, îslamî, henîfî, şafî'î, caferî, isma'îlî, evangalî, lûterî
-î/-yî (II): Mensûbbûn û girêdana bi cih, dever, herêm, gund, bajar û welatekî

nîşan dide.
 Nimûne: deştî, çîyayî, gundî, bajarî, zozanî, serhedî, behdînî, diyarbekrî, wanî, mêrdînî, kurdistanî, îraqî, afrîkayî, asyayî. deverî
-î/-yî (III): Ji rengdêrekê navdêreke abstrakt (mucered) çêdike.
 Nimûne: sorî, zerî, bozî, qencî, sarî, germî, çêyî, sistî. qelewî, reşî
-î/-yî (IV): Ji rengdêr yan jî ji navdêrekê navdêreke abstrakt çêdike.
 Nimûne: camêrî, azadî, serbestî, tolazî, serxweşî, rastî, dostî, nezanî, paqijî
-î/-yî (V): Ji navê kar û pêşeyekê navdêreke abstrakt çêdike û mijûlahîyekê nîşan dide.
 Nimûne: karkerî, zîvkerî, cotkarî, gulfiroşî, bikirî, dengbêjî
-î/-yî (VI): Ji navdêrekê ku dem nîşan dide navdêreke nû ji bo peryodeke taybetî çêdike.
 Nimûne: rojî, sênehî, nîvsalî, hefteyî, havînî, payîzî, zivistanî.
-î (VII): Ji navdêran rengdêr çêdike.
 Nimûne: avî, bejî, xwînî, bengî
-î (VIII): Ji rengdêran navdêrên konkret çêdike.
 Nimûne: şilî, gêrmî, germî
-î (IX): Ji navdêran navdêrên nû yên di maneya alav û tiştêkî ne çêdike.
 Nimûne: baranî, destî, derî, piştî, gulî
-î (X): Ji hokeran navdêr çêdike.
 Nimûne: binî, serî, nivî
-î/-yî (XI): Ji çî yan jî çî madenê çêbûna tiştêkî nîşan dide.
 Nimûne: hesinî, sifirî, polayî, zîvî
-îfk : balîfk, gulîfk
-îk : xurîk, qidîk, xidxidîk
-în (I) : Ji çî yan jî çî madenê çêbûna tiştêkî nîşan dide.
 Nimûne: zêrîn, zîvîn, darîn, derewîn, rastîn
-în (II) : Ji navdêran rengdêr çêdike.
 Nimûne: rengîn, zengîn, belgîn, ahîn, gurgîn, bengîn, dengîn, şermîn, nalîn, dilîn
-în (III) : Ji navdêran navdêreke nû çêdike.
 Nimûne: berfîn, tirşîn, rojîn
-în (IV) : Ev paşgir ji hokerekê hokereke nû çêdike.
 Nimûne: pêşîn, paşîn, dawîn, jêrîn, jorîn, navîn,
-îne : Ji navdêran navdêreke nû çêdike.
 Nimûne: çarîne, yekîne, pêşîne
-înî (I) : Ji çî yan jî çî madenê çêbûna tiştêkî nîşan dide.
 Nimûne: darînî, zîvînî, zêrînî
-înî /-yînî : Ev paşgir ji navdêrekê navdêrên nû yên abstrakt çêdike.
 Nimûne: kurdînî, pîrînî, dêyînî, bavînî, hevalînî, dostînî, bengînî, mêrînî, kurînî, keçînî, bûkînî, lawînî
-înok : Ev paşgir maneya "kesê ku bi wî karî radibe, wî karî dike" dide peyva nû.
 Nimûne: xapînok, çivînok
-îş / -iş : Ev paşgir ji navdêran navdêreke nû çêdike û maneya "karê ku tête kirin" dide peyva nû.
 Nimûne: bexşîş, spariş
-îtî /-yîtî : Ev paşgir ji navdêrekê navdêrên nû yên abstrakt çêdike.
 Nimûne: kerîtî, bavîtî, gundîtî, mîrîtî, dêyîtî, seyîtî
-îtîk : bangerîtîk
-îyan : Ji rengdêrekê navdêreke nû, ku di maneya cih û deverê de ye dide peyvê.
 Nimûne: germîyan
-jen (I): Ji lêkera "jenîn, jendin"ê ya bi maneya lêdanê de ye. Wek paşgir maneya "kesê yan jî tiştê ku karê lêdana wî tiştî dike" dide peyva nû.
 Nimûne: kevanjen, avjen, bajen, agirjen, livajen, libûjen, kemanjen
-jen (II): Ji lêkera "jenîn"ê ya bi maneya "dîwardanîn"ê de, wek paşgir "kesê ku bi wî karî radibe" dide peyvê.
 Nimûne: dîwarjen

-jimêr : Paşgira ji lêkera "hejmartin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê hejmartinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: demjimêr (alava ku demê dihejmêre, kronomêtre)

-k (I) : Pirtika ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînnişandanê ye.

Nimûne:qûtîk, pîrk, nêrîk, kanîk, çêlik, kurîk, cênîk, cêwîk, sêwîk, kevçîk, cok /cihok,

-k (II) : Pirtika ji bo navên tişt, hacet û alavan e.

Nimûne:daralînk, cerîfk, bermalk, binmilk

-ka : qestîka, qazîka, zûka, xwezîka, hêdîka, dizîka

-kanî / -(î)kantî : Bi alîkarîya vê paşgirê ji navdêrekê peyveke nû ku êdî hoker e, çêdibe û maneya "bi awayê... , bi tehrê..." dide peyvê.

Nimûne: keçkanî / keçkantî / keçikantî, lawkanî / lawkantî / lawikantî, jinkanî / jinkantî / jinikantî, mêrkanî / mêrkantî / mêrikantî-ke : binke

-kî (I): Maneya "wek, mîna, fena, şitî, şubhê" dide peyvê û wê dike hoker.

Nimûne: filehkî (filekî), kurdkî, kurmanckî, almankî, ecemkî, erebkî, mirtîbkî, gundîkî, bajarîkî, axakî, mêrankî, nivîskî, devkî, qeşmerkî, serserkî, qeşmerkî, hêkkî

-kî (II): Hokera dem û zemanan çêdike û maneya "di dema (wexta)... de" dide peyvê.

Nimûne: nîvrokî, êvarkî, 'esirkî

-kar : Ji gotina kar e û vê xeysetê dide maneya peyvê.

Nimûne: cotkar, xwendekar, koşkar, xebatkar, sextekar, hîlekar, xizmetkar, gunehkar, minêkar, alîkar / arîkar, zîyankar, rîyakar, nîvekar, sitemkar, zulmkar, derewkar

-karî : Ev paşgir ji navdêran navdêreke nû ya abstrakt diafirîne.

Nimûne: destkarî

-keft : Paşgira ji lêkera "ketin / keftin"ê ye û maneya kesê / tiştê ku bi karê keftinê radibe dide peyvê. Lêkera "ketin"ê di devokên wek behdîni û hinekên botî de ne wek "ketin" lê wek awayê xwe yê kevn "keftin" tête gotin.

Nimûne: destkeft

-ker : Ev paşgir awayekî din ya paşgira "kar" e. Her bi maneya "kesê / tiştê ku bi wî karî radibe" dide peyva nû.

Nimûne: zivker, karker, zêrker, xebatker, hesinker

-kil : Paşgira ji lêkera "kilîn, (kilandin, kil kirin)"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê kilandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: dewkil

-kir : Paşgira ji lêkera "kirin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê kilandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: destkir, malkir, karkir, şuxulkir

-kirr : Paşgira ji lêkera "kirîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê kirînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: bikirr

-kêş (I): Paşgira ji lêkera "kêşan / kişandin (kaş kirin)"a barekî ye û maneya "kesê ku bi wî kar û pêşeyî radibe" dide peyvê.

Nimûne: avkêş, barkêş, kêlindîkêş (= tirpankêş)

-kêş (II): Paşgira ji lêkera "kêşan / kişandin" a tiştêkî bi dûman e û maneya "kesê / tiştê ku bi karê kişandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: afonyonkêş, cigarekêş, qelûnkêş, tiryakkêş, hewakêş / bakêş, mîxkêş

-kêş (III): Paşgira ji lêkera "kêşan / kişandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku ji aliyê manewî ve xwe dide ber wî karî" dide peyvê.

Nimûne: cefakêş, serkêş, zîyankêş, zehmetkêş, şûrkêş, dilkêş, balkêş

-kêş (IV) : Paşgira ji lêkera "kêşan / kişandin"ê ya ji bo wezinandinê ye û maneya "giranî"yê dide peyvê.

Nimûne: takêş

-koj : Paşgira ji lêkera "kotin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê kotinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: hestîkoj

-kuj : Paşgira ji lêkera "kuştin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê kuştinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: mêrkuj, spîkuj, mêşkuj, agirkuj, destkuj, bikuj, xwekuj, karwankuj

-kut : Paşgira ji lêkera "kutan / qutan"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê kutanê radibe" dide peyvê.

Nimûne: mîrkut / mêkut / mîkut, dankut, sîrkut, bakut, darkut, bankut

-ko : Ev paşgir carina ji bo xweşikirinê û carina jî ji bo piçûkxistina kesan ya di dema rewşa gazîkirinê de tete bi kar anîn.

Nimûne: Hemedko, Cemîlko, Resûlko, muxtarko, malxirabko, rebenko

-kok (I) : Ev paşgir ji bo piçûkxistin û sivikahîpêkirinê ye.

Nimûne: jinkok, mêrkok

-kok (II) : Ev paşgir ji bo piçûkkirina ji ber xweşik û narînbûnê ye. Ji rengdêr yan jî navdêran rengdêrek tete çêkirin.

Nimûne: fedîkok, xweşkok, keçkok, reşkok

-kokî : Ji rengdêran rengdêreke nû tete çêkirin.

Nimûne: kevinkokî, pembekokî, reşkokî, zerkokî, şînkokî,

-kolî : Ji lêkera "kolîn, kolandin"ê ye û paşgira didwan "î" lê hatiye zêde kirin û maneya "kesê bi karê kolandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: pêkolî (pîkolî)

-lok : Ev paşgira han heye ku ji lêkera "(dev) lê kirin"ê kurt bûbe.

Nimûne: devlok

-mal : Paşgira ji lêkera "malîn / maliştin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê malînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: destmal, pêstemal / pêşmal

-man / -iman: Bi maneya "cih" e. Di zimanê pehlewî de bi maneya "xanî, sera" de bû.

Nimûne: niştîman, xaniman

-mend : Paşgirek e ku di maneya "heyî, heye, xwedî" de ye. Tete dawîya navdêran.

Nimûne: dewle(t)mend, hunermend, bawermend, aqilmend (eqilmend), şewirmend, karmend

-mêj / -mij : Paşgira ji lêkera "mêtin, mêhtin / miştin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê mêtinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: xwînmêj (xwînmij), şîrmêj (şîrmij), marmêj (marmij)

-nak : Paşgirek e ku maneya "bi, tijî, tijî bi, bi ... dagirtî" dide peyvê.

Nimûne: xemnak, xeternak, derdnak, tirsnak

-nas (I) : Paşgira ji lêkera "nasîn"ê ya bergindî "ilm, zanist, zanîn"ê ye. Gava ku tete dawîya navdêran maneya "kesê ku bi wê zanistê mijûl dibe" dide peyvê.

Nimûne: zimannas, stêrnas, dîroknas, rojhilatnas, aborînas

-nas (II) : Paşgira ji lêkera "nasîn, (nas kirin)"ê ye û maneya "kesê ku bi karê naskirinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: xwedênas, kêmnas, çavnas, rênas

-nasî : Ev paşgira hevedudanî ye û ji paşgirên "-nas" û "-î"yê pêk hatiye. Wek di paşgira "-î"yê de jî hatiye behs kirin, bi alîkarîya vê navdêrên abstrakt tene çêkirin. Ji ber ku paşgira "nasî" xwedî taybetmendîya bi navkirina zanistan e, ango navê 'ilm û zanistekê bi me dide zanîn, çêtir e ku ev bi tena serê xwe li vir cih bigire. Bi vî awayî em bizanibin ku ev paşgir ji bo çêkirina navên zanistan e.

Nimûne: zimannasî, stêrnasî, dîroknasî, civatnasî, rojhilatnasî

-nêr : Paşgira ji lêkera "nihêrîn / nêrîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê nihêrînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: nexweşnêr, çavnêr (çavnihêr), zaroknêr

-nişîn : Paşgira ji lêkera "niştin, nişîn"ê ye û maneya "cihê ku ew kes lê rûniştîye" dide peyvê.

Nimûne: kurdnişîn, mîrnişîn, şahnişîn

-nivîs : Paşgira ji lêkera "nivîsin / nivîsandin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê nivîsinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: destnivîs, xweşnivîs, rastnivîs, çîroknivîs, sernivîs, reşnivîs.

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna bihara 2006an

Careke din delîvoya kombûna civîna Kurmancî li Dihokê, başûrê Kurdistanê, bi dest ket. Civîna me rojên di navbera 30/5 - 7/5 2006an de li dar ket.

Di vê civînê de ev heval beşdar bûn:

Mustafa Aydogan (Mêrdîn), Rûken Bagdu-Keskîn (Stenbol), Lutfî Baksî (Xerzan), Ehmedê Dirihî (Çewlîg), Elîşêr (Wan), Samî Ergoşî (Barzan), Cewher F. Seîd (Hewlêr), Ebdulsetar Fettah (Dihok), Newzad Hirorî (Dihok), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mahmûd Lewendî (Qerejdax), Enwer Mehemed Tahir (Hewlêr), Emîn Narozi (Batman), Kendal Nezan (Diyarbakir), Selam Nûman (Qamşilo), Fadil Omer (Dihok), Cemal Onursal (Cizîr), Enwer Osman (Hewlêr), Edîb Polat (Amed), Zinar Soran (Dêrik), Behrûz Şucaî (Kotol), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zilan (Agrî).

Ev cara didwan bû, ku me civîna xwe li parçe welatê xwe yê azad pêk anî. Bi dirêjahîya hefteyekê tamam me li ser programeke giran kar kir. Xala herî girîng ya xebatê babeta navên gulûgîyayan yê hem zanistî û hem jî kurdî bû. Di vî warî de, bi sayeya kedeke yekcar mezin ya hevalên pîspor ji başûr û bakurê Kurdistanê, me dikaribû em berhemê berbiçav ji civînê derbixin.

Xalên din yê civînê, ji navên demûdezhêhên dewletê û peyvên rojnamevanîyê pêk dihat. Piştî hîmdanîna dewleta federal li başûrê welat, çawan ku wê guhartineke nû

di dîroka me kurdan de pêşde anî, wisan jî wê tesîra xwe li ser zimanê me kir. Hindek mefhumên nû anîn û hindek delîvayên din dane ber pêşdeçûna zimanê kurdî.

Navên dezgehên dewletê û peyvên rojnamevanîyê du babetên girîng bûn ku divîya kar li ser bête kirin. Ev yek ji bo nêzîkîna devoka kurmancîya bakur û behdînî jî xwedî girîngîyeke mezin bû.

Cihê serfirazîyê bû, ku ev civîna me rastî rojên yekbûn û hevogirtina herdu îdareyên Kurdistanê hatibû. Vê hikûmeta yekbûyî hêvî, hez û şewqeke bêhevta dixist dilê me hemûyan.

Bi dirêjahîya herdu hefteyên me li Kurdistanê, em bûn mêvanê hikûmetê. Vê hikûmeta yekbûyî em bi comerdîyeke kurdewarî hêwirandin û bi hêzên xwe yê ewlehîyê em hildan bin baskên xwe yê parastinê. Ji hîç xizmetekê dirixî nekir.

Em bi dilekî germ wê pîroz dikin û jê re xweşbextî û serkeftinê dixwazin. Herweha ji dil û can spasî vê mêvandarî û xizmetên pêşkêşkirî dikin.

Encamên xebata vê civînê di vê hejmara Kurmancî de tîn belav kirin.

Flora Kurdistanê

Amadekar : Edîb POLAT

kurde	latînî	tirkî	fransizî	îngilizî
adarok, gulalesûre, kurikmast	<i>Anemone coronaria</i>	taçlı kırlalesi, rüzgar çiçeği, gül lale	anémone couronnée, anémone de Caen	crown anemone
alal, hilale, melaq, lale, helal	<i>Tulipa</i>	lale	tulipe	tulip
baqilê gamêşan, şolgenik, kuşne, baqilfisek	<i>Vicia sativa</i>	arpa figi, buğday figi, ekin figi, (burçağın bir türü)	vesce commune	common vetch
baqilê xatûnî, kelikê xatûnî, baqilxatûn	<i>Sativum saccharatum</i>	baklagillerden nazlı gelin	pois mangetout	sugar snap peas
baxox, angelok, kanêje	<i>Centaurea kurdica</i>	peygamber çiçeği	centaurée kurde	kurdish centaurea
behîva beji, badema çiya, çaçale	<i>Prunus carduchorum</i>	yabani badem	variété d'amandier sauvage	species of wild almond-tree
bendika avî, vîzdorik (zaza)	<i>Cardamine hirsuta</i>	tüylü köpük otu	cardamine hérissée	hairy bittercress
bêwîjan, pûjang, gulikê maran	<i>Achillea millefolium</i>	adi civanperçemi	millefeuille, achillée	yarrow
beybûn, beybûna demanan, babûnc	<i>Matricaria chamomilla</i>	papatya	camomille	camomile
beybûna beyaran	<i>Matricaria sp.</i>	çayır papatyası	camomille des champs	corn camomile
binevş, binefş, wenewşe (zaza), gularengag	<i>Viola odorata</i>	kokulu menekşe	violette	violet
binevşa belek	<i>Viola tricolor</i>	alaca menekşe	pensée sauvage	wild pansy
birinc, riz	<i>Oryza sativa</i>	pirinç	riz décortiqué	rice
biyok, bih, bihok, bihi, bi	<i>Cydonia oblonga</i>	ayva	coing	quince
botav, batovk, nûjdar, bahtof, sûrinc	<i>Hypericum triquetrifolium</i>	kızılıcak otu, kantaran	millepertuis	curled -leaf St John's wort
bûkik, bûkanî, bûk, bwîk, nîsanok, patpatok, patpatole, bûkûzava, gulênîsan, rêywek	<i>Papaver rhoea</i>	gelincik	coquelicot	common poppy
çarçar, şebraq	<i>Xanthium spinosum</i>	dikenli sıraca otu	lampourde épineuse	spiny cocklebur
çekem, dakone (zaza)	<i>Viscum album</i>	ökse otu	gui	mistletoe
çengê meryemê, siklamen	<i>Cyclamen purpurescens</i>	siklamen, tavşan kulağı	cyclamen commun, cyclamen rouge-pourpre, marron de cochon	cyclamen
çevk, çexşûr (cûreyek heliz e)	<i>Ferula communis</i>	çakşır otu	férule commune	giant fennel
çilek, tûya erdan, tûfrenği	<i>Fragaria vesca</i>	çilek	fraise	strawberry
çim, giyareş	<i>Lolium temulentum</i>	delice	ivraie enivrante, herbe à couteaux	darnel ryegrass
colbenî, şolikê maran, baqilê maran, kelîmar	<i>Lathyrus tuberosus</i>	koşkoz	gesse tubéreuse, gland de terre	tuberous pea, sweet pea
çûng, pêmirîşk	<i>Ranunculus</i>	düğün çiçeği	renoncule	crowfoot
cux, bencerek (zaza)	<i>Digitaria</i>	çatal otu (dijitarya)	digitaire	common crabgrass, large crabgrass
darçin	<i>Cinnanomum zeylanicum</i>	tarçın	cannelier de Ceylan, arbre à cannelle	cinnamon tree
dargerînk, daralînk, badar	<i>Hedera helix</i>	duvar sarmaşığı	lierre	ivy
darucan, şêrpûg	<i>Echinochloa crusgalli</i>	darica otu	panic des marais, pied-de-coq	barnyard grass
dinêv, dimor	<i>Lolium temulentum</i>	delice	ivraie enivrante, herbe à couteaux	darnel ryegrass, tare
dirî, dirîmok, dirîreşk, dendûreşk, tûtirk	<i>Rubus</i>	böğürtlen	mûre sauvage	blackberry
dûvikê hespê, sipingê maran, singê maran, şitlê xezalan, tilîper, rûnîn (zaza), vaşbitrî (zaza)	<i>Equisetum arvense</i>	at kuyruğu	prêle des champs, queue-de-renard	horsetail, cattail, joint brass, bottle brush, shavegrass, horse pipe
dûvrovî	<i>Setaria faberii</i>	kirpi darî	sétaire géante, sétaire de faber	faber bristlegrass, giant foxtail, nodding foxtail

erpelan, pîrepind	<i>Scorzonera spp</i>	bir tür dağ çöveni	scorsonère	black salsifis
fasûlî, fasûlye, fasolî, fasla (zaza)	<i>Phaseolus vulgaris</i>	fasulye	haricot	bean
fîrêz (li hin deveran)	<i>Agropyron repens</i>	ayrık otu	chiendent	quackgrass
fîrêz, herêz, sînrek (zaza)	<i>Cynodon dactylon</i>	domuz ayrığı	chiendent, pied-de-poule, herbe des Bermudes	Bermuda grass
gêleqîr	<i>Bellevalia</i>	dağ sümbülü	variété de jacinthe	species of hyacinth
gêlik	<i>Scilla kurdistanica</i>	yıldız sümbülü	variété de scille	species of scilla
genek, dargenek, pilxin (zaza)	<i>Datura stramonium</i>	şeytan elanası, boru çiçeği	datura, stramoine, pomme épineuse	datura, thorn apple, stramonium
genim	<i>Triticum</i>	buğday	blé	wheat, corn
genimê nan, genimê ardî (cureyên : genimê rûtik, genimê meksîkî)	<i>Triticum aestivum</i>	ekmeklik buğday	blé tendre, froment	wheat
genimê savar, genimê req (cureyên : genimê sorgul, genimê girover)	<i>Triticum durum</i>	sert buğday	blé dur	hard wheat, durum wheat
gêregiya, giyabawer, kokvaş	<i>Hordeum bulbosum (poaceae)</i>	duvar arpası, yabani arpa, yumrulu arpa	orge noueuse	bulbous barley
gezgezik, gezgezok, gezgezk, derzînk (zaza), geznik, gezgezing	<i>Urtica</i>	ısrıgan otu	ortie	stinging nettle
gijok, rîxok	<i>Rhamnus kurdicus</i>	ak diken	nerprun, bourdaine	buckthorn
gilgilê stembolî, garisê stembolî, genimşamî, lazût	<i>Zea mays</i>	mayıs	maïs	indian corn
giyabeng, xirebenk	<i>Hyoscyamus niger</i>	kara banotu, göztohumu	jusquiamme noire, herbe aux poules	black henbane
giyagewrik, kifkedûpişk, giyadûpişk, vaşogewr (zaza)	<i>Heliotropium europaeum</i>	bankul otu	héliotrope	heliotrope
giyagirêçk, sûrpencik, darê şivanan	<i>Polygonum</i>	çoban değneği	renouée	knotgrass
giyayê belalûkê	<i>Veronica spp</i>	yavşan otu	véronique	speedwell, veronica
guhbelok	<i>Phlomis grandiflora</i>	ayı kulağı	phlomis à grandes fleurs	phlomis grandiflora
guhmişk, gjinjî rovî	<i>Anagallus avensis</i>	tarla fare kulağı	mouron rouge	scarlet pimpernel
gula bênişînê	<i>Arnica montana</i>	dağ arnikası	arnica des montagnes	mountain arnica
gula çavêşê, hemîşe bihar	<i>Calendula arvensis</i>	altmak, şamdan çiçeği, aynî sefa, portakal nergizi	souci des champs, gauchefer, souci sauvage	wild calengula, field marigold
gula hesretê, hanek (zaza)	<i>Crocus sativus</i>	safran	safran	saffron
gulengî, heşvil (zaza), savil (zaza), gulherçî	<i>Paeonia officinalis</i>	ayı gülü	pivoine	peony
gunikê beranan	<i>Polygonum convolvulus L.</i>	sarmaşık çoban değneği	renouée liseron	wild buckwheat, black bindweed
guriz, gelziwan (zaza), gurisk	<i>Anchusa officinalis</i>	tıbbî sığır dili	buglosse officinale	common bugloss
guriz, gelziwan, gûriz, gwîriz	<i>Myosotis arvensis</i>	unutma beni	myosotis des champs	field forget-me-not
gurk, gurgeh	<i>Orobanch</i>	canavarotu	orobanche	broomrape
gurnikê mêşinan, gurnûka	<i>Arctium lappa</i>	dulavratotu	bardane, rhubarbe du diable	greater burdock
gurxenêq, kerxenêq	<i>Aconitum napellus</i>	kaplanboğan, kurtboğan	aconit napel, casque de Jupiter	monk's hood
gûriz, golmize, zimanê ga	<i>Anchusa azurea kurdica</i>	sığır dili	buglosse	bugloss
hêjîr, incire	<i>Ficus carica</i>	incir	figue	fig
helerge, lerge	<i>Angelica archangelica</i>	melik otu, angelica	angélique	angelica
helhelok, belalûk	<i>Prunus mahaleb</i>	mahlep, idrisağacı	faux merisier	mahaleb sherry
helîkek, giloka zer, gelûka zerde, helikok	<i>Erysimum kurdicum</i>		vélar, érysimum	wallflower
hêro	<i>Alcea kurdica</i>	hatmî çiçeği	rose trémière sauvage	wild hollyhock
hes	<i>Ornithogalum kurdicum</i>	yabani sümbül	variété d'ornithogale	ornithogalum
hevrist, hêvrist, wêrs, wers, hors	<i>Juniperus communis</i>	ardıç	genévrier commun	juniper
hêzeran, tûra kûrila (Kerkûk)	<i>Delphinium</i>	yabani kuşayağı	delphinium, pied d'alouette	delphinium
hinar, henare	<i>Punica granatum</i>	nar	grenade	pomegranate
hingivîn, mijmijok, vaşê mêşan (zaza)	<i>Lamium spp</i>	ballıbaba	lamier	dead nettle
îsotê cumo	<i>Physalis alkekengi</i>	güvey feneri, patlangaç	physalis, alkékenge, coqueret	physalis, winter cherry, cape gooseberry
îsota sor, bîbera sor	<i>Capsicum annum</i>	kırmızı sivri biber	piment	pepper, capsicum, chilli
kakao, kekew	<i>Theobroma cacao</i>	kakao	cacao	cacao
kari, kardî, kardû, marmaroşk	<i>Arum maculatum</i>	lekeli yılan yastığı	arum tacheté, gouet tacheté, pied de veau	lords and ladies, cuckoo pint
kartol, petate, qûnpir, ritax, kirtop, sêvik, kartofil	<i>Solanum tuberasum</i>	patates	potatoe	potatoe
kelendor, kerbeşa derewîn, zirkerbeş, kerbeşa keran	<i>Onopordum spp.</i>	adi eşek dikeni	chardon	cotton thistle
kelxa deveyan, qoleg	<i>Centaurea kurdica</i>	devedikeni	variété de centaurée	centaury
kergezîk, gezing	<i>Urtica dioica</i>	büyük ısrıgan	grande ortie, ortie dioïque	large nettle
kerbalcana beji	<i>Atriplex hastata</i>	kara pazı	arroche hastée	hastate orache, iron root
kerengnebî, kengirker, kêngerê nebî, çistole	<i>Eryngium campestre</i>	boğa dikeni	panicaut champêtre	sea holly
kevlepîr	<i>Boraginaceae</i>	hodan	myosotis	forget-me-not
kêrat, qereqaç	<i>Anagyris foetida</i>	zivircik	anagyris fétide, bois-puant	bean clover, stinking wood
kitan, kitaf, guş	<i>Linum</i>	keten	lin	flax
kitana kûvî	<i>Linum usitatissimum</i>	yararlı keten	lin utile (utilisé pour l'huile)	annual flax, linseed
kizink, kiznok, xulêr, kizina beji, xurêl	<i>Vicia cracca</i>	kuşfiği	vesce craquette,	bird vetch
rihan, merzekew	<i>Ocimum basilicum</i>	fesleğen	basilic	basil
kîsikê şivanî, tûrikê şivanan, tarek (zaza)	<i>Capsella bursa pastoris</i>	çoban çantası, kuşkuş otu	capselle, bourse-à-pasteur	shepherd's purse
koksor, lûexandir (zaza)	<i>Amaranthus retroflexus</i>	kırmızı köklü tilki kuyruğu	amarante réfléchie, amarante à racine rouge	redroot amaranth, redroot pigweed
kulîlka cotarî, hanhanek, ciwanemerg, pîvok	<i>Merendera kurdica, Colchicum kurdica</i>	gül faki	colchique du Kurdistan	autumn crocus, meadow saffron
kuncîkerk	<i>Sesamum indicum</i>	yabani susam	sésame	sesame seed, sim sim
lavlavka avî	<i>convolvulus ssp</i>	kuzu sarmaşığı	fleurs violettes, grimpe aux arbres	
lavlavk, leflelok, malvênçe	<i>Convolvulus arvensis kurdica</i>	tarla sarmaşığı	liseron des champs	bindweed, lesser bindweed
limon, leymûn	<i>Citrus</i>	limon	citron	lemon
mamîran	<i>Gentiana lutea</i>	sarı jantian	gentiane jaune	yellow gentian
mastêrek, tiliya xanimê	<i>Digitalis purpurea</i>	yüksük otu (alrenkli)	digitale pourprée	foxglove
mastêrk, sinbêleşên (zaza)	<i>Polygonum persicaria</i>	kırmızı ayaklı kara buğden	renouée persicaire	persicaria
meroje, merje, mîrajo	<i>Asparagus officinalis</i>	kuşkonmaz	asperge	asparagus
nançivîk	<i>Thlapsi arvensis</i>	tarla akça çiçeği	tabouret des champs, monnoyère, herbe-aux-écus	stinkweed, pennycress
nanê çûçê, nançivîk, nançûk, nançûçik	<i>Thlapsi kurdicum</i>	çoban dağarcığı	monnoyère, tabouret des champs	field penny-cress
naznaz	<i>Portulaca grandiflora</i>	ipek çiçeği	pourpier à grandes fleurs	moss rose
nefel	<i>Trifolium spp</i>	yonca	trèfle	clover

nefela nêr, nefela binêrik	<i>Trifolium hybridum</i>	melez yonca, isveç üçgülü	trèfle alsike, trèfle hybride	alsike clover
nefela sor, keta sor	<i>Trifolium pratense</i>	kızıl yonca, çayır üçgülü	trèfle rouge, trèfle des prés	red clover
okaliptus, tadar	<i>Eucalyptus globulus</i>	ökaliptus	eucalyptus	eucalyptus
pencepîsik	<i>Ranunculus repens</i>	horoz ibiği, sürünücü düğün çiçeği	pied de poule, renoncule rampante	creeping buttercup
peqpeqok, teqteqok, çeççeçok	<i>Silene spp (caryophyllaceae)</i>	nakil, yapışkan otu	silènes	catchfly
pirpar, parpar, pêpîne	<i>Portulaca oleracea</i>	semiz otu	pourpier commun	purslane
pîvaz, piyaz	<i>Allium cepa</i>	soğan	oignon	onion
pîzel, pîzil	<i>Juncus</i>	hasır otu	jonc	rush
pûjan, naneya beji	<i>Mentha arvensis</i>	kır nanesi	menthe des champs	mentha arvensis
qaçmûk, şewbor	<i>Hesperis kurdica</i>	acem menekşesi	variété de julienne	common dame's violet
qaco, şîrok, talişk, xasa beji, talika zerencam (zaza)	<i>Lactuca serriola</i>	küçük ağı marul, küçük eşek marolu	laitue serriole	prickly lettuce
qarûş, karîş, qarûç, bencere, bencira	<i>Sorghum halepense</i>	kanyas, geliç	sorgho d'Alep	Johnson grass
qerenfil, qer nefel, qurnefil, mêxek, mêxik	<i>Dianthus</i>	karanfil	œillet	carnation
qesal mehîmûd	<i>Teucrium chamaedrys</i>	kısa mahmut otu	germandrée petit-chêne	wall germander
qinêber	<i>Cardaria draba</i>	kır teresi, yabani tere	passerage, cardaire drave	hoary cress, hoary pepperwort
qırşorik smartweed	<i>Polygonum lapathifolium</i>	ravend yapraklı çoban yaprağı	renouée à feuilles d'oseille	pale smartweed, dock-leaved
qurincok, giya qurincok, gorcal (zaza)	<i>Tribulus terrestris</i>	demir diken	tribule terrestre, croix-de-malte	caltrops
rebenok, mêlaq (cûreyek lale ye)	<i>Tulipa oculis-solis</i>	güneş gözü	variété de tulipe	a species of tulip
ribês, rêwas	<i>Rheum ribes</i>	ışgın	rhubarbe	rhubard
rihan, merzekene	<i>Ocimum basilicum</i>	fesleğen	basilic	sweet basil
rihana maran	<i>Salvia spp</i>	adaçayı	sauge	sage, clary
rîlik, rolik, rûl, ziqqum	<i>Nerium oleander</i>	zakkum, ağı çiçeği	laurier rose	oleander, rosebay
sabûnok	<i>Saponaria officinalis</i>	adi sabun otu	saponaire officinale, herbe à savon	soapwort
selmast, sêlmask, selmik, vilincê bizan (zaza)	<i>Chenopodium album</i>	akkaz ayağı	chénopode blanc, ansérine, chou gras	lamb's quarters, pigweed, goosefoot
sernixûnk	<i>Fritillaria persica</i>	acem ters lalesi	fritillaire de Perse	persian lily, persian fritillaria
sêva binerdê, sêvaxîn, saya binerdî	<i>Helianthus tuberosus</i>	yerelması	topinambour	Jerusalem artichoke
şirta çeman	<i>Calluna vulgaris</i>	adi süpürge çalısı	bruyère	heather
sîvanok	<i>Phlomis kurdica</i>	ayî kulağı	phlomis du Kurdistan	Kurdish sage
şoqilê hûr, mircor, çavreşk, baqilê hûr	<i>Vicia tetrasperma</i>	dört taneli fiğ	vesce à quatre graines	smooth tare
sorik, korek	<i>Panicum capillare</i>	kumdar, arnavut darısı	panic capillaire	witchgrass
sorsork, kitra sor, giyagêzk (gula wî : pîjildan, pîspisk, pîspisok, pîjik)	<i>Imperata cylindrica</i>	yelotu, kindıra, kan otu	paillote, paille de dys	cogon grass, blady grass
strîbeloq, strîşûjin, striyê çavbiloq, çavbeloq	<i>Centaurea</i>	deligöz	centaurée	centaurea
sumbil	<i>Hyacinthus orientalis</i>	sümbül	jacinthe	common hyacinth
şabelot	<i>Castane sativa</i>	kestane	châtaigne	sweet chestnut
şahtere	<i>Fumaria officinalis</i>	şahtere	fumeterre officinale	common fumitory
şembelik, xencelîsk	<i>Trigonella foenum-graecum</i>	çemen	fenugrec, sénégrain, trigonelle	fenugreek
şeqşeqok, çeççeçe	<i>Bongardia chrysogonum</i>	çatlak otu	bongardia	bongardia
şerabok, giya zirzirok, şofan	<i>Avena fatua</i>	yabani yulaf	folle avoine	wild oats
şêlmok, harik	<i>Sinapis arvensis</i>	yabani hardal	moutarde des champs	wild mustard
şîlan, gulşîlan, sûrgule	<i>Rosa canina</i>	kuşburnu	églantine	wild rose, dog rose, eglantine
şîlêr	<i>Fritillaria</i>	ağlayan gelin	fritillaire	fritillary
şîlêra sernixûnk	<i>Fritillaria persica</i>	acem ters lalesi	fritillaire de Perse	persian lily, persian fritillaria
şîlêra sernuxwîn, şîlêra sernixwînk, gulbenda şahî	<i>Fritillaria kurdica, Fritillaria imperialis</i>	ağlayan gelin, kral tuğu	fritillaire impériale (cette fleur est originaire du Kurdistan, pousse en altitude)	crown imperial
şînak, bedemçe, şivşînk	<i>Prunus arabica</i>	badem türü	variété d'amandier	prunus arabica
şirşirk, giyagenim, biragenim, xelvaş (zaza), şîlmok	<i>Bromus spp</i>	dibromlu	brome	brome grass
şolîk, colik, şoqil, baqil, baqla, kêlih, keli	<i>Lathyrus</i>	bezelye	pois	pea
şoqil, şolgenîk, baqilfisek, colgenî, kelîk, gasos (Bahdinan)	<i>Vicia sativa</i>	ehli fik, arpa fiği, buğday fiği	vesce	common vesce
şoqilê pisîkan, xişik	<i>Vicia hirsuta</i>	kaba tüylü fi	vesce hérissée	hairy tare
tîhnavk	<i>Labiata spp</i>	ballıbabagiller	variété de labiée	species of labiate
tîriyê dehlê	<i>Vaccinium myrtillus</i>	çoban üzümü	myrtille	whortleberry, blueberry
tîriyê hırçan	<i>Arctostaphylos uva-ursi</i>	ayî üzümü	busserole, raisin d'ours	bearberry
tîriyê maran	<i>Solanum nigrum</i>	köpek üzümü, köpek memesi	morelle noire	black nightshade
say mîrçikan	<i>Sorbus aucuparia</i>	kuş üvezi	sorbier des oiseleurs	mountain ash
tîrşok, tîrşoka xwarinê	<i>Rumex spp</i>	kuzukulağı	oseille	sorrel
tîrşok, tîrşoke	<i>Rumex acetosa</i>	kuzukulağı	oseille des prés	common sorrel
tîrşoka gayan	<i>Rumex obtusifolius</i>	küt yapraklı labada	patience obtuse	broad-leaved dock
tîrşoka keran	<i>Rumex dentatus</i>	labada	(oseille non comestible)	indian sorrel, toothed dock
tîrşoka kewan	<i>Rumex acetosella</i>	küçük kuzukulağı	fausse oseille, petite oseille	sheep's sorrel, small sorrel
tîrşoka zinaran	<i>Rumex crispus</i>	kıvrık labada	patience crépue	curly dock
tolik, xamazek (zaza)	<i>Malva neglecta</i>	ebegümeçi	mauve à feuilles rondes	dwarf mallow
tûtirşk, drîsork	<i>Rubus idaeus</i>	ahu dudu	framboisier	raspberry
xelîlok, pêlegleg, xilok, poşmê, poşmêz (zaza)	<i>Geranium spp</i>	turnagagası	gêranium	geranium
xerdela beji, xerdela reş	<i>Brassica nigra</i>	kara hardel	moutarde noire	black mustard
xilîk, hilîk, hilîreşk	<i>Prunus spinosa</i>	çakal eriği	prunellier, épinette, épine noire	sloe, blackthorn
xweşîl, taleşîr, şîrmar, xağşîr, xwelîşîrik, şîrik, şîroke, delêk (zaza)	<i>Euphorbia helioscopia</i>	seher otu	euphorbe réveil-matin	sun spurge, wartweed
zimanxwînk, zeliqok, nûsek, nwîsek, padûseh (zaza), dîgune	<i>Gallium aparine</i>	yapışkan otu	gaillet, gratteron	goosegrass, cleavers
zingilzava, tusiyê keran	<i>Eryngium spp</i>	boğa diken	panicaud (variété de chardon)	sea holly, eryngo
zirtîq, fîstîqa erdê, fîsteqê bierdkî	<i>Arachis hypogaea</i>	yer fıstığı	arachide	peanut, groundnut, monkey nut
zirtolîk, tolika keran, xamezeka sûre	<i>Malva sylvestris</i>	büyük ebegümeçi	grande mauve	common mallow
kimê, dobelan	<i>Ascomycetes hypogés</i>	yermantarı, domalan	truffe	truffle
kimeya reş	<i>Tuber melanosporum</i>	kara yermantarı	truffe noire	black truffle
şoqilê hûr, mircor, çavresk, baqilê hûr	<i>Vicia tetrasperma</i>	dört taneli fiğ	vesce à quatre graines, lentillon, ciceroles	smooth tare
beybûna mêrgan	<i>Leucanthemum vulgare</i>	çayır papatyası	marguerite de prés	ox-eye daisy
gurnîg, gurnîgamêş, gûrnûk, mwîsek	<i>Xanthium strumarium</i>	hakiki sıraca otu	lampourde aux écrouelles, lampourde glouteron	rough cocklebur
behîva beji, badema çiya, çaqale	<i>Prunus carduchorum</i>	yabani badem	variété d'amandier	almond tree



Achillea millefolium, bêwîjan, pûjang, gulikê maran



Aconitum napellus, gurxenêq, kerxenêq



Agropyron repens, firêz (li hin deveran)



Alcea kurdica, hêro



Amaranthus retroflexus, koksor, lûexandir (zaza)



Amagris foetida, kêrat, qereqaç



Anchusa azurea kurdica, gûriz, golvize, zimanê ga



Anchusa officinalis, guriz, gelziwan (zaza), gurisk



Anemone coronaria, adarok, gulalesûre, kurikmast




Arum maculatum, karî, kardî, kardû, marmaroşk



Asparagus officinalis, meroje, merje, mîrajo



Atriplex hastata, kerbalcana beji



Avena fatua, şerabok, giya zirzirok, şofan



Bellevalia, gêleqir



Boraginaceae, kevlepîr



Brassica nigra, xerdela beji, xerdela reş



Bromus spp., şirşirk, giyagenim, biragenim, xelvaş (zaza), şilmok



Calendula arvensis, gula çavêşê, hemîşe bihar



Capsella bursa pastoris, kîsikê şivanî, tûrikê şivanan, tarek (zaza)



Cardamine hirsuta, bendika avî, vîzdorik (zaza)



Cardaria draba, qinêber



Centaurea, strîbeloq, strîşûjin, striyê çavbiloq, çavbiloq



Chenopodium album, selmast, sêlmask, selmik, vilincê bizan (zaza)



Equisetum arvense, dûvikê hespê, sipingê maran, singê maran, şitlê xezalan, tilîper, rûnîn (zaza), vaşbitrî (zaza)



Echinochloa crusgalli, darucan, şêrpûg



Hedera helix, dargerînk, daralînk, badar



Merendera kurdica, *colchicum kurdica*, kulîlka cotarî, hanhanek, ciwanemerg, pîvok



Euphorbia helioscopia, xweşîl, taleşîr, şîrmar, xagşîr, xwelîşîrik, şîrik, şîroke, delêk (zaza)



Fumaria officinalis, şahtere



Gallium aparine, zimanxwînk, zeliqok, nûsek, nwîsek, padûseh (zaza), dûgune



Heliotropium europaeum, giyagewrik, kifkedûpişk, giyadûpişk, vaşogewr (zaza)



Hesperis kurdica, qaçmûk, şewbor



Brassica oleracea, kelem



Lamium spp., hingivîn, mijmijok, vaşê mêşan (zaza)



Lathyrus tuberosus, colbenî, şolikê maran, baqilê maran, kelîmar



Linum, kitan, kitaf, guş



Lolium temulentum, çîm, giyaşêş



Malva neglecta, tolik, xamazek (zaza)



Matricaria chamomilla, beybûn, beybûna demanan, babûnc



Mentha arvensis, pûjan, naneya bejî



Myosotis arvensis, guriz, gelziwan, gûriz, gwîriz



Panicum capillare, sorik, korek



Papaver rhoea, bûkîk, bûkanî, bûk, bwîk, nîsanok, patpatok, patpatole, bûkûzava, gulênîsan, rêywek



Phaseolus vulgaris, fasûlî, fasûlye, fasolî, fasla (zaza)



Phlomis grandiflora, guhbelok



Phlomis kurdica, sîvanok



Polygonum lapathifolium, qîrşsorik



Polygonum persicaria, mastêrk, sinbêleşên (zaza)



Portulaca oleracea, pirpar, parpar, pêpîne



Rumex obtusifolius, tirşoka gayan

Termên rojnamevaniyê

Amadekar : Newzad HIRÛRÎ

kurmancî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
reklam	reklam	réclame, publicité	advertisement
reklam kirin	reklam yapmak	faire la réclame, faire la publicité	to advertise
reklamger	reklamcı	publiciste	advertiser
reklamgerî	reklamcılık	publicité	advertising, publicity
agahdarî	enformasyon	information	information
analîz	analiz	analyse	analysis
analîz kirin (n.f.)	analiz etmek	analyser	to analyze
analîst	analist	analyste	analyser
jenîgarî, jiyanname	biyografi	biographie	biography
peqoşk, peqoşka axaftinê, balon	balon	bulle (de BD)	balloon
bandrol	bandrol	banderole,	banner
diruşm (n.f.)	1) bayrak, sancak 2) slogan	1) bannière 2) slogan, mot d'ordre	1) banner 2) slogan
stûr, tîpên stûr	kalın harfler	caractère gras	bold
weşandin	yayınlamak	publier, diffuser	to broadcast
weşan	yayınlama, yayın	diffusion, publication	broadcasting
klîp	klip	clip	clip
têgeh (n.f.)	kavram, mefhum	concept	concept
têgehî	kovramsal	conceptuel	conceptual
têgehbar	kavranabilir, anlaşılabilir	concevable	conceivable
netêgehbar	anlaşılabilir, kavranamaz	inconcevable	unconceivable
mafê weşanê	telif hakkı	droit d'auteur	copyright

Dezgehên dewletê

Amadekar : Samî ERGOŞÎ

kurdfî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
birêveber, rêveber	müdür	directeur	director
birêveberî, rêveberî	müdürlük	direction	directorate
navxwe	iç	interne	internal
navxweyî	dahili, iç	intérieur	internal, interior
elektrik, kareba	elektrik	électricité	electricity, power
birêveberiya belavkirina elektrîkê (an karebayê)	elektrik dağıtım müdürlüğü	direction de distribution de l'électricité	electric power distribution directorate
sexbêrî	bakım	entretien	maintenance
tora elektrîkê (karebayê)	elektrik şebekesi	réseau électrique	power grid
avero	lağım, kanalizasyon	tout-à-l'égout	sewers
birêveberiya av û averoyan	su ve kanalizasyon müdürlüğü	direction des eaux et des égouts	directorate of water supply and sewage
birêveberiya kar û cîwarkirinê	istihdam ve iskan müdürlüğü	direction de l'emploi et du logement	directory of employment and housing
birêveberiya çandiniyê	ziraat müdürlüğü	direction de l'agriculture	directorate of agriculture
saman	kaynak, servet	ressource	resource
samanên ajelî	hayvan kaynakları	ressources animales	animal resources
birêveberiya samanên ajelî û beytariyê	hayvan kaynakları ve baytarlık müdürlüğü	direction des ressources animales et des services vétérinaires	directorate of animal resources and veterinarian services
birêveberiya gumrikê	gümrük müdürlüğü	direction des douanes	directorate of customs
plankirina bajêr	şehir planlaması	planification urbaine	city planing
birêveberiya gencineyê	hazine müdürlüğü	direction du trésor	directorate of treasure or exchequer
birêveberiya weqfan û karûbarên dîni	wakıflar ve din işleri müdürlüğü	direction des biens de main-morte et des affaires religieuses	directory of mortmain and religious trusts
birêveberiya tapoyê	tapu müdürlüğü	direction des titres de propriété	land registry directory
birêveberiya baca hatiniyê (an derametê)	gelir vergisi müdürlüğü	direction de l'impôt sur le revenu	directorate of income tax
birêveberiya çavderiya bazirganiyê	ticaret denetleme müdürlüğü	direction de surveillance du commerce	directory of trade supervision/control
birêveberiya belavkirina sotemeniyê (an ardûyê)	yakıt dağıtım müdürlüğü	direction de distribution des combustibles	directory of fuel distribution
birêveberiya karûbarên civakî	sosyal işler müdürlüğü	direction des affaires sociales	directorate of social welfare
birêveberiya çavderiya darayî	maliye denetleme müdürlüğü	direction de contrôle financier	financial audit directory
birêveberiya spor (an werziş) û ciwanan	spor ve gençlik müdürlüğü	direction des sports et de la jeunesse	directorate of sports and youth
sindoqa çavderiya malbatan	aile yardım sandığı	fonds d'aide aux familles	family assistance fund
birêveberiya giştî ya perwerdeyê	eğitim genel müdürlüğü	direction générale de l'éducation	general directorate of education
birêveberiya perwerdeyê ya Dihokê	Dihok eğitim müdürlüğü	direction de l'éducation de Dihok	Dihok directory of education
taqîgeha keresteyên avakirinê	inşaat malzemeleri laboratuvarı	laboratoire des matériaux de construction	building materials testing laboratory
birêveberiya pasportê	pasaport müdürlüğü	direction des passeports	passport office
birêveberiya polisên parêzgeha (wilayeta) Dihokê	Dihok vilayeti polis müdürlüğü	direction de la police du département de Dihok	police directory of Dihok county or province
birêveberiya ewlekariyê ya Dihokê	Dihok emniyet müdürlüğü	direction de la sûreté de Dihok	Dihok directorate of security
birêveberiya trafikê	trafik müdürlüğü	direction du trafic	traffic directory
birêveberiya ava binerd	yeraltı suları müdürlüğü	direction des eaux-souterraines	directory of subterranean waters
birêveberiya nifûsê	nüfus müdürlüğü	direction de l'état-civil	directory of civil status
birêveberiya çalakîyên dibistanan	okul etkinlikleri müdürlüğü	direction d'activités scolaires	directory of school activities
birêveberiya polisên hawarê	imdat polisi müdürlüğü	direction de la police de secours	directory of emergency services
birêveberiya agirkujiyê	itfaiye müdürlüğü	direction des pompiers	fire brigade directory
serokatiya zanîngeha Dihokê	Dihok üniversitesi başkanlığı	présidence de l'université de Dihok	presidence of Dihok university
birêveberiya şaredariya Dihokê	Dihok belediye müdürlüğü	direction de la municipalité de Dihok	Dihok municipal directory
birêveberiya tendirustiyê	sağlık müdürlüğü	direction de la santé	directory of health
birêveberiya statîstîkê (an amarê)	istatistik müdürlüğü	direction de la statistique	directory of statistics
birêveberiya karkenariyê	emeklilik müdürlüğü	direction des retraités	directory of pensioners
birêveberiya şûnewarên kevnare	eski eserler müdürlüğü	direction des sites archéologiques	directory of archaeological sites
odeya bazirganiyê	ticaret odası	chambre de commerce	chamber of commerce
birêveberiya ava gundan	köy suları müdürlüğü	direction des eaux pour les villages	village water supply directory
kompanya tiştên xwarinê	gıda maddeleri şirketi	compagnie de l'alimentation générale	compagny of staple food stuppuly
birêveberiya avdanê	sulama müdürlüğü	direction de l'irrigation	directory of irrigation

Di kurdî de binavkirina nebatan

Amadekar: Ehmedê DIRIHÎ

Gelo di zimanên din de û di zimanê kurdî (kurmançî (k) û zazakî (z) = kirmanckî/kirdkî/dimilkî) de nebat çawa tên bi nav kirin? Binavkirina nebatan tê vê manayê: Bi navên sade û yekhejmar ên îlmî binavkirina nebat û grûba nebatan û danîna qaydeyan. Navên latîni hem dirêj in û hem jî gotina wan zehmet e. Lêbelê li dinyayê navên nebatan ên îlmî, bi latîni tên dayîn. Ji van navan re **“navên botanîkî”** tê gotin. Di ferhengên de jî, wek **bot** (*Morus alba*) tê nivîsîn.

Di vê nivîsarê de, min binavkirina nebatan bi kurdî (bi du zaravayên kurdî) û latîni dane ber hev. Çawa dişibihin hev, çawa tên wesifandin û manaya wesifan nîşan didin.

Ji bo navên bi kurmançî min tîpa (k) û bi zazakî jî tîpa (z) danîye ber. Ger nav di her du zaravayan de muştêrek be, min tiştêk nedanîye ber.

Di amadekirina vê lêkolînê de keda birayên min kek Malmîsanîj û kek Roşan Lezgîn gelek e. Wan di her warî de alîkarîya min kir û bi zanyarî û pêşniyarên xwe ev xebat dewlemendtir kirin. Ez gelekî spasî wan dikim. Herweha gelekî spasdarê kek Malmîsanîj im ku wî ev jî zaravayê zazakî kiriyê kurmançî.

1) Hin nebat navên xwe yên latîni, jî peyvên *kurd*, *carduchorum*, *Kurdistan* yan jî herêmenê Kurdîstanê werdigrin. Çend nimûne:

3) Di zimanê kurdî de navên nebatan, piranî bi îzafeya navdêran yan jî bi îzafeya rengdêran e. **Nimûne:** şitlên **kezalan** (k); kekvila **zerde** (z); sosina **awe** (z)

4) Di binavkirina nebatan de mirov reng, bêhn, tehm, şikil û cîyê ku lê hêşin dibe dide ber çavan.

5) Hin nebat jî bi navên heywanan tên bi nav kirin. **Nimûne:** nanê **mîrîşkan** (k); tîrşikê **gayan** (z); tîrşoka **gayan** (k); zûlê **kesayan** (z); adirokê **heşî** (z); dimê **lûyî** (z).

Heke navê heywanan li pêşiyê be, yekhejmar wî tê bi kar anîn. **Nimûne:** **dîk** penc (k); **marşing** (k); **şêrpûg** (k); **vergvaş** (z); **zozmêw** (z)

6) Di kurdî de carna hece tekerar dibe û li dû wan paşgira “-ik” yan jî “-ok”ê tê, bi vî hawî navê nebatê çêdibe. **Nimûne:** **bizbizok**; **hedhedik** (k); **reşreşik** (k); **kirkirok** (k); **lavlavk** (k); **parpar** (z); **qumqumok**; **sorsorik** (k); **tajtajik**; **wahwahok**; **xişxişik**; **xumxumik**

7) Di latîni û kurdî de, bi pêşgir û paşgiran jî navên nebatan çêdibin.

ZAYEND (NÊR Û MÊ)

Di latîni de zayenda navan heye. Nav yan nêr, yan mê û yan jî notr in. Zayend bi paşgiran tên nimandin.

nêr	mê	notr	maneya nimûne	maneya peyvê
-us	-a	-um	albus, alba, album	sipî
-er	-ra	-rum	niger, nigra, nigrum	reş(k), sîya(z)
-is	-is	-e	brevis, breve	kilm, kirr
-r	-ris	-re	acer, acris, acre	tal (k), cal (z)

Di kurdî de, di navan de zayend, yanî **nêr** û **mê** heye. Nebat li gor **zayenda** xwe tên bi nav kirin.

Di îzafeya zazakî de paşgiran nêr “-ê” û “-o”, paşgiran mê jî “-a” û “-e” ne. Di zaravayê kurmançî de, paşgira mê “-a” û paşgira nêr jî “-ê” ye.

1) Navên **dar**an mê ne. hebikêra argoşan (z) sayêra mîrçikan (z) dara biyê (k) dara sêvê (k)

2) Di zaravayê zazakî de navên **birran** (z) (= **devî** (k)) nêr in. Lê di kurmançî de mê ne û di

halê pirhejmarîyê de têne bi kar anîn. **birrê qalî** (z); **gezo sûrin** (z); **şitlê(n)** xezalan (k); **şirtê(n)** çeman (k)

3) Navên **fêkîyan** mê ne. **alûnça tirşe** (z); **momixa reş** (k); **sêva bejî** (k)

4) Navê **kevzê** mê ye. **kevza awe** (z); **kevza avê** (k)

5) Navên nebatên **alifî** yên **baqleyî** mê ne. neflika sipî (z); arguda bej (z); nefela sipî (k) kizina reş (k)

6) Navên nebatên **alifî** yên **genimî** nêr in. **xelvaş** (z); **çim**; **giyareş** (k)

7) Navên **kulîlkan** mê ne. **vilika kutikan** (z); **binefşa belek** (k); **sosina avê** (k)

8) Navên **sewzeyan** bi piranî mê ne. Tenê yên ku dişibihin organa nêrtîyê, hinek jî wan nêr in (xiyar, balcan, kundir û hwd). **îsoto sûr** (z); **xeyarê payîzî** (z); **xiyarê bejî** (k) **kundirê dolmikan** (k); **balcanê reş** (k)

A) NAVÊN NEBATANÊN KU ÎZAFE NE

Di kurdî de navên hin nebatan wek îzafeya navdêran yan jî îzafeya rengdêran e.

Îzafeya navdêran:

fisa **vergî** (z)
nequrê **leglegî** (z)
saya **argoşan** (z)
vilincê **bizan** (z)
neynûka **bûkê** (k)
baqilên **keran** (k)

Îzafeya rengdêran:

girnûga **gilore** (z); pêçeka **sipî** (z)
garisê **stenbolî** (k); kundirên **mîranî** (k)

Navên tewirên nebatan gelek caran bi îzafe ne. Wek nimûne ez çend tewirên “beqla/bakla”, “neflîke”, “tuye” û “qerqaşe” dinivîsim:

beqlaya **gayan**/ bakla **gayan**
beqlaya **heran**/bakla **heran** (z)
beqlaya **maran**/bakla **maran**
beqlaya **mîrçikan**/bakla **mîrçikan** (z)
beqlaya **pisîngan**/bakla **pisîkan**
beqlaya **sultanî**
beqlaya **xatunan** / bakla **xatunan** / bakla **xatunî**

neflika **sipî** (z); neflika **sûre** (z)
neflika **zerde** (z); tuya **qere** (z)
tuya **sîyaye** (z); tuya **sipî** (z)
tuya **sûre** (z); tuya **tirşe** (z)
tuya **ximrî**/tuya **xumrî** (z)
qerqaşa **payîzî** (z); qerqaşa **wesarî** (z)

B) HIN TAYBETMENDÎYÊN DINÊN NAVÊN NEBATAN

Li gor hin taybetmendîyên wan, meriv

Latîni

Alcea kurdica
Cirsium **carduchorum**
Paeonia mascula **kurdistanica**
Merendera **kurdica**
Centaurea **kurdica**
Astragalus **kurdicus**
Paracaryum **kurdistanicum**
Verbascum **kurdicum**

Li vir “kurdistanica” varyete ye û maneya “yê Kurdistanê / jî Kurdistanê, kurdistanî” dide, “carduchorum” jî bi maneya “yê kurdan” e.

2) Di latîni de, tenê navekî rast û îlmî yê her nebatê heye. Ji vî navî re “binomial” tê gotin û her cînsêk bi du peyvên tê bi nav kirin. Nimûne:

Latîni

Morus alba

Manaya “morus”ê, di kurdî de “tuye” / “tû” ye, manaya “alba” jî di kurdî de “sipî” ye.

Kurdî

hîro/hêro
vergvaş (z)
heşvil, savil (z)
kulîlka cotarî, hanhanek, pîvok (k)
baxox, angelok, kanêje (k)

dikare li ser navên din ên nebatan weha bibêje:

1) Navên nebatan ên bi peyvên “awe” (z)/ avî (k) û “varte” (z): **bencra awî** (z); **kuya awî** (z); **sungê vartî** (z)

2) Navên nebatên **yabanî**: **cewek** (z); **cewvaş** (z); **korekvaş** (z); **sîrvaş** (z); **şilêlvaş** (z); **încila zuray**/încila **zûre** (z); **nehaya bejî**/nehaya **bêjî** (z); **qewaxa pînce** (z) **sayek**/saya **borî** (z); **sîrik** **tîrşika zurayîne**/ **tîrşika zureyîne** (z) **valbor**/vala **borî** (z)

3) Navên nebatan ên li gor cîyan: **asmîn** (z); **binerdik** (k); **guldîwar** (k); **incasa maltayê** (k); **saya binerdî** (z)

4) Navên nebatan ên li gor alîyan (cîhetan): **vasê veraroj** (z); **verroj**/ **verrojîk**/ **verarojîk**/ gula **ververoji** (z); gula **berbiroj** / **gulberojk** (k)

5) Bi peyvên **bawerîyê**: **cehnemî**; **cenet-cehennem**; **kîngernebî**; **kuya şêxanî** (z)

6) Bi peyvên **cînsîyêtê**: **dêlek** (z); **dêleşit** (z)

7) Bi peyvên **demê** (**wext**): **adarok**; gula **adarê** (k); **gulenîsan** (k); **kulîlka gulanê** (k); **kuya zimistanî** (z)

8) Bi peyvên **merivatîyê**: **vêywek** (z); **bûkîk** (k); **xalcînek** (z)

9) Bi navên **kesan**: **elik-fatik** (k); **meyremxort** (k)

10) Bi navên **mîtolojîk**: **newroz**

11) Bi peyvên **tibî** (**hekîmtîyê**): **tadar**; **vaşê tenşîyî** (z); **giyayê balûkê** (k)

12) Bi peyvên bona xususîyêtên **jinan**: beqlaya **xatunan**/ **xatunî**, bakla **xatunan**/ **xatunî** **tarrê xatune** (z); **tîrşoka xatune**; **xatune**; **xatunek**

13) Bi peyvên **xwarinê**: **nanê mîrçikan** (z); **rûnî**; **rûnîn**

14) Bi navên **wesilan** (**organan**): **bilikê heşî** (z); **çimê pisîngan**, **çimga** (z); **çavga** (k); **goşgoz**; **penceşêr**; **pencexanim**

15) Bi peyvên **şekilan**: **girnûga gilor**; **pelpihûn** (z); **puncvaş** / **pûncvaş** (z)

16) Bi navên **eşyayan**: **giştonek** (z); **gulborî**; **gulzirnayî**; **lûleper mastêrek**; **qebqabîk**; **rêzile** (z); **zel** (z)

17) Bi navên **çekan**: **rim**; **singoyê îspanî**; **şimşîrî topîz**; **xencere**

18) Bi navên **heywanan**: **binevşa seg** (k); **bûkegur** (k); **derpêkê dîk** (k); **dilqoka heran** (z); **dirrika devan**; **fisegur** (k); **gelzûnê mîrçikan** (z); **giyaberaz** (k); **goşê kutikan** (z); **goştberxik** (k); **guhmişk** (k); **gunpîsik** (k); **gurnigê gamêşî**; **hebikê argoşan**/saya **argoşan** (z); **kardûnê heşî** (z); **kerenga kûsî** (k); **kerika berxo** (k); **kîngerê heran** (z); **kuvarokê bizinkî** (k); **kuvarokê mîkî** (k); **lepehîrk** (k); **luzê kesayan** (z); **marmaroşk** (k); **masîjehr** (k); **merzekew** (k); **mêşxwur**/ **mêşgir** (k); **nefela pîyê balindeyî** (k); **pêcanîk** (k); **pîqaze** (k); **piranê meşnan** (z); **rihana maran**; **rişê bizinê** (k); **sawinê mîrçikan** (z); **sungê maran**; **şaxeask** (k); **teliyê merrayan**/ **mirtelî** (z); **teliyê mozîkan** (z); **tîrîyê mamê rûvî** (k); **tizbîyê dewarî**; **vasê kekan** (z); **vasê leglêg** (z); **vasê pisîngan** (z); **vaşzerenc** (z); **vergvaş** (z); **vileheş**/ **heşvil**, **vilheşik** (z); **vilika kutikan** (z); **vilincê bizan** (z); **zozmêwe** (z); **zebata pilingî** (k)

19) Bi navên **hejmaran**: **çartelî**/ **çartelu** (z); **çarçal**/ **çarçar**; **çelpere** (k); **dimor**/ **dimol**; **gula şêstper** (k); **hezargez**; **hezarreng**; **hezartere**

20) Bi peyvaya “**boye**” (z) (bi kurmançî “**bêhn**”): **boyinvaş** (z); **şewboy**

21) Bi peyvên **tehmê**: **bîbero şîrîn** (z); **helûtîrşik** (z); **engura şekerî** (z); **engura şerabî** (z); **şekîrok**; **taleke**/ **taleki**, **talik** (z); **talika zerencan** (z); **tîrşinge**/ **tîrşingî**; **tîrşik**; **tîrşikêre** (z); **vasê hemgînî** (z); **zebeşa tahle** (z)

22) Bi peyvên **rengan**: **belgîzer**; **bengzerîk**; **binevşa belek** (k); **çavzerk** (k); **engura qerî** (z); **engura sûrî** (z); **gilgilo sipî**/ **girgilo sipî** (z); **goza sîyaye** (z); **gula sûre** (z); **gulezer**; **gulzêr** (z); **gulzêrîn**; **hebreş** (k); **îsoto sipî** (z); **kefzer**, **kevzer**; **kekila sipî** (z); **kelema sûr** (z); **kevza zerkesk**; **kevzareş** (k); **koksûre** (z); **kovikê erxîwanî** (k); **kumsûre** (z); **lalengî** (rengê mandalîn e); **lêmeka sipîyê** (z); **mexmork**; **sîrê kumîkmor** (k); **sorkelem** (k); **sosina sipî** (z); **sûrdar**/ **sûredar** (z)

sûrgule/ **sûrgul**, **sûrgulik** (z)
sûrince/ **sûrinci**/ **sûrinc**/ **sorince**/ **sûrînc** (z)
sûrvaş (z); **tarro sûr** (z); **teliyo sîya**/ **teluyo sîya**/ **sîyateli** (z); **teliyo zerd** (z); **tirewa sûre** (z); **tûreşk** (k); **vaşo gewr** (z); **vîla çeqere** (z); **xamazeka**/ **xanzeka**/ **ximazeka**/ **xamzeka sûre** (z); **xerdelo sîya**; **zergoz**; **zerzeng**

23) Bi peyvaya “**bin**”: **binerdî**; **bingozîk**

24) Bi peyvaya “**dare**” / “**dar**”: **darbenîşt**; **darçîn**; **dargez**; **darhulu** (k); **darşîlêr**; **dartizbî** ; **darziravîk** (k);

gendar/sûrdar (z); guldar; daralînk; darenan (z); dêdar; meledar
hişkdar / wişkdar (z)

25) Bi peyvay "gule"/"gul":

gulbend; gulmenşag (z); gulgîngîz; gulqedife; gulzer; gulbej; gulbihar (k); gulkelem; gulgîngîz; gula adar; gula çavêşê (k); gula hesretê (k); gulebêmîraz (k); gulehingvîn (k); gulemî; şevgul

26) Bi peyvay "şa"/"şah":

şagul; şabaqîl; şabelû; şabelûyêre/şablêre"/"şalbêre (z)

27) Bi peyvay "vaş" (z) yan jî "giya" (k):

vaşê bitrî (z); vaşê derban (z); vaşê genimî (z); vaşo nemir (z); vaşê sawînî (z); vaşê şitî (z); vaşê tuzbeyan/vaşê tuzbûn (z); vaşê ziwanok (z)

giyabehlûlk (k); giyaciva (k); giyagewrik (k); giyagirêçk (k); giyajehrik (k); giyamêşxur (k); giyaşermîn (k); giyayê ferîştayî (k); giyayê xanimê (k); giyayê kirman (k); hêzgiya (k); hircgiya (k); şîrgiya (k)

28) Bi peyvay "telî"/"teli"/"telu" (z) yan jî "stirî" (k):

mirteli (z); sîyateli (z)

agirstirî (k); stirîbeloq (k); stirîk (k); stirîmişk; stirîper (k); stirîyên çavbeloq (k); stirîyên gêxanê (k); stirîyên maran (k); stirîzerk (k)

29) Bi peyvay "vile"/"vil", "vilike"/"vilik" (z) yan jî "kulîlk" (k):

çavîl (z); heşvil (z); kekvil (z); kozvilik (z); savîl/savul (z); vilheşik (z)

kulîlka bayê (k); kulîlka cotarî (k); kulîlka gizbelokê (k); kulîlka hespan (k); kulîlka hesretê (k); kulîlka newalan (k); kulîlka nîsanê (k); kulîlka qesar (k); kulîlka şewatê (k); kulîlka tolgînê (k); kulîlka xezalan (k); kulîlka zehferan (k)

30) Bi peyvay "pîvaz" (k):

pîvaza çolê (k); pîvaza guran (k); pîvaza hirçan (k); pîvaza kuçikan (k); pîvaza kurdî (k); pîvaza kuvî (k); pîvaza maran (k); pîvaza genî (k); pîvazî (k); pîvazok (k); pîvaxag (k)

31) Hin navên nebatan bi tekrarkirina peyvekê çêdibin:

kefkefok; mijmijok; peqpeqok; şeşşeşok; tastasik; teptepik; teqteqok; xaşxaşik

C) YÊN KU BI PÊŞGIRAN ÇÊBÛNE

bê-

fasulyeya bêdasî/faslêya bêdasî (k)
gorcala bêteli (z); gula bêmiraz (k)
vila bêkoke (z); vaşo bêkok (z)

zir-

Pêşgîra "zir-" maneya "yabanî" û "sexe, nerast" dide. Nimûne:
zirbaqle (k); zircatir (k); zirfistiq (k); zirhewr (k); zirhêjîr (k); zirleylanq (z); zirsosin (k); zirşemamok (k); zirtolike (z)

Ç) YÊN KU BI PAŞGIRAN ÇÊBÛNE

-eke/-eki/-ek/-k

derzînek
kelawek (z)
korek (z); lêmek (z); paduseke/paduseki/padusek (z); sayek (z); sînzek (z); şîrzek (z)
veyveke/veywek (z)

-êre

alûncêre (z); beyêre (z); dirrikêre (z); findiqêre (z); gozêre (z); henarêre/nalbêre (z); kinayêre (z); lûxpêre (z); maşlêre/maşlêre (z); payîzêre (z); qêlikêre (z); sayêre (z); teyêre (z); valêre (z); vamêre (z); xibêre (z); zerdalîyêre (z)

-ik

derzînik/dêrzînik; gezik; sûrpencik (z); sûsik; şirtik

-in/-yin/-în/-yîn

pilxîn (z); tarro gilerzîgîn (z); telîyin/teluyîn (z); zerîn (z)

-ok

adirok; gezok; kiznok; silqok; sîrmok; şeşok; tirşok; xezalok; zengilok

D) NAVÊN KU BI FORMÊN CIHÊ TÊNE GOTIN

hirmî (k): hermê, hermî, hermû, hurmî, hurmê

tirî (k): tirih, turî

murî (z): meroe, meroy, miro, miroy, mirwa, mirwi, mura, murîye, murû, mûrû

E) NEBATÊN KU BI NAVEKÎ TÊNE GOTIN

Kurdî

Anix Satureja hortensis
Anix Mentha arvensis
Anix Mentha longifolia
Anix Pimpinella anisum
Anix Thymus fallax
Anix Origanum munzurense

Latînî

G) JI NAVÊN NEBATAN ÇEND GOTINÊN PÊŞIYAN Û ÎDYOM

Zazakî:

Îdyom:

Awe deketiş şekoke.

Beng werdiş.

Bi qasê goze bîyayîş la gozêre ra qisey kerdiş.

Çûleyê vame denêkerdiş.

Deyî şarî gay û bizî, deyî mi gulgîngîzî.

Hênî pûne ra aciz o, pûne zî şino çimeyê hênî de beno zergûn.

Herdîşe xas, qine pîvaz bîyayîş.

Kêna şargê gulan a, waştîya vîst û hewt tenan a.

Korek dest ra nêrîşayîş.

Mesela sîr û pîvaz kerdiş.

Mi eşt gozêre, şî gina mazêre.

Mi eşt sayêre, şî ame tuyêre.

Mîze verdeno telî, keno wişk.

Ne pîvaz werdiş, ne fek veşayîş.

Neheyê serê tahte bîyayîş.

Pele kelmayêre bîyayîş.

Sey girê dari bîyayîş.

Sey pirparî zêdiyayîş.

Sîr û pîvaz ra qisey kerdiş.

Şemo birayî Mamî, gozan bedelno bi vamî.

To vile dîy, tira darû çîy.

Xele bi firîk, mele bi şîrik.

Zîre korekî vîyartîş.

Gotimên pêşyan:

Gozê pûçî xirexir kenê.

Her vaş kokê xo ser o beno zergûn.

Pîvaz çiqas firk bo ende sere keno pîl.

Sereyê pîvazî, qina pîvazî yew î!

Welî ra telî, telîyî ra welî kuweno.

Kurmançî:

Îdyom:

Ava goşt û balcana, ne xwar ne da cîrana.

Ava ser berûyan, wek zavayê dilê xesûyan.

Avîlok zî nexşê xwedê ye.

Baxçê gula, para bêaqîla.

Berû jî darê ketî, dar nasnekirî.

Bi dilê keran bimîne, qevdek baxdenûs namîne.

Bi eşqa mewîja, dil diçe guvîja.

Bi serîyek sîr nekirin.

Bi şev şemamok bi roj pîrebok bûyin.

Bizrê pirparê bûyin.

Bo xatîrê gulê, dirik dikeve paşilê.

Bûyin dirika reş.

Bûyin îsot.

Çelleyê erebî û firîgên noka?!

Çî zanî qedrê gulê, kerbeş divêt kerê reş.

Çîl kilamên hirçî ne, hemû jî li ser dara hermî ne.

Darê min kulavê min, rehmet li dê û bavê min.

Dibê qey sêvek e, kirine du felq. (Teşbîh)

Dimirim dibiecim; ceh dibêjê ez birinc im.

te can e, ê me balcan e?/ te can e, ê min balcan e?.

Endilko bavê keko, tekê min o, tekê keko.

Garis jî destan nerîjîn.

Gayê fiso, nan garis o!.

Gula geş dane ber pozê kerê reş.

Ha namûs ha baxdenûs!.

Heft çîrokê hirçê ne, her heft jî li ser hermê ne.

Heke xiyar e, jî tûtîkê ve dîyar e.

Herçî ber e, gula zer e.

Heya herî bigre xernûf.

Hezîran hizirî, giya li baskê kizirî.

Kakîlê gûzê bûyin.

Kes pîvazan pê hûr nake.

Kirin wek pincar.

Li ser dirikan rûniştin.

Lomeya pîvaz jî sîr kirin.

Mala bavan gula geş, mala mêran roja reş.

Maneya nedayînê, "werîs li garis e."

Mar jî pûngê aciz e, pûng jî diçe li ber qula wî hêşîn tê.

Min sîr nexwarîye ku bîhn jî devê min bê!.

Nan heye, av heye, pîvaz heye, lo lo tu çima dimirî?.

Nav giya de tolikê begemkirin.

Ne dixwim gêlazan ne didim hevrazan.

Ne kortigê kerengan bûyin.

Nîsk kirin gîsk.

Nok jî dibêje pozê min heye!.

Pincara çiyayekî bûyin.

Pîrê nemir bihar tê, kero nemir qîvar tê.

Qîz sêva li darê ye, her kes çoyê xwe davêje.

Sêva çê para hirçê.

Sîr jî jî pîvaz re dibêje "wêde here, bîhn jî te tê!".

Tene bûn firîg, mele bûn şîrîg.

Tovê pirparê bûyin.

Ya tûrek mêwîj, ya kelemekî tûj.

Zarok kulîlka malan e. (Teşbîh)

Zebeş neçûyîn dêv.

Gotimên pêşyan:

Dar bi berê xwe şîn e.

Dar û devî bi guh in!

Dara hirmîyan sêvan nade!

Darê min kulavê min, rehmet li dê û bavê min.

Demek a kulîlkan e, demek a sosinan e.

Genimê dewsa kizinê, bexê li ber bizinê, mêrê bindestê jinê, her sê Hesabê mirinê.

Germ germa tûyan e, kêf kêfa rûtan e.

Giya di bin kevir de namîne.

Giyayê hewşê jî xwedî re tahl e.

Gul bê bîhn nabe.

Her giya li ser koka xwe şîn tê.

Jî sorik patîle çênabe.

Jî şîlanê nîr çênabe.

Ker jî nefelê fahm nake.

Kundirê miranî, çêtir e jî şekirê şîranî.

Nan nanê genimî, bext bextê mêran.

Nanê gilgil jî tunebûnê çêtir e.

Nok tê li kokê.

Petêxên zer para kûsiyan e!

Pîr bi pîvongê carek tê xapandin.

Pîvaz pîvaz e, çî sor e çî sipî ye.

Rojek a gulê ye, yek a gulşîlanê ye.

Serîyek pîvaz, bîhnê berdide beroşekê.

şohreta çeman dar û bî, şohreta qîz û bûkan şar û temezi.

Tebax e, tîrî bax e.

Temûz e, kakîlê kete gûz e.

Xwedîyê xiyarê çîlmisî, ne dixwe ne dide kesî.

Zarê şîrîn, pîvaza tûj dike hinguvîn.

Zebeş bi dengê xwe, hinar bi rengê xwe.

Zebeş jî xwarinê re, dendik jî danînê re.

Zor gizêrê radike.

Çavkanî

Baytop, Prof. Dr. Asuman, Bitkilerin Bilimsel adlarındaki Niteleyiciler ve Anlamları, İ.Ü Ecz. Fak. Yayınları, İstanbul, 1995

Baytop, Prof. Dr. Turhan, Türkçe Bitki Adları Sözlüğü, TDK Yay. Ankara, 1997

Bedîrxan, Celadet Alî, Ferhenga Kurmançî-Frensî, Kovara Vate, Stockholm, hûmare: 1-18 (1997-2002)

Davis, P.H., Flora of Turkey and the East Aegean Islands, 10 cîld, Edinburgh (1965-1988)

Erdem, Turan, Ferhenga Zazakî-Tirkî/Tirkî Zazakî, Doz Yay. İstanbul 1997

Farqînî, Zana, Ferhenga Kurdî-Tirkî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İst., 2004

Farqînî, Zana, Türkçe-Kürtçe Sözlük, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İst., 2000

Gruba Xebatê ya Vateyî/Vate Çalîşma Grubu, Türkçe-Kirmanca(Zazaca) Sözlük/Kirmanca(Zazaca)-Türkçe Sözlük, İkinçî

Basım, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2004

Guest, Evan, Flora of Iraq, Ministry of agriculture Republic of Iraq, 9 cîld, Baghdad, 1966

Îzoli, D., Ferhenga Kurdî-Tirkî, weşanên Deng, İstanbul, 1992

Malmîşanîj, Zazaca-Türkçe Sözlük/Ferhengê Dimilkî-Tirkî, Weşanên Deng, İstanbul, 1992

Özcan, Mesut, Zazaca-Türkçe Sözlük, Kaynak Yayınları, İstanbul, 1997

Polat, Edip, Bilim Dilinde Kürtler, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2004

Qazzaz, Şafiq, Kurdish-English Dictionary, Aras Press and Publishers, Erbil, 2000

Saadalla, Salah, Saladin's English-Kurdish Dictionary, Avesta Basım Yayın, 2000

Tazegül, Emrullah, Tarımsal Bilimler Sözlüğü, cild I-II, İzmir, 1987

Turgut, Harun, Zazaca-Türkçe Sözlük, Tij yayınları, İstanbul, 2001

Vate (kovara kulturî), Stockholm, hûmare, 1-25 (1997-2005)

KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE
Supplément du Bulletin de liaison et d'information

N° C.P. : 65913 A.S.

© INSTITUT KURDE DE PARIS

106, rue La Fayette, 75010 Paris

France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64

www.fikp.org

Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN

Réalisation : S. ILITCH & M. HASSAN

KURMANCÎ

Min ev nivîsî ne jî bo sahibrewacan
Belkî jî bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xani
(Sedsala XVIII)

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Civîna Parîsê ya payîza 2006an

Civîna 39an ya Kurmancî rojên di navbera 27/11 - 2/12-2006an de li Parîsê kom bû. Beşdarên civînê li ser peyvên kurdî û îranî di ermenî de, peyvên kêmnas, termên fûtbolê, peyvên di stranan de, ferhenga Avestayî-Kurdî, paşgir û pêşgirên kurdî xebitîn.

Ev hevalên han di civînê de beşdar bûn: Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Lutfi Baksî

(Xerzan), Elîşêr (Wan), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozi (Batman), Kendal Nezan (Diyarbakir), Cemal Onursal (Cizîr), Zinar Soran (Dêrik), Behrûz Şucaî (Kotol), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agirî).

Encamên ji xebata vê civînê di vê hejmara Kurmancî de tîn belav kirin.

Peyvên kurdî û îranî di ermenî de

Amadekar : Têmûrê XELÎL

ermenî	kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
	ermenî, êrmenî (m, r)	ermeni	arménien	armenian
	ermenî, ermenkî (n)	ermenice	arménien, langue arménienne	armenian, armenian language
ajdahak	ezderha, ejdiya, ejdeha, ziya, ziha	ejderha	dragon	dragon
koçarî	koçerî	bir Kürt oyunu	une danse kurde	a Kurdish dance
hox	(ji îranî ahaka) ax, xak	toprak	terre	soil, land, earth
axor	axur	ahur	étable	stable
azat, (avestayî azate)	azad	özgür, hür	libre	free
andam, (avestayî hendame)	endam	uzuv	membre	member
ambar, (ji îraniya kevn hembar)	enbar, embar	anbar	dépôt, entrepôt	warehouse, store
bijîşk (ji îranî pizîşk)	pizîşk, pêzêşk	doktor	médecin	physician, doctor
datavor (ji îraniya kevn date: heq, dad)	dadwer	hakim	jugue	judge
dataxaz	dadxwaz, dadres	savcı, dava makamı	procureur	prosecutor
djvar	dijwar	çetin, zor	difficile	difficult
doşab	doşav	pekmez	sirop épais de raisiné	a thickened grape/resinous syrup
gomêş	gamêş	camuş, manda	buffle	buffalo
gaz (ji îranîyê gez)	gaz, gez	arşın	mesure de longueur d'environ 68 cm	a yardstick (about 68 cm long)
gazar	gizêr, gêzer	havuç	carotte	carrot
girpan	girfan, berik	cep	poche	pocket
kopal	gopal	baston, asa	canne	cane
klor	kilor, gilover, gulor	yuvarlak	rond	round
hêl	hêl	kakule	cardamome	cardamon
hîmk	hîm	temel, esas	base, fondation	basis, foundation
hîmn	hîm: bingeh	kök, esas	racine	root
hol	hol; vizik	topaç	toupie	top, spinning top
hazar	hezar	bin	mille	thousand
comard	comerd	cömert, yiğit	brave, généreux	brave, generous
kîp	kîp : şidandî; derî kîp girtin kîpê hev rûniştin	sıkı, çok yakın; kapıyı sıkı kapatmak birbirine çok yakın oturmak	très serré, resseré; fermer bien la porte; s'asseoir très près l'un de l'autre	very tight, tightened up; to shut the door securely; to sit close together
ksak	kîs, kîsik	kese, torba	bourse	purse
kûrak	kurîk	at ya da eşek yavrusu	petit d'un cheval ou d'un âne	a foal (of horse or donkey)
mom	mûm	mum	bougie	candle
şapîk	şapik	gece gömleği	tunique de nuit	night shirt
bizêz	bizûz, gizûz	güve	mite	clothes moth
kap	kap	şerit, kısa şerit	laisse, corde	leash, cord
kaşêl	kaş	çekme, çekiş	traction	traction, haulage
lagan	legan	leğen	assiette large	large bowl
lavaş	lewaş, loş	levaş	fine galette de pain	a flat loaf of fine bread
paç	paç, maç	öpme, öpüş	baiser, embrassade	a kiss, a hug, an embrace
mêxak	mêxik	karanfil	oeillet, clou de girofle	a carnation, a clove

Peyvên kêmnas (II)

Amadekar : Kendal NEZAN

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
hox	küçük giriş kapısı	portillon	gate, barrier
kam n.m.	suyun geçişini engelleyen bir tür vana	dispositif en bois ou en métal bloquant le passage de l'eau (<i>sorte de vanne</i>)	a metal or wooden device for controlling water flow (an adjustable dam)
kamar n.f.	yuvarlak tahta çerçeve (elek, tef, vs)	cadre circulaire en bois (<i>de tambourin, ou d'un tamis</i>)	a circular frame (for a tambourine or sieve)
kamav	su kesildikten sonra arkta kalan birikinti	eau stagnante, flaque <i>n.f.</i> (<i>restant dans la rigole d'irrigation après que l'eau ait été coupée</i>)	a puddle (of water remaining in an irrigation channel after the water has been cut off)
kambûn	diş kamaşması	agacement des dents	having the teeth on edge
kam n.f.	un, yumurta sarısı ve sudan yapılan ve porselen eşya onarımında kullanılan yapışkan	colle artisanale, faite d'un mélange de farine, de jaune d'œuf et d'eau servant à réparer les porcelaines	traditional glue, made of a mixture of flour, egg yolk and water, used for repairing pottery and china.
kam dan; kam dan çiniyê	yapıştırmak, çatlak bir porseleni yapıştırmak	coller, recoller (<i>une porcelaine</i>) ; recoller une porcelaine	to glue, to stick, to glue together pieces of china
tevş, toş, tevşok	yassı, taşlarla oynanan bir çocuk oyunu	sorte de pétanque kurde	a Kurdish game of bowls
tûr n.f.	geleneksel bir Kürt oyunu (oyuncuların bir kısmı geniş bir çemberin içinde durup dışardan yaklaşan oyuncuları kemerleriyle vurur ve kemerlerini almaya çalışır)	jeu traditionnel où une partie des joueurs se tient à l'intérieur d'un grand cercle et frappe à coups de ceinture ceux qui s'approchent d'eux et cherchent à prendre leur ceinture	a traditional game in which some of the players stand inside a large circle and beat back with their belts those who try to approach them and take their belts away
pezmişok, pezmêjek, pezmijk, pezmişk	koyun kenesi	tique (de moutons)	a tick (the insect)
pêcemok	yarasa	chauve-souris	a bat (the flying mammal)
Pêvir, Pêwr, Perwîn, Sureya n.f.	Süreyya	les Pléiades (<i>constellation</i>)	the Pleiades
Pêwr û Mêzîn	Terazi burcu	la Balance (<i>constellation</i>)	Libra (constellation of)
piçiqîn, piçikîn, alîn, lefin	sarılmak	s'enlacer, se nouer	to embrace; to knot
piçiqandin, pêçan, alandin, lefandin	sarmak	enlacer, nouer, ficeler.	to intertwine, knot or tie up
fatfatik, şemşemotik, margîsk, marmarişok, marîjok, fatimoke	fatmacık, çayır kertenkelesi	lézard des près	green lizard
pêxew n.m.	örtü, bataniye	couverture	blanket
şemşemotik n.f.	bir çeşit Kürt mantısı	sorte de gros raviolis kurdes	a kind of Kurdish ravioli
apê mûş (an lûs) an mamê lûs	geleneksel bir Kürt oyunu: iki oyuncu gözleri kapalı bir şekilde belli bir mesafede karşı karşıya oturur. Aralarında bir yastık vardır, oyuncu karşısındakine kefiyesiyle darbe salmadan önce "mamê lûs, xwe bike çilûs, hat te derbeke bênamûs". (Lûs amca, eğil sana kötü bir darbe geliyor) der diğeri darbeden kaçmaya çalışır". En çok puan alan oyunu kazanır. Bir oyuncu karşısındakini vuramayınca oynama sırası diğerinin olur.	un jeu traditionnel kurde dans lequel deux personnes sont assises, séparées l'une de l'autre par un traversin, les yeux fermés. Elles se donnent des coups avec un « egal » noué. Le jeu consiste à esquiver les coups de l'autre. A chaque fois, on prévient l'autre avec : "mamê lûs, xwe bike çilûs, hat te derbeke bênamûs". La victoire est acquise aux points. Dès qu'on manque un coup, c'est l'autre joueur qui reprend la main.	a game in which two people are seated, separated by a cushion, with their eyes closed. they hit out at one another with a knotted "egal". the aim of the game is to dodge the opponent's blows. each time they warn one another with "mamê lûs, xwe bike çilûs, hat te derbeke bênamûs". victory is decided on points. Each time a player misses, his opponent takes over the striking.
pezkoguro n.f.	birdirbir	saute-moutons	leap frog
kerikê kerajo	geleneksel bir Kürt oyunu: oyunculardan biri gözünü kapar ve sırtını diğer oyunculara çevirir. Biri sırtına dokunup "Kerikê kerajo, kî te dajo?" (Eşek sürücüsü eşek, seni kim sürüyor?) der. Eğer sesini tanımazsa onu sırtına bindirip oyun sahasında gezdirir, tanırsa o sırtına biner ve sahayı dolaşır	jeu traditionnel kurde où un joueur ferme les yeux et tourne le dos aux autres. Quelqu'un touche son dos du doigt en disant : Kerikê kerajo, kî te dajo ? (petit âne conducteur d'âne, qui te conduit) S'il ne reconnaît pas la voix, il doit porter la personne sur son dos et faire un tour de terrain, s'il le reconnaît c'est lui qui monte sur son dos	a traditional Kurdish game in which a player closes his eyes and turns his back on the others. someone touches his back saying: Kerikê kerajo, kî te dajo? If he fails to recognize the voice he has to carry that person on his back round the field. If he does recognise the voice, then the other carries him.
çavşüteneke, çavgirtinok, çavgirtineke, veşartok	saklanbaç	jeu de cache-cache	a game of hide and seek
hol, vizik, teqal	topaç	toupie	spinning top
gizgizok	ottan yapılan küçük topaç	sorte de petite toupie faite d'une herbe (gizgizok) qu'on fait tourner sur un plateau.	a kind of small top made of a variety of grass (gizgizok) that is spun on a tray
ponijîn	kara kara düşünmek	avoir des pensées noires, en avoir lourd sur le cœur	to have dark thoughts, to be heavy hearted
ponijîn n.f.	kara düşünce	pensées noires	dark thoughts
pûrisandin	ufalamak	émietter	to shred or crumble
nanê hişk pûrisandin	kuru ekmek ufalamak	émietter le pain sec	to crumble dry bread
tûtûn pûrisandin	tütün yapraklarını ufalamak	émietter les feuilles de tabac	to shred tobacco leaves
qefilîn, cemidîn, qerimîn, simirîn	soğuktan donmak	être transi, geler <i>v.i.</i> , se refroidir <i>v.pr.</i> , se geler <i>v.pr.</i> , FAM. cailler <i>v.i.</i>	to be numb with cold, to be freezing,
qefilîn, betilîn, rat bûn, westiyan	(bazı kuzey ağzlarında) yorulmak, yorgunluktan halsiz düşmek	(REGION.) (<i>dans certains parlers du nord</i>) être fatigué, être épuisé, être exténué	(in some northern regional dialects) to be tired, worn out, exhausted
qerqaş, çilspî	saf beyaz, parlak beyaz	blanc pur, d'un blanc éclatant	pure white, a brilliant white
qesidandin	1) asmak, takmak; 2) çarpmak 3) baş vurmak	1) accrocher <i>v.tr.</i> 2) heurter <i>v.tr.</i> 3) adresser une requête.	1) to hang up; 2) to collide with or bump into s.o.; 3) to petition a court
qesidîn	1) uğramak; 2) yönelmek, başvurmak	1) visiter <i>v.i.</i> , rendre visite en passant, faire halte; 2) s'orienter <i>v.pr.</i> , s'adresser à...	1) to call in on s.o.; 2) to go and see s.o.
lî mala yekî qesidîn	birine uğramak	faire étape chez quelqu'un	to break one's journey at s.o.'s
qesp	sert, sağlam (taş yada çakmak taşı için)	solide (qualité d'une pierre, d'une pierre à briquet)	solid (eg. like a stone or a flint)
qeş n.f.	(batı ağzlarında) soyma	(<i>dans les parlers de l'ouest</i>) épluchage	(in the western dialect) peeling (fruits etc)
qeş kirin	soymak (meyve ve sebze)	peler, éplucher	to peel or clean fruit or vegetables

qetek	buğday ya da pirinci ayıklamada kullanılan tahta sini	plateau en bois utilisé pour trier le blé ou le riz des cailloux	a wooden tray used for sorting wheat or rice to remove small stones
qewarok	içi henüz oluşmamış taze ceviz	noix verte dont la coquille n'est pas encore formée.	an unripe nut whose shell has not yet formed
qewlî, bi qewlî	göre, -e göre	selon	according to
qewlî filankesê/î	falancaya göre	selon un tel	i.e according to so and so
qewilandin	(ender) inandırmak, ikna etmek, baştan çıkarmak (bkz qebûlandin)	(rare) convaincre <i>v.tr.</i> , persuader <i>v.tr.</i> , séduire <i>v.tr.</i> (voir qebûlandin)	(rare) to convince, to persuade or to seduce s.o. (see also qebûlandin)
qewîfî, tenbî	tenbih, tavsiye, sipariş	avertissement, recommandation, avis, conseil	a warning, an advice or recommendation
qewîfî kirin	1) tenbihlemek, tavsiye etmek; 2) sipariş vermek	1) donner un avis, conseiller, recommander ; 2) passer commande ;	1) to give advice, to advise or recommend; 2) to place an order
qewîfî lê kirin	birini tenbihlemek	recommander à...	to recommend to s.o.
qewîtiya pêşyan	ataların tavsiyesi, ata sözü	tradition, adage	a tradition, a saying
qeyal, qiyale n.f. AR.	öğlen uykusu, öğlen dinlenmesi	repos de midi, sieste	a mid-day rest, a siesta
ketin qeyalê	öğlen istirahatına çekilmek	faire la sieste, se mettre à l'abri de la chaleur pour le repos de midi	to take a siesta, to shelter from the heat, to take a mid-day nap
qebal adj. AR.	olgun, olgunlaşmış	mûr, mûri	ripe, ripened
qêna adv.	(ender) güçlükle, zor, güç bela	(rare) difficilement	(rare) with difficulty
qêna hat	güç bela geldi	il est arrivé avec peine.	he arrived with difficulty
qîcî, qîj, qîjî	kaynar, kaynaşan	(rare) bouillant(e), bouillonnant(e), effervescent(e)	(rare) boiling, effervescent
qîç n.f.	(yerel) an	REGION. moment	(regional) moment, short while
qîçekê ; bi vê qîçê vegeriyan	bir anlık; anında döndüler	REGION. moment, un petit moment ; ils sont revenus tout de suite	(regional) a moment, a short while; they returned immediately
qîdîk n.f.	kursak	jabot	crop (of bird)
qîdîka mirîşkan,	tavuk kursağı	jabot d'une poule	a chicken's crop
qîdûm n.f.	tırmık	râteau <i>n.m.</i>	a rake
qîdûm kirin ; erd qîdûm kirin	tırmıklamak	ratisser ; ratisser le sol	to rake
qîdûmkirin	tırmıklama	ratissage (du sol)	raking
kubik, qîlûz, xûz	kambur	bosse	hump
qîlvilandin n.f.	1) çalkalama; 2) sarsma	1) rinçage ; 2) secousse	1) rinsing; 2) a jolt or bump
qîlvilandin	1) çalkalamak; 2) sarsmak, silkelemek	1) rincer, passer à l'eau ; 2) secouer	1) to rinse out, to soak; 2) to shake
qîlvilîn	1) çalkalanmak; 2) sarsılmak, silkelenmek	1) être rincé, être passé sous l'eau ; 2) être secoué, être agité	1) to be soaked; 2) to be shaken or disturbed, to be agitated
qîmil, qîmir, qemer	yanık ten	hâle, teint hâlê	tan, a tanned complexion
qîmitokî	1) buruşuk; 2) solmuş, solgun	1) froissé, chiffonné, froncé, plissé ; 2) flétri, fané	1) creased, crumpled; 2) withered, wilted, faded
qînyat n.f.	1) takat, güç; 2) kanaat (bkz qenaet)	1) force <i>n.f.</i> , vigueur <i>n.f.</i> , énergie <i>n.f.</i> ; 2) conviction, croyance. Voir aussi qenaet	1) force, energy; 2) conviction, belief (see also qenaet)
qînyata min bi te re	sana güveniyom	je te fais confiance	I trust you
qînyata çavan	güründüğü kadar	à vue d'œil	as far as one can see
dîtina çavan qînyata dilan e	gözle görmek inanmaya yeter	la vue suffit à rassurer le cœur	the sight is enough to reassure the heart
qînyata dil şkêrandin,	muradına ermek, gönlünün arzularını gerçekleştirmek	réaliser un désir profond, s'efforcer, chercher à obtenir la réalisation d'un vœu, d'un désir	to achieve a deep wish or desire
qîn, qînik, qînik, qînike	nakarat	refrain, rengaine,	a refrain or melody
qînêre, qînotî	öğleden sonra yenilen hafif yemek	goûter <i>n.m.</i> , repas léger pris dans l'après-midi.	tea, i.e a light meal or snack taken mid-afternoon
qîran	salgın hayvan hastalığı:	épizootie <i>n.f.</i>	epizootic disease
qîran ketiye nav pez	sürü salgına bulaşmış	les moutons sont frappés par une épizootie	the sheep have caught an epizootic disease
qîrçok, <i>syn.</i> çîkûs	cimri	avare <i>adj.</i>	miserly, stingy
qîrçûn n.f.	hayvan yemi artığı	foufrage non consommé par les bêtes et devenu impropre à la consommation	fodder, not eaten by the animals and become unsuitable for consumption
bêşû	kar yığını	congère, amoncellement (de neige)	snowdrift, a heap of snow
qîtin	sigara ağızlığı	fume-cigarette	a cigarette-holder
qîtitk	kuruntu (kurumuş parçacık veya dilimler için)	pièce ou morceau séché (<i>de quelque chose</i>)	a piece or a dried piece (of s.thg)
qîtitkê xwînê	kan kuruntusu;	plaque de sang séché	a pool of dried blood
qîtitkê petêxê	kurumuş kavun dilimi;	tranche de melon séché ;	a slice of dried melon
qîtitkê (mêrî) kulê	baş belası, belalı delikanlı	casse-cou, jeune homme bagarreur	a daredevil, a reckless person
qîl	boynuz	défense	a tusk
qîlê berazan, <i>syn.</i> şirne;	yabani domuz boynuzu,	défense de sanglier	a boar's tusk
qîlê filan	fil dişi	défense d'éléphant	an elephant's tusk
qîqac n.f.	yaklaşık 12 kg olan eski tahıl ölçüsü	ancienne mesure de céréales d'une capacité de douze kilos environ	an old unit for measuring grain, of about 12 kg capacity
qîr, zift	asfalt;	asphalte <i>n.f.</i> , bitume <i>n.m.</i> :	tar, asphalt, bitumen. eg.
qîr kirin	asfaltlamak;	asphalter <i>v.tr.</i> , goudronner <i>v.tr.</i> ;	to asphalt or to tar
... kirin qîrê,	bulaştırmak, çamura batırmak, güç duruma koymak;	engluer, embourber, mettre dans le pétrin	to bog down, to get in a mess
bûn qîr	yapışmak, musallat olmak	être collant, être casse-pied	to be clinging, to be a nuisance
qetran	katran	goudron	tar
qoçandin, quçandin	büzmek;	replier, recroqueviller ;	to fold up again, to huddle;
xwe qoçandin ser hev,	büzülmek, kabuğuna çekilmek	se recroqueviller	to curl o.s. up
syn. xwe qosî ser hev kirin			
qol n.m.	kolye	collier <i>n.m.</i>	necklace
qolê zêran	on iki altın dizili kolye ya da baş takısı	collier ou diadème de douze piécettes d'or	necklace or diadem made of 12 small gold coins
qolê mil, girmilk	omuz başı	articulation du bras à l'épaule	shoulder joint
qolek an qolik n.f.	çerçöp olarak yakılan, bir tür irice deve diken	variété de gros chardon, utilisé comme brindille	a kind of large thistle used for kindling
qolik (bi qolikê ketin)	(koyunlarda) kelebek hastalığı	maladie de foie qui affecte les moutons (être atteint d'une maladie de foie)	liver disease affecting sheep, (to have a liver complaint)
qopik n.m.	1) topal 2) top biçiminde kumaştan düğme	1) cupule du gland; 2) bouton en tissu en forme de boule	1) an acorn cup; 2) a round cloth button
qoqik, kort	oyuk, delik	trou <i>n.m.</i> , cavité <i>n.f.</i>	a hole or cavity
qoqika çav	göz oyuğu	orbite de l'œil <i>n.f.</i>	eye socket

qoqika mējî	kafatası	boite crânienne	cranium
qoqilandin	1) delmek, oymak 2) oyuğundan çıkmak (göz)	1) trouser <i>v.tr.</i> , percer <i>v.tr.</i> ; 2) sortir de l'orbite (<i>œil</i>)	1) to make a hole, to pierce; 2) to gouge (an eye)
qoq n.f. tizbiya qoq	hint cevizi ağacı ya da kökü; hint cevizi ağacından yapılan tesbih	bois ou racine de cocotier : chapelet en bois de cocotier	the wood or root of a coconut tree a string of beads of coconut wood
qoq, qoqe n.f.syn. meqere qoqeya ta	makara iplik makarası	bobine <i>n.f.</i> bobine de fil	a reel, a spool a reel of thread
qoqilandin	oylatmak (bir çocuğu omuzunda oylatmak)	faire bouger, faire sauter (un enfant sur ses épaules)	to make s.o move or jump (eg. a child on one/s shoulders)
qorbaçe, kuxika qîrîqîrok, xeneqîtik, xeneqûtîk, xeniqok.	boğmaca	coqueluche <i>n.f.</i>	whooping cough
qorç n.f.	bir cilt hastalığı	une maladie de peau	a skin disease
qûrîn n.f.	turna çığılığı	cri de la grue	the cry of a crane (bird)
qoş n.f.	hayvanlarda doğum sancısı	convulsions d'un animal au moment de la mise bas	convulsions of an animal as it gives birth
mî ketiye ber qoşan	koyun doğum sancısı çekiyor	la brebis est prise des convulsions de la mise bas	the ewe is in labour convulsions
quşdik, qutîk, qotîk	ayna	miroir	mirror
qulat	top;	boule :	ball;
qulata berfê	kar topu	boule de neige	snow ball
quloz	1) yüksek; 2) zirve;	1) <i>adj.</i> haut, élevé; 2) <i>n.f.</i> cime, sommet	1) high; 2) summit or peak;
quloz bûn	yükselmek	s'élever ;	to rise;
qulozî hewa bûn	göklere göklere çıkmak	monter vers le ciel	to fly to the sky
quloz kirin	yükseltmek	élever	to raise or bring up
qurs	(yerel) yüce dağ	(régional) haute montagne	(regional) high mountain
kurt, qurt	akbaba	vautour	vulture
kurtê laşan,	leş kargası	vautour moine (<i>aegyptius monachus</i>).	a species of vulture (<i>aegyptius monachus</i>)
quzgezk, cûbir, cûbirk	dana burnu	courtillière; (lat) <i>gryllotalpa vulgaris</i>	a mole cricket (<i>gryllotalpa vulgaris</i>)
gezgez, gezgezk	dana burnu	mufler, gueule de loup ; (lat) <i>antirrhinum</i>	snapdragon (<i>antirrhinum</i>)
qûnteşî, hespê bûkê	helikopter böceği	libellule	dragonfly
sivoreav, seyê avî	su samuru	loutre	otter
qûz, kûjî, kûjik, kûze	sansar	fouine	weasel, stone martin
delek, semûr	zerdeva, ağaçsansarı	martre, zibeline	a marten, sable
kurebeşk, kurbeşk	porsuk	blaireau	badger
qwîz	kokarca	putois	polecat, skunk
sîxur	oklu kirpi	porc-épic	porcupine
cîq	sığircık	étourneau sansonnet, merle	a starling
lî ber xistin	(yerel) çaktırmak	(régional) faire comprendre	(regional) to make s.o understand
lî rû bi ber bûn	(yerel: orta Anadolu Kürtleri) çakmak, anlamak	(chez les Kurdes d'Anatolie) comprendre	(regional: anatolian Kurds) to understand
raber xistin	(yerel) teşvik etmek, çaktırmak, birinin kafasına koymak	(régional) inciter à faire quelque chose, faire comprendre, pousser à..., mettre dans la tête de	(regional) to urge s.o to do s.thg. make s.o understand, to push s.o to ...; to ram s.thg into s.o.'s head
raborandin, raborî kirin	1) geçinmek; 2) geçindirmek, geçimini sağlamak	1) faire passer; 2) assurer sa subsistance	1) help s.o. cross 2) to keep or support oneself
raborî, debar, îdare	geçim;	subsistance;	subsistance;
raboriya me baş e	geçimimiz iyi	nous avons un bon niveau de vie	we have a good standard of living
racivandin	toplamak, biraraya getirmek	réunir <i>v.tr.</i> , rassembler <i>v.tr.</i>	to unite or assemble
racivîn: cûn ser hev, civilîn	büzülmek, çekilmek (kumaş)	se recroqueviller, rétrécir <i>v.i.</i> (<i>le tissu</i>)	to shrivel up, to shrink (cloth)
raçandin	temel atmak	jeter les bases, les fondements	to lay the basis or foundations
ranav, ranaviş n.f.	telkin	suggestion	suggestion
ranavî yekî kirin	birine telkin etmek	suggérer à quelqu'un	to suggest to s.o
ramedan	yatırmak, uzatmak	étendre, allonger	to stretch, lay down, or lengthen
xwe ramedan	uzanmak, yatmak	s'étendre <i>v.pr.</i> , s'allonger sur le dos	to lie down, to lie on one's back
Syn. paldan, razan xwe dirêj kirin			
randin	sürmek, gütmek	mener, conduire	to lead, to drive
raperîn	bir ırmağı geçmek, aşmak	traverser une rivière, franchir <i>v.tr.</i> , survoler <i>v.tr.</i>	to cross a river, to go through or beyond; to fly over or skim through, (depending on contest),
raper	geçit	passage, gué	crossing, ford
rapêlîn	bükme, katlamak	plier <i>v.tr.</i> , replier <i>v.tr.</i>	to fold; to fold over
raps	ekilmiş tarla, ekilmiş arazi	champ cultivé, terrain cultivé.	cultivated field, cultivated land
rasandin, rêsandin	örmek 2) zank sürmek, yapıştırmak; susturmak	nouer, tricoter 2) coller	1) to knot, to knit 2) to stick
rêsayî, rêsî, rêsandî	örülmüş:	noué, tricoté :	knotted:
rêsayî	örülü, örgülü, eğimli	noué, barbelé	
têlê rêsayî	dikenli tel	fil de fer barbelé	barbed wire
rasteyar	samimi; içten	sincère <i>adj.</i> , franc, franche <i>adj.</i>	sincere, frank
rasteyarî	samimiyet, içtenlik	sincérité <i>n.f.</i> , franchise <i>n.f.</i>	sincerity
pê werkirin, lê kirin	dökmek, serpmek	saupoudrer	to sprinkle
xweyê pê werkirin	tuzlamak, tuz serpmek	saupoudrer de sel	to sprinkle salt
ratib: pergal	düzen;	ordre <i>n.m.</i> :	order, tidiness;
ratiba mala wî rind e	evi çeki düzenlidir	sa maison est bien rangée	the house is tidy
ratûtîkandin	(yerel): örtmek, kaplamak, üstünü kapatmak	(régional) mettre sur, couvrir	(regional) to put s.thg. on, to cover
lihêf ratûtîkandin	üstüne yorgan örtmek	couvrir d'une couette	to cover with a quilt
ravêjker	danışman	conseiller, ère <i>n.</i> , précepteur, trice <i>n.</i>	advisor, tutor
ravrav	kumral	blond vénitien, blond roux.	a reddish blond, ginger coloured
rawêj	1) tavsiye, öğüt, nasihat; 2) konuşma tarzı	1) conseil, recommandation; 2) manière de parler, parler <i>n.m.</i>	1) advice, recommendation; 2) a way of speaking, speech
rawêjkar, rawişkar	danışman	conseiller, ère	adviser,
rawêjkarî, rawişkarî	danışmanlık	fonction de conseiller	counsellor
pê re westan, pê re westiyan	biriyile uğraşmak	s'occuper de quelqu'un, passer du temps avec quelqu'un, se donner du mal pour quelqu'un	to look after s.o., to go to some pains for s.o.
raweşan, raweşîn. Syn. daweşîn;	1) sililmek, sarsılmak 2) dökülmek;	1) trembler, bouger brusquement, de façon saccadée, être ébranlé ; 2) tomber :	1) to tremble, to move jerkily, to be shaken; 2) to fall;

pelên darê raweşiyane	ağacın yaprakları dökülmüş; 3) yığılmak, toplanmak, herkes köye döküldü	les feuilles de l'arbre sont tombées 3) s'attrouper <i>v.pr.</i> , se masser <i>v.pr.</i> : tout le monde se rassembla au village.	the leaves have fallen; 3) to flock together, to form a crowd; everyone flocked to the village
her kes raweşiya gund	(yemel) serpmek, dökme	(régional) asperger <i>v.tr.</i>	(regional) to spray
raweşandin: reşandin	çamaşır serilen ip yada yer	étendoir à linge.	a clothesline
raxistek	1) mağrur, burnu havada; ukala 2) (mec.) eşraf	1) hautain, e <i>adj.</i> , arrogant, e <i>adj.</i> ; 2) FIG. notable <i>adj.</i>	1) haughty; 2) (fig) noteworthy
raymezî	mağrurluk; ukalalık	arrogance <i>n.f.</i> :	arrogance:
raymezî kirin	mağrur mağrurluk etmek, hava atmak	prendre des airs, faire preuve d'arrogance.	to put on airs, to display arrogance
rebisandin, repisandin, tepisandin	basmak, bastırmak	tasser <i>v.tr.</i>	to pack, to tamp down
rebisîn, repisîn, tepisîn	basılmak, bastırılmak	se tasser	to subside or shrink, to bunch up
rebisandin, rewisandin	sulamak, su vermek	arroser, irriguer	to water, to irrigate
refî n.f.	def, uzaklaştırma;	écartement, éloignement;	a gap or distance;
refî kirin	def etmek, uzaklaştırmak	écarter, éloigner	to separate or move away
regez n.f.	1) ırk; 2) cins	1) race <i>n.f.</i> ; 2) genre <i>n.m.</i>	1) race breed, 2) kind, type
remêl, rimêle, hewêrde, sûsik	bıldırcın	caille	quail
ramî	gösterme;	action de montrer:	showing;
ramî dan	göstermek	montrer	to show
renandin	rendelemek	raboter	to plane down or scrape
rengrêj	boyacı, elbise boyacısı	teinturier	dye
rengrêjxane	kumaş ya da elbise boyama yeri	teinturerie	dyeing
rengrêjî	boyacılık	métier de teinturier	the trade of dyeing
veresîn	çözülme (örgü)	filer, se défaire, se détricoter	to spin, to undo, to unpick
resandin	yetiştirmek	faire pousser, cultiver	to make s.thg. grow, to cultivate
reşbend	(yemel) uçurum	REGION. gouffre <i>n.m.</i>	(regional) a gulf, a chasm
fîrînek, fîrînok, zang	uçurum	abîme	abyss
reşîk, xarûk	yünden örülü çarık	sandale en laine et poils tissés pour l'hiver	a winter sandal woven of wool and hairs.
retimandin, ritimandin	tıkamak	boucher <i>v.tr.</i>	a butcher
retimîn, ritimîn	tıkanmak	être bouché, être obstrué	to be blocked
rewa	ödül;	récompense, prix	a reward, a prize;
rewa kirin	ödüllendirmek	récompenser	to reward
rewag	çadır çeperlerini kaplayan keçeden geniş şerit	bande de feutre qui entoure les haies (çît) autour de la tente	a felt band that surrounds hedges; (çît) or round a tent
rewdîn	çok aç, acından ölen	très affamé, qui meurt de faim.	very hungry, starving
rewdînî	açlık	famine <i>n.f.</i>	famine
dîlq n.m.	1) biçim, kılık; 2) rol;	1) forme ; 2) rôle;	1) form, shape; 2) a role;
ketin dilqê yekî	birinin kılığına girmek, birinin rolünü oynamak	prendre le rôle de quelqu'un	take on s.o.'s role

Termên fûtbol - II -

Amadekar : Mistefa AYDOĞAN

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
Federasyona Fûtbolê ya Ewrûpayê	Avrupa Futbol Federasyonları Birliği	UEFA (Union Européenne de football)	UEFA (Union of European Football Associations)
Federasyona Fûtbolê ya Navneteweyî	Uluslararası Futbol Federasyonları Birliği	FIFA (Fédération internationale de football)	FIFA (International Federation of Football Associations)
gol avêtin	gol atmak	tirer un but	to shoot a goal
gol kirin	gol yapmak	marquer un but	to score goal
gola lê	geçerli gol	but valide	valid goal
gola nelê	geçersiz gol	but invalide	invalid goal
golparêz, qelewan	kaleci	gardien de but	goalkeeper
kûpa	kupa	coupe	cup
kûpaya FFE (UEFA)yê	UEFA kupası	coupe de l'UEFA	UEFA cup
kûpaya şampiyonan	şampiyonlar kupası	coupe des champions	champions cup
lêdan, lêxistin	vuruş	tir	kick
lêdana aûtê, derlêderî	kale vuruşu, aut atışı	sortie de but	the goal kick
lêdana destpêkirinê	başlama vuruşu	coup d'envoi, engagement	kick off
lêdana ji goşeyê, goşelêderî	köşe atışı	tir de coin, corner	the corner kick
lêdana penaltiyê, lêdana cezayê, cezalêderî	penaltî atışı	penalty	the penalty kick
lêdana serbest a neyekser, serbestlêderîya neyekser	endirekt serbest vuruş	coup franc indirect	the indirect free kick
lêdana serbest a yekser, serbestlêderîya yekser	direkt serbest vuruş	coup franc direct	the direct free kick
lêdana serbest, serbestlêderî	serbest atış, serbest vuruş	coup franc	free kick
maç	maç	match	match
maça neteweyî	ulusal maç	match national	national match
şahê golan, şahê golavêjan	gol kralı	meilleur buteur	top scorer
şampiyon	şampiyon	champion	champion
şampiyonîya cihanê	dünya şampiyonası	championnat du monde	world championship
şampiyonîya Ewrûpayê	Avrupa şampiyonası	championnat européen	European championship
taçavêtin, avêtina ji kenarê, kenaravêjî	taç atışı	remise en jeu	the throw-in
taxim	takım	équipe	team
taximê neteweyî	ulusal takım, milli takım	équipe nationale	national team
tora golê, tora qeleyê	kale ağı	filet de but	goal net

Paşgirên kurdî

-III-

Amadekar : Reşo ZÎLAN

-o (I) : Ji bo çêkirina navên hem jin û hem jî mêran bi dawîya peyvê ve tete girê dan.

Nimûne: Soro, Mendo, Bazo, Silo; mo, Zeyno, Xeco, 'Eyşo, Weso.

-o (II) : Ev paşgir ji bo piçûkxistina kesan, tişt, cih û deveran û jê bi gilî û gazin behskirinê, yan jî ji bo saloxdan û wesifdanê tete bi kar anîn. Ev dikare hem di forma dema rewşa gazikirinê de be hem jî ji bo binavkirin û navlêdanîne be.

Nimûne: Hemo, Remo, Şemo, Heso, bavo, Silo, xalo, apo, gundo, çemo, guro, şahîno, hevalo, liço, lîko, xwaro.

-o / -yo (III) : Ji bo forma bangkirina zayenda nêr ya yekhejmar e.

Nimûne: kuro!, bavo!, keko!, zavayo!, gêjo!, dîno!

-ok / -yok (I) : Paşgirek e, ku ji bo salox û wesifdana mirovekî ye.

Nimûne: çepok, tirsok, kenok, mirovok, gerok, revok, şermok, zarok, girîyok, mizmizok, xapînok, xeydok, qarqarok, qehrok, dilbijok

-ok (II) : Bi alîkarîya vê paşgirê ji navdêr yan jî rengdêran navdêrên nû tene afirandin.

Nimûne: gulok, adarok, nîsanok, devok, nezok, pelok, kelok /kelek, miştok, peqpeqok, zelqok /zeliqok, keçelok, şemitok, şînok, gezgezok, xemrevînok, pêkenok, payîzok, dilok

-ok / -yok (III) : Ev paşgira ji bo piçûkkirinê ye. Gava ku tete dawîya peyvekê, tiştê ku jê tete kad kirin, ji aliyê mezinahîyê ve piçûk dike.

Nimûne: ferhengok, fetilok, hêjîrok, şekirok, şemamok, zengilok, xeberok, pîvazok, pîfdanok, kaniyok / kanyok, hestîyok, axayok

-oke : Ji navdêran rengdêrekê diafirîne.

Nimûne: bîroke, şiloke (şilope), şermoke, firoke, virroke, tiroke

-okî : Ev paşgir ji navdêran rengdêrekê çêdike.

Nimûne: qirêjokî, peritokî, zerikokî, reşkokî, gemarokî, pitpitokî, girînokî, gumgumokî, vinvinokî, ximximokî

-olek : Bi vê paşgirê rengdêr tete afirandin.

Nimûne: tatolek

-ole : Bi vê paşgirê rengdêr tene afirandin.

Nimûne: zirtole, tirole,

-olek / -olik : Bi vê paşgirê rengdêr tene afirandin.

Nimûne: gululik, çinçolek (cincîlk, çincîl), zirtolek

-olekî : Bi vê paşgirê rengdêrekê pêvebrî (atrîbutîv) tete çêkirin.

Nimûne: reşolekî, şînolekî, keşkolekî

-onek : Ev paşgira ji navdêrekê rengdêr yan jî navdêrekê nû çêdike.

Nimûne: tirsonek, zirtonek, bizdonek, fitlonek, zîvronek

-or : Bi vê paşgirê rengdêr tete afirandin.

Nimûne: şilor

-orik : Bi vê paşgirê rengdêr tete afirandin.

Nimûne: xilorik

-ose : Bi vê paşgirê rengdêr tete afirandin. Paşgira "-ose" kurtbûyîya paşgira "-asa" ye ku bi maneya „wek, mîna, fena, şubhê" ye.

Nimûne: keroşe.

-otankî : Bi vê paşgirê rengdêrekê pêvebrî (atrîbutîv) tete çêkirin.

Nimûne: reşotankî, pîrotankî.

-over : Bi vê paşgirê rengdêr tete afirandin.

Nimûne: girover / gilover, hilover.

-ox : Ev paşgir bi maneya "çêker, kesê ku dike, kesê ku bi wî karî radibe" dide peyvê. Paşgira "-ox" di zimanê pehlewî de heye û di farisîya îro de jî din peyvan de maye. Lê di kurdî de, herî zêde, di zaravayê zazakî (dimilî) de bi rengê gelekî berfireh tete bi kar anîn. Wisan ku dikare bi maneya "çêker" jî bo her kar û pêşeyî bête bi kar anîn.

Nimûne: çêkîrox, kirrox, kirox (kiryo), salox (salix).

-oyî : Bi vê paşgirê ji navdêrekê rengdêrek tete afirandin.

Nimûne: pesnoyî, şerooyî, peyvooyî

-pare : Ev paşgir bi maneya "kerr, perçe, parçe" ye.

Nimûne: yekpare, dilpare, cigerpere,

-perwer : Ji lêkera "perwerandin" a îranî ye ku di maneya "perwerde kirin, xwedî (xudan) kirin, jê re xwedî derketin, mezin kirin, terbiye kirin, hebandin" e de ye. Ev paşgir maneya "kesê / tiştê ku dihebîne / hez dike, jê re xwedî derdikeve" dide peyvê.

Nimûne: kurdperwer, mêvanperwer, nîştimanperwer, mirovperwer

-pêç : Paşgira ji lêkera "pêçandin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê pêçandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: birînpêç, serpêç, dorpêç, rûpêç

-parêz : Paşgira ji lêkera "parastin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê parastinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: welatparêz, hawîrparêz

-perest : Paşgira ji lêkera "perestîna" ku di maneya "hebandin, jê re secde birin" e de ye. Wek paşgir maneya "kesê ku wî tiştî dihebîne, ji wî tiştî re secdeyê dibe" dide peyvê.

Nimûne: agirperest, pûtperest, xaçperest, keysperest, xwepere, kevnepere, pûlperest, nijadperest

-pêj : Paşgira ji lêkera "pehtin / pijandin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê pehtinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: xwarinpêj, nanpêj, rûnpêj, aşpêj

-pîv : Paşgira ji lêkera "pîvan / pîvandin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê pîvandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: germîv, bapîv

-poş : Paşgira ji lêkera "poşîn" a bi maneya "lixwekirin, wergirtin" e ye. Gava ku tete dawîya peyvekê maneya "kesê / tiştê ku bi karê poşînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: zirîpoş, reşpoş, çavpoş

-rax : Paşgira ji lêkera "raxistin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê raxistinê radibe dide" peyvê.

Nimûne: serrax, binrax, cîrax.

-rês : Paşgira ji lêkera "ristin / rêsin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê ristinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: teşîrês.

-revîn : Paşgira ji lêkera "revîn / revandin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê revînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: xemrevîn, dilrevîn, xewrevîn, hevalrevîn.

-rêj : Paşgira ji lêkera "rêtin / rotin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê rêtinê radibe dide" peyvê.

Nimûne: avrêj, xwînrêj

-saz : Paşgira ji lêkera "saxten" a farisî ye ku dibe "çêkirin" a kurdî û maneya "kesê / tiştê ku bi karê çêkirinê / sazîkirinê" radibe dide peyvê.

Nimûne: dermansaz, diransaz, demsaz, çeksaz, karsaz.

-soj / -soz : Paşgira ji lêkera "sotin" e, ango şewitîn / şewitandinê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê şewitandin / sotinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: dilsoj / dilsoz

-stîn : Paşgira ji lêkera "standin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê standinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: ruhstîn

-şikên : Paşgira ji lêkera "şikandin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê şikandinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: balafirşikên, fermanşikên, kevirşikên, qeşaşikên, serşikên, deqşikên, dilşikên, şakşikên (=moralşikên)

-şo : Paşgira ji lêkera "şuştin" e ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê şuştinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: mirîşo, tenaşo (teneşo, teneşîr), destşo, cilşo, çekşo, kincşo, kiraşo, serşo, firaşo, amanşo, berxşo

-şok : Paşgireke hevedudanî ye, ji paşgira "-şo" û "-k" pêk hatîye. Maneya "cihê ku ew tiştê de tete şuştinê" dide peyvê.

Nimûne: serşok, destşok, pêşok, firaşok

-tir (I) : Paşgireke demê ye.

Nimûne: sibetîr, rojtîra din

-tir (II) : Paşgira forma kemper ya rengdêrî yan jî hokerî ya ji bo saloxdana rewşeke danberhevî û miqayesekirinê ye.

Nimûne: xweştir, çêtir, germtir, bihatir, bilindtir, xurttir, mezintir, pirtir, dûrtir, zûtir, derengtir, leztir, bezatir.

-tiraş : Paşgira ji lêkera "tiraşîn / tiraştin"ê ye û maneya kesê / tiştê ku bi karê tiraştinê radibe dide peyvê.

Nimûne: kevirtiraş (bertiraş), heykeltiraş, qelemtiraş, dartiraş, sertiraş, simtiraş.

-tirîn : Paşgira forma lapekemper ya rengdêrî yan jî hokerî ya ji bo saloxdana rewşeke danberhevî û miqayesekirinê ye.

Nimûne: xweştirîn, çêtirîn, germtirîn, bihatirîn, bilindtirîn, xurttirîn, mezintirîn, pirtirîn, dûrtirîn, zûtirîn, derengtirîn, leztirîn, bezatirîn

-tî : Paşgirek e ku ji bo çêkirina navdêrên abstrakt tête bi kar anîn.

Nimûne: şivantî, gavantî, hostetî, hevaltî, biratî, mirovtî, zavatî, kurdîtî, kertî, hartî, beredayîtî, durûtî

-van / -evan (I) : Ev paşgira ku di zimanê farisî de "-ban" e, di kurdî de bûye "-van" yan jî "-wan". Di zimanê kurdî de ew bi van çend awayên jêrîn tête bi kar anîn. Wek di van nimûneyan de jî xuya dike, maneya bingehîn ya vê paşgira lêkerî "panêrî / çavnêriya heywanan kirin, çûna ber heywanan, heywan xwedî kirin" e.

Li vir, hewce ye em bibêjin, ku peyva "şivan" a kurdî di zimanê pehlewî de "şuban" e û peyva "şu" ya ku ji zimanê sanskrîtî ye, di vê peyvê de maneya "pez" wergirtiye. Bi vî rengî, ew di farisî de bûye "çûban", lê di kurdî de dengê "ş" yê hatîye parastin û bûye "şivan". Ev peyv çûye nav zimanê tirkî û bûye "çoban". Herwekî ku xuya dike, mîna ku hinek kes dibêjin, peywendîya vê peyvê bi gotina "ço, çov, şiv" nîn e.

Nimûne: şivan, gavan, berxvan, karvan / kehrikvan, golikvan, dikvan, masîvan

-van / -evan (II) : Paşgira "-van"ê xwedî çend guhartoyên din e. Li vir, herwekî di nimûneyên jêrîn de jî dîyar dibe, ji bo çêkirina navên hin kar û pêşeyan e. Ev paşgir maneya "ew kesê ku ji karê navbirî fêm û beşedike, ew şuxul ji destê wî têt û xwedan wî karî ye" dide.

Nimûne: nêçîrvan, baxvan, lîstikvan, bêrîvan, aşvan, kelekvan, melevan, dîdevan, nêrevan, segvan, baxçevan, rezvan, melekvan (serpale), melûvan, qeflevan

-van (III) : Paşgira "-van"ê ya di vê guhartoyê de bi maneya "kesê ku ji lédana alaveke mûzîkê fêm dike, jê dizane û bi wî kar û hunerî radibe" dide peyvê. Li vir hewce ye bête gotin, ku di zaravayên din yê kurdî de ji bo saloxdana ev celeb karê hunerî paşgira "-jen"ê tête bi kar anîn, ku ji lêkera "jenîn"ê ye, ango "lê dan". Bo nimûne, dibêjin "keça min kemanê xweş dijene". Gava ku em bala xwe didin zaravayê kurmançî dibînin ku piraniya Kurmançan ji dël "jenîn"ê ve lêkera "lê dan"ê bi kar tinin. Ji ber hindê, vê nimûneya me gotî, bi awayê "keça min kemanê xweş lê dide / keça min xweş li kemanê dixê" dibêjin. Ji vê jî dîyar dibe, ku kurmançî ji zaravayên din yê kurdî û herweha ji zimanên din yê îranî bi dîr ketiye.

Nimûne: bilûrvan, zirnevan, tembûrvan

-van / -evan (IV) : Paşgira "-van"ê ya di vê guhartoyê de bi maneya "kesê ku çavê wî li ser karê

navbirî ye, kesê li tiştêkî miqate ye, panêr" e.

Nimûne: dergêvan, piştêvan

-van (V) : Paşgira "-van"ê ya di vê guhartoyê de ji navdêrekê rengdêrekê diafirîne.

Nimûne: dilovan

-wan (I) : Paşgira hevmaneya "-van"ê. Ji bo maneya di vê nimûneya jêrîn de li guhartoya jorîn ya (-van / -evan) (I)ê binihêre.

Nimûne: selwan / serwan (ango şivanê deveyan)

-wan (II) : Paşgira hevmaneya "-van"ê. Ji bo maneya di vê nimûneya jêrîn de li guhartoya jorîn ya (-van / -evan) (IV)an binihêre.

Nimûne: pawan, sîwan

-wer (I) : Paşgira bi maneya "xwedî kar û pêşeya navbirî" dide peyvê.

Nimûne: pilewer

-wer (II) : Paşgira "-wer" ya di vê guhartoyê de bi maneya "xwedîbûn"ê ye.

Nimûne: serwer

-wer (III) : Ev paşgira ji navdêrekê rengdêrekê çêdike û dide nîşan dan ku "ew tiştê navbirî ji çi materyalî" çêbûye.

Nimûne: zîwer (zîvîn), pilewer.

-weş : Ji lêkera "weşîn"ê ye û gava ku wek paşgir tête bi kar anînê maneya "tiştê ku karê weşandinê dike dide" peyvê.

Nimûne: pêlweş

-wî : Bi alîkariya vê paşgirê ji navdêrekê rengdêr yan jî navdêreke nû tene afirandin.

Nimûne: tawî, bawî, efsanewî, rêwî

-xane (I) : Paşgira bi maneya "xanî, avahî" ye.

Nimûne: nexweşxane, dersxane, çayxane, qehwexane, şîrxane, mêvanxane, dîwanxane, karxane, çapxane

-xane (II) : Paşgira bi maneya "derdana ku tê de tiştêk tête kirin" e.

Nimûne: agirxane, qûşxane

-xane (III) : Paşgira bi maneya "xaneyê çek û silehan" e.

Nimûne: şeşxane

-xwar / xwer / -xur : Paşgira ji lêkera "xwarin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê xwarinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: xwînxwar, goştixwar, pîrxwar, kedixwar, mîratixwar, bertîlxwar, mirovxwar, heramxwar, selexwar, xemxwar

-xwaz : Paşgira ji lêkera "xwastin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê xwastinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: miradxwaz, azadîxwaz, xêrxwaz, qencîxwaz, daxwaz, dilxwaz, şerxwaz, aştxwaz

-xenêq : Paşgira ji lêkera "xeniqandin"ê ye û maneya kesê / tiştê ku bi karê xeniqandinê radibe dide peyvê.

Nimûne: gurxenêq, kerxenêq

-xur : bnr > xwar

-xwer : bnr > xwar

-xwez : bnr > xwaz

-xwên : bnr > xwîn

-xwîn : Paşgira ji lêkera "xwendin"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê xwendinê radibe" dide peyvê.

Nimûne: quranxwîn

-yar /-iyar (I) : Ev paşgir bi maneya "dost, heval" e.

Nimûne: bextiyar, hişyar, zanyar, jîyar, nasyar, berpîrsiyar, peyar,

-yar /-iyar (II) : Ev paşgir maneya "kesê ku wî karî dike" dide peyvê.

Nimûne: cotyar, kiryar, kirryar, şandiyar

-za (I) : Paşgira ji lêkera "zan / zayîn"ê ye û maneya "ji dayîka bûye, hatîye dinê, zaye" dide peyvê.

Nimûne: nûza (=berza), hevalza (cêwî)

-za / -zî / -ze (II) : Bi maneya "ji kesê navbirî çêbûye, ji kesê navbirî dayîka bûye, hatîye dinê, zaye" dide peyvê.

Nimûne: birazî / biraza, xwarzî / xwarza, mîrza / mîrze

-zade : Ev paşgir bi maneya "zarokê ji navbirî çêbûyî, zarokê ..." dide peyvê.

Nimûne: begzade, esilzade, mîrzade, begzade, şêxzade, şehzade, perîzade

-zan : Paşgira ji lêkera "zanîn"ê ye û maneya "kesê / tiştê ku bi karê zanînê radibe" dide peyvê.

Nimûne: kurdîzan, zimanzan, rêzan, hozan, qedirzan

-zen / -ezen : Paşgira ji lêkera "zeden" a farisî ye ku bergindê "jenîn" a kurdî ye. Li gor kurdî diva bû ev pagir biba "jen" lê herwekî xuya ye, me ev form ji farisî bi deyn kiriye.

Nimûne: borîzen, şûrzen, qelpezen, neyzen

-zar : Ev paşgir bi maneya cih e, cihê lê çandina tiştêkî ye. Bi alîkariya wê rengdêr yan jî navdêr tèn çêkirin.

Nimûne: gulzar, bazar (ji biha-zar).

-zed : Herwek paşgira "-zen"ê, ku me li jorê jê behs kiriye, ev paşgir jî ji lêkera "zeden" a farisî ye ku bergindê "jenîn" a kurdî ye. Wek paşgir maneya "kesê ku hatiye pêşniyar / pêşkêş kirin" dide peyvê.

Nimûne: namzed

-zede : Herwek paşgira "-zen" û "zed"ê, ku me li jorê jê behs kiriye, ev paşgir jî ji lêkera "zeden" a farisî ye ku bergindê "jenîn" a kurdî ye. Wek paşgir maneya "kesê ku tiştê navbirî lê ketîye" dide peyvê.

Nimûne: felaketzede, qezazede

-firaz / finaz / finyaz : Paşgira bi maneya "bilind" e.

Nimûne: serfiraz

-eng : Ev paşgir ji paşgira "-aheng" ya îranî kurt bûye û di kurdîya îro de bûye "-eng". Ji hokerekê navdêr çêdike.

Nimûne: pêşeng

Peyvên di stranan de

Amadekar : Emîn NAROZÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
liyan: dilê min liyan e	tedirgin, endişeli; kalbim endişe doludur	inquiet, anxieux; mon cœur est inquiet	anxious; my heart is anxious
yabo: bavo	ey baba	(rég. dans les parlers de la plaine de Mêrdîn) père	(reg.) father
akincî: dêmanî, dêmatî	yerleşik	sédentaire	sedentary
seyir kirin, sêr an se kirin	bakmak	regarder	to watch, to look at, to observe
sibeng, sibê, spêde	sabah	matin	morning
êmilk: berxê ber şîr	süt kuzusu	agneau de lait	suckling lamb
qelibîn: qulibîn	devrilmek	être renversé	upside down; spilt; somersault
gulm: qurt	yudum	gorgée	a mouthful (of food or drink especially)
bed	kötü	méchant, mauvais	bad, wicked
bedgiran	çok ağır	très lourd, implacable	very heavy, implacable
kefen	kefen	linceul	a shroud
dupa; dupa ez ji bo te hatim	çoğunlukla, çoğunlukla senin için geldim	surtout, principalement ; je suis venu surtout pour toi	mostly; principally, above all I have come for you
êlî: ê'î; bi dengê ê'î	yüksek; yüksek sesle	élevé, haut ; à haute voix	loud, speaking out loud
rîdan: rî, rû, ridên	sakal	barbe	beard
mûçing	cımbız	pince à épiler	tweezers
çêlî, çêlik: derziya gir	iri iğne	grosse aiguille	a big needle
berek	yamaç, yokuş	col	a pass
bereka çiyê	dağ yamacı	col de montagne	a mountain pass
bereka hespê	at yularının boyuna geçirilen bölümü	pièce d'harnachement entourant le cou du cheval	a part of a horse's harness going round its neck
çil	doruk	sommet, cime	summit, peak
çilê darê	ağaç doruğu	cime d'un arbre	the top of a tree
çilê çiyê	dağ zirvesi	sommet de montagne	mountain summit
lî çil û çiyân	zirvelerde, yükseklerde	sur les hauteurs, sur les sommets	on high land
namil: navmil	omuz arası, sırt	le haut du dos, emplacement entre les deux épaules	top of the back, a place between the shoulder
teng û ber: teng û berteng	gümül dürsük	sangle, pièces d'harnachement entourant le ventre et le collier d'un cheval	strap, girth
li ber guhê yekî xistîn: pê hisandin	kulağına çalmak	faire sentir, mettre la puce à l'oreille	to make s.o. feel, set s.o. thinking
jin berdan	boşanmak (kadından)	répudiation, divorce	repudiation, divorce
hozinan; hozê mîhan û berxan ; mîhan hoz kirin	oğlakları koyunlara salmak	lâcher des agneaux sous les brebis	to put lambs to suckle at ewes
hebûk	1) varlık, mal 2) atın bileği, bukağılık	1) (rég. dans le Caucase) richesse ; 2) paturon, articulation inférieure (au-dessus des sabots) du cheval	1) (regional in Caucasus) wealth; 2) a horse's pastern (a joint just above the hoof)
li ser darê piyan rawestan, li ser lingan rawestan	ayakta kalmak, sürekli çalışmak	rester debout, travailler sans cesse	to remain on one's feet, to work continuously
ramûsan: maç	öpücük, öpme	baiser	a kiss
ramûsîn	öpmek	embrasser	to kiss
hingivê zeyiyan	oğul balı	premier miel de jeunes abeilles	virgin honey, the first honey from a fresh swarm
seqlawî (seklawî)	seklavi, slav kökenli asıl at	cheval de race slave	a Slav breed of horse
nal	nal	fer à cheval	horseshoe
bizmar, mîx	çivi	clou	nail
şop	iz	trace, empreinte	a mark, stamp
selef, selefê siwaran	süvari alayı	convoi de cavalier	a cavalcade, a convoy of horsemen
cuhar, cuher, ceher, cehar	yem torbası	musette, mangeoire	nose bag, feed bag
qozax	yosma, şuh	coquette, belle	smart, good looking, pretty
ji ... û pêştir	den itibaren	à partir de	as from, starting with
dilober, dilber	güzel kız, dilber	beauté, belle fille	a beauty, beautiful girl
evîndar	aşık	amoureux	in love
ceng	savaş	guerre	war
cangorî	kurban	sacrifice, victime	sacrifice, victim
hez kirin	sevmek	aimer	to love
guhdar	dinleyici	auditeur	a listener
dengbêj	ozan	barde, troubadour	a bard, minstrel
narîn	zarif, ince	fin, délicat, raffiné	fine, delicat, refined
spîyê gezoya bîstanan	<i>aphis gossypii</i>	pamuk yaprak biti	puçeron du cotonnier	cotton aphid
spîyê gezoya gulan	<i>aphis rosae</i>	gül yaprakbiti(gül afidi)	puçeron vert du rosier	rose aphid
spîyê pelên gûzan	<i>callaphis juglandis</i>	ceviz yaprak biti	puçeron du noyer	walnut aphid
spîyê pelên teneyî (dext)	<i>rhopalosiphum padi</i>	ekin yaprak bitleri		the bird cherry-oat aphid
spîyê simbilên (guliyên) genimî	<i>sitobion avenae</i>	hububat yaprak biti	puçeron du noyer	the english grain aphid
spîyê pelên genimî	<i>schizaphis graminum</i>	buğday yaprak biti	puçeron de céréales	spring grain aphid
spîyê pelên xoxan	<i>myzus persicae</i>	şeftali yaprak biti	puçeron vert du pêcher	green peach aphid
spîyê koka nîskan	<i>smynthuodes betae</i>	mercimek kök biti	puçeron de la racine de lentilles	bean root aphid
kurmê baqilkan	<i>bruchus rufimanus</i>	bakla tohum böceği	charançon de pois	broad bean weevil
kurmê nîskan	<i>bruchus lentis bruchus ervi</i>	mercimek tohum böceği	zabre de graines de lentilles	lentil seed beetle
kurmê pelên genimî	<i>tinea granella</i>	buğday güvesi	teigne des grains	corn moth
kurmê koka teneyî (dext)	<i>zabrus tenebrioides</i>	ekin kamburböceği	zabre des céréales	corn ground beetle
spîyê genimî	<i>sitophilus granarius</i>	buğday biti	charançon du blé	wheat weevil
spîyê birincî	<i>sitophilus oryzae</i>	pirinç biti	charançon du riz	rice weevil
maşotê nokan	<i>heliathis dipsacea</i>	domates yeşilkurdu	leucanie	marbled clover
maşotê gûzika pembûyî	<i>helioverpa armigera</i>	pamuk yeşilkurdu	ver de coton	cotton bollworm
maşotê pelên pembûyî	<i>spodoptera littoralis</i>	pamuk yaprak kurdu	noctuelle méditerranéenne	egyptian cotton leafworm
maşotê pembûyî	<i>spodoptera exigua</i>	çizgili yaprak kurdu	légionnaire de la betterave	beet armyworm
kurmê gindoran (petêx)	<i>myiopardalis pardalina</i>	kavun sineği	mouche de melon	melon fly
kurmê fistiğan	<i>eurytoma pistacia</i>	fıstık içkurdu		eurytoma
qoşnîla koka nîskan	<i>porphyrophora polonica</i>	mercimek kökkoşnili	chenille de lentilles	polish cochineal
kurmê şitlê sebzeyan	<i>agrotis segetum</i>	bozkurt	noctuelle des moissons	turnip moth
tevnepîrka pembûyî	<i>tetranychus urticae</i>	iki noktali kırmızı örümcek	tétranyque à deux points,	twospotted spider mite.
tevnepîrka pembûyî ya sor	<i>tetranychus cinnabarinus</i>	kırmızı örümcek	araignée rouge du cotonnier	the carmine spider mite,
kurmê gûşiyên tiriyan	<i>lobesia botrana</i>	salkım güvesi	eudémis de la vigne	european grapevine moth
maşotê çereyê	<i>pyrausta sticticalis</i>	çayır turtılı	chenille des près	meadow caterpillar??
qimilê tûyan	<i>dolycoris baccarum</i>	đut kimilî	punaise des baies	sloe bug
kuliyê kesk	<i>tettigonia (locusta) viridissima</i>	yeşil çekirgeler	grande sauterelle verte	great green bush-cricket
kuliyê çolê	<i>schistocerca gregaria</i>	çöl çekirgesi	criquet pèlerin	desert locust
gûstêrk, teyîsteyîsok, teysok, stêrstêrok, agirstênk, zîqzîqok, baranbirk	<i>lampyris noctiluca</i>	ateş böceği	lampyre, ver luisant	glow-worm
spîyê guritîyê	<i>sarcoptes scabiei</i>	uyuzböceği	sarcopte	itch mite




Kurmê daran ê sor -
Cossus cossus



Kurmê daran ê zer -
Zeuzera pyrina



Spîyê gezoya bîstanan -
Aphis gossypii




Spîyê gezoya gulan -
Aphis rosae



Spîyê pelên gûzan -
Callaphis juglandis



Spîyê pelên teneyî (danî) -
Rhopalosiphum padi



Spîyê simbilên (guliyên) genimî -
Sitobion avenae



Spîyê pelên genimî -
Schizaphis graminum



Spîyê pelên xoxan -
Myzus persicae



Spîyê koka nîskan -
Smynthuodes betae



Kurmê baqilkan -
Bruchus rufimanus



Kurmê nîskan -
Bruchus lentis



Kurmê pelên genimî -
Tinea granella



Kurmê koka teneyî (dext) -
Zabrus tenebrioides



Spîyê genimî -
Sitophilus granarius



Spîyê birincî -
Sitophilus oryzae



Maşotê nokan -
Heliothis dipsacea



Maşotê gûzika pembûyî -
Helicoverpa armigera



Tevnepîrka pembûyî -
Tetranychus urticae



Tevnepîrka pembûyî ya sor -
Tetranychus cinnabarinus



Kurmê gûşiyên tirîyan -
Lobesia botrana



Maşotê çereyê -
Pyrausta sticticalis



Qimilê tûyan -
Dolycoris baccarum




Kuliyê kesk -
Tettigonia (Locusta) viridissima



Kuliyê çolê -
Schistocerca gregaria



Gûstêrk -
Lampyrus noctiluca



Spîyê gurîtiyê -
Sarcoptes scabiei

Hinek termên entomolojîyê

Amadekar: Eyûb Sînan KIRAN

kurdî	latînî	tirkî	fransizî	îngilîzî
şehmar, şemar, bijmar, şarmar, zîvzîve, hezarpê, çilpê, pîrpêtk	<i>chilopoda</i>	çîyanlar	mille-pattes	milipede, centipede
kurmê toxuman	<i>bruchidae</i>	baklagiller biti	puceron des cosses	bean weevils
spîyê biqalîk	<i>diaspididae</i>	kabuklu bitler	hémiptères	diaspididae, hemitera
goştîxwer	<i>carnivora</i>	etçil	carnivore	carnivora
perwanegel	<i>lepidoptera</i>	kelebekker	lépidoptère	lepidoptera
mêşgel	<i>diptera</i>	çiftkanatlılar	diptère	diptera, fly
gûzika buhukan	<i>cocoon, pupa</i>	böcek mummyaları	cocon	cocoon, pupa
xerzê mêşan		sinek yumurtaları	œuf de moustique	mosquito eggs
kurmê daran	<i>cossidae</i>	ağaç güvesi	zeuzère	cossidae
spîyê pelên nebatan	<i>aphididae</i>	yaprak biti	aphydés	aphididae
neçîrvan	<i>predator</i>	avcı	prédateur	predator
heşerexwer	<i>insectivorous</i>	böceklerle beslenen	insectivore	insectivore
giyaxwer	<i>herbivor</i>	otçul	herbivore	herbivore

Gulûgîyayên Kurdistanê

- I -

Amadekar: Ehmedê DIRÎHÎ

Termînolojîya zanistî ya botanîk û gulûgîyayan xwedî zimanekî pir taybetî ye. Di vê zanistê de her gulûgîyayek xwedî çend navên lipeyhev in. Bo nimûne, wek navê malbatê, navê wan yên xweser, navên varyetê û paşnavê wan.

Gava ku gulûgîyayeke nû yan jî cureyeke wê ya nû têtê dîtin, eger berê navê vî cureyî tune be, navê wê yê zanistî li gor prensîpeke zanistî û navneteweyî lê têtê kirin. Navê bîngêhî dîyar e, lê paşnav û cure ne dîyar e. Zanyar di vê rewşê de çend rêyan didin ber xwe. Yek ew e ku navê kesê ew gulûgîya dîtîye lê bête zêde kirin. Ya din jî, ku piranî li gor vî dîçin, navê cihê ku ew lê hatîye dîtin lê, zêde dikin. Ew cih dikare devereke be, bajar yan jî welatek be, yan jî navê xelkekî be. Bi vî rengî ew dibe xwedî navekî nû yê zanistî û temam. Êdî ew nav li gor wê li navenda navneteweyî ya qeydkirina navên zanistî têtê nivîsin û dikeve lîsteya katalogan.

Di navên gulûgîyayan de, em dibînin ku gelek navên zanistî hene, ku di bin van navên latînî de hatine nivîsîn: "Kurdicum, Kurdica, Kurdistanica, Carduchorum/ Karduchorum".

Me wisan rast dît ku em wan navaan wergerînin kurdî û bikin: Kurdî/... Kurdan, Kurdistanî/ ... Kurdistanê, Kardoxî.

Bo nimûne, "Tulipa" heye ku bi kurdî jê re dibêjin -alal, hilale, melaq, lale, helal. Lê li Kurdistanê cureyek hatîye dîtin ku jê re gotine "Tulipa Kurdica". Em jî vî navî dikin -laleya kurdî-. Heçî peyva lale ye, peyveke kevn ya îranî ye; -alaleg- paşê di farsî û kurdî de bûye -lale/ alal hwd.

Li gor vî, em li jêrê hindêk ji wan wergeran pêşkêş dikin.


Beşa *Kurdicum* û *Kurdica*

latînî	kurdî
<i>Achillea nobilis subsp kurdica</i>	Bêwîjan kurdî
<i>Alcea kurdica</i>	Hêroya kurdî
<i>Anchusa azurea var kurdica</i>	Gûrîza kurdî
<i>Anthemis kurdica</i>	Beybûna kurdî
<i>Euphorbia kurdica</i>	Xweşîla kurdî
<i>Fritillaria crassifolia subsp kurdica</i>	Gulşilêra kurdî
<i>Fritillaria imperialis subsp kurdica</i>	Gulnixwîna kurdî
<i>Hesperis persica subsp kurdica</i>	Qaçmûka kurdî
<i>Linum pycnophyllum subsp kurdicum</i>	Kitana kurdî
<i>Nerium oleander subsp kurdicum</i>	Rûlika kurdî

latînî	kurdî
<i>Ornithogalum kurdicum</i>	Axbandira kurdî
<i>Orobancha kurdica</i>	Giyagurga kurdî
<i>Phlomis kurdica</i>	Sîvanoka /guhbeloka kurdî
<i>Pistacia atlantica subsp kurdica</i>	Kizwana kurdî
<i>Plantago kurdica</i>	Belghewêza kurdî
<i>Prunus kurdica</i>	Êrûga kurdî
<i>Ranunculus kurdicus</i>	Çûnga kurdî
<i>Thlaspi kurdicum</i>	Nançûka kurdî
<i>Tragopogon kurdicus</i>	Spinga kurdî
<i>Tulipa kurdica</i>	Laleya / alala kurdî




Achillea nobilis subsp kurdica
Bêwîjana kurdî



Alcea kurdica
Hêroya kurdî



Anchusa azurea var kurdica
Gûrîza kurdî



Anthemis kurdica
Beybûna kurdî



Euphorbia kurdica
Xweşîla kurdî



Fritillaria crassifolia subsp kurdica
Gulşilêra kurdî



Fritillaria imperialis subsp kurdica
Gulnixwîna kurdî



Hesperis persica subsp kurdica
Qaçmûka kurdî



Linum pycnophyllum subsp kurdicum
Kitana kurdî



Nerium oleander subsp kurdicum
Rûlika kurdî



Axbandira kurdî
Ornithogalum kurdicum



Orobancha kurdica
Giyagurga kurdî



Phlomis kurdica
Sîvanoka - guhbeloka kurdî




Pistacia atlantica subsp kurdica
Kizwana kurdî



Plantago kurdica
Belghewêza kurdî




Prunus kurdica
Êrûga kurdî



Ranunculus kurdicus
Çûnga kurdî



Thlaspi kurdicum
Nançûka kurdî



Tragopogon kurdicus
Spinga kurdî



Tulipa kurdica
Laleya - alala kurdî

KURMANCE

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information
© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, www.fikp.org
Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN, Réalisation : M. HASSAN

Kamuran A. BEDIR KHAN

Joséfa BERTOLINO

Kendal NEZAN

Ferhenga KURDÎ - FRANSIZÎ

PÊŞGOTIN

Ferhenga kurdî-fransizî xwedî dîrokeke dûr û dirêj a ku diçe ta salên 1930an. Di wê demê de, birayên Bedirxan, tevî hin rewşenbîrên kurd ên li Binê Xetê, dest bi tevgera nûjeniya kurmanciyê kiribûn, kovara Hawarê û pirtûkên bi alfabe ya xwe ya latîni çap dikirin. Mîr Celadet li ser rêzimana kurmanci û ferhengeke kurdî-kurdî dixebitî. Mîr Kamûran jî dixwest ferhengeke kurdî-fransizî ya berfireh amade bike.

Rêzimana Mîr Celadet, piştî mirina wî ya bêwext, bi destê hevalê wî Roger Lescot hat temam kirin û di sala 1970ê de, li Parisê, li jêr navê *Grammaire kurde (dialecte kurmandji)* çap bû. Mixabin, temenê Mîr Celadet wefa nekir ku xebata ferhenga xwe ya kurdî-kurdî bibe serî.

Mîr Kamûran di sala 1947an de li Fransayê bicih bû, û ta 1970ê li Xwendegêha zimanên rojhilatî (*Ecole des langues Orientales*) ya Zanîngeha Parisê profesoriya ziman û çanda kurdî kir. Mîr, di van salan de çend pirtûk li ser rêzimana kurdî û fêrbûna zimanê kurdî weşandin, Qur'an wergerand kurmanci û li ser ferhenga kurdî-fransizî xebitî. Hevjîna wî, Nathalie d'Ossowetzky, ku aristokrateka polonî bû û baş bi rûsî û almanî jî dizanibû ta mirina xwe, di sala 1975an de, alîkariya vê xebatê kir, nexasim ji bo ferheng û çavkaniyên rûsî.

Di sala 1978an de Mîr Kamûran jî piştî nexweşîneke kurt koça dawî kir. Berî wefata xwe ji bo ferhengê bi qasî 25.000 peyv berhev kiribûn û wergerandibûn fransizî. Lê ew di wê baweriyê de bû ku ew xebatê nivê bû, ji çapê re ne amade bû. Dixwest ku bi hindikî peyvên ku di ferhengên Qanatê Kurdo û Bakaev de hene li ser bîrên zêde kirin û ferheng bi peyvên soranî û dimilî jî bîrên dewlemend kirin ta ku bibe ferhengeke hemî zarava û devokên kurdî.

Ev erka giran bi awayekî kete ser milên min.

Amadekirina ferhenga zimanê gelekî ku di coxrafyayê berfireh, asê û perçekirî de belav bûye, nebûye zimanê dewletê, neketiye nav teşeyên kedi yê normên fermî, bê guman ne karê kesekî û ne jî yê çend salan e. Ji bilî bikaranîna berhevok û ferheng û çavkaniyên nivîskî, xebatên li ser zargotinê, li ser zarava û devokên Kurdistanê û yê civatên kurdî yê dervayî Kurdistanê (Xorasan, Anatolya navîn, Qefqas û hwd.) divêtin.

Ji bo destpêkê me komeke xebatê li Parisê pêk anî. Tê de: du xwendekarên berê yê Mîr Kamûran, Joséfa Bertolino û Caroline Delassus, hevjîna Roger Lescot, Marlise Lescot, zimannasê kurd Xosrow Ebdullahi û hin welatîyên kurd ên ku li gundan mane, cotkarî, şivanî an jî pişekarî kirine, bi kurdî mezîn bûne û jiyane.

Piştî danîna Enstîtuya kurdî, bergeha me firehtir bû; me dikarî salê du caran zimannas, nivîskar û rojnamevanên kurd ên ji navçeyên cihê yê Kurdistanê bicivînin, li ser pirsên berhevkirina peyvên kurdî yê devokan, yê pişeyan, yê klasîkên

nivîskî û yê zargotiniyê û bikaranînan wan ên îdyomî û methelokî bixebitin. Xebatên *Kurmanci*, li jêr serpereştiya Reşo Zilan, alîkariyê hêja dan zelalkirina wateyên gelek peyv û îdyoman û bi vî awayî ferhenga me dewlemendtir kirin. Dîsa, xebata koma *Vate* li ser zaravayê kirdkî, li jêr serpereştiya Malmîsanij, û ferhenga wî, bûn bingeheke peyvên dimilkî yê ferhenga kurdî-fransizî.

Di warê soranî ango kurdî ya navendî de me ferhengên kurdî-îngilîzî yê Tewfîq Wehbi û Şefîq Qezaz wekî bingeheke zanî, ji wan û ji ferhengên kurdî yê pirzaravayî yê Gîwî Mukriyanî û Hejar Mukriyanî gelek sûd wergirt.

Ji dawîya sedsala XIXan ve de rojhilatnasên rûs û zanayên kurd ên sovyetî û rûsî di gelek waran de xizmeteke mezin dane pêşvebirina kurdnasiyê. Me di xebata xwe de ji Ferhenga kurdî-fransizî (*Dictionnaire kurde-français*) ya Alexandre Jaba, ku di sala 1879an de li Sankt Petersburgê çap bûye û ji 15.000 peyvyan pêk tê, ji ferhengên kurdî-rûsî yê zanayê kurd ê navdar Qanatê Kurdo, ji ferhengên X. Bakaev û I. Farîzov gelek sûd wergirtiye her weha ji berhevokên hêja yê zargotina kurdî yê zanayên kurd Ordîxan û Celîl Celîl.

Li Bakurê Kurdistanê jî di niv-sedsala dawî de ferhengnasiya kurdî pêşve diçe. Piştî ferhenga Yûsif Ziyaeddîn Paşa bi wergera tirkî ya M. Emîn Bozarlan, ferhengên kurdî-tirkî yê Musa Anter (1967) û D. Îzolî (1992), Zana Farqînî ferhengên mezin ên tirkî-kurdî (2000) û kurdî-tirkî (2005) amade û çap kirine ku xebatên dewlemend û hêja ne.

Ferhenga kurdî-fransizî ya li destê we yekem ferhenga bi zimanekî biyanî ye ku peyvên ji hemû zarava û devokên kurdî bi wergera wan a fransizî pêşkêşî xwendevanan dike. Tê de bêtir ji 85.000 peyv hatine civandin. Lê ji ber ku hin peyv li gor navçe û devokan bi awayên cuda tên bilêv kirin û lewre hatine dubare kirin hejmara peyvyan bi qasî 70.000î ye. Me ev guherteyên devokî bi hêviya ku rojekê bi kêrî lêkolînê li ser *diyalektoloji* ango zaravanasiya kurdî bîrên xistin nav ferhengê.

Li gor zimanên din ev hejmareke gelek bilind û nişana dewlemendiyê mezin e.

Kurdî, nexasim di warê jiyana gundîtiyê, ya cotkarî û xwedîkirina pez û dewaran de, her wisa ji di warê peyvendiyan civakî û merivatiyê de pirr zengîn e.

Em carina di warê wergera wan a fransizî de ketin tengasiyê. Zimanê Molière û Voltaire her çend kevn û navdar be jî, ji bo **xezûr** û **zîrbav** tenê peyva *beau-père*, ji bo **xesî** û **jinbavê** peyva *belle-mère*, ji bo **zava** û **kurhilî** *beau-frère*, ji bo **pismam**, **kurxal**, **kurmet**, **kurxaltî**, **amoza** peyva *cousin*, ji bo **dotmam**, **keçxal**, **keçmet**, **keçxaltî** peyva *cousine* bi kar tîne.

Di kurdî de bi dehan peyv li ser teşeyên simbêlan, li ser awayên serî, poz û difn, hwd hene ku li hemberî wan kêr wêşeyên fransizî hene, her weha ji bo navên kar û berxan li gor jî û temenên wan.

Di milê din de, kurdî di warên ramaniyê, felsefî, zanistî û îdarî de beşeke girîng a peyvên xwe ji zimanên din, bi taybetî ji erebî û fransizî deyn kiriye. Tê de çend sed peyvên yewnanî (bexdenûs, fidan, fistan, îspanax, kilise, mengene, mermer, qanûn, qelem, hwd.) hene, lê yê tirkî pirr kêr in. Ta ku me kariye, me li ber peyvên ku ji zimanên biyanî ketine nav kurdî rîşeya wan diyar kiriye.

Lê hin peyvên reng e biyanî ketine kirasekî kurdî yê wisa lihevhatî ku reg û rêçikên rêwîtiya wan a dîrokî ji binemala wan a seretayî êdî nexuya ne, li benda lêkolînê etimolojiyê zanistî ne.

Piraniya peyvên kurdî *polisemîk* ango pirwate ne. Wateya wan di nav zeman de, carna ji li gor herêm û navçeyan, li gor civatê û awayê bikaranîna diguhere. Tenê di mînakên de bikaranîna wan dikare têgihîştina wan zelal û ronak bike. Lewre me di vê ferhengê de cihê fireh daye mînakên bikaranîna peyvyan di wateyên wan ên cuda de. Ev nimûne, li gor pêdiviyê, ji çavkaniyên zargotinê, ji gotinên pêşyan û ji kilam û stranên hatine hilbijartin.

Wekî îngilîzî, kurdî jî pirîcar merem û mebestên xwe, ziravî û nuansên xwe bi formên îdyomî îfade dike. Û me qasî pê zaniye ew îdyom berhev kirine û bi kar anîne.

Ferhengên bêkêmasî, yê ku tevahiya peyv û dewlemendiyên zimanekî bicivînin nîn in. Ferhenga me jî ne îstisna ye; wekî Xanî yê mezin gotiye ji "kemalê dûr e". Peyvên hin devokan, yê ku em ji wateya wan ne ewle bûn, yê nûçekirî û hêj baş rûneniştî, navên hin giya û çûkan ji ber nebûna agahiyên tekûz di vê çapa yekem a ferhengê de cih negirtin Em hêvîdar in ku xwendevan û zimannas me ji van kêmasî û şaşîyan agahdar bikin ku çapên pêşerojê kamiltir bin.

Ferheng berhema xebata gelek welatîyên kurd û dostên fransiz e. Navên hin ji wan beşdarên domdar ên xebata amadekirinê, ya xwendin û rastkirinê, di rûpela pêşî ya taybetî de hatine nivîsin. Em ji hemîyan re ji bo keda wan, her weha ji ferhengnasê fransiz ê navdar Alain Rey ji bo pêşgotina wî, ji *Centre national du livre* (Navenda neteweyî ya pirtûkan) ya Fransayê ji ber arîkariya wê ya ji bo çapa ferhengê spasdar in.

Spasiyê germ û taybetî ji bo dotmîra me ya wefadar Sinemxan Bedirxan ji bo hevkarî û pistivaniya wê.

Bi vê xebatê me xwast rêza xwe ji zimannas û welaparêzê kurd ê mezin Mîr Kamûran Bedirxan re nişan bidin, amanca ku di vî warî de dabû ber xwe bibin serî û giyanê wî yê pak şad bikin.

Em hêvîdar in ku ew ferhenga ku tabloyê berfireh a zimanê kurdî yê zindî, geleri û edebî tevî dewlemendiyên wî yê zaravayî û devokî pêşkêş dike alîkar be ji bo xwendevanên kurd û fransizîxêv ên din ji bo çêtir têgihîştina ziman û çanda kurdî.

Kendal Nezan

INSTITUT KURDE DE PARIS

Gulana 2017an de
derdikeve

DICTIONNAIRE
KURDE - FRANÇAIS

FERHENGA
KURDÎ - FRANSIZÎ

Sous la direction
de Kendal NEZAN

Préface
d'Alain REY

85 000
entrées

*R*iveneuve
éditions

Civîna Stockholmê

Civîna Kurmancî ya 59an rojên di navbera 10 – 17.12.2016an de li Kitêbxaneya Kurdî li bajarê Stockholmê hat li dar xistin.

Di vê civînê de li ser van babetan hat kar kirin: Ji ferhengoka Memdûh Birîfkanî ya dawîya dîwana wî, Peyvên ji Berrîya Mêrdînê, Hin peyvên hêla başûrê Wanê, Tesîra zimanê asûrî/ sîryanî li ser kurmancî, Şetrenc, Peyvên ji ferhengoka Jaba ya rewendan, Hin peyv ji "Nameyek Şernexê" û Hin peyvên kêmnas/ nenas.

Ev hevalên han beşdarî civînê bûn: Rênas Awdal (Zaxo), Mistefa Aydogan (Mêrdîn), Rojen Barnas (Diyarbakir), Michael Chayet (Washington), Elîşêr (Wan), Newzad Hirorî (Dihok), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Selam Nûman (Qamişlo), Zinar Soran (Dêrik), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agirî).

Berhemên ji xebata vê civînê li vê jêrê tene pêşkêş kirin.

Divekim û Vedikim:

Bandora zimanê sûryanî/aramî li ser kurmancî

Bi xameya : Michael L. CHYET

Di vê lêkolînê da, behsa taybetmendiyên devokên du deverên Kurdistanê tê kirin – Behdînan tevî Şîrnex û Hekkarîyan ji aliyekî, û Tûr 'Abdîn ya Mêrdînê ji aliyekî din – ku têda akincî yan rûniştvan yan binecîyên mesîhî yên sûryanî-axêv bi sedan salan li teniştê kurmancan jiyane. Texmîna min wisa ye, ku sûryanî-axêv li pêvajoya sedsalên borî hînî kurmancî bûne, û ku wan -- çend aliyên rêzimana kurmancî bi şaşî fêm kiribûn, û ku ew şaşiyên wan bûne norma kurmancî ya wan deveran.

I. Lêkerên hevedudanî. **Ve-di-kim yan di-vekim** Pêspirtikên ku yan berî yan paş nîşana dema niho *di-* tên ev in: *ber-, çê-, da-, der-, hil-, ra, rû-, ve, wer-*.

Di pirranîya devokên kurmancî da û bi giştî di soranîyê da, nîşana dema niho *di-* (*[d]e-* bi soranî) dikeve di navbera van pêspirtikan û reh (yan koka) dema niho ya lêkeran; lêbelê li deverên behskirî (Behdînan tevî Şîrnex û Hekkarîyan ji aliyekî, û Tûr 'Abdîn ya Mêrdînê), nîşana dema niho *di-* tê pêş van pêspirtikan. Herwisa, nîşana neyînî *na-* jî. Mînak:

Kurmancî	Behdîni û Torî	Soranî
(Ez) hil- di -gr-im	di -hil-gr-im	hef- de -gr-im
(Ez) rû- di -n-im	di -rû-n-im	da- de -nîş-im

Neyînî:

Kurmancî	Behdîni û Torî	Soranî
(Ez) hil- na -gr-im	na -hil-gr-im	hef- na -gr-im
(Ez) rû- na -n-im	na -rû-n-im	da- na -nîş-im

Em binêrine şikla fermanî (împeratîf) ya van lêkerên hevedudanî:

hil- di -gr-im	<i>fermanî:</i>	hil-gr-e
rû- di -n-im	<i>fermanî:</i>	rû-n-e

Texmîna min wisa ye: ji bona yê ku hînî kurmancî dibin, xuya ye ku şikla fermanî ya lêkerên wek *rûne!* Yan *veke!* reha dema niho ya van lêkeran e, û li gorî wê mentiqê, dema niho bi xwe dibe *di-rûn-im* û *di-vek-im* li şûna *rû-di-n-im* û *ve-di-k-im*. Bi giştî xwendekarên zimanên biyanî bi vî awayî rêbaz û qanûnên rêzimanî sade dikin (simplification).

Ev rewşa hanê di farsîyê da jî tê xuya kirin: Li şûna *di-* ya kurmancî *mî-* heye, ku bi tacikî û darîya Efxanistanê wek *mê-* tê xwendin. Di farsîya Îranê da, *mî-* dikeve navbera pêspirtikê û reha dema niho ya lêkerê, lêbelê di devokên tacikî û darî da, *mê-* li pêş e, wek mînak: Farsî *ber-mî-â-yem* = 'Ez derdikevim' beramberê tacikî û darî *mê-ber-â-yem*; Farsî *der-mî-â-ver-em* = 'dertînim' beramberê tacikî û darî *mê-der-â-ver-em*. Li Efxanistanê, axêverên

zimanên puştûyî û ûzbekî wek zimanê duwem hînî farsî dibin, û her wisa li Tacikistanê û li Ûzbekistanê tacikî-axêv û ûzbekî-axêv bi sedan salan li teniştê hev jiyane. Vêca rewşa sosyolîngvîstîk ya van zimanan dişibihe rewşa kurmancî û sûryanî.

II. Dema paşerojê ya lêkeran. Hem bi kurmancî û hem jî bi aramîya nûjen (sûryanîya nûjen), dema paşerojê ji nîşana paşerojê (*ê/dê/wê* bi kurmancî û *bit-* bi aramîya nûjen) tevî geranî (yan subjunktîf) dema niho pêktê: mînak: *Ew ê bi-pirs-e* û *Ez ê bi-pirs-im*; *bit-mbaqir* û *bit-mbaqir-in* bi aramîya Nûjen (*mbaqir* = *bi-pirse*). Li Behdînan û her wisa li Tûr 'Abdîn jî, pêspirtika *bi-* ya geranî/subjunktîfê kême: mînak, dibêjin *dê pirs-ît* û *dê pirs-im* li şûna *Ew ê bi-pirs-e* û *Ez ê bi-pirs-im*. Di van devokan da, reha tazî ya dema niho (*pirs-*) dişibihe şikla geranî/subjunktîfê ya aramîya nûjen (ango *pirsît* dişibihe subjunktîfa tazî ya aramî *mbaqir*). Ji ber ku ev diyardeya hanê bi tenê xuya ye di devokên kurmancî da yê ku li teniştê mesîhîyên aramî-axêv hene, em dikarin wê yekê wek bandora zimanê aramî li ser kurmancî bibînin.

III. Nîşankirina zayenda rengdêran û partîsîpên dema borî. Di devokên behdîni da, zayenda rengdêran tê diyar kirin: wek mînak: *yê* baş – nêr e; *ya* baş – mê ye; [*yêlt* baş – pirhejmar e. Ji ber ku di zimanên samî da (ango 'erebî, aramî/sûryanî û 'ibrî), zayenda rengdêran her gav bi qertafekê tê nîşandan (mînak: *şayyib* = *yê* baş [nêr]; *şayyiba* = *ya* baş [mê]; *şayyibîn* = *yê* baş [pirhejmar]). Li Tûr 'Abdîn jî, ev diyarde jî heye, herçende ku bikaranîna wê kêmtir xuya ye.

nêr:	<i>wê</i>	yan	<i>î</i>	= <i>yê</i> bi behdîni
mê:	<i>wa</i>	yan	<i>a</i>	= <i>ya</i> bi behdîni
pirhejmar:	<i>wê</i>	yan	[<i>y</i>]a	= <i>yê</i> bi behdîni

Mînak: Paîza, tîrh û şebes û petîx jî, *a* zeñf in.; Ew heywanat hemû jî *a* sêhrkirî ne

Destnîşankirina pirhejmar wek 'a' li şûna 'ên/êt' – şaşiyên xwendekarên tîne bîra mirovî, yê ku '*destan min' li şûna 'destên min' dibêjin.

Vêca, ev yek -- nîşaneke din ya şaşiyên biyanîyan e, yê ku hînî kurmancî bûn.

IV. Li Behdînan, li şûna *hiştin/hîştin* şikla *hêlan* heye. Reha dema niho jî: '*di-hêl-im*'. Bi soranî jî dibêjin *hêştin* (dema niho: *de-hêl-im*), û her wisa bi farsî jî lêkera *haştan* jî heye (dema niho: *mî-hal-am*), ku îro kême bi kar tê. Ji ber ku *hêlan* bi tenê li Behdînan (û li Qerejdaxê jî, li gorî Mehmûd Lewendî) diyar e, ez wisa texmîn dikim ku ev yek jî mîna keke din ya şaşiyên biyanîyan e, yê ku hînî kurmancî bûn.

Hin peyvên kêmnas – nenas

- VI -

Amadekar: Reşo ZÎLAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
şîl kirin; tûjî kirin, zûl kirin	dilimlemek	couper en tranches	to slice
şîl; tûjî, tîşk, kûzî, zûl, tîfş	dilim	tranche	a slice (for fruit)
şîlaq; şîlmaq, zîrçoq	çapak	chassie	eye gunk
şopik	merdane	rouleau	rolling-pin
şurt; qarûş	sokak süpürgesi	grand balai	big broom
şût; şematokî, huli	kaygan	glissant	slippery
şûtikîn	kaymak	glisser	to slip
tefeş; rû, çehre	çehre, yüz, surat	face, visage	face
tefeşpan; rûpan	geniş çehreli	visage plat et large	flat face
telb	kurum	suie	soot
terş; pez	küçük baş hayvanlar	ovins	sheep and goats
terşvan	küçük baş hayvanlar çobanı	berger d'ovins	sheepkeeper
berdestik	mutfak eldiveni	gant de cuisine	glove shaped pot holder
tileylan (cizîrî)	palyaço	clown	clown
til kirin (qoçgiri); avêtin, çekirin	atmak	jeter, lancer	to throw
tilmiz; tilik	şingil, çitnik	grapillon	a piece of bunch
tînk; dirrî, dirrik, strî, kelem, qelem	diken	épine	thorn
ting (t'ing); sergo, basme	gübrelik	fumier	dunghill
sergo; poxang, gûfank, sergîfk	mezbele, çöplük	décharge publique	tip, dump
tirak; tirag	sandalet	sandalette	sandal
tîrava; wexta 'esrê ye, 'esir	ikindi	milieu de l'après-midi	mid-afternoon
tirmêt; tîrbît, hevalên jidîl û samîmî, <filankes û filankes tirmêtên hev in>	tanış, tanıdık, samimi arkadaş	ami sincère, ami dévoué	close friend
ûd; minet	minnet	obligation, dette de reconnaissance	gratefulness, obligation

Ji ferhengoka Memdûh Birîfkanî

ya dawîya dîwana wî

- III -

Amadekar: E. NAROZÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
pelixîn	ezilmek, darbeyle ezilmek	être écrasé	to be crushed
peleşqe; kevn û kot	külüstür, eski püskü, pejmürde	vieillesse, usé, élimé	worn out
peqîşk; batîfk, belqok, peqîk, peqpeqîk	kabarcık	ampoule, cloque	blow, blister
perîşk; pîrmîçk, kuliyên berfê	kar tanesi	flocon de neige	snowflake
perozînk	karmaşa, kargaşa, bela	trouble	trouble
peyak; kesê ku ji axa xwe dûr dikeve, barkirî, koçkirî	gurbetçi, göçmen	émigré	immigrant, migrant
pêrar	bir önceki yıl	il y a deux ans	two years ago
pêrpîne	semiz otu	pourpier	purslane (<i>portulaca oleracea</i>)
pêşkêş; diyarî <ev pêşkêşa min e>	hediyeye	présent, cadeau	gift
pîfdank; zeqzeqe	balon	ballon	balloon
pîrêmîz; pîrmûs, pîrmûs	purmuz	réchaud de camping	primus
pîşî/pîşî/pîş; kêxmîte, kimxîte	un tozu	poussière de farine	milldust
pîtpîp; pîtepit	dırdır	grommellement, murmure	grumble, murmur
pût	çılız, güçsüz	chétif, maigrichon	puny
pîremêr; kalemêr	yaşlı erkek	vieillard	old man
pîlox; pûx	tam olgunlaşmış	bien mûr	overripe
porpor; lomekirin, pûkepûk, pîtepit	dırdır	grommellement, murmure	grumble, mumble
ripin; repin	bitki kökü	racine	plant root
taf, afet	bela, afet	calamité, désastre	disaster
tamar/temar; tamara xewê, morîka xewê	derin uyku	sommeil profond	deep-sleep
tamîzk; şevtîrsk, hîlbûn/hîldan	uçuk	bouton de fièvre, herpès	cold sore
tebayî; tevahî	birlik, birliktelik	ensemble, totalité	togetherness, together
tîlîz/telîz bûn; (terr û telîz bû) <kabarcık su topladı>	su toplamak (sivilce için)	s'infecter, devenir purulent	inflamed (blister)

Ferhengoka kurdî ya A. Jaba 1858

devoka Hekarî û revendên li derdora Mûş û Bazîdê - III -

Amadekar: ELÎŞÊR

	kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
cirnix	şemate, hêwirze	şamata, hengame	tumulte, vacarme	tumult
cûn	cûm	bir çîgnemelik	chique, quantité à mâcher en une seule fois	a mouthful of chewing gum
cihal	çewal	çuval	gros sac	sack
çespan	çapik	çevik	agile	agile
çekme	cizme	çizme	botte	boot
çuneyî	tuneyî	yokluk; fakirlik	indigence, pauvreté	nothingness; poverty
çûyîn	çûn	gitmek	aller	to go
çûye şû	çûye mêr	evlenmiş kadın	mariée	married women
çêr	xeber	küfür	juron, invective	swear
dadfiryad	hewarûgazî	feryat ve yardım	appel au secours	sos
debîr	katib	sekreter	secrétaire	secretary
dik	sekû	seki	banc en terre battue	a platform or earth bank
dî gel yekûdû	bi hev re	birlikte, beraber	ensemble	together, togetherness
demîn	xûy	huy, alışkanlık	caractère, nature	habit, temper
dewar	hesp	at	cheval	horse

Hin peyvên hêla Başûrê Wanê

Amadekar: Mele ŞEBAN TURGUT û ELÎŞÊR

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
axur; rêya paxêlan	yük kızıağı yolu ve izi	piste de traîneau	sled path and track
baskê hîryê; hîrya şehkirî ya ji bo ristinê li mil hatî alandin	eğirmek üzere kola sarılan yün miktarı	quantité de laine peignée enroulée autour du bras pour être filée	in spinning yarn, yarn wrapped around arm
berçik; ciyê qûtreşandina teyran	kuş yeminin serpildiği yer	endroit où on jette des grains pour les oiseaux	place where birdseed is strewn
berkur; çermê xebxebê	boynun altındaki sarkık deri	fanon	dewlap
berqendik; benê li ber kofiyê tê girêdan	hotozun etrafına bağlanan kaytan	cordelettes de la haute coiffure traditionnelle kurde	ornate cord for women's headdress
bêçî; sexel; navê karik û berxan a bi giştî	oğlak ve kuzu sürüsü	troupeaux d'agneaux et de cabris	herd of kids and lambs
biçirk; kada bê mirtoxe, bê kakil	yağlı sade çörek	petit pain au beurre	unsweetened plain pastry
bilulik; lûleya ji darê çêbûyî ya bi heyayê zarokê kur ve dihat girêdan ku cihê xwe şil neke	küçük çocuklarda sidik akıtma kavalı	tube en bois fixé au pénis de petits garçons pour les empêcher de souiller leur lit	in baby boys wooden tube for preventing bedwetting
biluvan; perdeya li ser berxika nû hatîye dinê	yeni doğmuş oğlak veya kuzuyu çevreleyen zar	membrane entourant un agneau nouveau né	membrin around newborn lamb
bindanik; nanê ji arvanê ber destarê	eldeğirmeni unundan yapılmış ekme	pain fait avec de la farine du blé moulu avec un moulin à main	bread made from flower ground in a handmeal
birnut; birnotî	enfiye	tabac à priser	snuff
bizmirik; bizmik	burunluk	muselière	muzzle
bor; darê ku livayê lê dipêçin	keçe dürtüm sınığı	bâton autour duquel on enroule la laine cardée	stick for carding felt into batt
cawîya gûniyê; beniştê gûniyê	geven sakızı	gomme d'astragale	a type of astragalus gum
cehcur; erdê hatî kutan, hatî qahîmkirin	basılarak sıkıştırılmış toprak	terre compressée	compressed soil
celeb; koma masîyên ku payîzan koç dikin	güzün göçen balık sürüsü	banc de poissons migrant en automne	fish flock which migrate during the autumn
çarberî; tîfka aşvanî, cihê agirê aşvan	değirmenci ocağı	âtre du meunier	fireplace of a miller
çemberak; şîşa yan hesina devê tirpanê	pirazvana	partie aigue du râteau qui s'encastre dans le manche	tang
bi destîyê ve girê dide			
çilak; singa bi arîkan ve tê aliqandin	çengel (ağaçtan)	crochet en bois	wooden hook
çilay; sîle, zileh, şemaq, şimaq, şîmaq, şîrmaq, şeqam, şilaq	tokat	gifle	slap
çingiz; mirovê kurt û lawaz	kısa ve sıska	de taille courte et malingre	short and skinny
destbilunik; destbênk, destbilînk;	bağırda	bandelette ou cordon entourant le berceau pour empêcher le bébé de tomber	the strap with which a baby is kept in its cradle
benê zarok di landikê de pê tê girêdan			
deveker; qismê ji zevîyê yê nehatibe dûritin li ser pêyan maye	tarlanın biçilememiş bölümü	partie non labourée d'un champ	part of field which has not been harvested
dexş; dehîf, dehîdan	iteleme	poussée, bousculade	push
dewilte; dewij, dewijn, tiflê li ser niwîşkê qijilandî dikeve	eritilmiş yağın üste çıkan tortusu	écume se formant à la surface du beurre fondu	froth that forms on the surface of melted butter
dunhe; dange, cihê alifê pez a li ser berfê	kar üstünde küçük başhayvanlara yem verildiği yer	emplacement sur la neige pour le fourrage des ovins	sheep forage place on snow
êşile; goşe, qurnet (ji bo keleh û xaniyan... birîna penîrê wekî çarêşile / çargoşe; penîrê çarêşile)	köşe	coin	corner
fişose; cûreke kûjeyan a bêhn jê tê	kokarca	putois	skunk
gerdîle; toterik, tayîre, çerx, teker	tekerlek, teker	roue	wheel
gindir; gundor, bejna insanê kurt û tijî	kısa ve tıknaz	courtaud	short and fat
gizim (kirin); xwe jê re hişk kirin	horozlanmak	se pavaner, faire le bravache	to swagger
gizîre; gizre, xang	yemlik olarak kaldırılan meşe yaprakları yığını	amas de feuilles de chêne stockées comme fourrage	oak leaves organized as a stack
gîrnijîn; bişirîn	gülümsemek	sourire	to smile
gîsî; cihê birînê	yara izi	cicatrice	scare
gocar; koçak, palê herî dawîyê	artçı ırgat	le dernier moissonneur d'un rang	the last reaper in the row
gulte; balgeya stûnê, serstûn	sütun başlığı	chapiteau	column head
gurgemêş; har, hirçê gurgemêş; hirçê har	azgın ayı, kuduruk ayı	ours en furie	furious bear

Devokê Berriya Mêrdînê

- X -

Amadekar: Hemîd KILIÇASLAN


kurdî	tirkî	fransîzî	ingilîzî
kozîya agir; kêle	ateş yakmak için yapılan odun/ tezek veya çırpı çatısı	disposition conique de bûches ou de brindilles pour faire le feu	pyramid fire
kulbuşî; kurî, kulbî <ji kulbuşî xwarin>	açgözlülük, açgözlülükten yemek	avidité, <manger par avidité>	greed, rapaciousness
şegreşîwan	ağıtçı kadın	pleureuse, vocératrice	female professional mourner
hitil-mitil	illahî	quoi qu'il arrive	or else
kurreder; qurreder	elin körü, zehir zıkkım	ferme la !, ta gueule !	general curse word, shut up !
kurrûze	paket, kutu, karton	paquet, boîte	pack, box
kurtêlxur	otlakçı, başkasının sırtından geçinen	parasite, pique-assiette	freeloader, sponger
kutayî, raçandina baş	iyi dokunmuş	bien tissé	well woven
latan	deve bacağı	patte du chameau	camel leg
lûl	gezinme, dolanma	promenade, flânerie	wander around
lûl bûn	gezinmek, dolanmak	flâner, se promener	to wander around
malanî; malane	eve yaraşır ev hanımı	maîtresse de maison	housewife
malin; maliştin	süpürmek, silmek	balayer, essuyer	to sweep, erase
mazmaze	kart koç, yaşlı koç	vieux bouc	old ram
mejileqandin	1. beyin sarsıntısı, 2. sapıtma	1. choc cérébral, 2. déraillement, dérangement	1. brain concussion, 2. go haywire
melkezêt, merkezêt	ince ve şefaf bir tür kumaş	variété de tissu mince et transparent	a type of tiny and transparent fabric
merkeb; seleşîr, seleşîr, çapîk	altına yemek konulan büyükçe sepet	grand panier en forme de cloche sous lequel on met la nourriture à protéger des animaux	upside down basket for protecting food from insects and animals
mestere; nimûne	örnek, nûmunelik	échantillon	sample
mewjîok; hêşînok; wek pizikan sor dibe, tayeke dezîyê rengîn tê hildikişînin	mavi irinli çiban	pustule à pus bleuâtre	a type of foot blow
miz, mize	mayhoş	acidulé	tart
mezeloq	yapışkan	collant, gluant	sticky
mîl	yara fitili	mèche médicale	wound wick
mirarokî; mirîmirî	ölgün	mourant	deathly looking
mirçînî	şaplatma	claquement	clapping
mixmixîn; ximximîn	patates, soğan, et vb.nin bütün halinde ocak veya tandırda ateş altında veya fırında kapalı bir kap içinde iyice pişmiş durumu	(légume) cuit braisé ou étuvé	to roast (onions, potatoes, etc.) thoroughly

Şetrenc

Amadekar: Selam NÛMAN

kurmancî	tirkî	fransîzî	ingilîzî
şetrenc, setrenc, kişik	satranç	échecs	chess
texteyê şetrencê	satranç tahtası	échiquier	chessboard
malik	hane	case	square
malikên rengtarî	koyu haneler	cases noires	dark squares
malikên rengvekîrî	açık haneler	cases blanches	light squares
berik, kevir	taş	pièce	piece
kevirên spî	beyaz taşlar	pièces noires	white pieces
kevirên reş	siyah taşlar	pièces blanches	black pieces
şah, melik	şah	roi	king
wezîr, ferezîn	vezir	reine	queen
keleh, rex	kale	tour	rook
hesp	at	cavalier	knight
fil	fil	fou	bishoppion
peyak, peya, serbaz, cundî, beydeq	piyon	pion	pawn
şahmat, şaxmat	şah mat	échec et mat	checkmate
teslîm!	mat!	mat	resignation
pate, beraber, serbiser, dergûşî, dergûşkî	yenişememe, berabere kalma	match nul, pat	draw
vekirin	açılış	ouverture	opening
federasyona cihanî ya şetrencê	dünya satranç federasyonu	fédération mondiale des échecs	world chess federation
rêbazên şetrencê	satranç kuralları	règles des échecs	rules of chess
rêz	yatay sıra	rang horizontal	rank
stûn	dikey sıra	rang vertical	file
kiş	şah	échec	check
pateya bêkiş	pat	impasse	stalemate
livên vekirinê	açılış hamleleri	mouvements d'ouverture	opening moves


rox	rok	roque	castling
di derbasbûnê de	geçerken almak	en passant	in passing
payedarkirin	piyon terfisi	promotion	promotion
xwarin	almak	prendre	to capture
liv	hamle	mouvement	move



Texteyê şetrencê



Kevirên şetrencê



Rêza kevîrên şetrencê



Şah, melik



Wezîr, ferezîn



Fîl



Hesp



Keleh, rex



Peyak, peya, serbaz, cundî, beydeq



rêzkirina kevîrên şetrencê

Hin peyv ji "Nameyek Şernexê"

ya pirtûka Evdîrehman Gundikî

- I -

Amadekar: Mistefa AYDOGAN

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
aravî	açık mavi	bleu clair, bleu de lessive	light blue
avrijînek	suyun durmadığı eğimli arazi	pente raide ou l'eau coule sans cesse	sloping land where water constantly flows down
avxwerik	sel sularının arazide oluşturduğu oyluk	cavité creusée par des crues	shallow gully
bablesût	hortum	tourbillon	whirlwind
bakut	rüzgarla oluşan kar yığını	congère	snowdrift
balingî	yastık	oreiller	pillow
bapîçk, bapêçk	dürüm	rouleau	roll (of food)

bavdost	babanın arkadaşı, dostu	ami du père	father's friend
bavenî	rûzgar almayan yer	endroit à l'abri du vent	windless place
bebeşêr (babeşêr)	aslan yavrusu	lionceau	lion cub
belsîs	dik kulaklı beyaz tiftik keçisi	chèvre angora blanche aux oreilles droites	upright eared white Angora goat
berbin	dağ eteği düzlüğü	plateau de piedmont	mountain range
berdolik	küçük koyak	petit vallon	small cove
berreşe: xwehdana simbêlan	bıyığı terleme çağı	puberté (lit. âge de transpiration de la moustache)	puberty (lit. perspiration of the mustache)
berevez: berqefa	rûzgar ve yağmur almayan doğal koranak	abri naturel qui protège du vent et de la pluie	wind-safe and rainsafe natural shelter
bergelî	ana vadiye açılan dere yatakları	lits de ruisseaux aboutissant à la vallée principale	creek bed in the main valley opening
berhilûsok	kaygan taş	Pierre glissante	slippery stone
berûk	saf tutmuş tarım işçilerinin işe koyulma vaziyeti	mise au travail d'ouvriers agricoles disposés en rang	line of farmers working in the field
beten	toprak örtülü eğimli dağ arazisi	terrain montagneux escarpé	sloping mountain land covered with soil
binas	suç, hata	faute	crime, fault, guilt
binaskar	suçlu, hatalı	coupable, fautif	guilty, criminal
bixurûk	çiçek tozu	pollen	pollen
bolik	genç kız ve delikanlıların karşılıklı atışmaları	chant lyrique interprété en alternance par des garçons et des filles	lyric sung in alternate repartee by a male and a female
bûklûk	tomurcuk	bourgeon	bud, rosebud
ciwanekeç	genç kız	jeune fille	young girl
coqî: bîr	grup (insanlar için)	groupe (d'hommes)	group (of people)
çakemêr	yiğit	brave	brave
çakemêranî	yiğitlik	bravoure	bravery
çakemêrane	yiğitçe	bravement	bravely
çavşelipî	çekik gözlü	qui a des yeux bridés	slant-eyed, almond-eyed
çêrik: dûrikên dawetan, dîlok, dîlanok, stranên dawetan	halay türkûleri	chanson de danse, air de danse	dance song
çim(ik)	koyun veya keçi trnağı	sabot d'ovidés	sheep hoof
çîq(ik): çît	çît	claire	reed fence
çîx xwastin	meydan okumak	défier	to defy, challenge
darmêş	yaban arılarına kovan işlevi gören ağaç kovuğu	ruche d'abeilles sauvages dans un creux d'arbre	wild bees' trunk hallow hive
dêhleşêr: dêleşêr	dişi aslan	lionne	lioness
dêhl-: dêl-	köpek, kurt vb gibi hayvanlarda dişilik ön eki	femelles	prefix denoting a female animal
deqdan: distan, dûzdan, sêpik, dexdanik, xacirgan	sacayağı	trépied	trivet
derkon	çadır önü	pas de la porte de la tente	the area in front of the tent

Gulûgîyayên Kurdistanê

- II -

Amadekar: Ehmedê DIRIHÎ


Beşa Kurdicum û Kurdica

Latînî	Kurdî
<i>Astracantha kurdica</i>	Gunîya kurdî
<i>Aubrieta parviflora var kurdica</i>	Dîdaya kurdî
<i>Centaurea kurdica</i>	Çavbeloqa kurdî
<i>Cephalanthera kurdica</i>	Salepa kurdî
<i>Colchicum kurdicum</i>	Ciwanemerga kurdî
<i>Corydalis rutifolia subsp kurdica</i>	Şepirzeya kurdî
<i>Cynara kurdica</i>	Engînara kurdî
<i>Daphne oleoides subsp kurdica</i>	Defneya kurdî
<i>Delphinium kurdicum</i>	Delava kurdî
<i>Draba brunifolia subsp kurdica</i>	Gulzerfina kurdî
<i>Euphrasia kurdica</i>	Devhirça kurdî
<i>Hedysarum kurdicum</i>	Guringeya (qoringe) kurdî
<i>Iris reticulata kurdica</i>	Newroza kurdî
<i>Koeleria kurdica</i>	Giyagewrika kurdî
<i>Linaria kurdica</i>	Belgîzera kurdî
<i>Marrubium kurdicum</i>	Pisila kurdî

<i>Noanea kurdica</i>	Sewinceya kurdî
<i>Paronychia kurdica</i>	Kepeka kurdî
<i>Potentilla kurdica</i>	Hêzgiyaya kurdica
<i>Prangos kurdica</i>	Heliza kurdî
<i>Pterocephalus kurdicus</i>	Sirgeya kurdî
<i>Rhynchocorys kurdica</i>	Nukloya kurdî
<i>Scabiosa kurdica</i>	Zîwana kurdî
<i>Scorzonera kurdica</i>	Zirgîzêra kurdî
<i>Scutellaria kurdica</i>	Majarka kurdî
<i>Sideritis libanotica subsp. kurdica</i>	Çayçiyaya kurdî
<i>Symphytum kurdicum</i>	Mijmijoka kurdî
<i>Taraxacum kurdicum</i>	Giyakewa kurdî



Astracantha kurdica -
Gunîya kurdî



Aubrieta parviflora var kurdica -
Dîdaya kurdî



Centaurea kurdica -
Çavbeloqa kurdî



Cephalanthera kurdica -
Salepa kurdî



Colchicum kurdicum -
Ciwanemerga kurdî



Corydalis rutifolia
subsp. kurdica -
Şepirzeya kurdî



Cynara kurdica -
Engînarâ kurdî



Daphne oleoides subsp. kurdica -
Defneya kurdî



Delphinium
kurdicum -
Delava kurdî



Draba bruniifolia subsp. kurdica -
Gulzerfina kurdî




Euphrasia kurdica -
Devhirça kurdî



Hedysarum kurdicum -
Guringeya (qoringe) kurdî



Iris reticulata kurdica -
Newroza kurdî



Koeleria kurdica -
Giyagewrika
kurdî



Linaria kurdica -
Belgîzera kurdî



Marrubium kurdicum -
Pisila kurdî



Noanea kurdica -
Sewinceya kurdî



Paronychia kurdica -
Kepeka kurdî



Potentilla kurdica -
Hêzgiyaya kurdica



Prangos kurdica -
Heliza kurdî




Pterocephalus kurdicus -
Sirgeya kurdî



Rhynchosorys kurdica -
Nukloya kurdî



Scabiosa kurdica -
Zîwana kurdî



Scorzonera kurdica -
Zirgizêra kurdî



Scutellaria kurdica -
Majarka kurdî



Sideritis libanotica subsp. kurdica -
Çayçiyaya kurdî



Symphytum kurdicum -
Mijmijoka kurdî



Taraxacum kurdicum -
Giyakewa kurdî

Beşa Kurdistanica

Latînî

Aquilegia kurdistanica

Bellevalia kurdistanica

Crepis kurdistanica

Kurdî

Pêkotira kurdistanî

Gêleqira kurdistanî

Sîroka kurdistanî

Crucianella kurdistanica

Paeonia kurdistanica

Scilla kurdistanica

Spîneşa kurdistanî

Gulhirça kurdistanî

Gêlika kurdistanî



Aquilegia kurdistanica
Pêkotira kurdistanî




Bellevalia kurdistanica -
Gêleqira kurdistanî




Crepis kurdistanica -
Sîroka kurdistanî



Crucianella kurdistanica -
Spîneşa kurdistanî



Paeonia kurdistanica -
Gulhirça kurdistanî



Scilla kurdistanica -
Gêlika kurdistanî

Beşa Carduchorum - kardoxî

Latînî

Allium carduchorum

Amygdalus carduchorum

Biarum carduchorum

Convolvulus carduchorum

Kurdî

Sîrmoka (sîrim) kardoxî

Behîva kardoxî

Karîya kurdoxî

Lavlavka kardoxî

Delphinium carduchorum

Fritillaria carduchorum

Onopordum carduchorum

Thesium carduchorum

Hêzerana kardoxî

Gulşilêra kardoxî

Kerenga kardoxî

Giyastêrka kardoxî



Allium carduchorum -
Sîrmoka (sîrim) kardoxî



Amygdalus carduchorum -
Behîva kardoxî




Biarum carduchorum -
Karîya kurdoxî




Convolvulus carduchorum -
Lavlavka kardoxî



Delphinium carduchorum -
Hêzerana kardoxî



Fritillaria carduchorum -
Gulşilêra kardoxî



Onopordum carduchorum -
Kerenga kardoxî



Thesium carduchorum -
Giyastêrka kardoxî

KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information

© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, www.fikp.org

Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN, Réalisation : M. HASSAN